

# Artuklu Kurdology

# Artuklu Kurdology

Çocuk ve İlkgençlik Edebiyatı Özel Sayısı  
Jimara Taybet ya Edebîyata Zarok û Nûciwanan  
Special Issue of Children's and Youth Literature

Periodical Journal for Kurdish Studies

18

January 2025

e-ISSN: 3062-0236



**MARDİN ARTUKLU**  
**ÜNİVERSİTESİ**  
**TÜRYİYE'DE YAŞAYAN DİLLER**  
**ENSTİTÜSÜ**

**Artuklu Kurdology**  
e-ISSN: 3062-0236  
<https://dergipark.org.tr/tr/pub/artuklukurdology>

**SAYI / JIMAR: 18**    **ISSUE: 18**

Ocak/Rebendan 2025    January 2025

**Yayıncı / Weşanger**    **Publisher**  
Mardin Artuklu Üniversitesi/MAÜ Press    Mardin Artuklu University /MAU Press  
<https://www.artuklu.edu.tr/mauyayinevi>    <https://www.artuklu.edu.tr/mauyayinevi>  
puplisher.maupress@artuklu.edu.tr    puplisher.maupress@artuklu.edu.tr  
@mauyayinlari    @mauyayinlari

**Kapsam / Qeware**    **Scope**  
Kürt Çalışmaları / Xebatên Kurdî    Kurdish Studies

**Periyot / Periyod**    **Period**  
Artuklu Kurdology yılda iki kez (Mart-Eylül) yayımlanan    Artuklu Kurdology is a peer-reviewed academic journal  
hakemli akademik bir dergidir.    published biannually (March-September).

**Yayın Dili / Zimanê Weşanê**    **Publish Language**  
Türkçe, Kürtçe, İngilizce    Turkish, Kurdish, English

**Dergi Politikası / Polîtîkaya Kovarê**    **Journal Policy**  
Artuklu Akademi Dergisi en az iki hakemin görev aldığı çift    Artuklu Akademi Journal uses the model of double-anonymi-  
tarafı kör hakemlik sistemini kullanır.    zed peer review, which has the duty of at least two reviewers.

**Açık Erişim - CC-BY-NC lisansı / Gihîna Vekirî**    **Open Access- CC-BY-NC**  
Hakem kimlikleri gizli tutulur ve yayımlanmaz.    The identities of reviewers are hidden and not published.

Yazarlar, çalışmalarının telif hakkına sahiptirler.    Authors retain the copyright of their work.

Artuklu Akademi APA 7 atf sistemini benimser.    Artuklu Akademi Journal adopts the APA 7 Citation System.

Yazıların hukuki sorumluluğu    The legal responsibility of the articles  
yazarlarına aittir.    belongs to the authors.

Artuklu Kurdology'nin tüm giderleri    Mardin Artuklu University covers all expenses  
Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından karşılanır.    of the Artuklu Kurdology.

Hiçbir ad altında yazarlardan ücret talep edilmez.    No fee is charged from the authors under any name.  
Dergide makalesi yayınlanan yazarlara da    No fee is paid to the journal authors  
herhangi bir ücret ödenmez.    whose articles are published.

**Derginin Eski Adı / Navê Berê yê Kovarê**    **Previous Title**  
The Journal of Mesopotamian Studies (JMS) Yayınlanan    The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)  
Sayılar: 1 (2016) – 16 (2024)    Range of Publication: 1 (2016) – 16 (2024)

**Önceki ISSN:** 2142-6659    **Former ISSN:** 2142-6659  
**Önceki e-ISSN:** 2687-6388    **Former e-ISSN:** 2687-6388

**İletişim / Têkilî**    **Contact**  
Mardin Artuklu Üniversitesi    Mardin Artuklu Üniversitesi  
Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü    Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü  
MARDİN / TÜRKİYE    MARDİN / TÜRKİYE  
jms@artuklu.edu.tr    jms@artuklu.edu.tr  
+90 482 212 98 84 20    +90 482 212 98 84 20

**Artuklu Kurdology**

e-ISSN: 3062-0236

<https://dergipark.org.tr/tr/pub/artuklukurdology>  
Sayı/Jimar/Issue: 18 (2025)

Çocuk ve İlk Gençlik Edebiyatı Özel Sayısı  
Jimara Taybet ya Edebîyata Zarok û Nûciwanan  
Special Issue of Children's and Youth Literature

**İmtiyaz Sahibi / Owner**

**Prof. Dr. İbrahim ÖZCOŞAR**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0776-4129>  
ibrahimozcosar@artuklu.edu.tr

**Sorumlu Yazı İşleri Müdürü / Managing Editor**

**Doç. Dr. Mustafa ASLAN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-1543-3154>  
mustafaaslan@artuklu.edu.tr

**Editör / Editor-in-Chief**

**Doç. Dr. Ahmet KIRKAN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-3885-5218>  
ahmetkirkkan@artuklu.edu.tr

**Özel Sayı Editörü / Special Issue Editor**

**Doç. Dr. Kenan SUBAŞI**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-7744-1646>  
kenansubasi@artuklu.edu.tr

**Editör Yardımcısı / Assistand Editor**

**Dr. Şehmus KURT**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-1083-8133>  
sehmuskurt@artuklu.edu.tr

**Tasarım / Design**

Rıdvan TURGUT

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü'nün bilimsel bir yayım organı olan Artuklu Kurdology dergisi, uluslararası hakemli bir dergi olup yılda iki sayı (Mart- Eylül) olarak yayımlanır. Dergide Kürt kültürü, dili ve edebiyatı alanlarında akademik nitelik taşıyan ve Türkçe, Kürtçe ve İngilizce dillerinde yazılan bilimsel çalışmalara yer verilir.

**Artuklu Kurdology dergisinde yayınlanan makalelerin içeriğinden yazarları sorumludur.**

Artuklu Kurdology is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. Artuklu Kurdology is an international peer-reviewed journal published semi-annually (March-September). The scientific research on Kurdish culture, language and literature written in Turkish, Kurdish and English languages are published in Artuklu Kurdology.

**Authors are responsible for the content of articles published in Artuklu Kurdology.**

**Dizinlenme Bilgileri / Indexing**



Editör Kurulu – Editorial Board

**Prof. Dr. Abdurrahman ADAK**  
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-9124-1605>  
abdurrahmanadak@artuklu.edu.tr

**Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN**  
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-3519-9892>  
zahirertekin@hotmail.com

**Prof. Dr. Mustafa ÖZTÜRK**  
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0637-8760>  
mustafaozturk@artuklu.edu.tr

**Doç. Dr. Salih AKIN**  
UNİVERSİTE DE ROUEN  
Fransa  
<https://orcid.org/0009-0002-7631-1596>  
salih.akin@univ-rouen.fr

**Doç. Dr. Bakhtiar SAJJADİ**  
KURDİSTAN UNİVERSİTY  
İran  
<https://orcid.org/0000-0002-6483-5803>  
b.sajadi@uok.ac.ir

**Doç. Dr. Ahmet GEMİ**  
DİCLE ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-4124-5525>  
ahmetgemi04@gmail.com

**Doç. Necat KESKİN**  
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0884-1309>  
necatkeskin@artuklu.edu.tr

**Doç. Dr. Yakup AYKAÇ**  
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-2602-484X>  
yakup.aykac@yyu.edu.tr

**Dr. Öğr. Üyesi Shahab VALİ**  
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0580-1598>  
vali.shahab@gmail.com

## Alan Editörleri - Section Editors

### Alan Editörü (Dil ve Gramer) - Section Editor (Language and Grammar)

**Dr. Mehmet YONAT**

MARDİN ARTUKLU UNIVERSITY - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-8576-7486>  
mehmetyonat@artuklu.edu.tr

### Alan Editörü (Klasik Edebiyat) - Section Editor (Classical Literature)

**Doç. Dr. Yakup AYKAÇ**

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-2602-484X>  
yakup.aykac@yyu.edu.tr

### Alan Editörü (Modern Edebiyat) - Section Editor (Modern Literature)

**Dr. Arş. Gör. Ümran ALTINKILIÇ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-1308-2271>  
umranaltinkilic@artuklu.edu.tr

### Alan Editörü (Folklor) - Section Editor (Folklore)

**Doç. Necat KESKİN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0884-13>  
necatkeskin@artuklu.edu.tr

### Alan Editörü (Kültürel Çalışmalar) - Section Editor (Cultural Studies)

**Dr. Öğr. Üyesi Shahab VALİ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0580-1598>  
vali.shahab@gmail.com

### Kürtçe Dil Editörleri (Kurmançî) - Kurdish Language Editors (Kurmanji)

**Dr. Güneş KAN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-7097-6047>  
guneskan@artuklu.edu.tr

**Dr. Arş. Gör. Sevda ORAK REŞİTOĞLU**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-7662-9962>  
sevdaorak@artuklu.edu.tr

**Dr. Resul GEYİK**

MARDİN ARTUKLU UNIVERSITY - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-3516-098X>  
resulgeyik@artuklu.edu.tr

### Kürtçe Dil Editörü (Sorani) - Kurdish Language Editor (Sorani)

**Doç. Dr. Zülküf ERGÜN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-8784-5636>  
zukkufergun@artuklu.edu.tr

### Kürtçe Dil Editörü (Zazakî) - Kurdish Language Editor (Zazakî)

**Dr. Arş. Gör. Pınar YILDIZ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-8175-0879>  
pinaryildiz@artuklu.edu.tr

### İngilizce Dil Editörü - English Language Editor

**Dr. Arş. Gör. Ziyattin YILDIRIMÇAKAR**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-4809-511X>  
ziyattinyildirimcakar@artuklu.edu.tr

### Türkçe Dil Editörü - Turkish Language Editor

**Dr. Öğr. Üyesi Mehmet YALÇINKAYA**

MARDİN ARTUKLU UNIVERSITY - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-4473-0078>  
mehmetyalcinkaya@artuklu.edu.tr

### Kitap Kiriği Editörü - Book Review Editor

**Dr. Mesut ARSLAN**

MARDİN ARTUKLU UNIVERSITY - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-7929-0631>  
mesutarслан@artuklu.edu.tr

### Etik Editörü - Ethic Editor

**Doç. Dr. Kenan SUBAŞI**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-7744-1646>  
kenansubasi@artuklu.edu.tr

### Mizanpaj Editörü - Layout Editor

**Arş. Gör. Ferhat YILMAZ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0009-0000-4737-4665>  
ferhatyilmaz@artuklu.edu.tr

### İndeks Editörü - Indexing Editor

**Dr. Şehmus KURT**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-1083-8133>  
sehmskurt@artuklu.edu.tr

### Web Sitesi Editörü - Web Page Editor

**Dr. Arş. Gör. Ziyattin YILDIRIMÇAKAR**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-4809-511X>  
ziyattinyildirimcakar@artuklu.edu.tr

### Sosyal Medya Editörü - Social Media Editor

**Arş. Gör. Ferhat YILMAZ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0009-0000-4737-4665>  
ferhatyilmaz@artuklu.edu.tr

### Danışma Kurulu / Advisory Board

**Prof. Dr. Abdulhalim AYDIN**

FIRAT ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-9411-6869>  
halimaydin@firat.edu.tr

**Prof. Dr. Farouk ISMAIL**

FREİE UNİVERSTAT - Almanya  
<https://orcid.org/0000-0002-0574-6050>  
farouk.ismail@fu-berlin.de

**Prof. Hayrullah ACAR**

MARDİN ARTUKLU UNIVERSITY - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-5263-7765>  
hayrullahacar@artuklu.edu.tr

**Prof. Dr. Mehmet Mesut ERGİN**

DİCLE ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-5923-5731>  
emesut@dicle.edu.tr

**Prof. Dr. Mehmet Nesim DORU**

ANKARA SOSYAL BİLİMLER ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-3519-7654>  
mehmetnesim.doru@asbu.edu.tr

# CONTENT / NAVEROK / İÇİNDEKİLER

## Research Articles / Gotarên Lêkolînî / Araştırma Makaleleri

### Temayên Pirsgirêknave di Edebîyata Zarokan de

Çocuk Edebiyatında Sorun Odaklı Temalar

Problem-Oriented Themes in Children's Literature

Ferhat ÇİFTÇİ..... 12-35

### Şopa Kovara Nûbiharê ya li ser Edebîyata Zarokan di Kovargerîya Kurdî de

Kürt Dergiciliğinde Nûbihar Dergisi'nin Çocuk Edebiyatı Üzerindeki İzleri

Traces of Nubihar Journal on Children's Literature in Kurdish Journal Publishing

Türkan TOSUN ..... 36-64

### Li Gor Pîvanên Edebîyata Zarokan Nirxandina Çîrokên Çetoyê Zêdo yên ji bo Zarokan

Çetoyê Zêdo'ya Ait Çocuk Öykülerinin Çocuk Edebiyatı Ölçütleri Çerçevesinde Değerlendirilmesi

Evaluation of Çetoyê Zêdo Children's Stories According to Children's Literature Criteria

Aydın MERAL..... 65-82

## Translation / Werger / Çeviri

### Cîhana Lêkolînên Edebîyata Zarokan a ku Her Diçe Berfirehtir Dibe

The Expanding World of Children's Literature

Peter HUNT..... 83-96

### Pênasekirina Edebîyata Zarokan û Zarokatiyê

Defining Children's Literature and Childhood

Karin LESNIK-OBERSTEIN..... 97-109

## Book Review / Danasîna Pirtûkan / Kitap Değerlendirme

### Girr û Gallî Mindalanî Kurd Dîrokçeya Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî

Neslihan GÜNEŞ EROL..... 110-115

---

## JI EDÎTOR

Piştî avabûna dibistanên nûjen ku bi destê netewedewletan hatin avakirin, zarokatî û xwendekarî bûne du diyardeyên nêzmana. Vê yekê jî kir ku divê zarok fêrî xwendinê bibin û cihê herî minasib jî ji bo wan dibistan bû. Di serî de ferqeke wisa xuyayî di nav edebîyata giştî û edebîyata zarokan de nebû. Çimkî hîn zarok û alema zarokatîyê baş nehatibû nasîn, loma berhemine xisûsî ji bo zarokan pir kêr bûn. Ji ber vê yekê di serî de hin klasîkên cihanê alema edebî ya zarokan dixemiland. Herweha berhemên edebîyata gelî û nexasim çîrokên gelî di serî de ew berhem in ku ji bo zarokan hatine berhevkerin, jinûvenivîsandin, wênekirin û çapkirin. Helbet weku hemû qadên edebîyatê, edebîyata zarokan jî bi demê re gelek nexş û nemûşên nû li xwe girtin, cureyên nû tê de hatin nivîsandin û bi pedagojîyê re li hev kir û hem bû qadeke serbixwe hem jî bû qadeke navdîsîplînî. Lê nêzî du sed salan e ku hîn jî tesîra dibistanan, perwerdeya neteweyî ya li ser edebîyata zarokan kêr nebûye. Bi kurtî ger perwerdeya bi zimanekî di nav sîstema perwerdeyê de ji xwe re cih dîtibe û pê re edebîyata zarokan a wî zimanî jî xwendekar û qadeke geşedanê peyda dike.

Tecrubeya zimanê kurdî di vê biwarê de weku qedera kurdan bûye, geh biriqiye geh çilmisiye, li hin perçeyan geşe daye û li hin perçeyan jî ketiye xeweke kûr. Loma di nav kurdan bi giştî de edebîyata zarokan weku hev bi pêş neketiye û nebûye xwedî nivîskar, xwendevan û berhem. Di nav kurmancîya Bakur de çend serdem hene ku edebîyata zarokan bûye xem û pêdivîyek. Xisûsen di salên 1930yî û şûnde li nav kurdên Sovyetê bi berhemên wergêran û telifê û di nav kitêbên dersan de edebîyata zarokan ji bo xwe geşedanekê peyda kiriye. Herçiqas di serê salên 1900î de rewşenbîrên kurdan li Stenbolê û Şamê xwestibin kurdî ji vê qadê bêpar nehêlin û ji zarokan re helbest û çîrokên nû binivîsîn jî ev daxwaz yan jî plan neçûye serî û ketiye xeweke giran heya salên 1980yan ta ku kurd koçî Ewropayê kirine û li wir zimanê kurdî pir kêr be jî di nav dibistanên Ewropayê de cih cihan hatiye xwendin. Ev yek jî bûye sebeb ku kurd ji nû ve rûnin û ji bo zarokan helbest, çîrok, rêzeçîrok, kovar û metnên pedagojîk yê perwerdekarîyê binivîsîn û çap bikin. Vê geşedanê piştî salên 1990î li Tirkîyeyê jî hêdî hêdî ji xwe re rêyek dît û nexasim piştî salên 2000î di gel ku di sîstema perwerdeya Tirkîyê de zimanê kurdî tuneye jî bi awayekî lawaz be jî berhem hatine nivîsîn û weşanxaneyên teybet bo zarokan hatin avakirin û pir hêdî be jî ji bo herka xwe rêyek bo xwe peyda kir.

Di edebîyatê de serkeftin, pêşketin û nivîsandina berhemên balkêş, tenê bi ceribandina nivîsê bi pêş nakeve, di edebîyata zarokan de jî ev li dar e. Herçiqas xwendevanên vê biwarê di kurdî de kêr bin jî rexneya edebîyatê û nirxandina berhemên edebîyata zarokan li gorî pedagojîyê, estetîka edebîyatê û rastî û îzafîyeta zarokan divê bîn nirxandin û rexnekirin da ku ji aliyê çawanî û kalîteyê ve ev qad bi pêş keve û xwendevan bigihêjin berhemên hêjatir. *Artuklu Kurdology* bi hejmarê xwe ya 18em xwest ku ji bo edebîyata zarokan a kurdî derîyê rexne û analîzê veke û ji aliyê teorî û pênaseyê ve hin rêgez û çarçoveyan li qadê zêde bike. Loma bi vê mebestê di vê hejmarê de sê gotarên vekolînî, du gotarên wergêranê û gotareke danasîna kitêbeke di vî warî de belav dike. Em li vir ji wan gotaran bi kurtî dikarin wiha behs bikin:

Gotara yekem a di kovarê de ji aliyê Ferhat Çiftçi ve hatiye nivîsîn bi sernavê “Temayên Pirsgirêknavend di Edebîyata Zarokan de”. Çiftçi di vê gotarê de xwestiye destnîşan bike ka di edebîyata zarokan a kurmancî de temaya pirsgirêknavend çawa hatiye honandin û pêşkêşkirin. Di gel aliyên qels û serkeftî çend çîrok û helbestên kurmancî nirxandine û gihiştîye encamekê.

Di gotara duyem de Tûrkan Tosunê li ser edebîyata zarokan a di kovara Nûbiharê de de xebateke bi navê “*Şopa Kovara Nûbiharê ya li ser Edebîyata Zarokan di Kovargerîya Kurdî de*” pêk anîye. Tosun li vir ketiye nav hûrgiliyên kovarê û nexasim nivîsên ji bo zarokan hatine nivîsîn, vîzyon û mîsyona kovarê ya di vî warî de nirxandiye û gihiştîye encamekê.



---

Gotara sêyem ji aliyê Aydın Meral ve bi sernavê “Li Gor Pîvanên Edebîyata Zarokan Nirxandina Çîrokên Çetoyê Zêdo yên ji bo Zarokan” hatiye nivîsîn ku Meral li gorî pîvanên edebîyata zarokan çîrokên Çetoyê Zêdo nirxandine. Meral çîrok ji aliyê ziman, vegêranê û rastî û îzafiyeta zarokan ve nirxandine û gihiştiye encamekê.

Weku me berê jî destnîşan kir du gotar jî di vê hejmarê de wergêran in ku yek jê gotara Karin Lesnik-Oberstein e û bi sernavê “Defining Children’s Literature and Childhood” di kitêba bi navê *International Companion Encyclopedia of Children’s Literature* de hatibû weşandin û Ferhat Yılmaz ji îngilîzî ev gotar bi sernavê “Pênasekirina Edebîyata Zarokan û Zarokatiyê” wergêraye kurdî û tê de ji gelek referansên sereke pênaseya zarok, zarokatî û edebîyata zarokan heye. Gotara duyem a wergêranê ya Peter Hunt e ku bi sernavê “The Expanding World of Children’s Literature” weku destpêka berhema bi navê *Understanding Children’s Literature* hatiye nivîsandin û Dilan Taycurê ev gotar bi sernavê “Cîhana Lêkolînên Edebîyata Zarokan a ku Her Diçe Berfirehtir Dibe” wergêraye kurdî û tê de qala berfirehbûna qada edebîyata zarokan, sînor û amancên vê qadê dike. Ev her du gotar jî ji bo nasîna sînor, çarçove, amanca edebîyata zarokan dê gelek bikêrhatî be ji bo edebîyata zarokan a kurdî û nexasim ji bo nivîskarên di vê biwarê de.

Herî dawî danasîna kitêba bi navê *Girr û Gallî Mindallanî Kurd-Dîrokçeya Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî* ji aliyê Neslihan Güneş Erol ve hatiye kirin. Erol di gel danasîna kitêbê hin xalên qels ên kitêbê jî destnîşan kirine û herweha daye zanîn ku ji bo dîroka vê qadê nexasim ji aliyê çapemenî û medyayê ve asoyeke berfireh pêşkêşî xwendevanan dike.

Bêguman vê hejmarê tenê bi keda min şikil negirtiye. Di serî de nivîskar û wergêranên ku bi berhemên xwe beşdarî vê hejmarê bûn, hekem û edîtorên ku gotar xwendin, sererastkirin û bi pêşnîyazên xwe tekûztir kirin û herweha edîtorê kovarê Doç. Dr. Ahmet Kırkan û cîgirê edîtor Dr. Şehmus Kurt bi pêşnîyaz û tevkarîyên xwe di vê hejmarê de ked dan û bûn sebeb ku em vê hejmarê pêşkêşî xwendevanan bikin. Ez spasdarê her yek ji wan im.

Bi hêviya ku ev xebat bi lêkolînên nû bi pêş bikeve, mezintir bibe û ji bo nîfşên paşerojê bê veguheztin.

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

*Edîtorê Hejmarê Taybet a Edebîyata Zarok û Nûciwanan*

## EDITORIAL

After the establishment of modern schools by nation-states, childhood and students became two similar phenomena. This also made it possible for children to be literate and the most suitable place for them was school. At first, there was no apparent difference between general literature and children's literature. Because children and the world of childhood were not yet well known, so the literary production was very low for children. That's why some of the world classics decorated the children's literary world. In addition, the works of folk literature, especially folk stories, are primarily works collected, rewritten, pictured and printed for children. Of course, like all areas of literature, children's literature has taken on many new forms and examples over time, new types have been written and agreed with pedagogy, and it has become both an independent and an interdisciplinary area. However over nearly two hundred years, the affect of schools, national education on children's literature, has not diminished. In short, if education in a language is included in the education system and children's literature of that language provides students and a development area.

The experience of the Kurdish language in this field has been like the destiny of the Kurds, it has been shining and paled, it has developed in some parts, and in some parts it has fallen into a deep sleep. Therefore, among the Kurds in general, children's literature has not developed similarly and has not had writers, readers, and products. There are several periods in Northern Kurmanji where children's literature has become a concern and a necessity. In the 1930s and later, children's literature specifically developed among Soviet Kurds with translators and textbooks. Although Kurdish intellectuals in Istanbul and Damascus in the early 1900s wanted to provide Kurds with this area and write new poems and stories to children, this request or plan did not go ahead and fell into a heavy sleep until the 1980s, when the Kurds migrated to Europe, where there was very little Kurdish language, and places were studied in European schools. This has also led the Kurds to rethink and write and publish poems, stories, stories, magazines, and educational pedagogical texts for children. This development has gradually found a way in Turkey after the 1990s, and especially after the 2000s, even though there is no Kurdish language in Turkey's education system, products have been written and special publishing houses have been established for children and have found a way for themselves very slowly.

In literature, success, development and writing of interesting works does not only improve by writing experience, and it is also the case in children's literature. Although readers of this field are scarce in Kurdish, criticism of literature and evaluation of children's literature products in accordance with pedagogy, literary aesthetics, reality and children's authenticity should be evaluated and criticized in order to develop this area in terms of quality and to reach more valuable products. *Artuklu Kurdology*, in its 18th issue, called for the opening of criticism and analysis for Kurdish children's literature and to increase some principles and frameworks in the field by theory and definition. For this purpose, it features three research articles, two translation articles and a book review in this field. Here's a brief description of these articles:

The first article in the issue is by Ferhat Çiftçi entitled "Problem-Oriented Themes in Children's Literature". In his article, Çiftçi aims to point out how the theme of the problem-centred has been established and presented in Kurmanji children's literature. He evaluated several Kurmanji stories and poems with their weak and successful sides, and reached a conclusion.

In the second article, Türkan Tosun has conducted a study on children's literature in Nubihar journal entitled "Traces of Nubihar Journal on Children's Literature in Kurdish Journal Publishing". Tosun has been included the magazine's details, especially articles written for children, evaluating the vision and mission of the journal in this regard and reached a conclusion.

The third article was written by Aydın Meral entitled “Evaluation of Çetoyê Zêdo Children’s Stories According to Children’s Literature Criteria”, in which Meral evaluated Zedeo’s stories according to the standards of children’s literature. Meral evaluated the stories in terms of language, narrative, truth, and children’s knowledge and reached a conclusion.

As we have mentioned above, two articles are translation in this issue, one of which is Karin Lesnik-Oberstein’s article entitled “Defining Children’s Literature and Childhood” which has been published in a book called *International Companion Encyclopedia of Children’s Literature* and Ferhat Yilmaz has translated this article from English under the title “Pênasekirina Edebîyata Zarokan û Zarokatiyê” into Kurdish, including many main references to the definition of child, childhood and children’s literature. The second translation article is by Peter Hunt’s entitled “The Expanding World of Children’s Literature” which has been written as the beginning of a work called *Understanding Children’s Literature* and Dilan Taycur has translated this article into Kurdish with the title “Cîhana Lêkolînên Edebiyata Zarokan a ku Her Diçe Berfirehtir Dibe”, which discusses the expansion of children’s literature, borders and objectives in this field. Both articles will be very useful for recognizing the boundaries, frameworks, and objectives of children’s literature for Kurdish children’s literature and especially for writers in this field.

Lastly, the book *Girr û Gallî Mindallanî Kurd-Dîrokçeya Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî* was reviewed by Neslihan Güneş Erol. Erol, along with the introduction of the book, has also mentioned some of the weak points of the book and has also stated that it provides readers with a broad context for the history of this area, especially by the publishing and the media.

Undoubtedly, this issue has not only been formed by my work. First of all, the writers and translators who participated in this issue with their works, the reviewers and editors who read, edited the article and made them more accurate with their suggestions, as well as the editor-in-chief Assoc.Prof. Dr. Ahmet Kırkan and Assistant Editor Dr. Şehmus Kurt with their suggestions and contributions have contributed to the issue and helped us to present this issue to the readers. I’m grateful to each of them.

With the hope that this work will be developed through new research and expand and be transferred to future generations.

Assoc. Prof. Dr. Kenan SUBAŞI

*Editor of the Special Issue of The Children’s and Youth Literature*

## Temayên Pirsgirêknabend di Edebîyata Zarokan de

### Çocuk Edebiyatında Sorun Odaklı Temalar

#### Problem-Oriented Themes in Children's Literature

Ferhat ÇİFTÇİ

<b>Ferhat ÇİFTÇİ</b>	Ferhat Çiftçi   <a href="https://orcid.org/0000-0003-4117-2477">https://orcid.org/0000-0003-4117-2477</a>   ferhateiftci1@gmail.com Ph.D., Muş Alparslan University, Muş, Türkiye.
<b>Jêgir</b> Citation Atıf	Çiftçi, F. (2025). Temayên Pirsgirêknabend Di Edebîyata Zarokan De. <i>Artuklu Kurdology</i> (18). 12-35 DOI: 10.35859/artuklukurdology.1578988
<b>Dîroka Şandinê</b> Submission Date Geliş tarihi	04.10.2024
<b>Dîroka Qebûlê</b> Acceptance Date Kabul Tarihi	23.12.2024
<b>Dîroka Weşandinê</b> Publication Date Yayın tarihi	30.01.2025
<b>Cureyê Gotarê</b> Article Type Makale Türü	<b>Gotara vekolinê</b> Research article Araştırma makalesi
<b>Hakemî</b> Peer-Review Hakemlik	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk</b> Ethical Statement Etik Beyanı	<b>Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsina vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têtûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunduğu beyan edilir.
<b>Kontrola İntihalê</b> Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	<b>Belê – iThenticate</b> <i>Yes – iThenticate</i> Evet – iThenticate
<b>Nakokiyên Berjewendiyar</b> Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî</b> Grant Support Maddi Destek	<b>Nivîskar beyan dike ku wî ji bo vê vekolinê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
<b>Mafê Telifê &amp; Destûr</b> Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	<b>Nivîskar li jêr lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

## KURTE

Ev gotar, di edebîyata zarokan de temayên pirsgirêknawend û çareseriyên wê dinirxîne. Pirsgirêknawend di nav mijarên edebîyata zarokan de pêdaçûneke giring tê hesabandin. Bi piranî di nav edebîyata zarokan de ev berhem wekî metnên nû tîn hesabandin. Herçiqas meriv di nav berhemên klasîk/kevin de li hin pirsgirêkan rast bê jî ev pêdaçûna nûjen pirsgirêkan di navenda berhemên de bi cih dike û bi amanceke plankirî wan bi kar tîne. Loma pirsgirêk û çareserîya wê di berhemên berbehs de bi taybetî tîn sêwirandin. Amanca sereke ya nêrîna pirsgirêknawend ew e ku zarok di gel navbeynkarîya berhemên wisa pirsgirêkên xwe çareser bikin yan jî jî vî alîyî ve alîkarîyekê bibînin. Ji xeynî vê yekê xwînerên din jî bi saya van berhemên jiyanê nas dikin û dibin xwedî nirxên wekî alîkarî, empatî û hwd. Pirsgirêknawend li gor prensîbên sereke yê edebîyata zarokan yê wekî rastîya zarokan û îzafiyeta zarokan şikil digire. Ji ber vê yekê hin taybetiyên xweser jî dihewîne. Berhemên mînak ku di vê xebatê de wekî vekolîna analîtîk a dokuman hatine nirxandin berhemên Kurmancî û yê wergêrana Kurmancî ne û temayên wan dikare wiha bîna rêzkerin: Pirsgirêkên ranezanê, nexweşiyê, wendabûnê, tenêmayînê, tîrsa çûna cem bijîşk, tîrsa çûn û destpêkirina dibistanê, qonaxa dijiwarîya hînbûnê ya ajotina bisiklêtê, tîrsa çûyina cem berber, kêmasîya bixwebaweriyê, feqîrî û zarokên xebatkar, parastina hawirdorê, pirsgirêka yêdînbûnê, pirsgirêka koçkirinê ya li herêmên tundûtîjî lê diqewime.

**Peyvên Sereke:** Edebîyata zarokan, pirsgirêknawend, temayên pirsgirêknawend, rewşa çareseriyê.

## ÖZ

Bu çalışmada çocuk edebiyatında sorun odaklı temalar ve bunların çözümleri incelenmektedir. Sorun odaklılık, çocuk edebiyatı konuları arasında önemli bir yönelim olarak kabul edilir. Çocuk edebiyatında bu eserler çoğunlukla yeni metinler olarak konumlandırılır. Her ne kadar bazı sorunlara geleneksel eserlerde rastlanılsa da bu yönelim sorunları merkeze alır ve onları amaçlı olarak kullanır. Bu yüzden sorun ve çözümü, söz konusu eserlerde özel olarak kurgulanır. Sorun odaklılığın temel amacı, çocukların bu tür ürünler aracılığıyla sorunlarını çözmeleri veya bu konuda yardım almalarıdır. Bunun dışında diğer okuyucular da bu ürünler sayesinde yaşamı tanır, yardımlaşma, empati vb. değerlere sahip olur. Sorun odaklılık çocuk edebiyatının temel ilkeleri olan çocuk gerçekliği ve çocuğa göreliliğe uygun olarak şekillenir. Ayrıca bazı bağımsız özellikler de içerir. Bu çalışmada doküman analizi yöntemiyle incelenen örnek ürünler Kürtçe ve Kürtçeye çevrilmiş eserlerden oluşmakta olup temaları uyku sorunu, hastalık ve doktor korkusu, kaybolma, okula başlama korkusu, bisiklet sürmeyi öğrenme güçlüğü, yalnız kalma, berbere gitme korkusu, özgüven eksikliği, yoksulluk ve çocuk işçiler, çevreyi koruma, göç ve ötekileştirmenin yaşandığı bölgeler şeklinde sıralanabilir.

**Anahtar Kelimeler:** Çocuk edebiyatı, sorun odaklılık, sorun odaklı temalar, çözüm durumu.

## ABSTRACT

In this study, problem-focused themes in children's literature and their solutions are analyzed. The focus on problem themes is viewed as an important approach within the subjects of children's literature. These works are often regarded as contemporary texts in children's literature. While traditional works may also include certain problems, problem-focused literature intentionally centers these issues and addresses them purposefully. Therefore, the problem and its solution are specifically crafted in these texts. The primary purpose of problem-focused themes is to help children solve their own or idiosyncratic find guidance in addressing them through these works. Additionally, other readers gain insight into life through these stories, fostering values such as cooperation, empathy, and more. Problem-focused themes are developed in line with the core principles of children's literature—child-centered reality and relevance—while also possessing independent qualities. In this study, the sample works analyzed

through the document analysis method consist of Kurdish and translated texts, with themes that include sleep issues, fear of illness and doctors, getting lost, fear of starting school, challenges in learning or ride a bicycle, loneliness, fear of going to the barber, lack of self-confidence, poverty and child labor, environmental protection, life in conflict zones, migration and marginalization.

**Keywords:** Children's literature, problem orientation, problem-focused themes, solution status.

### Destpêk

Edebîyata zarokan, di serdema modern de wekî têgiheke nû tê qebûlkirin û bikaranîn. Ev nûbûna wê, bi pêşketina perwerde û navendbûna psikolojîya zarokan re têkildar e. Di her demê de zarok û edebîyat hebûne û evana di nav jiyane de cihekî girîng girtine. Lêbelê zarok çiqas hatiye naskirin û ji bo wan bi taybetî çi hatiye amadekirin, ev mijareke rexneyî ye. Ji ber vê yekê tê gotin ku berhemên ku bi têgihiştina klasîk ji bo zarokan hatine nivîsandin ne li ser zarokan in (Oğuzkan, 2013, r. 3). Bi vî awayî di gel pêşketina pedagojî û guherîna zêhniyetê hewcedarîya naskirina dinyaya zarokan pêk hatiye û herwiha ji bo wan hewcedarîyan metnên nû derketine pêş û pê de pê de edebîyata zarokan di nav edebîyatê de ji xwe re şûneke taybet wergirtiye. Loma edebîyata zarokan wekî şaxeke serbixwe dikare bê binavkirin.

Di nav edebîyata her neteweyê de edebîyata zarokan wekî şaxek bi qonaxên cihêreng berfireh bûye. Jiyan û çanda neteweyan û tezahurên wê wekî berhem û pêkanînen kevneşopî di vê navberê de wekî destpêk yan jî çavkanî dikare bê nîşandan. Bi gotina Ungan, Arıcı û Şimşek (2016, r. 163), çavkanîya herî pêşî ya edebîyata zarokan ji berhemên edebîyata gelî pêk tên. Edebîyata zarokan ya modern jî li ser vê yekê ava bûye û geşedanek peyda kiriye. Di vê mijarê de bandora dinyaya Rojava (Amerîka û Ewropa) nayê înkarkirin. Edebîyata zarokan ya modern wekî çavkanî nebe jî herî pêşî di nav neteweyên Rojavayî de ji xwe re eleqeyek peyda kiriye û wekî ixraca çandî û edebî tesîr li civatên Rojhilatî kiriye û ew şibandiye xwe. Îro di nav edebîyata zarokan de hin mijarên modern bi rastî ji aliyekê ve wekî encama temasa çandî dikare bê xwendin. Ji ber vê yekê di navbera edebîyata zarokan û têgihên modern yê polîtîka, çand, perwerde, derûnnasî û hwd. û guherîna wan de têkilîyek dikare bê avakirin. Li gor Şirin (2019, r. 13) edebîyata zarokan hê jî wekî enstrumanekê modernbûnê tê bikaranîn.

Edebîyata zarokan ya modern bi nêzîkbûna dinyaya zarokan bala xwe daye rastîya zarokan û îzafiyeta wan. Bi gotineke din zarok di vê qadê de bûye navend û kevneşop, rastîya mezinan, dinyaya nirxan û bendewarîya civat û hwd. encax bi şertên pedagojî û derûnnasîya zarokan ve hatiye girêdan. Loma ev her du têgih wekî prensîbên binyadî yê edebîyata zarokan tên hesibandin. Subaşî (2021) ji bo famkirana her du têgihan ya ji aliyê nivîskarên ve hîskirina zarokatîyê derdixe pêş û ew destnîşan dike ku ev hîskirin nêrîna bi çavên zarokan, fikirîna bi hişên wan, bihîstina bi guhên wan, hîskirina bi dilê wan û ji van hemûyan girîngtir vegotina bi zimanê wan çêdibe. Li gor wî encax bi vî awayî berhemên li gorî zarokan yê edebî û estetîk tên afirandin. Ji ber vê yekê her çi dikeve dinyaya zarokan û her çi der û dorê ve dinyayê dipêçe ew wekî têkilîyeke rastîya zarokan û îzafiyeta zarokan bi hêmanên xwe şênber dike. Berhemek, qelîte û muteberîya xwe ji tevdehîya van digire. Helbet ferqa wan jî heye û ev ji aliyê şumûl, naverok û şikil ve dikare bê diyarkirin. Ji ber vê yekê rastîya zarokan dikeve nav çarçoveya îzafiyeta zarokan û bi gelemperî ji aliyê hêmanên naverokê ve tê xuyakirin. Jiyan serlehang, bûyerên ku di jiyana zarokan de pêk tên û li gor bergehên wan be, tema û mijarên ku bala zarokan bikişînin, hewandina xeyal û listikan, vegotîneke ku zarokan ji xwe dûr nexîne û kêfa wan bîne, peyamên veşartî û hwd. di nav çarçoveya rastîya zarokan de dikare bê rêzkirin. Îzafiyeta zarokan jî hem ji hêmanên naverokî hem jî ji yê şiklî pêk tê û van hêmanan li goreyîbûna zarokan dipêve. Bi gotineke din îzafiyeta zarokan ew e ku hem ji hêla naverokî hem jî hêla şiklî ve sêwirandina berhemekê li gorî nêrîn û hîsên zarokan be.



Herçiqas îro edebîyata zarokan di gel modernbûna xwe weku qadeke serbixwe bê famkirin jî ev yek li dijî peywendî û tesîrkirina li hev nîne. Çimkî modernbûn destûrê nade vê dijayetîyê û li gorî aqilê modern qadek xurtbûna xwe ji têngî û hêmanên qadeke din a derûdorê digire. Zarok jî bi jiyana, eleqe û hewcedarîyên xwe di nav edebîyata zarokan de di gel mijarên takekesî û civakî bi vî awayî dibe têngiheke lêzêdebûyî ya edebîyatê. Îroj pircureyîya nimûneyên berheman û nirxandinên curbicur yên li ser edebîyata zarokan dikare bê gotin ku ji ber vê piralî û firepeywendîyê çêdibe. Di nav jiyana îroyîn de zarok û mijarên cihêreng, têngiştin û pirsgirêkên li ser wan bi vî awayî şikil digirin. Sibe dê çi bibe, ew girêdayî şert û mercên dinyayê û guherîna nêzîkatîyên li ser zarokan e.

### 1. Pirsgirêknabend di Edebîyata Zarokan de

Di nav mijarên edebîyata zarokan de xaleke herî giring ew e ku pirsgirêkên zarokan di nav berheman de bîhêskirin. Tenê pirsgirêkên zarokan jî ne, bi gotina Şirin (2019, r. 44) çawa ku rastîya zarokan di nav rastîya dinê de ye û di ser de jî bi nêrîna zarokan ev li hev bikin û berhemek bi vî rengî bê nivîsandin, ew fikirandina sereke ya edebîyata zarokan e ku li gorî rastîya zarokan pêk hatiye. Ji ber vê yekê pirsgirêknabend li ser du hêlên hevpar şikil digire. Pirtûkên wisa ji aliyê kategorîyê ve di nav pirtûkên zarokan yên rasteqîn de tîhêbandin (Dilidizgün, 2018, r. 104).

Zarok, di nav jiyana xwe de hem ji aliyê geşedanê hem jî ji aliyê perwerdeyê ve divê xwedî karîna çareserîya pirsgirêkan be. Ev karîna ji bo wê/î wekî ezmûn, spartek yan jî pêdivîyêkê nîne. Lêbelê amanceke edebîyata zarokan ew e ku jiyane bi zarokan bide nasandin û di dema gavavêtina wan a nav jiyane de alîkarîyê bike. Ji bo vê yekê berhemên zarokan bi rewşeke xwezayî pirsgirêkên zarokan digire dest û dixwaze bi rêya van pirsgirêkan rê û rêbazên çareserîyê nîşanî wan bide yan jî zarok wan rê û rêbazan hîs bike û bixwe têbigihêje û peyda bike. Bi vî awayî edebîyata zarokan piştîgîriya zarokan dike û di rasthatina rewşên dijwar de jî ew bi taybetîya nivîs, wêne û hêmanên din rolekê pêk tîne.

Me binavkirina vê qadê weku “pirsgirêknabend” danî ku di lîteratura rojava da jî wisa ye. Ji bo binavkirina vê qadê navên wekî mijarên dijwar, mijarên hesas, mijarên dijber, mijarên mebestdar yên taybet û hwd. tîhêbandin, di gel ku bi gelemperî di lîteratura biyanî/rojawa de jî weku “problem-oriented” tê tercîhkirin (Yılmaz & Yakar, 2018). Herçiqas wisa bê binavkirin jî çareserî di nav pirtûkên berbehs de hêmaneke jêneger e. Ji ber vê yekê pirsgirêk û çareserî divê wekî temamkerê hev bîhêskirin. Kaya û Tanrıverdi (2020) jî balê dikişînin ser vê xalê û dibêjin di pirtûkên zarokan de bûyer û rewş ji belokirina pirsgirêkan zêdetir lêgerîna çareserîyê berbiçav dike. Li vir giringî li ser çareserîyê ye û ev jî derbasbûn û pakbûna pirsgirêkê dixwaze. Piştî van tesbîtan meriv dikare bibêje ku di eslê xwe de ev pirsgirêk û çareserîyên rastîya jiyane ne ku di edebiyata zarokan de jî bi awayîne xwemal xwe didin der. Çawa ku şev û sibe, tarî û ronî bi hev re ne wekî wan pirsgirêk û çareserî jî bi hev re ne û ji hev naqetin.

Li gorî Dilidizgün (2018, r. 108) pirtûkên pirsgirêknabend hin rastîyên ku ji aliyê xwînerên xwe ve nayên famkirin yan jî ew bi van re nikarin tîkiliyêke rasterast daînin bi saya edebîyatê dike nav dinyaya wan. Bêguman di vê mijarê de amanc û fokûs li ser pirsgirêk û çareserîyên wê kom bibe jî wekî rola avaker hêmanên din jî giring in. Her çî di jiyana zarokan de bikeve nav çarçoveya eleqe û hewcehîya wan ew hemû dibin babetên maqûl. Kêf û henek, şadbûn, pêşketina qadên geşedanê û hwd. wekî hêmanên hewceyî tîhêbandin û pirsgirêk jî bi gihiştina çareserîya xwe, wekî hêmanên din digihêje rewşeke asayî û maqûl.

Têgiha pirsgirêknabend, çawa ku di navê wê de jî xuya ye bi navbeynkarîya edebîyatê ji bo çareserîyê li rêyan digere. Temayên pirsgirêknabend bi taybetî di çarçoveya amancên edebîyata zarokan de cihekî berbiçav digire. Lêbelê tê zanîn ku hevparên edebîyatê hene û yek ji wan kêma bimîne berhemên edebîyatê duçarê qelsîyê dibin. Ji ber vê yekê di nav behsa edebîyata zarokan de

hevparên estetîk, amanc, rola takekesî û civakî bi hev re watar in. Loma temayên pirsgirêknabend divê tenê bi taybetîya xwe ya sereke neyê sînardarkirin. Edebîyata zarokan di vê mijarê de tenê ji aliyê estetîk ve pênasîyeke kamil ji xwe re nabîne. Helbet estetîk di mijarên hunerê de nayê sistkirin û dema ew xal hat îhmalkirin rîskeke mezin pêk tê. Lêbelê rola takekesî û civakî jî nayê îhmalkirin. Wekî hevsengîyê hêmanên takekesî, civakî û estetîkê û hunera edebîyata zarokan di nav xwe de dikin hêzeke duhêlî. Eger wisa neyê famkirin edebîyat wekî wesayîteke şikestî tê qebûlkirin û hevsengîya têgihên estetîkê û yên jiyânî wê çaxê şikestîyê dixwin. Ji ber ku pirsgirêknabend di nav jiyânî de li ser probleman disekine û bi saya edebîyatê jî li çareserîyên wan probleman digere, ev yeka di hunerê de girêdayî kontekstê ye û ji destên hevparên edebîyatê yên ji xeynî estetîkî jî meşruîyeta xwe xweyî dike. Di vê peywendê de sîdwergirtin û bikaranîna hêmanên li derveyî estetîkê di tewereya estetîkeke xurt de dibin hêmanên temamker ên estetîkê.

## 2. Temayên Pirsgirêknabend

Temayên pirsgirêknabend û çareserîyên wan dikare di bin çend sernavan de bîn dabeşkirin. Herçiqas temayeke pirsgirêknabend bi têkildarîya xwe bikeve bin sernavên curbicur jî dîsa bi taybetî û nêzîkbûna xwe di bin sernavê de dikare bê bicihkirin. Bi vî awayî temayên pirsgirêknabend yên wekî takekesî û civakî ji hev cuda dibin. Hin tema hene ku bi naveroka xwe wekî civakî yan jî takekesî dikare bê hesabandin. Carinan hin tema bi her du alîyan ve jî eleqedar e. Dîsa temayek bi nêzîkatîyên cihêreng ji pir hêlan ve dikare bê nixandîn.

Li gor Yılmaz û Yakar (2018) li ser temayên pirsgirêknabend di qadê de xebatên curbicur wekî mirin, cihêbûn, pirçandî, astengdarî, şidet û zordarîya hevtemenî hatine kirin û ev temayên berbiçav in û dîroka wan xebatan jî bi qasî niv sedsalekê bi paş de diçe. Lêkolera di cihekî din de temayên ku bêtir tîr qalkirin û nivîsandin wiha rêz dikin: koç, astengdarî-cihêrengîya takekesî, şidet, cihêbûn, mirin, feqîrî, zarokên xebatkar, zarokên sêwî û bê dêûbav. Dilidüzgün (2018, r. 108-109) ji bo vê yekê behsa nakokîyên malbatê, têkçûna peywendîyê, jiyana bajêr, dabeşbûna civakî, pirsgirêkên jiyana dibistanî û pîşeyî, astengdarî, mirin, hesasîyetên hawirdorê, bandorên li ser zarokên xebatkar, nêzîkatîyên sîyasî û civakî wekî nimûne rêz dike. Di çarçoveya van iqtîbasan de temayên pirsgirêknabend dikare wiha bê dabeşkirin û rêzkirin: Pirsgirêkên takekesî wekî mirin, astengdarî, zordarîya hevtemenan, fobîyên curbicur, cihêbûna dêûbavan, nexweşî, tenêbûn û hwd.; pirsgirêkên civakî jî wekî şer û heremên ku tundûtîjî lê hene û tesîra wan li ser zarokan, koç û penaberî, serhildan, feqîrî û zarokên xebatkar, zarokên kûçeger, parastina hawirdorê û hwd.

## 3. Taybetîyên Pirsgirêknabend û Çareserîya Wê

Berhemeke edebîyata zarokan ya serkeftî bi gelemperî ji aliyê hêmanên wekî ziman, naverok, şikil û wêneyî ve divê xwedî hin taybetîyan be. Bi pêwendîya van hêman û taybetîyan rastîya zarokan û îzafîyeta zarokan jî taybetîyên pîralî dihevine. Di temayên pirsgirêknabend û çareserîya wê de di bin van hêman û taybetîyên gelemperî de taybetîyên serbixwe jî dikare bê pêşkêşkirin. Li gorî destnîşankirina hin xebatan (Turan, 2005; Yılmaz & Yakar, 2018) ji bo temayên berbehs taybetîyên ku balê dikişînin wekî çend xalan dikare bîn rêzkirin:

- » Çareserî divê bi rehetî û tesadûfî nebe û mûhakemeya zarokan divê piçûk neyê dîtin.
- » Çareserî divê tenê bi destên mezinan xwe negihîne zarokan. Alîkarîya mezinan dibe ku bibe, normal e lê ked û hewldana serleheng jêneger e.
- » Serleheng, divê kesayatekî bêkêmasî nebe û bi tevger û amancên xwe bi kesayetên di jiyana rasteqîn de lihevkerî be.



- » Di lêgerîna çareserîyê de serlehang divê kêmasîyên xwe li alîyekî bihêle û qabilîyeta guherîn û dawîanînê jê bê.
- » Di çareserîya pirsgirêkan de divê tenê çareserîyek neyê nîşandan, ji zarokan re rê û rêbazên alternatîf û hilbijartî bîn pêşkêşkin.
- » Di çareserîya pirsgirêkan de divê serlêdana tundîyê tunebe.
- » Lehengên ku di navenda pirsgirêkan de ne divê bi tevger û kesayeta xwe pir marjînal nebin.
- » Divê pirsgirêk yeka gelemperî be û mînakên marjînal nebin malê gelemperîbûnê.
- » Di pirtûkên zarokan yê pirsgirêknawend de lehengên ku xwedî pirsgirêk in yan jî tûşî pirsgirêkan tên divê neyên amanckirin û wekî yekane çavkanîya pirsgirêkê neyên nîşandan.
- » Pirtûkên wisa divê nebe suîstimala hestan û merivên xwedî kêmasî û yê di rewşên dijwar de hêstirbaranî neke. Divê bi ked û hewldanekê bersîva pirsgirêkê bê dayîn.
- » Pirtûkên wisa divê wekî olana pirsgirêkên îdeolojîk neyên pêşkêşkin.
- » Bûyer û rewşên ku tên vegotin divê di çarçoveya tecrubeya zarokan de be.
- » Ji bo lehangên divê paşerojên pêkan bîn sêwirandin.

#### **4. Têkilîya Pirsgirêknawend û Bîblîyoterapîyê û Cudahîya Wan**

Di navbera pirsgirêknawend û bîblîyoterapîyê de tekilîyeke xurt heye. Bîblîyoterapî ji merivan re ji bo çareserîya pirsgirêkên wan yan jî ji bo ew xwe baştir nas bikin û fam bikin, amadekirina pêvajoyek e yan jî çalakîyeke pêkanîna sûdwergiritinê ye ku bi navbeynkarîya berhemên edebî pêk tê (Öner & Yeşilyaprak, 2006, r. 559). Bi nêrîneke din bîblîyoterapî bi lihevkarîna demekê, pirtûkekê û merivekî pêk tê (Öner, 2007). Hem navbeynkarîya berhemên hem jî guncavîya sê hemanên di edebîyata zarokan de ji bo temayên pirsgirêknawendî hewcedar in. Ji alîyê din ve amancên bîblîyoterapî û pirsgirêknawend ji pir hêlan ve dikeve nav çarçoveyekê. Öner û Yeşilyaprak (2006, r. 560) di pêvajoya bîblîyoterapîyê de hin amancan rêz dikin ku ev bi hêsaniyê dikarin wek yê pirsgirêkvandî ji bîn hesabandin:

- » Hîskirina tenênebûnê bi dîtina ku merivên din jî wan pirsgirêkan dijîn ên pê ra rûbirû maye.
- » Ji bo xwe û merivên din xwedîbûna hişyarîyekê.
- » Ji bo çareserîya pirsgirêkekê peydakirina rê û rêbazên curbicur.
- » Di jiyandê de dîtina wateyan û hilbijartina rol-modelan.
- » Di rûbirûbûna rewşên nû û curbicur de peydakirina halê guncanbûnê û derbaskirina dijwarîyên di pêvajoya guncanbûnê de.

Öner (2007) di xebateke din de ji bo pêvajoya bîblîyoterapîyê qala sê qonaxan dike ku evana di navbera çîrok û xwîner de pêk tên. Wekîhevîbûn û olandan, zelalbûn û xwenasîn û yê dawî yekkerbûn. Ev qonax hem ji alîyê pêvajoya xwendinê ve hem jî ji aliyê bandorên wê ve wekî berhemên pirsgirêknawend dikare bê famkirin. Ji ber van tesbîtan tê gotin ku ji xeynî şibandina pirsgirêknawend û bîblîyoterapîyê ferqa wan li ser hin taybetîyên teknîk kom dibe. Bi gotina Akgün û Karaman Benli (2019) bîblîyoterapî wekî klînîk û geşedanî du beş in ku ya klînîk ji aliyê pisporên derûnnasan ve di

wexta çêbûna rewşên pirsgirêkî de; ya geşedanî jî ji aliyê pispor û perwerdekarên ve ji bo pêşlêgirtin û çareserîya pirsgirêkan tê bikaranîn. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku di edebîyata zarokan de temaya pirsgirêknabend ji beşa bîblîyoterapîyê ya klînîk cuda ye û bi piranî dişibe bîblîyoterapîya geşedanî. Di pênaseya bîblîyoterapîyê ya Karagül (2018, r. 44) de jî çareserîya pirsgirêkên derûnnasîyê balê dikişîne. Bi vî awayî bîblîyoterapî bi gelemperî ji aliyê pêkanîn, pêvajo, pispor û hwd. ve li gor bikaranîna berhemên pirsgirêknabend xwedî taybetiyên serbixwe ye.

### 5. Hin Baldarî li ser Pirsgirêknabendîyê

Di nav mijarên edebîyata zarokan de taybetî, cudahî û manendîyên pirsgirêknabend û çareserîya wê hene. Bi xwendineke din çarçoveya pirsgirêknabend û çareserîya wê dikare di gel hin baldarîyan diyartir bibe. Herî pêşî berhemek li ser çî hewcedarîyan pêk hatibe ew hemû ji bo berhemên pirsgirêknabend jî carî ne. Ji ber vê yekê wesf û qelîteya edebîyata zarokan çawa bê ziman wisa berhemên berbehs jî taybetîyêkê dihewîne.

Cudahîya yekê ji berhemên din ew e ku pirsgirêknabend hem bi bêjeya mijar hem jî bi bêjeya temayê dikare bê binavkirin. Lêbelê tema ji bo pirsgirêknabendê li gorî mijarê guncavtir e. Wisa ku hem mijar hem jî tema bi navenda vegêranê re têkildar e, lê tema bêtir bi aliyê razber ê metnê re eleqedar e ku ew jî pirtir nêzî amancê ye. Mijar di nav metnên sewirandî de wekî hêmana bûyerê dimîne û axir li gor temayê li kêlekê cih digire. Tema wisa nîne û hem di xwendinên serveyî de hem jî di yên binveyî de karîger e. Bi gotineke din cudahîya tema û mijarê taybetîyêke pirsgirêknabendê nîşan dide. Wisa ku tema bi taybetîya xwe ya razber li pêş şenberîya mijarê ye. Loma dikare bê gotin ku ji bo pirsgirêknabendê bikaranîna temayê dirusttir e.

Her berhem li gorî xwe pirsgirêkekê dihewîne, lê ev hewandin wê nake berhemêke pirsgirêknabend. Yên ku nakevin vê çarçoveyê pirsgirêkên girêya rûdanê tên hesibandin û ev pirsgirêk weku pirsgirêkên di pirsgirêknabendê de tematîk nayên behskirin. Di metnên wisa de bal bi piranî li ser serpêhatîyê ye. Loma cudahîyêke din a berhemên pirsgirêknabend ew e ku ji metnên sewirandî yên din ji aliyê navendbûna pirsgirêkê ve cuda dibe.

Taybetîyêke din a pirsgirêknabend ew e ku di pirtûkên zarokan de bi piranî pirsgirêkên modern yên ku di navendê de zarok hene, hatine sewirandin. Berhemên çandî û hin cure û tema li derveyî vê şeweyê dimînin. Mînakên wekî cihêbûn, zordarîya hevtemenan, astengdarî, zarokên kûçeger û hwd. bi piranî temsîlên honakên modern in. Ji hêla din ve mînaka mirinê her tim heye û ew yek di berhemên çandî û gelerî de jî derbas dibe. Lêbelê eger ew di nav sewirandinê de neyê navendê û nebe wekî pirsgirêkekê tenê bi behskirineke kontekstî dimîne. Loma temayên pirsgirêknabend di bin edebîyata zarokan ya modern de derdikeve pêş.

Temayêke ku dibe pirsgirêknabend carinan dibe ku bala zarokan nekişîne û dûrî alema wan zarokan be jî. Lêbelê divê ev wekî menfaeta civakî bê dîtîna ku zarokan hînî pirsgirêkên jiyanê dike. Loma di beşdarbûna hin temayan de ya zarokan encax di gel şertekê dikeve çarçoveya îzafîyeta zarokan ku divê zarokê/i ew dîtibe û jiyabe. Pirsgirêknabend bi vî awayî bêtir mihtacî pêwendîyêkê ye. Wekî mînak wextê meriv bala xwe da ser temaya koç û penaberîyê dê ji pir hêlan ve bê nixandin. Hêmanên sîyasî, civakî, etnîk, erdnîgarî û hwd. taybetiyên vê temayê ne. Îcar mimkûn e di serî de bi dinyaya zarokên xwîner re eleqedar nebe û bala wan nekişîne. Loma ji bo balkişandinê hêmanên hevpar ên balkêşiyê wekî cihê lîstîk, mîzah, serpêhatî û hwd. li kar in û tîna bikaranîn. Lêbelê amanca edebîyata zarokan a civakî ev e ku zarokan ji bo jiyan û paşerojê amade bike. Dinyaya mezinan û ya zarokan herçiqas ji hev cuda be jî divê tenê dinyayêke derveyî rastîyê û şîrîn û paqij nîşanî wan neyê kirin (Çiftçi, 2022, r. 169-170). Ji ber vê yekê hin temayên pirsgirêknabend temayên nerasterast in. Ev yek ji aliyekî ve edebîyata zarokan û bi taybetî temaya pirsgirêknabendê dike çarçoveya navzanistîyê.

Xaleke din a muhîm, xwendina berhemên pirsgirêknabend tenê ji bo zarokên xwedîyê wan pirsgirêkan nîne. Eger wisa bê famkirin ev dibe têgihîştineke li dijî civakîbûn, hesta parvekirinê û empatîyê. Amanc ew e ku bi navbeynkarîya van berheman nîşan bide her çî bê serê meriv jî divê dîsa meriv li ser xwe be, li ber xwe bide û bi hêvî li dinyayeke çê binêre û bigere. Kesên ku van pirsgirêkên di berheman nejiyane jî bi navbeynkarîya huner û edebîyatê bibin hev xemê wan pirsgirêkên berbehs da ku ew jî bibin merivine hêvîdar, parveker û avaker.

Pirsgirêknabend bi piranî di çîrokên modern û romanên zarokan da xuya dibe. Ev cure berhem ji aliyê taybetîyên xwe yê sewirandinê ve pirsgirêk û çareserîyên wê bi awayekî piralî nîşan didin. Loma ji bo peydakirina çareserîyên cihêreng û li ser fikirandin û muhakemekirinê bi kêrhatî ne. Di berhemên çandî de navend bi piranî li ser şîretê ye û bûyer li pêş e. Helbet cureyê helbestê jî pirsgirêkan dikare ji xwe re bike tema yan jî evana bihundirîne. Mînakên wisa jî hene. Ev tesbît ji bo cureyên din jî carî ye. Lêbelê temayên pirsgirêknabend di hin berhemên modern ên wek çîrok û romanên de wekî amanceke xurt xuya dibin.

## 6. Rêbaz

Ev xebat, bi rêbaza lêkolîna wesfî hatiye avakirin. Bi vî awayî herî pêşî qada edebîyata zarokan li gor temaya pirsgirêknabend û têkilîyên wê hatiye nîqaşkirin. Ji bo amanca xebatê berhemên mînak yê Kurmancî (telîf) û yê wergêrana Kurmancî li gorî analîza dokumanî hatine nirxandin û bi taybetîyên xwe hatine senifandin. Çarçoveya pirsgirêknabendbûnê ya metnê mînak li gorî temayên wan hatiye diyarkirin. Berhemên ku di navenda wê de pirsgirêkeke diyar tuneye, hatiye cudakirin. Piştî mînakên nirxandî di bin tema û kategorîyan de hatine bicihkirin û bi hin îqtîbasan hatine şirovekirin.

## 7. Çend Mînak ji Berhemên Telîf

### 7.1. Heyvîn Çima Ranazê

Pirtûka *Heyvîn Çima Ranazê* ji aliyê Sîya Sîtavê (2023) ve hatiye nivîsîn. Wênexêza wê Esmâ Ak e. Ji bo zarokên pêşdibistanî ye. Ji navê pirtûkê jî diyar e ku ranezan/raneketin ji bo zarokan wekî pirsgirêkekê hatiye nîşandan. Ranezan/raneketin hem ji bo tendurîstîyê hem jî ji bo geşedana zarokan rewşeke xirab e. Ji aliyê din ve ji bo dêûbavan jî pirsgirêkeke mezin e. Loma ev pirtûk, bi vî awayî bi ceribandina rê û rêbazinan li çareserîya vê pirsgirêkê digere. Di serî de ji bo destpêkê pîrsek tê pêşkêşkirin:

“Şev bû, her kes razayî bû, lê Heyvîn ranediza! Xew lê herimîbû. Gelo çima? Dengê wê diçû her kesî û her derî û hemû cîranan” (r. 2).

Di pirtûkê de bi alîkarîya cîranên ajel yê sêwirandî ev pirsgirêk hinek sist dibe û bala zarokan dikişîne ser xwe. Bi saya vê sêwirandinê, zarok wekî temaşevanekî dikare rewşa xwe ji dûr ve temaşe bike û bi serlehenga pirtûkê re bikeve nav hêvîyêkê:

“Cîrana wan Legleg Xanimê îdare nekir, hat li derî xist û got: ‘Leq leq! Heyvîn çima ranazê? Gelo ez wê li ser piştî xwe bigerînim û bifirînim dê aş bibe? Leglegê Heyvîn girt, da ser piştî xwe, firand û gerand.

Heyvîn aş bû. Leglegê ev danî û çû mala xwe” (r. 4).

Di pirtûkê zarokan de divê pirsgirêk pir bi hêsanî neyên çareserkin. Di vê pirtûkê de sêwirandin berdewam e û pirsgirêk didome û bi alîkarîya cîranên din çareserî dewam dike û vegêran tê neqilkin. Ji hêla din ve mînakên kenînê jî bi temaya pirsgirêkê re li hev dike û hevşengîyêkê diafirîne:

“Xêleke din Heyvînê dîsa dest pê kir û got: ‘Weee weee ûweee!’

Îcarê cîrana wan mirîşkê hat û got: ‘Qid qid qid qideqidqid!’ Heyvîn çima ranazê? Dibe ku birçî be? Ha vê hêka min bidê, belkî razê” (r. 6).

Her çi dikin Heyvîn ranazê û ev rewş berdewam dike. Cîranên wan ên din çêlek û beq jî tîn û li gorî xwe tiştêkî dikin. Heyvîn hinekî aş dibe, lê dîsa jî ev pirsgirêk çareser nabe. Pirtûk di dawîyê de bi strana dayîka Heyvînê diqede:

“Hopanî! Hopanî!

Kêziya min a panî

Avête golanî

Gola min qamiş e

...” (r. 13).

Ev mînak, bi canîkî di navbera Heyvîn û dayîka wê de hezkirin û têkilîyeke xurt ava dike. Herçiqas li vir gerîna çareserîyê bi destê serlehengê nebe jî piçûkbûna serlehengê vê xisûsiyetê safî dike. Ji ber ku Heyvîn li gorî vegêranê wekî pitik tê famkirin.

## 7.2. Aryen Diçe Bijîşk

*Aryen Diçe Bijîşk*, ji hêla nivîskar Ridwan Polat (2023) ve hatiye nivîsandin. Wêne jî ji hêla Ahmed Birî ve hatiye xêzkirin. Temenê xwînerîya vê berhemê serdema pêşdibastanê ye. Ev berhem ji bo zarokan mijareke dijwar vedibêje. Nexweşbûn û çûyina nexweşxaneyê ji bo zarokan rewşeke tirsê ye. Zarok hem bijîşkan mereq dikin û carinan ji mezinan dipirsin ka ew çi dikin hem jî ji ber nexweşî, derzî û êşê ditirsin. Loma ji bo kontrol û muayeneyê û hwd. çûyina cem bijîşk ji bo wan wekî pirsgirêk tê hesabandin. Ji hêla din ve berhem li ser bûyer û serpêhatiyên nexweşxaneyê ye û di berhemê de pişeyek wekî hînkê tê pêşkêşkirin:

“Dêya Aryenê di destê wê da tabletek hat jûra wê ya listikê. Ji nişka ve jê ra got:

‘Keça min sibê divê em biçin bijîşk, ji bo kontrola te ya mehane.’ Piştî van gotinan Aryenê hinekî tirsîya. Di dilê xwe da digot.

Îcar ev kontrol ji kû derket, off off...! Dayê” (r. 2).

Di berhemê de ji bo çareserîya wê pirsgirêkê diyarî û daxuyanîya dayîka wê, alîkarî û axiftina çêker ya bijîşkê û xweamadekirina serlehengê balê dikişîne. Bi taybetî tevgera serlehengê wekî gaweke giring dikare bê hesabandin:

“Dayika wê di rojbûna wê da, seta bijîşkan diyarî wê kiribû. Aryen jî weke bijîşkekê, pêlistokên xwe danîn ser maseyê û dest bi kontrola wan kir” (r. 3).

“Dayika Aryenê, dema razanê hat jûra wê û ji bo xewnên xweş bibîne çirokekê jê ra xwend. Paşê jê re wisa got: ‘Keça min ez dizanim tû nexweş î. Jixwe tu dizanî em her meh diçin kontrole.’ Keça xwe maç kir û jê ra got: “Şev baş.” (r. 5).

“Bijîşk ji wan re got. ‘Tu bi xêr hatî Aryena delal’ Ez ê niha venêrîna te bikim û li kompîtûra xwe binivîsim” (r. 9).

Zanatî û ragihandineke serkeftî ya bijîşk di çareserîya pirsgirêkê de roleke giring pêk tîne. Wekî mînak bijîşk ji Aryen pîrsa muzîkê dike û bala wê dikişîne dûr û derveyî pirsgirêkê û wekî listik wê hînî wê rewşê dike:

“Bijîşk Sîpan ji Aryenê re got:

‘Tu ji guhdarîkirina li muzîkê hez dikî?’

Aryenê got. ‘Belê.’

Bijîşk Sîpan got:

‘Em ê aniha guhdankekê bikin guhên te. Deng were kîjan guhên te, tu yê wê hêlê rakî jor’ (r. 12).

Aryen bi dîtina kiryar û ragihandina bijîşk Sîpan û bi tevger û atmosfera wî ya çêker ji tirsra çûyina cem bijîşk difilite û ji dayîka xwe re wekî daxwaz wiha dibêje:

“Bijîşk Sîpan... got:

‘We pir baş li Aryenê mêze kiriye, ez we pîroz dikim. Mehekî şûnde ez dîsa li benda we me.’

Aryenê ji nişka ve kelecânî bû û ji dêya xwe ra got:

‘Dayê, dema ez mezin bibim, ez ê jî bibim bijîşk’ (r. 18).

### 7.3. Bajarê Morîyan

Di nav berhema *Bajarê Morîyan* ya Yehya Elewîferd (2016) de helbesta *Wendabûn* bi sernav û naveroka xwe wekî mînak dikare bê pêşkêşkirin. Pirtûk ji hêla Îlgar Rehîmî ve hatiye wênekirin. Ev berhem ji bo zarokên pêşdibistanê guncav e. Di vê mînakê de ji bo çareserîya wendabûnê xebateke komî heye ku ev di terza pirsgirêknawendîyê de gelek giring e. Helbest pirsgirêka wendabûnê û çareserîya wê wiha vedibêje:

“Wenda bûye moriyek

Li bazara mala me

Hinek li pey digerin

Li hewş û hola me

Morî bilez berhev bûn

Wendayî peyda kirin

Alî kirin bi hev re

Dê û bavê wî şa kirin” (r. 21).

Ev mînak, bi cureyê xwe jî dikare bi pirsgirêknawendîyê bê têkildarkirin. Tê zanîn ku helbest metnên rîtmîk û bi qafîye ne. Ji ber vê yekê zimanê helbestê bala zarokan dikişîne û kêfa wan ji helbestan re tê. Loma, ji bo temenê pêşdibistanê nivîsandina berhemên helbestkî dikare wekî rêbazeke guncav bê dîtîn. Helbest bi vî awayî ji bo çareserîya pirsgirêkan ji aliyê şeweyê ve hin derfetan dihundurîne û zarokan bi kêfxweşî nêzikî pirsgirêkên wan dike.

### 7.4. Mîro Diçe Dibistanê

*Mîro Diçe Dibistanê* ji aliyê Mem Bawer (2021) ve di nav rêzepirtûkeke pêşdibistanî de hatiye nivîsîn. Wênexêzê pirtûkê Ahmed Biri ye. Temaya vê berhemê wekî tirsra destpêkirina dibistanê dikare

---

bê hesabandin. Ev qonax mimkûn e bi navbeynkarîya mamoste di gel listik û helwesteke avaker bi hêsanî û xweş derbas bibe. Pirsgirêk bi serleheng Mîro û hevalê wî yê bi navê Soro re eleqedar e. Mîro û hevalên xwe ji bo amadekarîya çûyina dibistanê di nav motîvasyonekê de tîn vegêran. Lê Soro xwe ji wan dûr dixê û naçe dibistanê:

“Mîro û hevalên wî, serê sibê, dê biçûna dibistanê. ... Soro nedixwest here dibistanê. Di dilê xwe da digot: ‘Ez ê nikaribim wêneyên xweşik xêz bikim. Mamoste dê bi min ra bixeyîde.’ Ji ber vê gelekî ditirsîya.” (r. 3).

Haya Mîro ji Soro tune:

“Mîro çû hundir, hemû hevalên wî li fêrgehê bûn. ... Paşê çû li cîyê xwe rûnişt. Çavên xwe gerandin, lê Soro xuya nedikir.” (r. 8).

Piştê dem diguhere û Soro biryar dide û diçe derê dibistanê û bi alîkarîya Mamoste û hevalên xwe beşdarî wan dibe. Bi wî awayî adaptasyona Soro tê şûnê û pirsgirêka wî çareser dibe. Lebelê ev pirsgirêk herçiqas ji aliyê Soroyê xwediyê pirsgirêkê bê helkirin jî hinekî tesadufî pêk tê û ev yeka hinekî agahî yan jî piştvanîyeke sêwirandî dixwaze. Soro çima ji nişka ve ji biryara xwe vegehrîya û çû derê fêrgehê? Çi bû ku wî ev gava krîtîk avêt? Her zarok ji destê pirsgirêkan wisa bi rahatî û di carekê de nikare bifilte. Loma di pirtûkên zarokan de guherîna ku pêk tê divê hem di carekê de nebe hem jî bi şeweyeke rasteqîn pêk bê:

“Çenteyê Soro li piştê wî bû. Heta nivrokî li der û dora dibistanê gerîya. Lê belê bêriya hevalên xwe kiribû. Hat ber derîyê dibistanê û li derî xist.

Mamoste got: ‘fermo were hindir.’ Soro got. ‘Mamosteyê min bibore. Min nedixwest ez werim dibistanê. Lê belê poşman bûm.’ Mamoste got: ‘Dibistan pir xweş e. Mirov bi hevalên xwe ra fêrî gelek tiştên xweş dibe. Kerem ke were rûne’” (r. 20-22).

Di dawîya pirtûkê de tê dîtin ku herçiqas Soro beşdarî hevalên xwe û pola xwe bibe jî pirsgirêka wî di nav mentîqa geşedaneke de nayê helkirin. Çareserî pir lawaz dimîne. Mamoste û hevalên wî xêzên wî gelek dicibînin û ev yek nikare pirsîyarên xwîneran bi dawî bike. Çimkî pirsê hîskirina ewil ya Soro ya ku dê wêneyên nexweşik çê bike “çima hebû?” divê bihata bersivandin. Ji ber nebûna vê pêbawerîya bi metnê dişkê, xwîner pir zû jê aciz dibe û zewqeke edebî jê nagire û dixerixe:

“Soro wêne boyax kir. Mamoste wêneyê Soro gelek eciband. Hevalên Soro jê ra li çepikan xistin. ...” (r. 22).

### 7.5. Seta Hitokê û Papûşko

Seta *Hitokê û Papûşko* ji aliyê Newaf Mîro (2019) ve hatiye nivîsandin. Wênexêz Oğuzhan Kodalak e. Di nav setê de *Baxçeya Zarokan* (Mîro, 2019a) û *Nexweşî* (Mîro, 2019b) li ser pirsgirêkan radiwestin. Temenê xwendinê serdema pêşdibistanê ye.

*Baxçeya Zarokan*, pirsgirêka tîrsa çûn û destpêkirina dibistanê vedibêje. Hitokê keçikeke piçûk e û hevalê wê yê bi navê Papûşko jî hirçekî pêlistok e. Hitokê serpêhatiyên xwe bi piranî ji Papûşko re vedibêje. Di vê berhemê de pirsgirêka berbehs wiha tê pêşkêşkirin:

“Min ser û çavên xwe şuştin wekî hercar. Dayê, porê min şe kir. ... Ez gelek kelecana bûm, ... Ji ber kû, îro cara pêşî ez ê biçûma dibistanê.

Gava em hatin ber derîyê zarokxaneyê, min nedixwest ez bikevim hundir. (r. 4-7).

Hêdî hêdî ew hîni cihê dibistanê dibe û agahiyên dayîka wê ji ji vî aliyê ve rola çêkirina hesta



wêrebûnê dibîne. Lêbelê ev ji aliyê çareserkirina pirsgirêkê ve têrî nake ku bi hêsani wekî şîret dikare bê hesibandin. Keda serleheng li vir kêr e û encama pirtûkê li gorî derûnasîya zarokan nehatiye sêwirandin. Hitokê dikeve rola mezinan û her wekî ku şîretan li xwe bike:

“Gava em ketin hundir, di hundir de gelek zarokên din jî hebûn. ... Gelek hevalên min jî çêbûn. ...

Oyy oyy! Gava dayê xwest here, min hişk bi destê wê girt û berneda. Min dixwest ez bi dayê re vegerim malê. Lê dayê ez girtim hembêza xwe û ez maçî kirim. Dayê gote: ‘Ev der dibistan e. Dê hevalên te çêbibin, tê li vir bilîzî û hînî tiştên nû bibî.’ (r. 7-9).

Berhema *Nexweşî* jî ji navê xwe xuya ye ku li ser nexweşîyê disekine û vê dijwarîyê bi zarokan dide nasandin. Hitokê bi gotina dayîka xwe nake û di hewayê sar de kincên minasib li xwe nake. Ji ber vê yekê nexweş dikeve û bi vî awayî giringiya pêşgirîyê fam dike:

“Papuşkoyê min î delal, ez îro bi dayê ra çûm sûkê. ... Fanêleyek hebû çiqas min jê hez kir. Lê ji ber ku tenik bû, dayê ji min re nekirî. Dayê qet min fêr nake. Ew dibêje; zivistan tê, divê kincên te qalind û germ bin. Û peyva wê ya her car: ‘Sar e, serma ye, kincik bav û bira ye.

Lê ji xwe tu dizanî Papuşkoyê min î delal. ... ez çûm nav parka zarokan ya li ber mala me. ... Min têêra xwe lîst. Ez çiqas şa bûm ku haya Dayê jê çênebû. Û tew kincên qalind jî ne li min bûn. Lê êvarê canê min sincirî û ez nexweş ketim. ... Ma tu dizanî Papuško! Min fêr kir ku gava kincên meriv qalind bin, mirov dikare li ser berfê û qeşayê jî bilîze” (r. 3-9).

## 7.6. Xwezî Bi Wan Rojan

*Xwezî Bi Wan Rojan* romaneke ji bo nûciwanan e û ji bo temenê ji salên 9-11 û berjortir hatiye nivîsandin. Ji aliyê Îsmail Dîndar (2019) ve hatiye nivîsandin û wênexêz jî Necmeddîn Biri ye. Li ser jiyana wan gundî û qaçaxçîyan radiweste ku di kêleka sînor de dijîn. Bi vî awayî di gel vegotina serlehengê di berhemê de hin bîranînên xweş û eşbar tînin zimên. Jiyana Celal û yê cîran û gundîyên wî bi temayên heremên ku tundûtîjî lê heye, koç û serhildan lê çê dibe, bi hev re dikare bê nîşandan. Ev her du tema di berhemê de bi têkilîyêkê cih digirin. Berhem, di navbera her du hêlên sînor de vegêrana bûyerên tundûtîjîyê ya li hemberî jiyana gundî û zarokan e. Piştê di dawîya pirtûkê de jiyana û dijwarîyên jiyana cîranên wan ên koçber tê pêşkêşkirin. Hem bîrakirina jiyana berê û tama wê hem jî sextîya heremên ku tundî û eş naqedin tînin ber çavan:

“Dêya min bi kelecaneke mezin, digot.

-Li min pepûkê, li min rebenê, li min evdalê! Qaçaxçî û esker li hev qewimandin. ...

Dengê girîyê zarokan, tevî qîjeqîja tivingan bûbû, gund bi yek carê şîyar bûbû, li serê banan, ji nav nivînan, li dengê guleyan guhdarî dikirin û li ronîya guleyên şanîdanê yê ku ji tivingên leşkeran derdiketin û ezmanî ronî dikirin, temaşa dikirin” (r. 24-25).

“Rojê ku cîranên me, bavê hevalê min Şengo û dapîr û bapîrên wî bi rê ketin û berê xwe dan rêya çûnûnehatinê...

Heta kaset bi her du serîyan dihate guhdarkirin, ev silav û ev gazin çend caran dubare dibûn, kes nedizanî. Pîrsa xanîyên xwe dikirin, gelo hilweşîyane yan li ser pîyan in...

Di gundê me de sê çar mal mabûn ji êzidî û suryanan lê gundên derdorê yê ku xwerû suryan an êzidî bûn, tenê yek mal jî nemabû. Gund ji mirovan xalî bûbûn” (r. 30-34).

Di dawîya romanê de ji bo çareserîyê nirxa wekhevîyê tê vegotin û kiryarên ku li dijî vê yekê ne tînin redkirin. Encamên tundîyê û cudakirina gel û çandên din ku li dijî mirovayetîyê ne tînin redkirin:

“Em ligel komek zarok bûbûn dê û bav. Zarok li benda me û gezek nanê bi xweşî û şahî bûn ku ev jî mafê her zaroka/ê li ser rûyê erdê bû; çî reş, çî spî. Çî kurd, çî suryan, çî alman û çî êzîdî...” (r. 45).

Ji aliyê din ve di vê romanê de li ser vegotinê hinek hestên mezinan ên wekî hesreta demên berê jî xuya dike. Navê berhemê jî bi vî awayî dikare bê famkirin. Eger ji bo zarokan dinyaya mezinan ya nostaljik bê vegêran û zarok bi vê yekê negihîjin rastîya xwe ya îroyîn hin kêmasî dibe ku pêk bên. Di vê berhemê de ji aliyê naskirina dinyaya mezinan ve derfetên girîng hene lê ji aliyê vegotin û hestên ku tînan veguhastin ve berhem hinekî din baldariyê divê.

Di edebîyata zarokan de bikaranîna tundiyê jî mijareke baldar e. Tundî rastîya dinê ye û zarok jî ji ber vê yekê carna têkildarî tundiyê dibin. Nivîskar nikare ji zarokan re dinyayeke cuda ya bêyî rastîyan bisêwirîne û wan ji jiyana dîr bixîne. Cureyê fantastîk jî axirî li ser rastiyên vîşartî rûdine. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku roleke edebîyata zarokan ew e ku xwînerên xwe ji bo paşerojê amade dike. Loma em dikarin bibêjin ku di edebîyata zarokan de pirsgirêk ne li ser tundiyê lê di veguhastina wê de ye. Eger tundî bi pîvaneke maqûl bê bikaranîn guncav e. Bi vî awayî, em dikarin bibêjin ku berhema mînak ji vî aliyê ve hêmanên xwe yê tundiyê di nav sêwirandina xwe de bi pîvaneke maqûl bi kar anîye. Di berhemê de hêvî, hezkirina jîyan û welêt û nîrxên mirovayetiye jî hene û ligel hêmana tundiyê tînan pêşkêşkirin.

### 7.7. Ejderhayê Tirsonek

*Ejderhayê Tirsonek* çîrokek e û li gorî xwînerên 7 salî û berjortir dikare bê destnîşankirin. Nivîskarê wî Çetoyê Zêdo (2020) ye û li ser pirsgirêka ejderhayekî biçûk radiweste ku kêmasîya bixwebaweriyê dijî. Bi vegotîneke mîzahî pirsgirêk bi alîkariya hin bûyer û rewşan tê veguhastin:

“Dê û bavê Ejder ew ji dibistanê anîn. Diviyabû bi malbata xwe re dest bi firîne bikira. Malbata wî ji ejder re got: ‘Haydê, dema firîne ye. Bide dû me.’ û firîyan. Dema ku li xwe zivirîn dîtî ku Ejder nefiriyaye. Di cih de daketin cem Ejder û jê re gotin:

- Çî derdê te heye Ejder? Tu çima nafirî? Ejder pir fedî kiribû, got:

- Ez jî dixwazim wekî we bifirim lê gelekî ditirsim” (r. 13).

Pirsgirêka Ejder bi hêsanî nayê çareserkirin û xemgîniya wî hinek didome. Lê rojekê di daristanê de Ejder wîna dibe û rastî dînozoran tî û di navbera wan de bûyereke diqewime û Ejder bi ked û hewldana xwe di halekî matmayî de fam dike ku hêza firîne pê re heye. Ji ber vê yekê baweriyê bi xwe tîne û bi vî awayî kêfa wî tîne şûnê:

“Dînozoran xwe ji bo êrîşê hazir kiribûn. Ejder biryar da û baskên xwe li hev xistin û dengên ecêb derxistin. ... Ejder piştî ku halê dînozoran dît hinekî din wêrektor bû. Ewqas baskên xwe li hev xistin ji ber xwe ve bi hewa ket. Ejder dema ku bi carekê re xwe hewa dît ji kêfa agir ji devê xwe pijiqand. Ji tîrsa agirê Ejder, her yek ji dînozoran bi aliyekî de reviyân” (r. 20).

## 8. Çend Mînak ji Berhemên Wergêrayî bo Kurmancî

### 8.1. Seta Dilşa

Seta Dilşa, rêzepirtûk in ku li gorî xwînerên di temenê pêşdibistanê de ne. Berhemeke wergêrayî ye ku ji Almanî bo Kurmancî hatiye wergêran û mijarên berhemê derbarê serpêhatiyên curbicur yê serleheng Dilşayê de ne. Di berhema orijînal a Almanî de navê serlehengê Conni ye. Wer dixuye ku ji bo avakirina nêzîkatîyeke çandî di pirtûkên seta bi Kurmancî û Zazakî de navê Conni wekî Dilşa hatiye guherîn. Nivîskarê wê Liane Schneider (2022) e. Wênexêz Eva Wenzel-Bürger, wergêr



jî Abdullah İncekan e. Di nav setê de hin pirtûk li ser pirsgirêknawend jiyanê disekinin ku ev pirsgirêknawend ji bo zarokan di hin cihan de dijarîyan dihewîne. Pirtûkên *Dilşa Wenda Dibe* (Schneider, 2022a), *Dilşa Dest bi Dibistanê Dike* (Schneider, 2022b), *Dilşa Hînî Ajotina Bisiklêtê Dibe* (Schneider, 2022c) wekî temayên pirsgirêknawend dikare bên hesibandin. Di vê serîyalê de pirtûkên din jî di nav jiyana zarokê de di çarçoveya temaya pirsgirêknawend de dikare bên şirovekirin. Lê mînakên ku navên wan hatine rêzîkirin jî aliyê temaya pirsgirêknawend ve diyartir in.

*Dilşa Wenda Dibe* (Schneider, 2022a), mijara xwe ji wendabûna Dilşayê di dema kirîna cil û bergên de digere. Dilşa di pirtûkê de ji dayîka xwe du caran dîr dikeve û wenda dibe. Ev bûyer herçiqas xwînerên zarok bide tirsandin jî bi hin agahiyên dayîka Dilşayê tirsan wan dîtîmire:

“Demê Dilşa bi cotek solên nû ji bo ceribandîna diçe û tê, ji nişka ve li aliyê din ê refîkê coteke solên sporê yê sor dibîne. ... Ev solên nû pîr xweşik in; lê gelo îcar dayê kanê? Dilşa di nava refîkan de lê digere û gazî wê dike.

Baş bû ku dikan ewqas ne mezin e û Dilşa dayê zû dibîne. Dayê jê re îzah dike ka divê ew çî bikin, dema ku ew careke din di dikanekê de hevdu wenda bikin. Divê Dilşa biçê ber kasayekê û ji firoşkarekê re vê yekê bibêje. Mikrofoneke wan heye û dikarin pê di tevayîya dikanê de gazî dayê bikin” (r. 8-9).

Di pirtûkê de wendabûna Dilşayê ya cara duyem bêtir tirs û xofê dihewîne ku hem hesta tirsandinê dide xwîneran hem jî di dawîya vê dijarîyê de pêkanîna çareserîyê nîşan dide:

“Dilşa digere û digere. ... Lê dayê li wir jî tune.

Niha tiştê ku dayê gotibû, tê bîra wê: ‘Biçe cem kaseyêkê.’ Lêbelê li vir kase li ku derê ye? Çavên Dilşayê tijî hêstir dibin. ...

Ji nişka ve dengê anonekê tê: ‘Dêya Dilşaya piçûk li ber kaseya li kêleka merdîwana otomotîk li hêviyê sekinîye” (r. 20-21).

Wendabûn ji bo zarokên piçûk tirs û bêçaretîyê dihewîne. Loma ev pirsgirêknawend ji bo zarokên piçûk travmatîk e. Hewce ye ku zarokên piçûk pê de pê de xwedî xweserîya xwe bibin û hînî vê dijarîya jiyanê bibin. Ev yek ji bo zarokan zû yan dereng divê pêk bê û zarok van tirs û xofên xwe li dû xwe bihêle. Di vê mînakê de pirsgirêknawend hinek hatiye îzahkirin û ev tiştêkî erênî ye. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku divê mezin di gel zarokan bikevin nav ragihandin û danûstandineke çêker û li ser pirsgirêknawend biaxivin.

*Dilşa Dest bi Dibistanê Dike* (Schneider, 2022b), ji navê wê diyar e ku li ser pirsgirêknawend tirsan çûn û destpêkirina dibistanê disekine. Bi vegotîneke erênî û kêfxweş kesayet, bûyer û cihên dibistanê dide nasandin û tirsan Dilşayê sist dike:

“Dilşa hê nizane ka ew ji bo dibistanê şa dibe yan na. Gava mamoste yekî bi hêrs be, wê çî bike? Mîna ku Dilşayê carekê di televîzyonê de dîtibû. Dibe ku baştir be ew hê jî biçê bexçeyê zarokan? Lê bavo dibêje: Êdî mamosteyên mîna yê di filiman de tunene. ‘Û ji bilî vê jî divê tu xwendîna hîn bibî. Hingê tu dikarî êvaran ji Yaqub re çîrokan jî bixwînî.’ Ev fikir li xweşa Dilşayê diçe.” (r. 5).

*Dilşa Hînî Ajotina Bisiklêtê Dibe* (Schneider, 2022c) qonaxê giring ya ji bo zarokan vedigêre. Dilşa wextê hînî ajotina bisiklêtê dibe, tûşî hin dijarîyan tê. Ev pirsgirêknawend bi alîkarî û rêveberîya dêubav dikeve rêya çareserîyê. Hin xeternakîyên ku tîr serê Dilşayê bi ked û hewldana wê axirî tîr derbaskirin.

“Heywax, li pêşîya wê sênc heye! Dilşa diqêre. ‘Zelal, meriv çawa fren dike?’ Pê re nagihîne, ew hema li sêncê diqelibe” (r. 7).

“... Bavo nişanî Dilşayê dide ku meriv pedalan û frena destan çawa bi kar tîne. ... Dilşa êdî dikare biajo. Pir hêsan e. Biskilêt naheje” (r. 14).

Dema ku Dilşa hîn ajotina bisiklêtê dibe, dibîne ku ev pirsgirêk tenê ya wê nîne. Zarokên din jî dibe ku li erdê kevin. Ev wekî normalîzasyona pirsgirêkan dikare bê nişandan û ji bo çareseriyên wê jî bibe mînak:

“Di quncikekê de pedala Zelalê digihê erde. Zelal jî pê re xiş dibe û li erdê dikeve” (r. 22).

## 8.2. Seta Morîs

Seta Morîs, berhemê wergêran e û ji bo xwînerên di temenê pêşdibistanê de hatiye amadekirin. Hin serpêhatiyên kûçikê bi navê Morîs tînin vegêran. Nivîskara rêzepirtûkan Lotta Olsson (2009) e. Wênexêz Maria Jönsson, wergêr jî Amed Tigrîs e. Pirsgirêkên temenê berbehs di hin pirtûkên setê de di gel hin dijwarîyan tînin çareserkin. Pirtûkên ku wekî pirsgirêknawend bînin hesabandin di seta Morîs de ev in: *Morîs li ber Malê ye* (Olsson, 2009a), *Morîs li Mêrga Mezin* (Olsson, 2009b), *Morîs li ba Berber* (Olsson, 2009c).

*Morîs li ber Malê ye* li ser tenêmayîne radiweste. Rojekê xwediya kûçikê piçûk wî li malê tenê dihêle û Morîs vê rewşê jî xwe re dike xem. Lê mezinbûna temenî hin rewşên nû ji bo zarokan pêk tîne. Loma pirsgirêka tenêmayîne û rûbirûbûna bi vê rewşê re rastîyeke jiyanê ye û divê çareserîya wê pêk bê:

“Ji bo ku Morîs bi tenê li malê bimîne hîn biçûk e. Xwediya Morîs weha difikire. Û Morîs bi xwe jî weha difikire. Gelek, gelek biçûk e. Lê rojekê xwediya Morîs dibêje: ‘Îro divê demeke kurt tu li ber malê bî. Tu nuha êdî mezin î.’ Anuha Morîs qet naxwaze mezin be. Anuha Morîs dixwaze pir biçûk be. Ewqas biçûk be ku nikaribe li ber malê be. Lê xwediya wî piçêkî wî mist dide û dibêje: ez zû tîm. Û ew diçe. Ew her diçe! Morîs li malê bi tenê dimîne. (r. 8-9).

Meriv bi hêsanî hîn vê rewşê nabin. Kûçikê piçûk jî dengê bayê ditirse bêyî ku bizane ew dengê bayê ye û di nav malê de ev tirs demekê berdeham dike. Ev yek jî divê heta pîvanekê hebe û tirs jî aliyê zarokên xwîner ve jî bê hîskirin. Serleheng Morîs jî bo şikandina tirsê du sê ceribandînan din jî dike. Wekî mînak li ber derî disekine lê derî venabe û paşê dev jê berdide. Lêbelê ked û hewldana wî girîng e ku li çareserîya pirsgirêka xwe digere. Di dawiyê de xwediya Morîs tê û kifş dibe ku ew dengê bayê ye û ev tiştêkî asayî ye. Pirsgirêk wisa normalîze dibe:

“Dûre mal jî binî ve bêdeng dibe. Bêdengîyeke bitirs. ... Hingê jî nişka ve dengêkî seyr dibîhîse. Ev çi bû gidî? ... Dema xwediya wî kilîtê li derî dixê, ... Xwedî dibêje; ‘Wîî tu li vir î! Tu çi jêhatî yî!.. Bayî pencera mutfaxê vekiriyê, ma tu tirsîyayî?’” (r. 14-22).

*Morîs li Mêrga Mezin* jî wekî *Morîs li Ber Malê ye* li ser tenêmayîna piçûkan radiweste. Xwediya vî kûçikê dixwaze ew bi tena serê xwe bimîne û hîn vê rewşê bibe:

“Morîs ne kûçikê mezin e. Morîs gelek biçûk e. Ji bo Mêrga Mezin hîn biçûk e. Lê rojekê xwediya Morîs dibêje: ‘De baş e! Ez te berdidim, tu dikarî piçêkî bilîzî.’ Û ew Morîs berdide. ... Xwediya Morîs nexuyaye. Morîs di çiyê xwe de sip û sar dibe. Gelo ew çûye malê? ... Ji nişka ve dibîhîse ku yek bang dike û dibêje ‘Morîs!’” (r. 9-22).

*Morîs li ba Berber* li ser hînkirina çûyina cem berber disekine û ev jî bo zarokan rewşeke nû ye û dibe ku wekî pirsgirêk pêk bê. Ji ber ku rewşeke nû ye, hînîbûna wê jî hin dijwarîyan dihewîne. Morîs jî pê de pê de hînî karê berber û derdorê dibe:

“Morîs pêşiyê xwe gelekî bi tenê hîs dike. Lê piştê dibîne ku ew qet jî ne bi tenê ye” (r. 16).

Serleheng bi çavderiyên xwe hîn dibe ku çûyina cem berber û karê wî tişteki xweşik e. Piştê bala wî diçe ser bûyerên din jî:

“Pêşiyê Morîs tê şamponkirin. A rastî ew ji vê yekê hez nake. Lê nuha kêfa wî jê re te. ... Û dûre tê zuwakirin. ... Û piştê li ser masayekê radiweste. Li hember awêneyeke weha mezin û mezin. Morîs difikire, gelo ê nuha çi bibe?” (r. 18).

Di dawîya pirtûkê de tîrsa Morîs a ku ji ber çûyina cem berber lê peyda bûbû, dadigere hezkirinê û tîrsa Morîs qet namîne:

“... Pêşiyê berber aliyekî diqusîne. Şeqeşeqa meqesê ye. Û Morîs xwe ji cî tev nade. Piştî demekê Morîs his dike ku qet natirse” (r. 20).

### 8.3. Zarokên li ber Tevna Mehfûrê

*Zarokên li ber Tevna Mehfûrê* ji du çîrokên dirêj pêk tê û li gorî xwînerên 10-12 salî û berjortir e. Nivîskarê wê Hûşengê Moradiyê Kirmanî (2022) ye û ji hêla Kenan Subaşî ve ji Farsî hatiye wergêran. Çîroka *Nimiko* serpêhatiya zarokên feqîr û gundîyan e û li ser temaya zarokên xebatkar radiweste. Çîroka duyem ya *Rizo*, *Esedo*, *Xecîceyê* jî li ser heman temayê radiweste. Lê em ê di vê xebatê de tenê çîroka *Nimiko* binirxînin.

Di çîroka *Nimiko* de serleheng zarokêki xebatkar yê heft heşt salî ye bi navê Nimiko. Malbata Nimiko feqîr û neçar e û bavê wî ji hêla serdestan (mixtar û notirvanê gund) ve tê xapandin û pereyên ku di destê wan de hene, giş ji wan tê standin û di ser de jî wan dîkin deyndar. Ji ber vê yekê bavê Nimiko Yedullah herçiqas bixwaze kurê xwe bide xwendinê jî pêk nayê. Bi navbeynkarîya merivên sûdparêz û xirab (Maşoyê Şeytan) kurê xwe dide şola tevna mehfûrê li gundekî dûrî gundê wan.

“Bi kurtî her çi pêk hatibe jî tişteki ku ji destê me bê, nîne. Ew notirwanê zeviyan e, emên belengaz nikarin tişteki jî pê bikin” (r.13).

“- Ez lawikê xwe naşînim ser karê ristina mehfûran. Tu dixwazî bila bibe lord jî dîsa naşînim. ... - Ez dixwazim Nimiko bişînim xwendinê” (r.37-38).

“... Li nav gundan digere, zarokên sêwî û bêkes îcare dike û dibe dide ber destê mirovên ji xwe zalimtir. Piçek dilê wan naşewite. Wan cîgera xwe ji nav ruhê xwe derxistiye. ...” (r. 42).

Jiyan û qedera Nimiko ji ber vê rewşa neçarîyê dikeve nav lepên kedxwaran û li ser serpêhatiyên wî û hevalê wî yê bi navê Sefero dijwarîyên ku zarokên xebatkar dibînin tê vegêran û rexnekirin:

“Ev tişteki nû nebû. Maşoyê Şeytan her roj yan jî her hefte zarokê du zarok îcare dikir û dibire gundê jor” (r. 49).

Ji aliyekê ve pirsgirêknawend dikare di gel şeweya rexneyî bê pêşkêşkirin. Çimkî pirsgirêk bi xwezayî di nav xwe de tiştên ku bî rexnekirin û bî çareserkirin, dihewînin. Bi taybetî pirsgirêkên civakî ji hêlekê ve rexneya civakî ne:

“Eger hûn Xwedê û pêxember dinasin, çima rojekê vî Evdilahê notirvanê zeviyan naînine vir û hînî wî nakin ku Xwedê û pexember jî heyê? Da ku ewqas zilim neke” (r. 13).

Temayên pirsgirêknawend divê bûyer û rewşan ji destê şeweya dramatîk derxînin û rêyên xelasbûnê yê alternatîf nîşanî xwîneran bidin. Sefero alîkarîya hevalê xwe Nimiko dike û ew her du heval li rêyên xelasbûnê digerin. Heta vê gavê hêvî û hêzên hevalan baş in. Lêbelê di dawîya çîrokê de Sefero

serpêhatiyêke pir xirab dijî û bi şewata ku di şikeftê de dertê dimire. Li vir rexneyek heye ku eger zarokên di wî temenî de meriv bişîne karên ji wan girantir, ji xwe dûr bixe û bixe destê însanên kedxwar mimkûn e ku tiştên wiha xeternak bî serê wan. Ev yeka ji aliyê mafên zarokan ve hêmanên îhmal û îstîsmarê jî dide berçavan. Herçiqaqas ev dawî pir trajîk be jî bi temsîla Nimiko û Sefero nîşandana rewşa zarokên di wan halan de ne û ev nikare bê veşartin:

“Qirîna Sefero her çû kêmîr bû û rawesta.

-Bavo şewitîm, şewitîm, şew...

Nimiko hewar dikir û digiriya:

Sefero şewitî. Birevin şewitî” (r. 77).

Nimoko jî ji ber vê rewşê herçiqaqas şopa xelasbûnê peyda kiribe jî aqûbeta wî hinek nediyar dimîne. Vegera wî ya gund û rewşa malbata wî ji ber peyama ku bavê wî dabû serdestan dê çi bibe, ne diyar e. Dikare bê gotin ku vegêr bi zanafî ew der şêlû hiştibe û zarokê di nav agir de kuştibe û yekî jî serwindayî kiribe. Ev her du rewş jî pir asayî ne ku bî serê zarokên di wî temenî de yê ku ji malbata xwe dûr in. Bi vî awayî dikare bê gotin ku ev mînak digel mirina Sefero û aqûbeta Nimiko ya nediyar ji aliyêkê ve hinek hêvîşikestî dimîne. Lêbelê hêvî bi sembola gûza çargurçik ya Nimiko tê temsîlkirin. Peyva Nimiko ya di dawiyê de dibêje “Ez li vir im” jî peyveke xurt û watadar e ji bo hêvîyê. Helbet di metnên zarokan de tenê dinyaya şîrîn û hêsan nayê vegotin lê dijwarî û rastîyeke pir hişk jî li gor zarokan divê bi sêwirandineke guncav û bi dozajêke maqûl bê vegotin:

“Nimiko nêzî şikeftê, li kêlêka kevirêkî rûniştibû. Xwe qincilandibû hev. Gûza çargurçik di destê wî de bû. Her diçû mitirb nêzîktir dibûn. Dengê zingezinga zengilê kera wan dihat bihîstin. Nimiko dengê xwe bilind kir:

-Hey...! Hey... Ez li vir im.” (r. 78).

#### 8.4. Cinawira Gola Wanê

*Cinawira Gola Wanê* çîrokeke wergêran e û li ser temaya hişmendî û parastina hawirdorê radiweste. Ji aliyê Nivîskar Berfa Servîn (2020) ve hatiye nivîsîn û ji aliyê Betul Sînanoğlu ve hatiye xêzkirin û ji aliyê Mele Mihemed Kêrsî ve ji Tirkî hatiye wergerandin. Temenê xwînerîyê li gor metn û dirêjîya wê ji bo zarokên 9 salî û jortir dikare bê destnîşankirin. Li ser xwezayê û hezkirina wê yan jî hişmendiya wê hin pirtûkên din yê mînak di Kurdî de hene, lê ew wekî pirsgirêknawend nayên hesibandin. Çimkî di metnan de pirsgirêknawendbûn nebûye amanc û temaya sereke.

Di vê mînakê de parastina hawirdorê di gel serpêhatiya Cinawira Gola Wanê tê vegêran. Merivên bêhişmendî her ku diçe golê bi qirşan qirêj dikin. Serleheng di serî de hinek pasîf bimîne jî dû re dikeve pey parastina golê. Guherîna serleheng li vir pir giring e û ji xwîneran re dibe mînak. Lêbelê ev yeka tiştêkî hêsan nîne û ji vî aliyê ve livdarîya merivan zû bi zû nayê şûnê:

“Her ku gol qirêj dibû masiyan yek bi yek ber bi devê çeman ve koç dikirin. Dema koç dikirin jî ku çî yê wan hebû li pey xwe dihiştin” (r.13).

“Mirov çavnebar bûn. Lewre wan dixwest ku tevahiya xwezayê di bin xizmeta wan de be. Ew xwediyê vê hizra şaş bûn, lewre wan dar dibirîn, ajal dikuştin, li her cihî jî betonê avahî çêdikirin, bi bendevan pêşî herîkîna avê digirtin û ziyar didan xwezayê” (r. 21).

Ji ber vê yekê tehemula Cinawir Xanimê namîne û biryar dide ku micadele bike di gel merivên ku golê qirêj dikin:

## Ferhat ÇİFTÇİ

Temayên Pirsgirêknawend di Edebîyata Zarokan de

“Çi dibe bila bibe, pêwîst e ez van mirovan bidim rawestandî. Ev gol mala min e, piştî ez mala xwe neparêzim ma çî wateya jiyînê heye, dibêje û dest bi êrîşê dîke” (r. 23).

Lêbelê ev kar bi tena serê wê nayê çareserkin. Ji ber vê yekê di pirtûkê de nirxa alîkarîyê derdikeve pêş û ev yeka bi destê zarokan û bi plan û ked û hewildanên wan xwe nîşan dide:

“Zarok bi kelekeke piçûk hatibûn giravê. ... Çawa Cinawir Xanim wan zarokan dibîne piçekî dilxweş dibe, ... Ew çîroka xwe ji serî heta dawî ji zarokan re vedibêje. ...

Zarok gelek li ber xwe dikevin û gelekî şerm dikin. Lewre ew jî mirov bûn. Heta îro jî qirêjkirina golê re tu xem nexwaribûn.

Zarok sozê didin Cinawir Xanimê ku dê ji niha û pê ve golê qirêj nekin û nehêlin kesekî din jî qirêj bike” (r. 29-30).

### 9. Tabloya Berhemên Mînak li gor Pirsgirêk û Taybetîyan

Di xebatê de mînakên ku ji aliyê pirsgirêknawendî û çareserîya wê ve hatine nirxandin, bi taybetîyên xwe dikarin bî nîşandan û berawirdkirin. Ji bo vê yekê tabloya berhemên mînak wiha ye:

H.	Berhem	Nivîskar/ Helbestvan	Cure	Temen	Telif/ Wergêran	Kategorî	Pirsgirêk/ Tema
1	Heyvîn Çima Ranazê	Sîya Sîtav	Çîroka biwêne	03-06	Telif	Pirsgirêkên takekesî	Pirsgirêka ranezanê
2	Aryen Diçe Bijîşk	Ridwan Polat	Çîroka biwêne	03-06	Telif	Pirsgirêkên takekesî	Nexweşî û tirs çûna bijîşk
3	Bajarê Morîyan (Helbesta Wendabûn)	Yehya Elewîferd	Helbest	03-06	Telif	Pirsgirêkên takekesî	Wendabûn
4	Mîro Diçe Dibistanê	Mem Bawer	Çîroka biwêne	03-06	Telif	Pirsgirêkên takekesî	Tirs çûn û destpêkirina dibistanê
5	Baxçeya Zarokan	Newaf Mîro	Çîroka biwêne	03-06	Telif	Pirsgirêkên takekesî	Tirs çûn û destpêkirina dibistanê
6	Nexweşî	Newaf Mîro	Çîroka biwêne	03-06	Telif	Pirsgirêkên takekesî	Nexweşî
7	Xwezî Bi Wan Rojan	Îsmail Dîndar	Roman	09-11+	Telif	Pirsgirêkên civakî	Heremên ku tundûtîjî, koç û serhildan lê heye
8	Ejderhaya Tirsonek	Çetoyê Zêdo	Çîrok	07+	Telif	Pirsgirêkên takekesî	Kêmasîya bixwebawerîyê
9	Dilşa Wenda Dibe	Liane Schneider	Çîroka biwêne	03-06	Wergêran	Pirsgirêkên takekesî	Wendabûn

## Ferhat ÇİFTÇİ

Temayên Pirsgirêknawend di Edebîyata Zarokan de

10	Dilşa Dest bi Dibistanê Dike	Liane Schneider	Çiroka biwêne	03-06	Wergêran	Pirsgirêkên takekesî	Tirsa çûn û destpêkirina dibistanê
11	Dilşa Hînî Ajotina Bisiklêtê Dibe	Liane Schneider	Çiroka biwêne	03-06	Wergêran	Pirsgirêkên takekesî	Dijwarîya hînbûna ajotina bisiklêtê
12	Morîs li Ber Malê ye	Lotta Olsson	Çiroka biwêne	03-06	Wergêran	Pirsgirêkên takekesî	Tenêmayîn
13	Morîs li Mêrga Mezin	Lotta Olsson	Çiroka biwêne	03-06	Wergêran	Pirsgirêkên takekesî	Tenêmayîn
14	Morîs li Ba Berber	Lotta Olsson	Çiroka biwêne	03-06	Wergêran	Pirsgirêkên takekesî	Tirsa çûyina cem berber
15	Zarokên li ber Tевна Mehîrê	Hûşengê Moradiyê Kirmanî	Çirok	10-12+	Wergêran	Pirsgirêkên civakî	Zarokên xebatkar
16	Cinawira Gola Wanê	Berfa Servîn	Çiroka biwêne	09+	Wergêran	Pirsgirêkên civakî	Parastina hawirdorê

### Encam

Temayên pirsgirêknawend di nav edebîyata zarokan de di gel berhemên xwe bi şeweyeke nû tên bicihkirin. Piştî serdemên kevneşopîyê bi geşedena pedagojîyê zarok bûne navend û bandorên vê yekê li ser berhemên zarokan jî xuya bûye. Hewcedarî û eleqaya zarokan pirsgirêkên wan derxistiye pêş û digel navbeynkarîya berhemên edebîyata zarokan çareserîyên wan hatine nîşandan. Bi vî awayî berhemên berbehs di bin prensîbên edebîyata zarokan de yên weku rastîya zarokan û îzafiyeta zarokan di gel hin taybetîyên din arasteyî qonaxeke nû û girîng bûne. Ji ber vê yekê di edebîyata zarokan de temaya pirsgirêknawend di nav sînorê xwe de xwe dispêre bikaranîneke taybet. Bi gotineke din vê temayê berhemên xwedî amanc derxistiye holê. Ev taybetîya xwedî amancbûnê jî ji aliyê estetîk û naverokê ve wekî hevşengîyek tê hesabandin. Çimkî hêmanên edebîyatê û bi vî awayî yên edebîyata zarokan hevdu temam dikin. Ango navbeynkarîya berhemeke edebî di vê rewşê de nirxa huner û estetîkê danaxîne û berevajî bi vê taybetîyê şênber dibe û derfetên takekesî û civakî di gel vê tekiliyê der tên.

Temayên pirsgirêknawend curbicur in û di bin kategorîyên takekesî û civakî de dikarin bîna dabêşkirin. Ji bo kategorîya takekesîyê pirsgirêkên wekî mirin, astengdarî, zordarîya hevtemenan, hin fobî, cihêbûna dêûbavan, nexweşî, tenêbûn û hwd. dikare bîna rêzkirin. Yên civakî jî wekî şer û heremên ku tundûtîjî lê heye, koç û penaberî, serhildan, feqîrî û zarokên xebatkar, zarokên kûçeger, parastina hawirdorê û hwd. dikarin bîna destnîşankirin. Herçiqas temayek ji hêla piralîbûna xwe di bin kategorî û temayên cihêreng de bê diyarkirin jî ev yeka bi taybetîya têkildarîyê wata dar dibe. Di vê xebatê de temayên pirsgirêknawend di edebîyata zarokan de di gel berhemên Kurmancî yên telîf û yên wergêrana Kurmancî hatine nirxandin. Heşt mînakên telîf û heşt mînakên wergêranê li gor temayên xwe yên pirsgirêknawend di bin kategorîyên takekesî û civakî de hatine diyarkirin. Piştî naverokên mînakên bi iqtibasên rasterast hatine nîşandan û çareserîyên wan pirsgirêkan li gor hin taybetîyên pirsgirêknawend hatine şirovekirin. Bi vî awayî hatiye dîtin ku di metnên mînak de temayên pirsgirêknawend yên takekesî wekî ranezan, nexweşî û tirs çûna cem bijîşk, wendabûn, tirs çûn û destpêkirina dibistanê, qonaxa dijwarîya hînbûna ajotina bisiklêtê, tenêmayîn, tirs çûyina cem berber, kêmasîya bixwebawerîyê ne. Yên civakî jî li ser temayên pirsgirêknawend ên wekî feqîrî û zarokên xebatkar, parastina hawirdorê, heremên ku tundûtîjî, koç û serhildan lê heye, radiwestin. Herçiqas

## Ferhat ÇİFTÇİ

Temayên Pirsgirêknabend di Edebîyata Zarokan de

---

di vê xebatê de mînakên ku hatine nirxandin temamê pirsgirêkan nîşan nede jî nêzîkatîyekê pêşkêşî xwîneran dike. Bergeha mînakine bi vî awayî dikare bibe temsîlek ji bo yên din.

Ji aliyê din ve hatiye tesbîtkirin ku li gor berhemên mînak di edebîyata zarokan de pirsgirêknabend di gel cure û temenên cihêreng ji xwe re eleqeyekê dibîne. Ev tema bi piranî ji aliyê çîrokan ve hatine bikaranîn. Ev yek bi metnên sêwirandî re dikare bê peywendîdarkirin. Lêbelê cureyên din jî ji bo van temayan guncav in. Di pirsgirêknabendiyê de temen jî hem ji bo zarokatîya zû hem jî ya dereng ji xwe re guncavîyekê dibîne.

Çareserîyên ku di metnên mînak de xuya bûne curbicur in. Hin mînak ji aliyê sêwirandinê ve hinek qelsîyan dihewînin û ev ji bo pêkanîna çareserîyan dibe ku bawerîyê hinek sist bike. Hin mînak jî di gel sêwirandîna xwe ya xurt hem ji aliyê ked û hewldana serlehengan ve hem jî ji aliyê çareserkirina pirsgirêkan ve agahiyên maqûl dihewînin. Bi vî awayî dikare bê gotin ku tenê ji bo berhemekê hilbijartina temaya pirsgirêknabend bes nîne û di gel vê yekê rêveberîya prensîbên pirsgirêknabend jî hewcedar e.



### Çavkanî/References

Akgün E. & Karaman Benli G. (2019). Okul öncesi dönem çocuklarla bibliyoterapi: bir uygulama örneği. *Psikiyatride güncel yaklaşımlar*, 11(1), 100-111. doi:10.18863/pgy.392346

Çiftçi, F. (2022). *Mekânda Yitmek Dilde Barınmak-Mültecilik ve Çocuk Edebiyatı*. Ankara: Nobel Akademik Yayıncılık.

Dilidüzgün, S. (2018). *Çağdaş çocuk yazını-yazın eğitime atılan ilk adım* (Çapa 3yem). Weşanên Tudem.

Karagül, S. (2018). Çocuk edebiyatı ve bibliyoterapi. *Çocuk ve Medeniyet*, 3(6), 43-55.

Kaya, M. & Tanrıverdi, S. (2020). Sorun odaklı bir durumdan çözüm odaklı bir duruma yöneliş: edebî eserlerde karakter tahlili. *Journal of History School*, 46, 1784-1798. Doi: 10.29228/joh.43343

Oğuzkan, F. A. (2013). *Çocuk edebiyatı* (Çapa 10an). Anı Yayıncılık.

Öner, U. (2007). Bibliyoterapi. *Cankaya University Journal of Arts and Sciences*, 1(7), 133-150.

Öner, U. & Yeşilyaprak, B. (2006). Bibliyoterapi: psikolojik danışma ve rehberlik programlarında çocuk edebiyatından yararlanma, dnd. *II. Ulusal Çocuk ve Gençlik Edebiyatı Sempozyumu (Gelişmeler, Sorunlar ve Çözüm Önerileri)*, rr. 559-565.

Subaşı, K. (2021). Nirxandina helbestên zarokan ên kurdî li gorî “rastîya zarokan” û “îzafiyeta zarokan”. *Mukaddime*, 12(1), 220-248. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.803810>

Şirin, M. R. (2019). *Çocuk edebiyatına eleştirel bir bakış-çocuk edebiyatı nedir ne değildir?* (Çapa 2yem). Uçan At.

Turan, L. (2005). Arkadaş edinme güçlüğü çeken çocukların problemlerini çözmede çocuk edebiyatından yararlanma. *Atatürk Üniversitesi Kazım Karabekir Eğitim Fakültesi Dergisi*(12), 124-135.

Ungan, S., Arıcı, A. F., & Şimşek, T. (2016). Çocuk edebiyatının kaynakları. Dnd. T. Şimşek (Ed.), *Kuramdan uygulamaya çocuk edebiyatı el kitabı* (çapa 4an ) de. Grafiker. 163-216.

Yılmaz, O. & Yakar, Y. M. (2018). Türk Çocuk Edebiyatında Sorun Odaklı Yaklaşım. *Çocuk ve Medeniyet*, 3(6), 29-42.

### Berhêmên Mînak yên di Xebatê de Hatine Nirxandin / Evaluated Sample Works

Bawer, M. (2021). *Mîro Diçe Dibistanê* (Wênesaz: Ahmed Biri). Dîyarbekir: Weşanxaneya Morî.

Dîndar, Î. (2019) *Xwezî Bi Wan Rojan* (Wênesaz: Necmeddîn Biri). Dîyarbekir: Weşanxaneya Morî.

Elewîferd, Y. (2016). *Bajarê Moriyân* (Wênesaz: Îlgar Rehîmî). Dîyarbekir: Weşanxaneya Hîva.

Kirmanî, H. M. (2022). *Zarokên li ber Tevna Mehîfûrê* (Wergêr: Kenan Subaşı). Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Mîro, N. (2019a). *Hitokê û Papûşko-Baxçeya Zarokan* (Wênexêz: Oğuzhan Kodalak). Dîyarbekir: Weşanxaneya Morî.

Mîro, N. (2019b). *Hitokê û Papûşko-Nexweşî* (Wênexêz: Oğuzhan Kodalak). Dîyarbekir: Weşanxaneya Morî.



Olsson, L. (2009a). *Morîs li Ber Malê ye* (Wênesaz: Maria Jönsson), (Wergêr: Amed Tîgrîs). Swêd: Weşanxaneyê Apecê.

Olsson, L. (2009b). *Morîs li Mêrga Mezin* (Wênesaz: Maria Jönsson), (Wergêr: Amed Tîgrîs). Swêd: Weşanxaneyê Apecê.

Olsson, L. (2009c). *Morîs li Ba Berber* (Wênesaz: Maria Jönsson), (Wergêr: Amed Tîgrîs). Swêd: Weşanxaneyê Apecê.

Polat, R. (2023). *Aryen Diçe Bijîşk* (Wênesaz: Ahmed Birî). Dîyarbekir: Weşanxaneyê Morî.

Schneider, L. (2022a). *Dilşa Wenda Dibe* (Wênesaz: Eva Wenzel-Bürger), (Wergêr: Abdullah Încekan). Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Schneider, L. (2022b). *Dilşa Dest bi Dibistanê Dike* (Wênesaz: Eva Wenzel-Bürger), (Wergêr: Abdullah Încekan). Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Schneider, L. (2022c). *Dilşa Hînî Ajotina Bisiklêtê Dibe* (Wênesaz: Eva Wenzel-Bürger), (Wergêr: Abdullah Încekan). Stenbol: Weşanên Nûbihar.

Servîn, B. (2020). *Cinawira Gola Wanê* (Wênesaz: Betul Sînanoglu), (Wergêr: Mele Mihemedê Kêrsî). Van: Weşanên Sîtav.

Sîtav, S. (2023). *Heyvîn Çima Ranazê* (Wênesaz: Esmâ Ak). Îzmîr: Weşanên Na.

Zêdo, Ç. (2020). *Ejderhayê Tirsonêk* (Wênesaz: Ronî Battê). Stenbol: Weşanên Nûbihar.

### EXTENDED ABSTRACT

The aim of this study is to examine problem-oriented themes in children's literature, focusing on Kurdish and Kurdish-translated children's books. Problem-oriented themes in children's literature are predominantly found in contemporary texts that deviate from traditional approaches. With the increasing importance of pedagogy in the modern era, child-centred works have become the cornerstone of children's literature. These works, shaped by the principles of child relativity and child reality, have gained significant attention. Texts that prioritize children's interests and needs focus on the child's world and experiences. In children's books featuring problem-oriented themes, the challenges faced by children—either directly or indirectly—and potential solutions are explored. In this regard, problem-oriented works in children's literature can be seen as purposeful texts. Through these books, children gain various perspectives on solving their own problems or addressing issues affecting others. They experience the guiding and supportive influence of literature, both linguistically and fictionally, in overcoming life's challenges.

Problem-oriented themes in children's literature encompass a wide range of topics and can be categorized into individual and social problems. Death, disability, peer bullying, phobias, divorce, illness, loneliness etc. can be listed as individual themes. Social problems, on the other hand, are reflected in themes such as war and violence, migration and refugees, resistance, poverty, child labor, street children, and environmental protection. Some of these themes possess both individual and social dimensions, allowing for a relational evaluation. While the exploration of these themes in children's literature highlights their functional aspects, the literary, aesthetic, and pedagogical qualities of children's literature play a complementary role in shaping these works. Additionally, there is a strong connection between children's literature and bibliotherapy. Both utilize the power of books to address specific problems. However, bibliotherapy is more specialized, involving structured applications, a defined process, and expert supervision, setting it apart from general problem-oriented approaches.

In this study, which employed document analysis as a qualitative research method, problem-oriented themes in Kurdish children's books and children's books translated into Kurdish from various languages were examined. To achieve this, works deemed suitable for evaluation within the scope of problem-orientation were identified. Children's books that did not address an individual or social problem as a theme were excluded from the study. Accordingly, a total of sixteen children's books written in various literary genres and aimed at different age groups—eight originally in Kurdish and eight translated—were analyzed, and their themes were categorized under individual and social problems. Direct quotations from the selected works were used to illustrate the findings related to the problems and their proposed solutions. These contents were evaluated within the framework of the principles of children's literature and the requirements of problem-oriented themes.

The children's books and themes identified in the context of individual problems in the study are as follows: *Heyvîn Çima Ranazê* (sleep problem), *Aryen Diçe Bijîşk* (fear of illness and doctor), *Nexweşî* (illness), *Bajarê Morîyan/ Wendabûn* (getting lost), *Dilşa Wenda Dibe* (getting lost), *Mîro Diçe Dibistanê* (fear of starting school), *Baxçeya Zarokan* (fear of starting school), *Dilşa Dest bi Dibistanê Dike* (fear of starting school), *Dilşa Hînê Ajotina Bisiklêtê Dibe* (difficulty in learning how to ride a bicycle), *Morîs li Ber Malê ye* (being alone), *Morîs li Mêrga Mezin* (being alone), *Morîs li Ba Berber* (fear of going to the barber), *Ejderhaya Tirsonêk* (lack of self-confidence). The children's books and themes identified in the context of social problems are as follows: *Xwezî Bi Wan Rojan* (regions where violence, migration, marginalisation and struggle are experienced), *Zarokên li ber Tevna Mehfûrê* (poverty and child labour), *Cinawira Gola Wanê* (protecting the environment).

It is understood that the problem-oriented themes in the analysed works vary across age groups, from early childhood to late childhood. These themes are presented through different literary genres,

---

including picture stories, short stories, novels, and poems, with picture stories being the most prevalent form. It was observed that the analysed texts exhibited both weak and strong aspects in terms of their fictional structure. In some cases, coincidences were used to resolve the problems, which weakened the fictional structure and reduced its credibility. Conversely, in other works, the problems were resolved appropriately through the efforts of the protagonist, reflecting a stronger and more believable storyline. Additionally, some texts highlighted the positive influence of parents and adults, whose correct guidance and optimistic attitudes helped address the challenges. In works with a more tragic tone, life's harsh realities were portrayed in ways that aimed to align with a child's perspective. However, in some texts, the resolution was framed within an adult-oriented context, diverging from the realities of a child's experience. In this context, the importance of presenting a well-constructed fictional resolution, rather than merely addressing a problem as a theme in children's texts, has been recognised, alongside the necessity of adhering to the principles of children's literature and the requirements of problem orientation.

## Şopa Kovara Nûbiharê ya li ser Edebiyata Zarokan di Kovargerîya Kurdî de

### Kürt Dergiciliğinde Nûbihar Dergisi'nin Çocuk Edebiyatı Üzerindeki İzleri

#### Traces of Nubihar Journal on Children's Literature in Kurdish Journal Publishing

Türkan TOSUN

<b>Türkan TOSUN</b>	Türkan Tosun   ORCID: 0000-0002-3815-262X   tosunturkan@gmail.com Ph.D. at Kurdish Language and Literature Department Graduate Student, Independent Researcher, Bingöl-Türkiye.
<b>Jêgir Citation Atf</b>	Tosun, T. (2025). <b>Şopa Kovara Nûbiharê ya li ser Edebiyata Zarokan di Kovargerîya Kurdî de</b> . <i>Artuklu Kurdology</i> (18). 36-64 DOI: 10.35859/artuklukurdology.1575218
<b>Dîroka Şandinê Submission Date Geliş tarihi</b>	28.10.2024
<b>Dîroka Qebûlê Acceptance Date Kabul Tarihi</b>	23.12.2024
<b>Dîroka Weşandinê Publication Date Yayın tarihi</b>	30.01.2025
<b>Cureyê Gotarê Article Type Makale Türü</b>	<b>Gotara vekolinê</b> Research article Araştırma makalesi
<b>Hakemî Peer-Review Hakemlik</b>	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk Ethical Statement Etik Beyanı</b>	<b>Haftîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsina vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têtûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
<b>Kontrola İntihalê Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü</b>	<b>Belê – iThenticate</b> <i>Yes – iThenticate</i> Evet – iThenticate
<b>Nakokiyên Berjewendîyan Conflicts of Interest Çıkar Çatışması</b>	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî Grant Support Maddi Destek</b>	<b>Nivîskar beyan dike ku wê ji bo vê vekolinê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
<b>Mafê Telifê &amp; Destûr Copyright &amp; License Telif Hakkı &amp; Lisanslama</b>	<b>Nivîskar li jêr lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.
	Ev gotar beşek ji teza lîsansa bilind a Türkan TOSUN a bi navê “Edebiyata Zarokan Di Kovara Nûbiharê De (1992-2010)” ye ku bi şewirmendîya Doç. Dr. Mehmet Zahir Ertekin hatiye amadekirin û parastin.

## KURTE

Edebiyat qadeke hunerê ye ku mirov hest, xeyal, fikr û tecrubeyên xwe bi rêya ziman û nivîsê bi awayekî dewlemend û xweşik tînin zimên. Edebiyata zarokan jî ji wan berhemên li gor temen û taybetmendiyên geşedanê ya zarokan hatine nivîsîn re tê gotin. Li cîhanê di warê edebiyata zarokan de bi derengî xebat hatine kirin, lê dîsa jî ji ber ku di vê qadê de êdî zêdetir hewl tê dayîn ev dibe sedema kêfxweşiyê. Kovara *Nûbiharê* ya ku wek kovareke temendirêj a kurdî ji sala 1992yan vir ve weşanê dike di kovargeriya kurdî de xwedî cihekî girîng e. Di vê xebatê de nivîs û xêzên ku di kovara *Nûbiharê* de hatine çapkirin û dikevin bin banê edebiyata zarokan bi berfirehî hatin nirxandin. Ewil bi çarçoveyeke giştî behsa têgehên zarok û edebiyata zarokan û armanca edebiyata zarokan hat kirin. Paşê beşa zarokan a ku di kovarê de bi salan wek beşeke cuda hatiye amadekirin hat analîzkirin. Di kovarê de ji bo zarokên kurd kîjan nivîs, xêz û wêne hatine weşandin mijarên vê xebatê ne. Ji bo ku ev nivîs û wêne bîn tesbîtkirin, hejmarên *Nûbiharê* yên di navbera salên 1992 û 2010î de hatin lêkolînkirin û li ser wan analîz hat kirin. Armanca xebatê ew e ku di qada edebiyata zarokan a kurdî de gaveke biçûk bê avêtin ku ev kêmasî bala nîfşên nû bîkîşîne û li ser vê mijarê zêdetir xebat bîn kirin. Bi saya vê xebatê me tesbît kir ku kovara *Nûbiharê* herçiqas bi pisporî, rêkûpêk û awayekî pedagojîyê ve nebe jî, hewl daye ji bo zarokên kurd beşeke zarokan amade bike û ji hêla dînî, exlaqî, neteweyî ve wan hem kêfxweş û hem jî perwerde bike.

**Peyvên Sereke:** Edebiyat, Zarok, Edebiyata zarokan, Kovara Nûbiharê

## ÖZ

Edebiyat insanın duygu, hayal, düşünce ve deneyimlerini dil ve yazı yoluyla zengin ve güzel bir biçimde ifade ettiği bir sanat dalıdır. Çocuk edebiyatı da çocukların yaş ve gelişim özelliklerine uygun olarak yazılan eserleri ifade etmektedir. Dünyada çocuk edebiyatı alanındaki çalışmalar geç başlamış olsa da bu alanda artık daha fazla çaba sarf ediliyor olması memnuniyet vericidir. Uzun soluklu bir Kürt dergisi olarak 1992 yılından bu yana yayın hayatına devam eden *Nûbihar* dergisi, Kürt dergiciliğinde önemli bir yere sahiptir ki bu çalışmada *Nûbihar* dergisinde yayımlanan metin ve çizimler çocuk edebiyatı kapsamında ayrıntılı olarak değerlendirilmiştir. Önce genel bir çerçevede çocuk ve çocuk edebiyatı kavramları ve çocuk edebiyatının amacı ele alınmış, ardından dergide yıllardır ayrı bir bölüm olarak hazırlanan çocuk bölümü incelenmiştir. Dergide Kürt çocuklarına yönelik hangi yazı, çizim ve resimlerin yayımlandığı bu çalışmanın konusunu oluşturmaktadır. Bu yazı ve resimlerin tespit edilebilmesi için derginin 1992-2010 yılları arasındaki sayıları araştırılmış ve içerikleri analiz edilmiştir. Çalışmanın amacı Kürt çocuk edebiyatı alanında küçük bir adım atarak yeni nesillerin dikkatini bu alandaki eksikliğe çekmek ve bu konuda daha fazla çalışma yapılmasına vesile olmaktır. Bu çalışma ile tesbit ettik ki, *Nûbihar* dergisi her ne kadar profesyonel ve pedagojik biçimde olmasa da Kürt çocukları için dergide bir bölüm hazırlamak için çaba harcamış, onları dini, ahlaki ve milli açıdan eğitmek ve eğlendirmek istemiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Edebiyat, Çocuk, Çocuk edebiyatı, Nûbihar Dergisi

## ABSTRACT

Literature is an art in which people express their feelings, dreams, thoughts and experiences in a rich and beautiful way through language and writing. Children's literature is expresses works written in accordance with the age and development characteristics of children. Although studies in this field have started late in the world, it can be considered a reason that more efforts are being made. *Nubihar* journal, which has been published since 1992 as a long-term Kurdish journal, has an important place in Kurdish journals, and in this study, the texts and drawings published in *Nubihar* journal have been evaluated in detail within the scope of children's literature. First of all, the concepts of child and

children's literature and the purpose of children's literature were discussed in a general context, and then the children's section, which had been prepared as a separate section in the journal for years, was examined. Which articles, drawings and pictures targeting Kurdish children are published in the journal constitute the subject of this study. In order to determine what is prepared for Kurdish children, the *Nubihar's* issues between 1992-2010 were examined and evaluated. The aim of the study is to take a small step in this field and draw the attention of new generations to this deficiency in Kurdish children's literature and to be the reason for more studies on this subject. With this study, we have determined that *Nubihar* journal, although not in a professional and pedagogical way, made an effort to prepare a section for Kurdish children and wanted to educate and entertain them in religious, moral and national terms.

**Keywords:** Literature, Child, Children's literature, Nûbihar Journal

### Destpêk

Zarok toximên gel û welatan in, civak bi hebûna zarokan li ser piyan disekinin û digîhîjin dahatûyê. Herçiqas zarok kesayetên girîng bin jî, gelek civak bi têra xwe qedrê wan nagirin, ji bo wan naxebitin ku ev di gelek qadên jiyânê de xwe dide der. Ji ber ku zarok şexsên pir girîng in, divê ew baş bîn perwerdekirin, ji bo wan berhemên dewlemend bîn amadekirin û derbarê wan de zêdetir xebat bîn kirin. Bi vê mebestê me jî li ser edebiyata zarokan a di kovara *Nûbiharê* de lêkolînek kir û armanc ew e ku di kovarê de ji bo zarokan çî hatiye amadekirin bê tespîtîkirin û ew bi berfirehî bîn analîzkirin. Qasî ku tê dîtî di vê qadê de xebat kêr in û hêvî ew e ku xebata me jî bibe ji perçeyek xebatên edebiyata zarokan a kurdî û nîfşên nû li ser vê mijarê zêdetir hewl bidin.

Di vê xebatê de me rêbaza lêkolîna dokumanê, senifandin û analîza naverokê bi kar anî. Ewîl wêne, nivîs û xêzên ji bo zarokan hatine weşandin yek bi yek hatin tesbîtîkirin. Paşê me hemûyan di bin sernavên cuda de senifand ku xebateke rêkûpêk derkeve holê. Dema senifandin temam bû, me vê carê li ser naveroka wan analîz û şîroveyan kir ku agahiyên berfireh bîn bidestxistin. Ji bilî senifandin, analîz û şîroveyan, me hemû mijaran bi tabloyan nîşan da ku kesên meraq dikin û bixwazin zêdetir agahiyên bi dest bixin bila bi rehetî xwe bigîhînin hejmarên kovarê û naveroka mijaran. Bi saya vê lêkolînê em gihîştin agahiyên berfireh ku ew ê bikaribin di vê qadê de bîn bikaranîn. Girîngiya vê xebatê ew e ku di qada edebiyata zarokan a kurdî de agahiyên nû bide xwîneran, balê bîkşîne ser vê qadê û ji bo kesên ku li ser vê mijarê dixebitin bibe yek ji wan çavkaniyên ku bi mijarê re eleqedar in.

Me di vê xebatê de beşa Zaroknameyê (paşê wek Zarokistan û Nûbihara Biçûkan nav guhertiye) ya di kovara *Nûbiharê* de ji bo zarokan hatiye amadekirin nîrxand. Ji ber vê, hejmarên *Nûbiharê* yên di navbera salên 1992 û 2010î de hatine weşandin yek bi yek hatin lêkolînkirin, hewl hat dayîn ku di edebiyata zarokan a kurdî de rola kovarê bê tespîtîkirin û li ser van nivîs û wêneyan şîrove û nîrxandin bîn kirin. Ji bo ku ew bîn tespîtîkirin 112 hejmarên *Nûbiharê* yên di nav 19 salan de hatine weşandin (ji van hejmaran hinek sê mehan carekê, hinek çend hejmar bi hev re hatine weşandin) hatin nîrxandin. Hat dîtî ku bi tenê di nav salên 1992-1993-1995-1996-1997-1999-2000-2009 û 2010î de yanê 9 sal jî bo zarokan beşek hatiye amadekirin. Gelo naveroka wan nivîs, xêz û wêneyan ji çî pêk tê, zimanê wan hêsan e an giran e, ew li gor asta zarokan in an na, li gor pîvanên edebiyata zarokan hatine amadekirin an na, ev pirs hemû di vê xebatê de hatin bersivandin û derbarê wan de şîrove hatin kirin.



## 1. Zarok û Edebiyata Zarokan

Zarok û edebiyata zarokan du mijarên bi bi hev re têkildar in ku gelek caran li ser niqaş hatine kirin. Ji bo peyva zarokê gelek pênase hene ku ferhenga Cambridgeê dibêje; kesî/kesa ciwan ê ku hê mezin nebûye (Cambridge, 2024). Lê ev pênaseya berfireh dikare mijarê zelal bike; zarok ew kes e ku ji du saliya xwe (temambûna dergûşiyê) heta 15 saliya xwe (dema kamilbûnê) ji hêla fizîkî, derûnî, civakî ve di navbera van herdu heyaman de mezin dibe û di civakê de hewl dide ku bibe şexsek (Tüfekçi Çan, 2014, r. 1). Li gor Peymana Mafên Zarokan a Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî (NY) jî her çiqas kesek zû kamil bibe jî, heta ku 18 salên xwe tije neke ew wek zarok tê hesibandin (Çocuk Haklarına Dair Sözleşme, 2024, r. 5). Di kurdî de ji bo kesên ku temenê wan heta dozdeh û sêzdeh navên wekî zarok, zaro, zarî, gede, gedek, sêlek, sêwlek, doman, qeçek, sebî, mindal, eyal, tifal, biçûk, piçûk, weled û hwd tên bikaranîn (Pertev, 2009, r. 21). Wek ku tê dîtin zarok ew kes in ku temenê wan ji yek an jî du salî dest pê dike û gelemperî heta sêzdeh û panzdeh salî dewam dike. Ji vê heyama ku di navbera van salan de derbas dibe ra jî dibêjin heyama zarokatiyê ku ji bo geşedana hişî, ruhî û fizîkî ya zarokan pir girîng e.

Li ser rûyê erdê dema însanan xwestine ku tiştêkî bibêjin, an bi devkî an jî nivîskî fikr û hestên xwe anîne zimên. Ji van hinek ji ber ku li gor hunerekê hatine gotin an jî nivîsandin, ew wek edebiyat hatine nixandin. Bêşik her gotin û nivîs ne edebiyat e. Edebiyat hunerek e ku mirov hemû bihîstin, kirin û fikrên xwe bi awayekî dewlemend û bitesir di hemû heyaman de bi vê hunerê tînin zimên (Kavcar, 1999, r. 4). Edebiyata zarokan çi ye û kingê derketiye holê? Niqaşên li ser vê mijarê di destpêkê de gelemperî ew e ku edebiyata zarokan perçeyek an jî binbeşeke edebiyatê ye û tena serê xwe divê wek qadeke cuda neyê nixandin. Di nav demê de ev nêrîn guheriyê û ew wek qadeke serbixwe heta roja me hatiye.

Dema em lê dinihêrin tê dîtin ku mezinan bi sedsalan zarok wek şexsên serbixwe qebûl nekirine û ji ber vê nêrînê jî hewce nedîtine ku ji bo wan edebiyatekê ava bikin. Zêdetir berhemên devkî yên wek çîrok, tiştanok, lorîk, fabl, metelok û hwd ji bo wan gotine, an jî di nav rûpelên rojname û kovaran de bi tenê çend rûpel ji bo zarokan veqetandine bes. Lê piştî Serdema Navîn dema tesîra heyama Ronesansê (Ronahîbûn) çêbûye û Ewropa hinekî pêşve çûye, ew nêrîna ku zarokan wek şexsekî qebulnekirin jî guheriyê û êdî ji bo wan edebiyateke taybet hatiye avakirin. Dema ev hişmendî piştî sedsala 17emîn li seranserê cihanê belav bûye, her civak li gor xwe xebitiye û ji hêla edebiyata zarokan ve hêdî hêdî gavên girîng hatine avêtin (İnal, 2014, r. 30, Neydim, 2003, r.147-148, Şirin 2007, r. 6).

Di navbera zarok, ziman, perwerde û edebiyatê de têkiliyeke girîng heye. Edebiyata zarokan ji hemû tiştên devkî an jî nivîskî, yên ku xîtabê mezinbûn, geşedan, xeyal, hest, fikr, qabiliyet û zewqa zarokan dikin, hem wan perwerde û hem jî kêfxweş dikin re tê gotin (Yalçın-Aytaç, 2014, r.17). Fikra edebiyata zarokan wek qadeke cuda cara ewil li Îngiltereyê hatiye rojevê. Çaxê ku behsa mijarê hatiye kirin, ewil keşîş û kesên nêzîkî civata dêrê û paşê jî hin hîndekaran bertek nîşanî vê nêrînê dane. Lê paşê hêdî hêdî ev bertek kêmbûne, edebiyata zarokan heta roja me hatiye û ji bo zarokan zêdetir berhem hatine amadekirin. Güleç û Geçgel destnîşan dikin ku heta sedsala 16emîn ji bo zarokan tu pirtûkek jî nehatiye nivîsandin û wiha dibêjin:

“Heta sedsala 16emîn mirov rastî pirtûkeke ji bo zarokan hatiye nivîsandin nayê. Heta vê sedsalê zarok hewcedariya xwe ya edebiyatê bi berhemên edebiyata gel, an jî bi pirtûkên ku ji bo mezinan hatine nivîsandin pêk tînin. Berhema Johann Amos Comenius a bi navê “Orbis Pictus (Bi Dîmenan ve Dinya) ya ku di sala 1637an de hatiye weşandin wek pirtûka zarokan a biwêne ya ewil dikare bê qebûlkinin (2012, r. 1).

Dema behsa edebiyata zarokan tê kirin, du tişt balê dikşînin; yek ew e ku berhemên li Rojavayê navdar in û li cihanê ji hêla gelek kesan ve tên zanîn ji bo ku zarok jî sûtê ji wan werbigrin, bi

zimanekî hêsantir ji nû ve hatine nivîsandin. Mînak, fablên La Fontaine û Ezop, çîrokên gelerî yên ku ji hêla Charles Perrault ve bi navê “*Contes de ma mère l’Oye*” (Çîrokên Dayika Qaz) hatine weşandin û çîrokên “*Rapunzel*” (Rapunzel), “*Hänsel und Gretel*” (Hansel û Grethel), “*Rotkäppchen und der Wolf*” (Keçika Kumsor û Gur), “*Dornröschen*” (Rindika Razayî) yên ji hêla du birayên alman Jacob û Wilhelm Grim ve hatine berhevkirin. Ji bilî van, pirtûka John Newbery a “*Mother Goose’s Melody*” (Strana Dayika Qaz), berhema Daniel Defoe ya “*Robinson Crusoe*” (Robinson Crusoe), berhema Jonathan Swift ya “*Gulliver’s Travel*” (Seyahatên Gulliver), pirtûka Charles Dickens ya “*David Copperfield*” (David Copperfield, berhema Lewis Carroll a “*Alice’s Adventures In Wonderland*” (Alis li Diyarên Nedîtî), pirtûkên Jules Verne yên “*Voyage au centre de la Terre*” (Seyahata Ber Bi Navenda Dinyayê), “*De la Terre à la Lune*” (Seyahata Ber Bi Hivê Ve), “*Les Enfants Du Capitaine Grant*” (Zarokên Kaptan Grant), “*Vinght mille lieues sous les mers*” (Di Bin Behrê De Bîst Hezar Fersah), “*Le tour du monde en quatre-vingts jours*” (Di Heyştê Rojan De Gera Alemê) jî bi zimanekî ku zarok bikaribin rehet fêhm bikin û pê kêfxweş bibin ji nû ve hatine nivîsîn.

Xala duyem jî ew e ku di nav demê de fikra edebiyata zarokan reh daye û êdî berhem rasterast ji bo zarokan hatine nivîsîn. Yanî nivîskar û helbestvanan bi taybetî ji bo zarokan berhem amade kirine. Ev bi rastî jî piştî salên dûr û dirêj pêk hatiye ku hê jî xebatên di vê rêyê de gav bi gav dewam dikin. Wek ku tê ditin fikra edebiyata zarokan di sedsala 17emîn de li Rojavayê dest pê dibe û paşê li cihanê belav dibe. Piştî ku keşfên erdnîgariyê çêbûn, Ewropa dewlemend bû, kapîtalîzmê dest pê kir, mirovan ji gundan koçî bajarên kir, Ronesans û Reformê dest pê kir, tesîra felsefeya ronahîbûnê jî li ser civakê zêde bû (Înal, 2014, r. 30). Ev geşedan bûn sedem ku zarok şûna kar û xebatê êdî herin dibistanan, perwerdeyê bibînin, ji bilî Încil û pirtûkên olî berhemên din jî bixwînin û binivîsin. Van hemûyan jî edebiyata zarokan re rê vekir û ji wir pê ve ji bo zarokan hêdî hêdî berhem hatin amadekirin. Dikare bê gotin ku ev berhemên devkî û nivîskî yên li gor asta zarokan hatin amadekirin û hê jî tînan amadekirin zimanê zarokan pêş ve dibin, wan kêfxweş dikin û li ser geşedana wan a hişî û derûnî tesîreke baş dikin. Ji bilî vê, ew fikr û hêstên zarokan dewlemend dikin û asta wan ya ecibandî bilind dikin (Sever, 2015, r.17).

Di pêvajoya dîrokê ya edebiyata zarokan de hema bibêje li hemû welatan geşedana edebiyata zarokan ji heman pêngavê derbas bûye. Edebiyata zarokan ewil jî bo perwerdeya dîmî û exlaqî wek navgînekî hatiye bikaranîn ku ew wek “nêrîna pedagojîyê”, paşê wek berhema hunerî hatiye nixrandin ku ev jî wek “nêrîna estetîkê” hatiye nixrandin. Herî dawîn jî hatiye gotin ku zarok jî xwedî hestan in û ev jî bûye sedem ku “nêrîna psîkolojîyê” derkeve holê. Di edebiyata zarokan da çend teoriyên sereke hene ku Tüfekçi Çan wan wek ya ku “nivîskar” derdixê pêş, ya ku “xwîneran” derdixê pêş û ya ku “naverok”ê derdixê pêş bi 3 cureyan dabeş dibe û wan jî di nav xwe da wek sernavên cuda bi hurgilî tasnîf dibe (2014, r. 20, 25).

Bi kurtasî edebiyata zarokan jî wek edebiyata mezinan dixwaze hest û fikran bi awayekî xweş û bitesîr bîne ziman û wan zarokan bide xwendin. Tiştên ku edebiyata zarokan ji edebiyata din cuda dibe ew e ku çarçoveya wê bi zarokan ve hatiye sînordarkirin. Fêrkirin, perwerdekirin, terbiyekirin jî di gel demderbaskirinê û kêfê cî digire. Şimşek armanca edebiyata zarokan bi bîst xalan eşkere dibe (2007, r. 31). Lê mirov dikare yê sereke bi vî awayî bîne ziman; beriya her tiştî armanc ew e ku zarok kêfxweş bibin û bi saya edebiyatê dema wan baş derbas be. Lewra berhemên baş û biqalîte tesîreke erênî li ser hiş û ruhê wan dikin, dinyaya zarokan a hest û xeyalan dewlemend dibe. Edebiyata zarokan agahiyê dide zarokan, tiştan hîn wan dibe, bi saya van agahî û perwerdeyê asoya wan fireh dibe. Zarokên ku asoya wan fireh dibin jî bi çavekî din li dinyayê û mirovan dinihêrin, tiştên nû keşif dikin. Yek ji armanceke din a edebiyata zarokan jî ew e ku xwendinê bi zarokan bide hezkirin ku dema ew mezin dibin, di navbera wan û xwendinê de pireyê xurt ava bibe. Kesên ku di zarokatiya xwe de bi pirtûk, kovar an jî berhemên din re eleqedar dibin, gelemperî baş diaxivin, di nivîsê de ziman baş bi kar tînin, hest û fikrên xwe rehet tînin ziman.



Di bingeha edebiyata zarokan de fêrkirin, agahdarkirin, perwerdekirin û kêfxweşîkirin heye ku mezin ji bo vê hewl didin û berhemên zarokan amade dikin. Helbet her nivîs, xêz, wêne û berhemên ji bo zarokan tên amadekirin ne perçeyek edebiyata zarokan in, pîvanên wê hene ku me kêm zedê bi çend xalên sereke behsa wan kir. Lê bi kurtasî, divê zimanê berheman hêsan û zelal be, zarokan netirsîn e, xemgîn neke, dema wan xweş derbas bike, zimanê wan pêşva bibe, agahiyan fêrî wan bike, zarokan perwerde û terbiye bike, kêfê bide hiş û mêjiyên wan û hwd. Edebiyata zarokan ji folklorê bigire heta dîrokê, ji filolojiyê bigire heta hunerên bedew, ji dîrokê bigire heta hunerên dîtarî bi gelek qadan re têkildar e û ji sala 1980 û vir ve gelek teoriyên wek oryantîzîm, femînîzîm, postmodernîzîm, psîkanalîtîk di rexnekirina vê qadê de hatine bikaranîn (Uğurlu, 2010, r. 1921, 1945).

Piştî van agahiyan dema em berê xwe didin civaka kurdan em dibînin ku li gor cihanê di edebiyata zarokan a kurdî de ji bo zarokan berhem -bi taybetî yên nivîskî- gelekî kêm in. Ji ber sedemên siyasî yên wek qedexekirina ziman, kêmbûna saziyên kurdan, berhemnivîsandina ji bo mezinan, aborî û hwd edebiyateke xweser a zarokan ya birêkûpêk ava nebûye. Wek cihanê di nav kurdan de jî edebiyata zarokan ewil bi berhemên devkî pêş ketiye û paşê berhemên nivîskî hatine amadekirin. Ev berhemên nivîskî jê gelek jî di rojname an jî kovaran de (Hawar, Nûbihar û hwd) bi çend rûpelan hatine weşandin, lê paşê yên ku rasterast ji bo zarokan hatine amadekirin derketine holê. Dîrok û geşedana edebiyata zarokan a kurdî ji ber ku mijareke berfirehe em ê di vê gotarê de bi tenê behsa perçeyek ji wê bikin. Lê dikare bê gotin ku li gor Rojava û cihanê gelekî dereng dest pê kiriye û hê jî rewş zêde neguheriye û negihîştîye asteke baş. Lewra weşanên wek kovar, pirtûk, rojname û hwd yên ji bo zarokan kêm in û hêwî ew e ku ji vir şûn de ew zêdetir bîr amadekirin. Çaxê ku berhemên nivîskî bîr lêkolînkirin wê bîr dîtî ku di naveroka wan de şûna zimanekî zelal û hêsan a ku zarok bikaribin bi rehetî fêm bikin, gelemperî zimanekî giran hatiye bikaranîn. Ev jî dikare bibe mijara xebateke din û li ser lêkolîneke berfireh bê kirin. Rewş her çiqas wiha be jî, hin nivîskar û rewşenbîrên kurd xwestine vê kêmasiyê jî holê rakin û ji bo zarokan ked dane. Di vê keliyê de em dikarin bibêjin ku kovara *Nûbiharê* jî yek ji wan weşanan e ku di destpêka weşana xwe (1992) heta heyameke dirêj (2010) ji bo zarokên kurd çend rûpel amade kiriye. Ev mijar û navarokên kovarê çiqas li gor pîvanên edebiyata zarokan in (mijarên balkêş, zimanê hêsan, kêfxweşîkirin, agahdarkirin, fêrkirin, perwerdekirin, balkêşandin û hwd) û gelo gihîştîne armanca xwe an na wê niha bîr nixandî.

## 2. Bi Çarçoveyê Giştî Kovara Nûbiharê

Salên 90î ji bo kurdan herçiqas salên dijwar bin jî, ji hêla çapemeniyê ve destpêka heyameke nû ye jî. Li Tirkiyeyê di sala 1991ê de qanûna 2932an a ku zimanê kurdî di qada axaftin, weşandin û çapkirina fikr û ramanan de qedexeyê dikir hat betalkirin (Resmî Gazete, 1991, r. 8). Bi feshîkirina vê madeyê qedexeya li ser weşana kurdî jî ji holê rabû û heyameke nû dest pê kir. Kovara *Nûbiharê* jî wek çend kovarên din di vê heyamê de bi zimanê kurdî dest bi weşanê kir. Kovara ku ji bo çand, hûner û edebiyata kurdan derket qadê bi berpirsariya Sabah Kara û Süleyman Çevik di Çiriya Pêşîn a sala 1992an de li Stenbolê hejmara xwe ya ewil weşand. Xwediyê kovara ku bi awayekî mehane dest weşanê kir, Mahmut Yarluğ bû. Kovar ji hejmara 87emîn pê ve êdî wek bihar, havîn, payîz û zivistan sê mehan carekê demsalî hat weşandin. Rûpelên wê ji 32yan pêk hat, lê piştî ku bû demsalî hejmara rûpelên wê jî di navbera 96 û 110an de zêde bû. Peyva nûbiharê ya ku tê meneya bihara nû gelo çima hatiye hilbijartin? Bersiva vê li ser malpera nubiharblogê hatiye dayîn û tê gotin ku Nûbihar navê xwe ji Nûbihara Biçûkan ya Ehmedê Xanî digire û xwe dewama wan kesên ku di tarîxê de ji edebiyata Kurdî re xizmet kirine dibîne.<sup>1</sup>

1 Kesên dixwazin dikarin li ser vê linkê agahiyê bi dest bixin <https://nubiharblog.wordpress.com/nubihar/>

Dema hejmarên kovarê bê lêkolînkirin tê dîtin ku hin mehan kovar nehatiye weşandin, lê pişt re du hejmar bi hev re hatine çapkirin. Wek hejmarên 41/42, 43/44 51/52 û 53/54. Rêvebirên kovarê ji ber sedemên cuda di îlona 1997an de bi hejmara 60emîn dev ji weşandina *Nûbiharê* berdane û gotine ew ê navbereke çend mehan (6 meh) bidin û di nîsana 1998an de çar din dest bi weşana xwe bikin (Nûbihar, 1997, r. 4). Meha nîsanê ji ber ku sedsaliya rojnamegeriya kurdî ye, *Nûbiharê* di nîsana 1998an de çar din dest bi weşana xwe kiriye. Kovarê cara duyem jî di sala 2000î de navber daye weşana xwe (piştî hejmara 86an). Rêvebirên kovarê piştî vê hejmarê êdî dev ji weşana mehane berdane û di sala 2002yan de bi hejmara 87an ya zivistanê dest bi weşana demsalî (sê mehan carekê) kirine. Di heyama ku kovara *Nûbiharê* dest bi weşanê kiriye kovarên kurdî yê wê wek *Rewşen-Jiyana Rewşen*, *Newroz Ateşî* (*Agirê Newrozê*), *Serketin*, *Tewlo*, *Zend*, *Nûdem* û hwd jî dest bi weşanê kirine û kêmasiya kovargerîya kurdî ya salan bi van xebatan ve hinekî ji holê rabûye.

Zimanê *Nûbiharê* xwerû kurdî ye, ji sedî 99 bi zaravayê kurmançî hatiye weşandin. Lê car caran nivîsên zazakî (dimilkî) û soranî jî hatine nivîsandin, mînak hejmara 118emîn tevahî bi zazakî ye. Derbarê armanca kovarê de jî li ser berga ewil a kovarê “*Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat*” hatiye nivîsandin. Ji vê tê fêmkirin ku kovar dixwaze çand, edebiyat, dîrok û hunera kurdî belav bike û biparêze. Di nivîseke pêşgotinê ya bi sernava “*Di Payîz de Nûbihar!*”ê de jî behsa armanca kovarê hatiye kirin (Nûbihar, 1992, r. 3). Di kovargerîya kurdî de gelemperî gelek kovar bi nêrîneke çepgir hatine weşandin, lê *Nûbihar* bi nêrîna xwe ya neçepgir balê dikşîne. Rêvebirên kovarê her çiqas kesên dîndar bin jî, nivîsên kurdên ku fikrên wan ji hev cuda ne di kovarê de weşandine. Dibe ku ji ber vê tevgerê rewşenbîr û pisporên zimanê kurdî bi salan kovarê wek baneke hevpar a kurdî dîtine û di *Nûbiharê* de kom bûne, ew wek kovareke kurdî ya temendirêj hê jî weşana xwe didomîne.

Herçiqas navê çend kesan derkeve pêş jî, gelek kesên din di kovarê de helbest, çîrok, hevpeyvîn, fabl, mamik, biyografî, çarîn, hevpeyvîn û gelek nivîsên curbicur nivîsîne. Mînak; Abdullah Kîran, Abdurrahman Adak, Ahmet Aras, Berken Bereh, Celîlê Celîl, Firat Cewerî, Hayrullah Acar, Hatîce Mollakendî, Gulîstan Çoban, Sidîq Gorîcan, Lokman Polat, Mehmet Öncü, M. Emin Bozarlan, M. Zahir Ertekin, Murad Celalî, Perwîz Cîhanî, Recep Dildar, Rojbîn Özkan, Rojen Barnas, Rohat Alakom, Roşan Lezgîn, Salih Kevirbirî, Selman Dilovan, Selîm Temo, Xalid Sadînî û Zilkîf Xweşhêvî. Ji wan hinekan hem bi navên xwe yê fermî û hem jî bi navên mustear nivîsandine. Hejmara nivîskarên jin di destpêkê de pir kême, paşê hinekî zêde dibe, lê dîsa jî ew bi têra xwe di kovarê de cî nagirin.

Dema em berê xwe didin nivîskarên beşa Zaroknameyê navê Xelîl Amed (î), Sabah Kara û Rojbîn Özkanê balê dikşîne. Sabah Kara di hejmara 2, 3, 4, 6, 7, 78, 79-80-81 û 82yan de, Xelîl Amed (î) di hejmara 8 û 56an de, Rojbîn Özkanê jî di hejmara 107-108-109-110-111 û 112yan de ji zarokan re nivîsandine û beş amade kirine. Xêncî wan, hin kesên din jî fabl, çîrok, mamik, tiştanok û hwd nivîsandine ku meriv dikare navê wan wek Mehmêd Alî Sadîk, Murat Malpir, Zelal Hawar, Besra Pîranî, Melayê Xursî, Nûbar Asan, Azad, Ebdillahi Amed û Selman Dilovan rêz bike.

Ji ber ku kovar kovareke edebî, çandî û hunerî ye tê de gelek nivîsên curbicur yê wê wek çîrok, pexşan, helbest, gotinên pêşyan, metelok, ceribandin, gotar, hevpeyvîn û hwd hene. Kovar di destpêkê de ji hêla edebiyata kurdî ya klasîk ve gelekî dewlemend e, lewra helbest, beyt û çarînên Melayê Cizirî, Feqiyê Teyran, Mela Huseynê Bateyî, Seyîd Eliyê Findikî, Baba Tahirê Uryan, Ehmedê Xanî û hwd hatine weşandin. Ji bilî vê, ji zimanê tirkî, farisî, almanî, îngilizî, erebî, frensî, norwêcî û yê din helbest, çîrok, gotar û hwd werger hatine kirin. Di destpêkê de zêdetir nivîsên îslamî, yê li ser jiyana Hz. Pêxember, sehabe û Seidê Kurdî, beşên ji Qur’anê û Rîsaleya Nûrê, helbestên klasîk û hedîsên Pêxember hatine weşandin. Lê nivîsên ji folklorê kurdî yê wê wek gotinên pêşyan, heyranok, biwêj, payîzok, çîrok, lawje, destan, meselok, pêkenok, şîret, serpêhatî û çîrvanok jî gelek hatine weşandin, yanê ji vê hêlê ve kovar gelek dewlemend e.

### 3. Zarokname - Zarokîstan - Nûbihara Biçûkan

Kovara *Nûbiharê* herçiqas ne kovara zarokan be jî, hin nivîskar û rewşenbîrên kurd çend rûpel jî bo zarokan veqetandine û di vê beşa ku navê wê wek Zarokname, Zarokîstan û Nûbihara Biçûkan dem demî guherîye de jî wan re nivîsîne. Navê beşê di hejmara ewil de bi Zaroknameyê dest pê kiriye û heta hejmara 78an (di vê demê de carna ev beş nehatiye amadekirin) bi vî awayî hatiye nivîsandin. Di hejmarên 79, 80 û 81 ên ku sê hejmar bi hev re hatine weşandin de navê beşê bûye Zarokîstan. Piştî hejmara 82an navbereke dirêj a qasî 9 salan çêbûye û heta hejmara 107an jî bo zarokan tu tişt nehatiye amadekirin. Di sala 2009an hejmara 107an de navê beşê dîsa wek Zarokname hatiye nivîsandin.

Dema kovar hejmara xwe ya 108emîn diweşîne, navê beşê vê carê jî wek “Nûbihara Biçûkan” tê guherandin û heta hejmara 112yan ev nav tê bikaranîn. Ji xwe hejmara 112emîn (Havîn 2010) jî bo zarokan êdî dibe hejmara dawîn û bêyî ku agahiyek ji zarokan re bê dayîn dev ji beşa “Nûbihara Biçûkan” tê berdan. Heke mirov naveroka kovarê binihêre, tê dîtîn ku ji bo zarokan çîrok, fabl, pêkenok, helbest, bîranîn, gotinên pêşîyan, karîkatur û hwd hatine weşandin. Ji van cureyan hejmara hinekan zêde û ya hinekan jî kême. Lê dîsa jî ji hêla naverokê ve dewlemendiyek xwe dide der. Armanca van nivîsan ew e ku zarok bi van agahîyan ji hêla dînî, exlaqî, neteweyî û çandî ve bînerwerdekirin û dema wan xweş derbas be.

Ji bo fêrkarî û perwerdeyê di kovarê de gelemperî mijarên dînî, neteweyî û yên exlaqî hatine hîlbijartin. Mînak jiyana Pêxember û sehabeyan, navdarên kurd, gotinên pêşîyan, pêkenok, karîkatur, fabl û çîrok naveroka beşê pêk tînin. Amadekarên beşê kedeke mezin dane, lê dema naverokê bê analîzkirin tê dîtîn ku zarok wek mezinan hatine hesibandin, gelemperî zîmanekî jî bo mezinan di nivîsan de hatiye bikaranîn. Di mînakên ku wê bînerwerdekirin de ev rewş hat şîrovekirin.

#### 3.1. Naveroka Zarokname, Zarokîstan û Nûbihara Biçûkan

##### 3.1.1. Mijarên Dînî û Exlaqî

Kovara *Nûbiharê* ya ku bi nêrîneke îslamî dest bi weşanê kiriye di hejmarên ewil de nivîsên dînî û exlaqî zêdetir weşandiye ku ev nêrîn di beşa Zaroknameyê de jî tê dîtîn. Mijarên Zaroknameyê, zîmanê ku hatiye bikaranîn, peyamên ku tînin dayîn bi eşkere nîşan didin ku rêvebirên kovarê xwestine perwerdeyê dînî û exlaqî bidin zarokan. Ji bo vê jî, di gelek nivîsan de mijarên ku behsa hebûna Xwedê, dîne îslamê, pêxamberan, sehabeyan, meha remezanê, rojîgirtinê û hwd dikin hatine weşandin. Di hejmara yekem de navê nivîsa ewil “Du qise ji jiyana pêyamber ê Ekrem” e. Di vê nivîsê de mijar tevgerên Hz. Mihemed û tîkiliya wî ya bi mirovan re ye. Di qîseyayê ewil a bi navê “Peyamber ê Ekrem û du helqe civat” de nivîskar behsa pêxember û du civatan dike. Di qîseyayê duyem a bi navê “Mirovê Ricaker” de jî mirovekî hal û wextê wî zêde nebaş diçe li cem Pêxember ku ji wî alîkariyê bixwaze. Lê beriya ku ew alîkariyê bixwaze Pêxember şîretê li wî dike (Azad, 1992, r. 30-31). Ji ber zîmanê ku hatiye bikaranîn mirov dikare bibêje ku ev nivîs ne li gor asta zarokan e, wêneyê hatiye xêzkirin jî zêde balkêş nîne.

Di hejmara 8emîn de bi sernava “Pûtên Bêxêr û Bêkêr” nivîsek di beşa Zaroknameyê de heye ku behsa sehabe Eba Zer dike ku wî çawa pûtê xwe perçe kiriye û dîne îslamê hîlbijartiye (Amed, 1993, r. 27). Mijar, bi zîmanê ku hatiye bikaranîn û wêneyê ku hatiye xêzkirin ve li gor asta zarokan giran e. Di hejmara 9emîn de Ebdillah Amed bi navê “Rûpelek ji Exlaqê Pêxember” nivîsek amade kiriye û bi devê Hz. Hesen û Hezretî Huseyînê kurên Hz. Elî behsa exlaqê Pêxember, tevger û gotinên wî kiriye (1993, r. 27-28). Ji bilî vê, bîranîneke Hz. Eyşe (jina Pêxember) û bîranîneke sehabe Bavê Talha yê derbarê Hz. Mihemed de jî hatine nivîsandin. Nivîseke din jî di hejmara 11emîn de bi navê “Pêxember û Lepên Şixulker” derdikeve pêşberî me û tê de pesnê xebat û xîretê tê dayîn (Amedî, 1993, r. 29), lê zîmanê wê ne herikbar e, li gor zarokan giran e û dibe ku bala wan nekêşîne.

Di hejmara 108emîn de jî Rojbîn Özkanê behsa meha remezanê û rojgirtinê kiriye. Sernavê nivîsê “Meha Remezanê” ye û dibêje: “Zarokên delal! Xwedê, her sal mehekê rojgirtin li me ferz kirîye. Ev meh, meha Remezanê ye...” (2009, r. 92). Di binê nivîsê de wêneyekî biçûk a ku tê de mizgeftêk û bi tîpên erebî nivîseke erebî hatiye nivîsandin heye. Zimanê nivîsê zelal e û mijar bi kurtasî hatiye vegotin. Li gorî hevokên kin û şêwazê mirov dikare bibêje ku ev li gorî asta zarokan e. Di hejmara 110emîn de dîsa nivîseke Rojbîn Özkanê heye ku ew jî behsa Nûh Pêxember û Çiyayê Cûdî dike. Piştî nasandina Çiyayê Cûdî Özkan destnîşan dike ku keştiya Nûh Pêxember li ser vî çiyayî sekiniye (2010, r. 91).

Di gelek civakan de exlaq wek nirxêkê taybet tê qebûl kirin û ferdên civakê jiyana xwe li gorî rê û rêbazên wê saz dikin. Civak heke tiştekî qebûl bike û jê hez bike ew jî hêla exlaqê ve baş tê nirxandin, lê heke nepejirîne jî ew nebaş tê hesibandin û divê neyê kirin. Rêvebir û nivîskarên *Nûbiharê* jî ji ber ku girîngiyê didin dîn û exlaqê, di beşa Zaroknameyê de ev mijar di çarçoveya dînê îslamê de derxistine pêş. Di gelek nivîsan de ev mijar rasterast nehatibe gotin jî, di hevokan de bi awayekî veşartî behsa başbûn û xirabiyê, sebirkirinê, dirustbûnê, alîkariyê û hwd hatiye kirin. Di hejmara 56emîn de nivîsa ku sernavê wê “Rûpelek Ji Dîroka Îslamê” ye behsa tevger û exlaqê Hz. Omer dike ku mirov dikare vê di bin beşa exlaqê de nîşan bide. Nûbar Asan li vir behsa meseleyê jî dewra Hz. Omer dike û dibêje rojekê Hz. Omer derdikeve ser mînberê ku xutbeyê bide. Lê sehabeyek dibêje ku ew naxwaze wî guhdarî bike lewra pirtiyen (qumaş) ku di herbê de ji wan re wek xenîmet hatine dayîn encax qasê kinçekî li wan hatiye belav kirin, lê Hz. Omer kinçekî dirêj li xwe kiriye ku xuyaye para wî zêde hatiye dayîn. Piştî vê kurê wî Ebdillah dibêje wî pirtiyê para xwe daye bavê xwe, loma kinçe wî dirêj e û sehabe êdî guhdariya Hz. Omer dike (Asan, 1997, r. 29).

Jimar	Mijarên Dînî û Exlaqî	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Du Qise Ji Jiyana Pêyamber ê Ekrem	Azad	1	30-31	Çiriya Pêşîn, 1992
2	Rûpelek Ji Exlaqê Pêxember	Ebdillah Amed	9	27-28	Hezîran, 1993
3	Pûtên Bêxêr û Bêkêr	Xelîl Amed	8	27	Gulan, 1993
4	Pêxember û Lepên Şixulker	Xelîl Amedî	11	29	Tebax, 1993
5	Meha Remezanê	Rojbîn Özkan	108	92	Havîn, 2009
6	Nûh Pêxember û Çiyayê Cûdî	Rojbîn Özkan	110	91	Zivistan, 2010
7	Rûpelek Ji Dîroka Îslamê	Nûbar Asan	56	29	Gulan, 1997

### 3.1.2. Gotinên Navdaran û Navdarên Kurd

Di her civakê de kesên rihspî yên bi nav û deng hene ku qedrê wan tê girtin û civak guh dide gotin û şîretên wan. Ji gotinên wan ên ku ji fikr û hestên wan pêk tên re dibêjin “gotinên navdaran”. Ev gotinên kin, lê têr û tije tesîrê li ser civakê dikin û tîr jiberkirin. Gotinên van rihspîyan yên wek pêxember, helbestvan, nivîskar û filozofan her çiqas ne cureyêkê edebiyata zarokan bin jî, di kovarê de ev wek cureyêkê taybet derdikeve pêşberî me û em rastî gotinên 4 kesên navdar yên Hz. Mihemed, Seîdê Kurdî, Cegerxwîn û Hz. Elî tîr. Di hejmarên 34 û 35 ên ku bi hev re hatine weşandin de gotina Hz. Mihemed ya “Ew kesê ku tiştekî ji bo xwe bixwaze, lê ji bo birayê xwe nexwaze, bawerîya wî nîn e” û ya Seîdê Kurdî “Ez bê nan dikarim bijîm, lê ez nikarim bê azadî bijîm” hatine nivîsîn (Nûbihar, 1995, r. 46). Gotina Pêxember exlaq û başiyê hînî zarokan dike ku dema ew tiştekî ji bo xwe bixwazin

divê ew heman tiştî ji bo hevalên xwe jî bixwazin. Bi gotineke Seîdê Kurdî ve jî girîngiya azadiyê hatiye destnîşankirin. Peyva azadiyê û girîngiya wê dibe ku ji bo asta zarokan ne mijareke hêsan be, lê amadekarên beşê xwestine haya wan ji azadiyê hebe. Ji bo fêrkarî û agahdarbûna derbarê kesên navdar de ev gotin girîng in.

Di hejmara 45an de jî gotineke helbestvanê kurd Cegerxwîn hatiye weşandin ku dibêje; “Xebat bikin roj û şev, şûr û qelem digel hev” (Nûbihar, 1996, r. 30). Armanc ew e ku zarok hem navê wî bizanibin û hem jî gotina wî ji ber bikin. Lewra ew behsa girîngiya xebat û xwendinê dike. Di hejmara 109an de gotineke Hz. Elî ya ku dibêje: “Zanîn însên dike xwedî şeref. Însanên zana meşale ne ku riya heqîqetê rohnî dikin. Nemiriya însên di zanînê de ye. Însan bimire jî, zanîn dê heta hetayê her bijî” hatiye nivîsandin (Özkan, 2009, r. 92). Bi vê gotina Hz. Elî ji zarokan re peyamek tê dayîn ku ew bizanibin zanîn şeref e, ji bo zanabûnê jî divê hînbûna agahiyê û xebat hebe.

Di her civakê de ji bo ku zarok derbarê dîrok, çand û edebiyata xwe de bibin xwedî agahî ji wan re behsa hin kesên navdar tê kirin. Di nav kurdan de jî navê hin kesan zêdetir tê bihîstin ku ew ji ber gotin, kirin, fikr û berhemên xwe navdar in û hestên neteweyî zindî digirin. Di kovarê de behsa Seîdê Kurdî, Evdilmelik Firat, Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî hatiye kirin û ew hatine nasandin. Xelîl Amed di hejmara 37emîn de xwestiye ku Seîdê Kurdî û Evdilmelik Firat li zarokên kurd bide nasîn, ji ber vê jî du lehengên bi navê Rengîn û Xemgîn (paşê bi berfirehî wê behsa wan bê kirin) daye axaftin û bi saya diyaloga di navbera wan de ev kes hatine nasandin. Rengîn ji Xemgîn dipirse ku ew Seîdê Kurdî nas dike an na û paşê dibêje Seîdê Kurdî behsa 3 dijminan (nezanî, xizanî-feqîrî û perçebûyin) dike ku ew nahêlin kurd azad bibin û peş ve herin. Li ser vê gotinê Xemgîn dibêje “Seydayê Delal ji bo xelasbûna me kurdan tiştêkî din jî dibêje, ew jî; xwendin, xwendin, xwendin. Desthevgirtin, desthevgirtin, desthevgirtin e” (Amed, 1995, r. 23).

Di nav kurdan de Seîdekî din ê navdar jî Şêx Seîd e ku di hejmara 39emîn de vê carê behsa Evdilmelik Firatê neviyê Şêx Seîd tê kirin. Dîsa bi saya axaftina di navbera Rengîn û Xemgîn de Evdilmelik Firat bi zarokên kurd tê nasandin (Amed, 1995, r. 23). Rengîn ji Xemgîn re dibêje ew kesekî azadîxwaz, biratîxwaz, insanîxwaz e. Heq û hiqûqê, çand û hunera xwe dixwaze û ji ber vê hatiye girtin. Di hejmara 108emîn de jî Rojbîn Özkanê behsa Ehmedê Xanî kiriye û ew wek rêber, wêjevan û ramanwerê kurd daye nasîn. Özkanê bal kişandiyê ser Xanî, behsa xebat û berhemên wî kiriye ku ew ji hêla zarokan ve bê hezkirin (2009, r. 92). Özkanê di hejmara 109emîn de jî dîsa şairekî kurd Melayê Cizîrî daye nasîn. Wê ewil bi kurtasî behsa jiyana Cizîrî kiriye û paşê bi helbesteke Mela ve nivîsa xwe qedantiye (2009, r. 92).

Jimar	Gotinên Navdaran û Navdarên Kurd	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Gotinên navdaran	-	34-35	46	Tîrmeh-Tebax, 1995
2	Cegerxwîn	-	45	30	Hezîran, 1996
3	Gotineke Xweş (Hz. Elî)	Rojbîn Özkan	109	92	Payîz, 2009
4	Rengîn û Xemgîn (Seîdê Kurdî)	Xelîl Amed	37	23	Çiriya Pêşîn, 1995
5	Rengîn û Xemgîn (Evdilmelik Firat)	Xelîl Amed	39	30	Çileyê Pêşîn, 1995
6	Bapirê Me Ehmedê Xanî	Rojbîn Özkan	108	92	Havîn, 2009
7	Melayê Cizîrî	Rojbîn Özkan	109	92	Payîz, 2009



### 3.1.3. Gotinên Pêşîyan

Li cihanê di gelek civakan de hin gotin hene ku ew derbarê çand, edet, dîn, dîrok û civakê de agahiyên taybet di xwe de di hewînin. Ji ber ku mezinan li gor fikr û tecrubeyên xwe derbarê mijarên cuda de ev tişt gotine û gelek kodên civakê di wan de hene û ew derbasî nîşan dibin ku ji wan re dibêjin gotinên pêşîyan. Ev gotinên kollektîf ên hezar salan yê dîrok, sosyolojî û felsefeya civakê nîşan didin, axaftinê jî xurt dikin (Tîgrîs, 2001, r. 1) Zimanê kurdî ji hêla gotinên pêşîyan ve dewlemend e. Gotinên pêşîyan herçiqas cureyekî edebiyata zarokan nebe jî, dema em li zaroknameya *Nûbiharê* dinihêrin em rastî pênc mînakên tîn, lê ji wan yek “Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e” di hejmarên cuda de du caran hatiye weşandin. Di hejmara 36emîn de sê gotinên “Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e”, “Kurmê darê ne ji darê be dar narize” û “Giya di bin kevir de namîne” hatine weşandin (Nûbihar, 1995, r. 25). Ev gotin hemû jî ji hêla gelek kurdan ve tîn zanîn û di nav jiyana rojane de tîn bikaranîn. Gotina “Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e” cara duyem di pêkenokeke Xoceyê Navdar (Nasredîn Xoce) de derdikeve li hemberî zarokan. Di nivîsê de tê gotin rojekê cîranekî Xoce jê dipirse ku duh êvarê dengê ji mala Xoce hatiye, gelo mesele çi bûye? Xoce dibêje jina wî gotiye ka cubeyê xwe derxe ku ewê bişo, lê Xoce dernexistiye. Piştî vê, wan hev du biriye û aniye, di dawiyê de jina Xoce wî avêtiye derve (Amed, 1996, r. 30).

Rojbîn Özkanê di hejmara 110emîn de behsa gotina “Keda helal dibe mû naqete, keda haram bibe weris jî diqete” kiriye. Nivîskarê bal kişandiyê ser rizqê helal û bereketa wê û gotiye rizqê haram çiqas zêde be jî di dawiya dawîn xelas dibe. Ji bo ku zarok der barê têgeha helal û heramê de bibin xwedî agahî paşê behsa meneya helal û heramiyê kiriye û ji Qur’ana Pîroz ayeta 168an a sureya Beqereyê jî mînak nîşan daye (2010, r. 92).

Jimar	Gotinên Pêşîyan	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e Kurmê darê ne ji darê be dar narize Giya di bin kevir de namîne	-	36	25	Îlon, 1995
2	Şêr şêr e çi jin çi mêr e	Xelîl Amed	41 42	30	Sibat/Adar, 1996
3	Gotinek pêşîyan	Rojbîn Özkan	110	92	Zivistan, 2010

### 3.1.4. Ceribandin

Ji bo ku zarok ji hêla zanist û perwerdeyê ve xwe pêşva bibin, hin caran hewcedarî bi nivîsên ku jê re dibêjin “ceribandin”ê heye. Ceribandin cureyeke edebiyatê ye ku nivîskar bêyî ku bigihêje encamên teqez, bê îdia û delîl bi tenê dilsozî fikr û ramanên xwe tîne ziman û mijarên edebiyat, felsefe û zanistê dinivîse. Lê di edebiyata zarokan de li gor cureyên din di qada ceribandînê de kêmasiyek mezin heye (Şahbaz, 2008, r. 189-203). Di kovara *Nûbiharê* de jî heman rewş xuya dike, lewra bi tenê ceribandinek hatiye weşandin, lê ev ne cureya ceribandînê ye ku em qesta wê dikin. Di hejmara 108emîn de Rojbîn Özkan behsa ava germ, sar û şirogerm dike û wiha dibêje:

“Sê şerbikên wek hev yekê bi ava sar, yekê bi ava kel û yek jî ava şirogerm tijî kin. Eynî qasê de destekî xwe têxin nav ava kel û destê din jî têxin nav ava sar. Paşê herdu destên xwe bi hev re têxin nav ava şirogerm. Hûnê tiştêkî balkêş bibînin. Destê ku ji nav ava sar derketiye wê kel be, Ê ji nava ava kel derketiye wê sar be.” (2009, r. 92).

Her çiqas ev ceribandin ne cureyeke edebî be jî, ji bo ku zarok agahiyeke nû hîn bibin û li malê ceribandîne bikin nivîseke baş e û li gor asta zarokan e.

### 3.1.5. Cihên Dîrokî

Hînbûna erdnîgariyê û agahiyên derbarê cihên dîrokî de ji bo perwerdeya zarokan girîng e. Divê derbarê nexşeya welêt û dinyayê de, bajar, navçe, gund, behr, çem, gol, keleh, qesr, pire, cihên dîrokî û girîng de agahî ji biçûkan re bîn dayîn. Ev hemû dikarin di nav çîrok, helbest, meselok û cureyên din ên edebiyata zarokan de bi awayekî hunerî û zimanekî hêsan bîn behskirin, lê tena serê xwe ne cureyeke edebiyatê ye. Di *Nûbiharê* de ew wek beşeke edebiyata zarokan hatiye hesabandin û bi serenava “Cihên Dîrokî” hatiye weşandin. Lê bi tenê di nav du hejmaran de behsa cihên dîrokî hatiye kirin. Amadekarên beşê kêman caran behsa deşt, zozan, çiya, gol, behr û bajarên kurdan û welatên din ên cihanê yên navdar kirine. Di kovarê de yekem car di hejmara 107emîn de behsa cihekî dîrokî tê kirin.

Rojbîn Özkanê bi serenava “Zarokno Hûn Bi Vêna Dizanin?” nivîseke ku ji pirsê pêk tê pêşkeşî zarokan kiriye ku ev ji bo balkişandinê metodeke baş e. Di nivîsê de behsa “Pireya Malabadî” ya dîrokî ya di navbera Farqîn û Batmanê de ye tê kirin û taybetmendiya piyeyê tê vegotin (2009, r. 127). Di hejmara 109emîn de dîsa Rojbîn Özkan cihekî dîrokî bi zarokan dide nasîn. Ev cih Medreseya Sor e ku Melayê Cizîrî li wir ders daye. Wêneyekî biçûk li kêleka çepê ya nivîsê hatiye weşandin (2009, r. 92). Bi nasandina Medreseya Sor hewl hatiye dayîn ku zarok hem der barê navderekî kurd Melayê Cizîrî û hem jî derbarê cihekî dîrokî de bibin xwedî agahî, nivîs li gor asta zarokan e.

Jimar	Cihên Dîrokî	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Zarokno hûn bi vêna dizanin? (Pira Malabadî)	Rojbîn Özkan	107	127	Bihar, 2009
2	Medreseya Sor	Rojbîn Özkan	109	92	Payîz, 2009

### 3.1.6. Çîrok

Çîrok yek ji cureya edebiyatê ye ku zarok gelemperî li gor cureyên din herî zêde çîrokan hez dikin. Ji bo geşedan û perwerdeya zarokan çîrok di nav cureyên edebiyata zarokan de xwedî cihekî taybet e. Li gor ferhenga Oxfordê çîrok pênaseya mirov û bûyerên nerast in (Steel, 2000, r. 651). Oğuzkan jî çîrokan wek serpêhatiyên ne ji rêzê destnîşan dike û dibêje mirovan devkî ji hev hildane û ji nifşekî derbasî nifşên din dikin (2000, r. 17). Bozkurt jî tîne ziman ku di zaravayê kurmançî de ji bo çîrokan “xebrojîk” an jî “xevroşîk”, di zaravayê soranî de jî çîrok tê bikaranîn (2013, r. 819). Zarokên ku temenê wan di navbera 3 û 9an de ne zêdetir ji çîrokan hez dikin. Lê, ji ber ku çîrok xwedî zimanekî cuda ne, bûyerên ecêb di çîrokan de diqewimin, mekanê ku bûyer lê derbas dibin mekanên ecêb û bi raz in û qehreman kesên cuda ne, qasî zarokan mezin jî ji çîrokan hez dikin (Güleryüz, 2002, r. 194). Peyv û hevokên ku di çîrokan de tên bikaranîn, zûgotinok, dia, nifir, agahiyên derbarê edet û kevneşopên civakê de yên ku di çîrokan de tên behskirin hişê zarokan pêşve dibin. Çîrok zimanê zarokan dewlemend dikin û ji bo geşedana wan a fikrî dibin alîkar. Xala herî girîng ew e ku divê nivîskar, derûnnas, pedagog, zimannas, wênesaz, civaknas û kesên pispor wek lijneyekî bîn li cem hev û ji bo zarokan çîrokan binivîsin û xêz bikin. Lewra agahiyên şaş, wêneyên xirab, mijarên xetere yên ku zarokan bitirsînin, peyv û gotinên xelet yên ku zimanê wan xirab bikin divê di çîrokan de ya rast di hemû berhemên edebiyata zarokan de neyên bikaranîn.



Di hejmara duyem a *Nûbiharê* de Sabah Kara ji Siyawêş Kîsrayî çîrokeke bi navê “Ko zivistan çû, bihar tê” wergerandiye kurdî (1992, r. 24-26). Di hejmara 7emîn de dîsa Sabah Kara çîrokeke bi navê “Qendîla Biçûk” çîrokek nivîsiye (1993, r. 23-26). Ji bilî Kara, di hejmara 45emîn de Xelîl Amed çîroka “Viz Viz Ji We Hingiv Ji Min” (1996, r. 31), di hejmara 47emîn de Besra Pîranîyê çîroka “Noka Genî” û Melayê Xursî jî çîroka “Mirî Çawa Tê Şuştin?” (1996, r. 30), di hejmara 107emîn de Rojbîn Özkanê “Çîroka Newrozê” (2009, r. 125-126), di hejmara 108emîn de Zelal Hawarê çîroka “Pîrê û Rovî” (2009, r. 94), di hejmara 111emîn de jî dîsa Rojbîn Özkanê çîrokeke Sadîk Yalsîzuçanlar a bi navê “Çîroka Kalo Heyvo” (2010, r. 94) nivîsandine.

Ji bo ku bibe mînak meriv dikare behsa çîroka bi navê “Ko zivistan çû, bihar tê” bike. Di çîrokê de kalekî bi navê “Apê Nuroj” ji zarokan re behsa çîroka zivistanê û derengmayîna biharê dike (Kara, 1992, r. 24-25). Zimanê çîrokê û wêneyên ku hatine xêzkirin hêsan e û li gor asta zarokan e. Zarok dema ku çîrokekê guhdar bikin û yan jî bixwînin divê ji mirov, heywan, nebat, hawîrdor û siruştê hez bikin. Divê hestên zarokan, kelecana wan bi çîrokan ve zindî bibe. Divê çîrok xweş û balkêş bibe ku zarok dawîya çîrokê meraq bikin. Di vê çîrokê de jî peyama ew e ku zarok derbarê heywanan de hesas tevbigerin, zirarê nedin heywanan, wan neêşînin û aciz nekin. Ji bilî vê, behsa demsalên zivistan û biharê hatiye kirin. Behsa alîkariyê ya dermankirina heywanên birîndar jî ji zarokan re hatiye kirin.

Jimar	Çîrok	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Ko Zivistan Çû Bihar Tê	Sabah Kara	2	24-25	Çîriya Pêşîn, 1992
2	Qendîla Biçûk	Sabah Kara	7	23-26	Nîsan, 1993
3	Viz Viz Ji We Hingiv Ji Min	Xelîl Amed	45	31	Hezîran, 1996
4	Noka Genî	Besra Pîranî	47	30	Tebax, 1996
5	Mirî Çawa Tê Şuştin?	Melayê Xursî	47	30	Tebax, 1996
6	Çîroka Newrozê	Rojbîn Özkan	107	125-126	Bihar, 2009
7	Pîrê û Rovî	Zelal Hawar	108	94	Havîn, 2009
8	Çîroka Kalo Heyvo	Rojbîn Özkan	111	94	Bihar, 2010

### 3.1.7. Kurteçîrok

Kurteçîrok jî wek cureyekî kin ên çîrokan dikarin bînin nîrxandin ku li gor çîrokan zêdetir di hişê însanan de cî digirin. Di kurteçîrokan de peyamek tê dayîn û mijar bi zelalî xwe dide der. Di kovarê de 4 kurteçîrok hene ku jê 2 heb jî hêla Xelîl Amed ve hatine nivîsîn. Murat Malpir bi navê “Ka Em Bavên Ber Aqîlan” di hejmara 46emîn de (1996, r. 31), Xelîl Amed bi navê “Çîz-mîz Nizanim” di hejmara 47emîn de (1996, r. 29), bi navê “Çavê Neyartiyê Kor e” di hejmara 56emîn de (1997, r. 29) û Mehmet Alî Sadîk jî bi navê “Şeltik Şültik” di hejmara 110emîn de (2010, r. 92) kurteçîrok nivîsîne. Kurteçîrok li gor cureyên din di kovarê de hindik in, ji hêla ziman û peyaman ve gelemperî ne li gor asta zarokan in.

Jimar	Kurteçîrok	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Ka Em Bavên Ber Aqilan	Murat Malpir	46	31	Tîrmeh, 1996
2	Çîz-mîz Nizanim	Xelîl Amed	47	29	Tebax, 1996
3	Çavê Neyartiyê Kor e	Xelîl Amed	56	29	Gulan, 1997
4	Şeltik Şültik	Mehmêd Alî Sadik	110	92	Zivistan, 2010

### 3.1.8. Pêkenok

Ken di jiyana mirovan de tiştêkî taybet e ku mirov gelek caran li hemberî êş û tehdeyan bi saya wê li ber xwe didin. Ew ji bo mirovan xususiyetek e ku li hemberî bûyer, dîmen an jî axaftineke ku ji bo wan ecêb e mirov bi ken bertek nîşan didin (Kaya, 2011, r. 29). Di edebiyata zarokan de jî pêkenok di xwe de ken, qîrf û henekan dihewînin. Lê hin caran ew rexneyan dikin û hin caran jî peyama şîretan didin. Di nav kurdan de gelek pêkenokên navdar hene, lê dema em berê xwe didin *Nûbiharê* em dibînin ku şûna pêkenokên kurdî, zêdetir pêkenokên Nasredîn Xoce (di nav gel de wek Xoceyê Navdar an jî Xoceyê Meşhûr jî tê nasîn) hatine weşandin. Ew bi gotin û mîzaha xwe ve meşhur e ku di pêkenokên wî de peyama şîret an jî rexne hene. Ji ber vê, mirov hin caran şûna ku tiştêkî ji kesekî rasterast bibêjin, şûna vê behsa pêkenokeke Xoce dikin. Kesê li hember jî fêma dike ku ew pêkenok ji ber çî tê gotin û peyama weşartî fêma dike.

Di kovarê de nozdeh pêkenok hatine weşandin ku ji wan du heb ji hêla Rojbîn Özkanê, yek ji hêla M. Êhsan Hêvîdar û yên mayîn jî ji hêla Xelîl Amed ve hatine amadekirin. Ji bilî çend heban hema bibêje hemû pêkenok der barê Xoceyê Meşhûr de ne. Navê pêkenokan û nivîskarên wan di tabloya li jêr de hatin nîşandan. Ji bo mînakê, di hejmarên 34 û 35 ên ku bi hev re hatine weşandin de Xelîl Amed pêkenokeke bi navê “Revîna Xewê” ji bo beşê amade kiriye. Tê gotin rojekê xewa Xoce nayê, ew lempyê vêdixê û derdikeve kuçeyê. Dema paswan (bekçî) wî dibîne, ji wî dipirse ka ew di vê saetê de li kuçe çî digere, Xoce jê re dibêje “Xewa min wenda bû, ez lê digirim” (1995, r. 47). Ji ber ku pêkenok pir kin e, Xoce bi henek diaxive, zarok dikarin pê kêfxweş bibin û bi hêsanî fêma bikin, li gor asta zarokan e.

Jimar	Pêkenok	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Pêkeniyek ji Xocê Meşhûr	Xelîl Amed	10	22-23	Tîrmeh, 1993
2	Revîna Xewê	Xelîl Amed	34-35	47	Tîrmeh-Tebax, 1995
3	Ker û Tirşî	Xelîl Amed	34-35	47	Tîrmeh-Tebax 1995

4	Mêvanê Çavpîrsî	Xelîl Amed	34-35	47	Tîrmeh-Tebax, 1995
5	Secdekirina Xanê	Xelîl Amed	36	23	Îlon, 1995
6	Agir û Şeytan	Xelîl Amed	36	23	Îlon, 1995
7	Ewê biemiliya birçîbûnê	Xelîl Amed	37	23	Çîriya Pêşîn, 1995
8	Emê weka xwe bikin	Xelîl Amed	37	23	Çîriya Pêşîn, 1995
9	Ji te re çi?	Xelîl Amed	38	29	Çîriya Paşîn, 1995
10	Neûzubîllah	Xelîl Amed	38	30	Çîriya Paşîn, 1995
11	Rêya Axur	Xelîl Amed	39	29	Çîleya Pêşîn, 1995
12	Ji xwe ezê peyabama	Xelîl Amed	39	29	Çîleya Pêşîn, 1995
13	Zimanê Xerîb	Xelîl Amed	40	30	Çîleya Paşîn, 1996
14	Ez jî nizanim	Xelîl Amed	40	30	Çîleya Paşîn, 1996
15	Derdê Xoce	Xelîl Amed	41-42	30	Sibat/Adar, 1996
16	Te çend qat jimartiyî?	Xelîl Amed	46	30-31	Tîrmeh, 1996
17	Nimêjên Zêde	Rojbîn Özkan	107	126	Bihar, 2009
18	Derewîn	Rojbîn Özkan	108	93	Havîn, 2009
19	Tu ji bîr neke	M.Êhsan Hêvîdar	111	91	Bihar, 2010

### 3.1.9. Fabl

Mezin dema bixwazîn tiştêkî hîn zarokan bikin, peyamekê bidin wan an jî şîretê li wan bikin hin tiştan dikin. Ya herî hêsan rasterast bi wan re axaftin e, rêya duyem ew e ku çîrok û meseleyan ji wan re bibêjin û ya sêyem jî ew e ku bi wan re bileyîzin ku ew peyamê fêm bikin. Fabl jî mîna çîrokên manzûm ji bo perwerde û kêfxweşîya zarokan tîk bikaranîn ku mezin wan jî ji zarokan re dibêjin. Çîrokên manzûm yê ku lehengên wan bi gelemperî ji heywanan hatine hilbijartin û di dawiyê de armanc ew e ku şîretêkî û dersekî bide re fabl tê gotin (Türkçe Sözlük, 2011, 845). Zarok heywanan hez dikin, bi wan re dileyîzin û hevaltîyê dikin ku fabl wek cureyeke edebiyata zarokan zêdetir bala wan dikşîne. Kesên wek Ezop, La Fontaine û Beydaba yê di cihanê de bi nivîsandina fablan tîk nasîn, di nivîsên xwe de heywanên cuda bi kar anîne û bi rêya wan peyam dane xwîneran. Di kovara *Nûbiharê* de em rastî fableke La Fontaine ya navdar “Çîrçîrk û Morî”yê tîk. Fabl behsa çîrçîrka teral

û moriyê jêhatî dike ku ew di hejmarê 9emîn de derdikeve pêşberî zarokan.

“Çirçirik ta havînê

Xilas be distirîne

Wextê dibê zivistan

Li wê dibê taristan

Kurm û mêşa nabîne

Gelek pusman dimîne

Ew diçe mala mêrû

Dibê “Birçîme îrû

Hinek xwarin dixwazim...” (Seyda, 1993, r. 28)

Morî heywanên jîr û jêhatîne, her tim bi tena serê xwe an jî bi komî dixebitin. Ew ji bo zivistanê ji xwe re xwarinê berhev dikin ku di rojên sar de bi rehetî bijîn. Lê çirçirk li gor moriyên heywanên bêxem in, îro hebe dixwin û sibê nafikirin ka ew ê çi bikin. Di çîrokê de tevger û jiyana her du heywanan hatiye miqayesekirin. Bi rêya heywanan ji zarokan re peyam tê dayîn ku divê mirov her tim bixebitin û mihtacî kesî nebin. Di *Nûbiharê* de 11 fabl jî hêla Sabah Kara, Îrşad Seyda, Xelîl Amed, Hemîd Gorûgan, Şivan Ar, Selman Dilovan û Rojbîn Özkanê ve hatine weşandin ku di tabloyê de ew hatin nîşandan. Heywanên ku di van fablan de navê wan zêdetir tîr behskirin jî şêr, kûsî, morî, çirçirk, dîk û kêvroşk in.

Jimar	Nivîskar	Fabl	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Hemîd Gorûgan-Sabah Kara	Barana Şadî	3	24 - 25	Berçile, 1992
2	Sabah Kara	Pîtros	4	28 29	Çileyê Paşîn, 1993
3	M.Azad-Sabah Kara	Çîroka Ristî	6	24 - 29	Adar, 1993
4	Îrşad Seyda	Çirçirik û Mêrû	9	28	Hezîran, 1993
5	Xelîl Amed	Pêşbazîya Kerguh û Kosî	34-35	46	Tîrmeh-Tebax, 1995
6	Xelîl Amed	Mêraniya Gêrik	36	25	Îlon, 1995
7	Xelîl Amed	Şêr û Kergu	36	25	Îlon, 1995
8	Xelîl Amed	Şêr û Mişk	47	29	Tebax, 1996

9	Rojbîn Özkan	Çîroka Dîko û Kîso	108	93	Havîn, 2009
10	Şivan Ar	Kûsî û Şêr	110	92	Zivistan, 2010
11	S. Dilovan	Îcar ev rast e	111	93	Bihar, 2010

### 3.1.10. Helbest

Helbest cureyek edebiyatê ye ku zarok gelek caran li gor pexşanê zêdetir jê hez dikin. Lewra helbest ji hevokên kin, gotinên lihevhatî û xweş pêk tên, ji ber vê jî bi hêsanî tên jiberkirin. Di wan de biwêj, gotinên pêşyan, şîret û peyvên xemilandî hene. Ev dewlemendiya peyv û gotinan zimanê zikmakî pêşve dibin û zarok dikarin bi zimanekî têr û tije bi axivîn û binivîsin. Helbestên zarokan du cure ne ku yek rasterast ji bo hest û fikrên zarokan yanê ji bo wan tên nivîsîn, ya duyem jî mijar bi xwe zarok in û di helbestê de behsa zarokan tê kirin. Di edebiyatê de helbestên behsa zarokan dikin, zêdetir in. Yanê mezinan ne ji bo kêf û hestên zarokan, ji bo xwe nivîsandine, lê mijar zarok in. Helbest zarok jî hin helbestên ji bo mezinan hatine nivîsandin dikarin bixwînin, lê heke helbest li gor asta wan be zêdetir jê hez dikin.

Yalçın û Aytaş dema behsa taybetmendiya helbestên zarokan dikin, dibêjin di helbestên zarokan de divê rîtm (aheng), qafiye (hevdengî) û wezin hebe, fikr sade bîn vegotin, fikrên felsefî yên giran tê de tunebin û risteyên wan jî kin bin (2014, r. 210-211). Helbestên ji bo zarokan tên nivîsandin heke behsa hezkirina xwezayê, welat, malbat, heval û dostan bike, mijar heywan, pirtûk, dayik, demsal, bajar, gund û hwd bin, ew bi zimanekî sade bîn nivîsîn, zêdetir balê dikşînin. Helbest divê zêde dirêj nebin, lewra piştî demekê zarok naxwazin bixwînin. Bixwazin jiber bikin jî, ji ber dirêjahiya wê nikarin jiber bikin.

Di *Nûbiharê* de 7 helbest hatine weşandin ku û yek ji wan helbesta helbestvanê kurd Cegerxwîn e, yên din hemû helbestên Sabah Kara ne. Ji bilî Kara tu kesî helbest nenivîsandiye. Helbesta Cegerxwîn a bi navê “Ji biçûkan re” weke fabl hatiye nivîsandin. Yên Kara gelemperî ne li gor asta zarokan in, lewra peyv û mijarên ku zarok nikarin bi hêsanî fêhm bikin di wan de hatine bikaranîn. Yanê mijar zarok in û peyva “zarokan” hatiye bikaranîn, lê ji bo mezinan in. Di helbesta Cegerxwîn a bi navê “Ji biçûkan Re” de behsa şêr û pilingekî ji bo serî penêr li hevdu nakin û diçin li cem rovî ku ew bibe hakemê wan tê kirin. Roviye ku di nav heywanan de bi qurnazî û fênekiyê tê nasîn, şûna ku bi adil tevbigere wan dixapîne û penêrê wan dixwe. Qismeke helbestê wiha ye;

“Şêr û piling tev de çûn,

Rastî serîk penîr bûn.

Vî jê xwar û wî jê xwar

Her d’wa li hev dane dar.

Yekî ji ê di re got,

Herdu rabûn bûne cot.

Go em herin cem rovî...” (1995, r. 46).

Di vê helbesta kin ya ku wek fabl hatiye nivîsandin de behsa heywanan tê kirin û ew bi qafiye hatiye nivîsandin. Mirov dikare bibêje ev li gor asta zarokan e, wan kêfxweş dike û peyamê dide wan

ku ew dijminatîya hev nekin, zîrek û çavvekirî bin.

Jimar	Helbest	Hejmar	Rûpel	Nivîskar	Sal
1	Ji Biçûkan Re	34- 35	46	Cegerxwîn	Tîrmeh-Tebax, 1995
2	Kerek Hebû Zarokno	78	4	Sabah Kara	Îlon, 1999
3	Riziyaye Zarokno	78	4	Sabah Kara	Îlon, 1999
4	Ronî Heye Zarokno	79-81	5	Sabah Kara	Çr. Pêşîn- Çl. Pêşîn,1999
5	Maro	79- 81	5	Sabah Kara	Çr. Pêşîn- Çl. Pêşîn,1999
6	Dilek Hebû Zarokno	82	31	Sabah Kara	Çileyê Paşîn, 2000
7	Gulek Hebû Zarokno	82	31	Sabah Kara	Çileyê Paşîn, 2000

### 3.1.11.Karîkatur

Zarok çawa ku ji xwendin û guhdarîkirinê hez dikin, her wisa wêne, boyax û xêzan jî hez dikin. Heta wisa ku wêne û xêzên rengîn gelek caran ji nivîsan zêdetir bala zarokan dikşînin. Karîkatur cureyek mîzahê ye ku zarok bi van xêz û wêneyên komîk kêfxweş dibin. Ji bilî mîzahê, karîkatur hin caran peyamên taybet didin û rexneyan jî dikin. Li gor nivîsan zêdetir balê dikşînin, di hişê mirovan de zûtir cih digirin, rêya mîzah û rexneyê li ber însanan vedikin. Heke di mijarekê de rexneyên tûj bîn kirin, dibe ku ev mixatabên xwe biêşîne û hêrs bike, lê dema bi rêya karîkaturê ev rexne bîn kirin mirov nermtir tevdigerin û zêde li ber xwe nakevin. Karîkatur ji bo perwerdeyê jî rêbazeke baş e ku Özer wiha dibêje: “Li gor min heke bê xwestin karîkatur dikare perwerde û hînkirinê balkêştir bike. Karîkatur dîtbarî ye (xitabê çav dîke), şêrîn e, balkêş e, tiştekî wisa ye ku derfeta nîqaşkirinê dide mirov” (2007, r. 21).

Perwerdeyê li aliyekê bihêle, ji bo kêf û henekê jî di edebiyata zarokan a kurdî de hejmara karîkaturan pir kême. Ev kêmasî di Zaroknameyê de jî tê dîtin, bi tenê di hejmara 36emîn de bi navê “Dilocan” karîkaturek hatiye xêzkirin bes. Di vê karîkaturê de zarokê ku cil û bergên kurdî li xwe kiriye û piştê li piştê xwe alandiye heye. Cil û bergên wî qilêr in. Ji çavên wî wisa xuya dîke ku wî tiştekî nebaş kiriye. Dayika wî jê re dibêje ji ber ku wî cil û bergên xwe pîs kiriye, ewê xwarinê nede wî. Dema ku Dilocan vê cezayê dibîhîze, şûna ku li ber xwe bikeve û xemgîn bibe ji dayika xwe re dibêje: “Bila be Yadê! Hûnê jî xwarinê nexwin. Ji ber ku min gişt qedand!” (Dost, 1995, r. 25). Ji ber ku henek û qirfê di xwe de dihevine û tevgerên zarokan ên har nîşan dide ku divê ew jî wisa tevnegerin li gor asta zarokan e.

### 3.1.12.Nasandina Berheman

Ji bo zarokan xwendin tiştekî girîng e, lewra tehmê dide jiyana wan û deriyê cîhaneke din ji wan re vedike. Hezkirina xwendinê jî bi berhemên xweş û heja çêdibe. Ji ber vê, mezin gelek caran rê nîşanî zarokan didin ku ew berhem û pirtûkên baş hîlbijêrin û xwendinê hez bikin. Ji zarokan re pêşniyazkirina berheman mijareke hesas e û divê mezin hem berhemên cihanê û hem jî berhemên neteweyî pêşniyazê zarokan bikin. Di beşên Zaroknameyê de nasandina berheman hema bibêje qet

tuneye. Bi tenê di hejmara 109emîn a kovarê de nivîseke bi serenava “Berhemek (Nûbihara Biçûkan Ehmedê Xanî)” ya ku behsa ferhenga Ehmedê Xanî dike hatiye weşandin ku wiha dibêje:

“Ehmedê Xanî ferhenga xwe ya bi navê Nûbihara Biçûkan di sala 1683’yan de, ango 11 sal beriya temamkirina “Mem û Zînê” nivîsandiye. Ferheng ji destpêkek, 13 beşan û 954 bêjeyan pêk tê. Xanî di malikeke destpêkê de bi zelalî diyar dike ku wî ev ferhenga han ji bo zarokên kurdan amade kiriye...” (Özkan, 2009, r. 92).

Li ser vê nivîsê wêneyê berhema Ehmedê Xanî ya bi navê “Nûbihara Biçûkan” jî hatiye weşandin ku haya zarokan ji koka wan, çand û huneran wan hebe. Her çiqas ev tena serê xwe cureyek edebiyata zarokan nebe jî heke di beşa Zaroknameyê de behsa hin pirtûk, ferheng û berhemen kurdî an jî biyanî bihata kirin wê ji bo zarokan baştir bûbûya. Lewra zarok gelek caran li gor pêşniyazan pirtûkan dixwînin û ev jî dibe sedem ku fikr û hestên wan dewlemend bibe, lê beşa zarokan ji vê hêlê ve gelekî qels maye.

### 3.1.13. Nameyên Zarokan

Name peyamên nivîskî ne ku fikr û hestên kesekî yê bi rêya nivîsê digîhîne kesên din û di kovaran de jî minakên wan tên dîtin. Dema xwendevan bi nameyan fikrên xwe yê derbarê kovarê û nivîskaran de dibêjin, berpîrsyar û nivîskarên kovarê kêfxweş dibin. Lewra ev pêşniyaz, rexne û şiroveyên nameyan kovarê pêşve dibin û nivîsên baştir tên weşandin. Ji bilî vê nameyên hest û fikrên din jî tînin ziman wek cureyek edebiyata zarokan girîng in. Di beşa zarokan de jî Rojbîn Özkanê jî zarokan xwestiye ku ew ji *Nûbiharê* re nameyan bişînin û wiha gotiye: “Tika: Zarokên hêja! Em dixwazin hûn jî di van rûpelên Nûbihara Biçûkan de raman û daxwazên xwe binin ziman. Navnîşana me ev e: zarokname@gmail.com.” (2009, r. 92). Dema Zarokname hat lêkolînkirin, hat dîtin ku banga wê zêde bal nekişandiye, lewra bi tenê du nameyên zarokan hatine weşandin bes. Dibe ku sedemên vê yê cuda jî hebin, lê dema em berê xwe didin kovarê em dibînin ku di hejmarên 111 û 112yê de du name derdikevin pêşberî me ku ew di vê tabloyê de hatin nîşandan.

Jimar	Name	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Name: Nûdem Elçî	Nûdem Elçî	111	93	Bihar, 2010
2	Nameya Tombişê Ji Zehrayê re	Selman Dilovan	112	92-93-94	Havîn, 2010

### 3.1.14. Nasandina Zarok û Heywanan

Di kovaran de carna wêneyên zarokan û agahiyên derbarê wan de tên weşandin ku bi saya van wêneyan ew tên nasîn. Ev zarok kî ne, çend salî ne, çi hez dikin û hwd gelek agahiyên bi vî rengî di binê wêneyên wan de tên parvekirin. Di beşên Zaroknameyê de beşeke wiha nehatiye amadekirin. Bi tenê di hejmara 112emîn a ku hejmara dawîn a beşa Zaroknameyê de behsa du zarokan (Pelda û Zehra) hatiye kirin bes. Ew jî rastarê zêdetir behsa axaftin û tevgerên wan dike (Dilovan, 2010, r. 92-94).

Hezkirina heywanan her çiqas di zarokatiyê de dest pê bike jî jyana modern a li bajaran derfetê nade zarokan ku ew heywanên cuda nas bikin û bi wan re eleqedar bibin. Zarok ji ber ku nikarin heywanan ji nêz ve nas bikin, ancax bi saya kovar, pirtûk, televîzyon û înternetê dikarin derbarê wan de bibin xwedî agahî. Ji ber van sedeman mezin derbarê heywanên cuda de divê agahiyan bidin zarokan. Heke



derfet hebe divê ew zarokan bibin gundan, siruştê û baxçeyên heywanan ku zarok hinekî wextê xwe li van deran derbas bikin û heywanan ji nêz ve nas bikin. Hin kovarên zarokan behsa heywanan dikin, lê beşên Zaroknameyê di vî warî de qels e, lewra bi tenê di hejmarekê de heywanek hatiye nasandin ku ew jî kêvroşk e (Özkan, 2009, r. 93). Di çîrok û fablên ku hatine nivîsandin de heywan derbas dibin, lê ji bilî vê hejmarê rasterast behsa wan nayê kirin ku ev ji bo zarokan kêmasî ye.

Jimar	Nasandina Zarok û Heywanan	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Pelda û Zehra	Selman Dilovan	112	92-93-94	Havîn, 2010
2	Kîvroşk	Rojbîn Özkan	109	93	Payîz, 2009

### 3.1.15. Bîranîn

Di jiyana însanan de gelek tişt tîr serê mirovan, gelek serpêhatî çêdibin, lê mirov ancax ên ku zêde tesîrê li ser hiş û dilê wan dikin bi bîr fînin. Ew dibe ku derbarê kesekî û cihê de, dibe ku derbarê bûyerekê de bin. Ji wan hinek bîranînên baş û hinek jî yên nebaş in. Yıldız ji bo bîranînê dibêje ew tiştê tê hiş û dilan re bîranîn tê gotin ku ew di kurdî de bi peyvên cuda yên birewerî, yadaşt, bîrhat, bîranîn, bîrayî, xatira, bîrhatî û vîrameyîş tîr binavkirin (2018, r. 123-124). Bîranîn ne ew tişt in ku bi belgeyan bîr piştraskirin, ew li gor tecrube û çavdêriyan tîr nivîsandin. Ji ber vê, zîmanê bîranînan zelal û sade ye, bi hesteke dilsozî tîr nivîsandin û tê de agahî derbas dibin. Bîranînên hin navdaran gelek caran ji ber ku agahiyên girîng, dîrok, felsefe û çandê di xwe de dihevin gelekî girîng in. Divê kovaran de him bîranînên kesên navdar û him jî bîranînên zarokan bîr weşandin ku zarok jê îstifade bikin. Di beşên Zaroknameyê de ji vê hêlê ve kêmasî heye, lewra bi tenê di hejmarên 109 û 112emîn de du bîranîn hatine weşandin.

Di hejmara 109emîn de Özkan bi sernava “Mirişka kurtê” ji devê zarokê behsa bîranînekê dike. Di nivîsê de tê gotin mirişkeke bi navê Cinco heye ku ketiye kurtê û çêlikên wê çêbûne. Di vî bîranînê de hem behsa hezkirina heywanan tê kirin û hem jî derbarê çêbûna çêlikên mirişkan de ji bo zarokan agahî tê dayîn. Zîmanekî hêsan û zelal hatiye bikaranîn. Zarokên meraq bikin ka gelo cûcîkên mirişkan çawa çêdibin, bi saya vî bîranînê dikarin bibin xwedî agahî (Özkan, 2009, r. 93). Di bîranîna navê “Mol Axa” ya di hejmara 112emîn de jî zarokê behsa bîranînekê xwe ya derbarê daxwaza çûyîna zozanan dike. Özkan ji devê zarokê dibêje her sal gundî diçin zozanan, lê ji ber ku di nav du eşîran de şerek çêbûye, gundî wê salê neçûne zozanan. Ji ber vê, zaroka ku behsa vî bîranînê dike xemgîn dibe û dibêje (navê hevala wê Seyran e) rojekê eta Seyranê Xezal ji wan re dibêje xemgîn nebin, ew ê îsal herin zozanê Mol Axa. Di dawîya bîranînê da tê fêmkirin ku Xezalê henekên xwe bi zarokan kiriye û ew xeyalîkeştî bûne (2010, r. 91). Mezin dema hin caran dixwazin henekên xwe li zarokan bikin, divê bi baldarî tevbigerin ku dilê zarokan ji ber wan henekan neşkê, ew hêrs û xemgîn nebin. Di vî bîranînê de ev hest û raman bi awayekî baş hatiye vegotin. Zîmanê nivîsê hêsan e, mijar balkêş e û mirov dikare bibêje ku li gor asta zarokan e.

Jimar	Bîranîn	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Mirişka Kurtê	Rojbîn Özkan	109	93	Payîz, 2009
2	Mol Axa	Rojbîn Özkan	112	91	Havîn, 2010

### 3.1.16. Lîstik

Peyva lîstikê dema tê bikaranîn zarok tên bîra mirov. Lewra zarok û lîstik du peyvên gelekî lihevhatîne ku bêyî hev nabin. Zarok bi saya lîstikê kêfxweş dibin, tiştan hîn dibin, dema xwe xweş derbas dikin û bi şahî mezin dibin. Kîjan zarok dibe bila bibe, temenê wan çî dibe bila bibe, ew bê lîstik nasekinin. Bi pênaseyeke gelemperî lîstik; rehetî û bêhnvedan e, enerjîya zêde ya li hundir avêtin e, tetbîqkirin e, bicîanîna daxwazan e, zewq û cureyek fêrbûnê ye (Aksoy-Çiftçi, 2014, r. 2). Lîstik li ser zarokan tesîreke baş dike, hem jî hêla fizîkî û hem jî hêla derûnî û hiş ve wan pêşve dibe. Ji ber vê, di berhem û kovarên zarokan de divê lîstikên cur bi cur, yên bi peyvvan, tevgeran, alav û amûran tên lîstin bên weşandin û behsa wan bê kirin.

Di civaka kurdan de heta salên dawîn ji ber ku pêlîstokên modern kêmkirî bûn, înternet û telefonên destan li gor Rojavayê dereng ketin malên kurdan, zarokên kurd gelek lîstikên resen dizanibûn û bi hev re dilîstin. Lê piştî demekê wan jî dev ji van lîstikan berdan. Her çiqas kurd jî hêla lîstikan ve dewlemend bin jî, di *Nûbiharê* de kêmasiya lîstikan tê dîtin. Bi tenê di hejmara 109emîn de Rojbîn Özkanê behsa “Lîstika Qanqolê” kiriye û wiha bangî zarokan dike;

“Zarokên şêrin!

Lîstika qanqolê yek ji lîstikên zarokan e ku li Kurdistanê jî hêla zarokan ve tê lîstin.

Fermo em fêrî listika qanqolê bibin.

Hêlek qanqola dara beruyê têtê qulkirin.

Di vê qulika fireh de hundirê qanqolê tê valakirin.

Paşê di hêla qanqolê ya fireh bi peleke tenik tê girtin.

Gava ku zarok pifî qulika piçûk ya qanqolê dikin,

Mîna neya rastî dengê xweş jê dertê.

Lîstikvan bi vê qanqolê li gora xwe megaman pêk tînin.” (2009, r. 93).

### 3.1.17. Mamik

Mamik berhemên gelêrî yên devkî ne ku nayê zanîn kingê û jî hêla kî ve hatine gotin. Ew li ser mirov, nebat, reng, heywan, xweza, bûyer, alav, amûr, cil û berg, fêkî, sebze û tiştên din hatine gotin. Mamik raz, veşartin, meraq, kêf, hişyarî, lîstik, fikirandin û zanîna di xwe de dihewînin. Wek pênase, mamik amûreke kêfê ye ku xisûsî di şevên dirêj ên zivistanê de zêdetir zarok, keç û jin pê dema xwe dibuhurînin (Subaşî, 2016, r. 72). Mamik tişteki ku nayê zanîn e ku bi awayekî nerasterast tê pîrskirin, yê ku mamikê guhdar dike an jî dixwîne hewl dide ku di hişê xwe de wê pê derxe (Starr, 1909, r. 6). Li deverên cuda jî bo mamikan peyvên cuda yên wek tiştanok, tiştik, têdexistinok, qinik, kelemamik,

tên bikaranîn. Ji bilî van pêderxistinok, têderxistinok, metel, tiştanok, mamik, hetele, tiştonek, çistan, qinîk, tiştik, apik, çistan, meyl û şertik jî tên bikaranîn (Gazî, 2006, r. 11).

Feydeyên mamikan ji bo geşedana zarokan a fikrî û derûnî zêde ye. Ji ber ku ew li ser pirs û bersivan dimeşin mêtîyê zarokan didin xebitandin, wextê wan xweş derbas dikin, wan kêfxweş dikin, zimanê dayikê bi hêsani hînê wan dikin, hesta meraq û kelecane li wan peyda dikin keresteyên girîng in. Subaşi li ser girîngiya peyv, gotin û ziman ya di mamikan de disekine û dibêje: “Mamik di bîr û hişên netewan de wek hunereke devkî ji mêtî ve ye tê gotin û bûye amûreke listina li ser peyv û têgehane. Ji ber vê yekê ye ku mamik di eslê xwe de wek behreke zimên an jî gencîneyeke bîr û zimanê gel e (2018, r. 216). Zargotin û çanda kurdî herçiqas ji hêla mamikan ve dewlemend be jî ev dewlemendî bi têra xwe di beşên Zaroknameyê de nayê dîtin. Lewra bi tenê du hejmaran de (34-35) çend mamik wiha hatine nivîsandin:

“1- Humhuma li ber çema; ne dengê gur e, ne diz. (Aş)

2- Hilindir, bilindir, law ji bav bilintir. (Agir û dûman)

3- Ho dibêjim, tefşo dibêjim; bi nav dikim, lê nabêjim. (Tefşo)

4- Sibehê bikire û bixwe, nîvro bide hevalê xwe, êvarê bide neyarê xwe. (Pîvaz)

5- Qesra spî, lê bê derî. (Hêk)” (Derxistinok, 1995, r. 47)

Di hejmara 55an de jî di bin sernava “Rengîn û Xemgîn” de du lehengên zarok diaxivin, herdu heval pirsan ji hevdu dikin û hewl didin bibersivînin (Amed, 1997, r. 30). Bi rastî ev rasterast ne mamik in, lê ji ber ku pirs in û kesê li hember hewl dide ku bersiva pirsan bide, mirov dikare bibêje ku ew li ser mijara mamikan dikarin bên hesabandin.

Jimar	Mamik	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Derxistinok	-	34-35	47	Tirmeh-Tebax ,1995
2	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	55	30	Nîsan, 1997

### 3.1.18. Leheng (Rengîn û Xemgîn)

Leheng ji wan kesên ku mijar li ser wan dimeşe û ew di navenda bûyerê de cî digirin re tê gotin. Di edebiyata zarokan de ew tena sere xwe ne cureyek be jî di gelek berhemane de (çîrok, helbest, fabl hwd) ew bi tevger û axaftinê xwe xwedî rola sereke ne û tesîrê li ser zarokan dikin. Çawa ku însanek dikare bibe leheng, hin caran heywan, nebat an jî amûrêk jî dikarin bibin leheng. Di berhemên ji bo zarokan hatine nivîsandin û xêzkirin de leheng divê bi tenê ji kur, an jî keçan pêk neyên, divê ji zayendên wan cuda bin. Ew divê pir îdealîze neyên kirin û ji dûrî rastiyê nebin û divê taybetmendiyên wan li gor asta zarokan be. Zarok lehengan hez dikin, wan ji xwe re dikin mînak û rêber, gelek caran jî hewl didin wek wan tevbigerin. Heke leheng zêde baş û bêqusir bin, zarok hewl didin wek wan tevbigerin, lê ev ne mumkin e. Lewra dema heval û kesên der û dora wan ne li gor vê taybetmendiyê bin ew aciz dibin û dilê wan dişkê. Berevajî vê, heke leheng zêde nebaş be, tund û hov tevbigere, zarok vê carê jî çav didin wan û bi awayekî nebaş tevbigerin. Bi kurtasî divê leheng ne zêde bêqisûr û ne jî zêde hov û fantastîk bin ku di navbera wan û zarokan de têkiliyeke baş ava bibe.

Di *Nûbiharê* de du lehengên zarok ên bi navê Rengîn û Xemgîn ji hêla Xelîl Amed ve hatine xêzkirin. Ev leheng yekem car di hejmarên 34 û 35an de tînin û paşê di hejmarên din de jî derdikevin pêşberî zarokan. Taybetmendiya wan ev e; herdu leheng jî kur (mêr) in, bi hev re kurdî (zaravayê kurmancî) diaxivin, cil û bergên kurdî yên ku jê re dibêjin şal û şepik li xwe dikin, ji hela kesayetiyê ve Xemgîn yekî ecêb e û gelek caran tiştên li serî wî, Rengîn jî berevajî wî yekî rûken, xweşbêj û zana ye. Ji ber ku her du leheng jî kur in ev dikare bê rexnekirin. Lewra edebiyata zarokan bi tenê ne ji bo kuran e, qîz jî hene. Xaleke girîng jî ew e ku dema ev leheng kurdî diaxivin ew li ber zarokên kurd dibin mînakên baş. Zarok wê çav bidin wan û wê zimanên xwe yê zikmakîyê biaxivin ku ev jî tiştêkî girîng e. Amadekarê van lehengan xwestiyê zarokên kurd cil û bergên kurdî nas bikin, ji ber vê kincên kurdî li zarokan kiriye. Rengîn û Xemgîn hin caran tiştêkî nadin serê xwe, lê gelek caran şaşîkek li serê wan heye û şal û şepik li xwe kirine. Ev jî xalek muhîm e, lewra miletek bi çand û hunera xwe, xwarin û vexwarina xwe, cil û bergên xwe ji civakên din vediqetin û taybetmendiya xwe didin nîşandan. Ji lehengan yek jîr û zana û yê din jî hinek saf û kênzana ye ku ev taybetmendî di jiyana de jî wisa ye. Hevalên wiha ji hev cudatir tiştan hîni hev dikin, ji hev dişewirin û henekan bi hev dikin.

Ji bo mînakê, di hejmara 34 û 35an de Rengîn û Xemgîn rastî hev tînin, silavê didin hev. Rengîn dibîne ku rewşa Xemgîn nebaş e, ji wî dipirse ku ka ew çima ketiye vî halî. Xemgîn behsa serpêhatiya xwe dike û dibêje bavê wî ji wî re gotiye “vî barî bibe bajêr” û dema wî bar li ser piştê ker bi cî kiriye, kerê bar li ser piştê xwe avêtiye û zirtikek avêtiye Xemgîn û paşê behsa bûyerê dike (Amed, 1995, r. 47). Wek ku tînin herdu leheng bûyera ku hatiye serê Xemgîn diaxivin. Piştî vê, di hejmara 36emîn de “Rengîn” û “Xemgîn” dîsa dibin mêvanê zarokan, lê liv ir wênayê wan tune. Rengîn ji Xemgîn dipirse ka çima madê wî tune û ew nebaş xuya dike. Xemgîn dibêje dema wî xwestiyê bi çakuç ve bizmarekî di dîwêr de bikute, çakuç li destê wî ketiye. Dema wî xwestiyê bavê wî bizmar bigre û ew jî bi çakuç ve li bizmarê bixe, vê carê jî wî bi çakuç ve destê bavê xwe xistiye û ew eşandiye (Amed, 1995, r. 23). Li vir jî dîsa tiştêkî tê serê Xemgîn û ew pê diêşe, meriv dikare bibêje ku li gor asta zarokan e.

Jimar	Leheng	Nivîskar	Hejmar	Rûpel	Sal
1	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	34-35	47	Tîrmeh-Tebax 1995
2	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	36	23	Îlon, 1995
3	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	38	29-30	Çiriya Paşîn, 1995
4	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	40	29	Çileyê Paşîn, 1996
5	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	41-42	29	Sibat/Adar, 1996
6	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	45	30	Hezîran, 1996
7	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	46	30	Tîrmeh, 1996
8	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	48	25	Îlon, 1996
9	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	53-54	30	Sibat/Adar, 1997
10	Rengîn û Xemgîn	Xelîl Amed	56	28	Gulan, 1997

### Encam

Edebiyata zarokan a ku bû mijara vê xebatê, çîrok, helbest, roman, bîranîn, jînenîgarî, name, nivîsên rêwîtiyê, gotar, şano, rojname, kovar û hwd di xwe de dihewîne. Ev berhem ji bo zarokên ku temenê wan ji du salî dest pê dibe heta ew kamil dibin tî amadekirin. Tesîra edebiyata zarokan li ser hiş, derûnî, geşedan û kesayetiya zarokan heye û gelek agahiyan fêrî wan dibe û dibe sedem ku dema wan xweş derbas be. Me di vê xebatê de qismêke edebiyata zarokan a kurdî hîlbijart û em li ser xebitîn. Kovara *Nûbiharê* ya ku di kovargerîya kurdî de xwedî cihêkî taybet e û beşeke xwe ji bo zarokan amade kiriye bû armanca me û em li ser nivîs, xêz û wêneyên ku di kovarê de ji bo zarokên kurd hatine weşandin xebitîn. Di dawîya xebatê de em gihîştin hin encaman ku meriv dikare bibêje rola kovara *Nûbiharê* ji hêla edebiyata zarokan ve gelekî girîng e, kovarê bi nivîs û xêzên xwe mohra xwe li ser edebiyata zarokan a kurdî xistiye.

Kovara *Nûbiharê* di hejmara ewil de destnîşan kiriye ku ew ji bo mezinan tê weşandin. Ji bo beşa Zaroknameyê behsa agahiyekê nehatiye kirin, hema rasterast bi du nivîsên derbarê jiyana pêxember de dest bi beşa ewil a Zaroknameyê hatiye kirin. Her wisa, ev beş bi awayekî rêkûpêk û pisporî nehatiye amadekirin. Piştî demekê bêyî ku ji zarokan re agahî bê dayîn ku êdî ev beş wê di kovarê de cî negire, dev ji amadekirina vê beşê hatiye berdan. Di sala yekemîn (çiriya pêşîn 1992- îlon 1993, hejmarên 1, 2, 3, 4, 6, 7, 8, 9, 10 û 11emîn) de ji bo zarokan nivîs hatine weşandin. Di sala duyemîn (cotmeh 1993- çiriya paşîn 1993, hejmarên 13, 14, 15, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24) de ji bo zarokan tu tişt nehatiye nivîsandin. Di sala sêyemîn (çiriya pêşîn 1994-îlon 1995, hejmarên di navbera 25-36an de hatine weşandin) de bi tenê di hejmarên 34, 35 û 36emîn de nivîs hene. Di sala çaremîn (çiriya pêşîn 1995-cotmeh 1996, hejmarên navbera 37-49an) de ji bilî hejmarên 43, 44 û 49an di hemû hejmaran de ji bo zarokan nivîs hatine weşandin. Di salên din de jî di hin hejmaran de nivîs û xêz hene, di hinekan de tune ne.

Di kovarê de 19 pêkenok, 11 fabl, 10 nivîsên diyaloga di navbera du lehengan de, 8 çîrok, 7 helbest, 4 kurteçîrok, 4 nivîsên der barê navdarên kurdan de, 3 nivîsên der barê jiyana gotinên Pêxember de, 3 nivîsên derbarê perwerdeya dîni de, 3 gotinên navdaran, 2 gotinên pêşiyên, 2 nivîsên derbarê cihên dîrokî de, 2 nameyên zarokan, 2 bîranîn, 2 mamik, ceribandinek, karîkaturek, nivîseke nasandina berheman, nivîseke nasandina zarokan, nivîseke nasandina heywanan, nivîseke derbarê exlaqê de û listikek heye. Ev hemû di nav salên dûr û dirêj de hema bibêje ji hêla Sabah Kara, Xelîl Amed (î) û Rojbin Özkanê ve hatine amadekirin. Ji bilî wan, bi tenê çend kesan hin nivîs şandine kovarê ku bînan weşandin. Dema em berê xwe didin naveroka beşa zarokan tê dîtîn ku ji hêla mijaran ve ew dewlemend e, lê ji hêla pedagojî, metod, pergala û cureyên nivîsan ve hin kêmasî hene. Herçiqaas ekîbeke di qada edebiyata zarokan de pispor tunebe jî, nivîskarên vê beşê bi dildarî çî ji destê wan hatiye kirine ku ev beş amade bibe. Gelek nivîs û xêzên ji bo geşedan û fêrkirina zarokan di kovarê de balê dikşînin.

Nivîsên ku di beşa Zaroknameyê de hatine weşandin jê hinek herçiqaas li gor asta zarokan bin jî, hinek jî ji hêla naverok, pedagojî û zimanê ku hatiye bikaranîn ve ne li gor asta zarokan in û meriv dikare wan ji sînorên edebiyata zarokan derxe. Li gel vê, *Nûbiharê* xwestiye ku zarok zimanê xwe yê dayikê hîn bibin, xwendina wan pêş ve here, ew ji çand û civaka xwe dîran nemînin û haya wan ji nîrxên neteweyî û cihanê hebe. Di berhemên zarokan de wêne, xêz û karîkatur li gor nivîsan zêdetir bala zarokan dikşînin, lê di Zaroknameyê de hejmara wêne, xêz û karîkaturan gelek kêman in, beş ji vê hêlê ve pir qels maye ku ev dikare bê rexnekirin. Xaleke din jî ew e ku di kovarê de hin nivîsên dibe ku zarokan bîfîrsînin hene ku ji hêla naverokê ve qet ne li gor asta zarokan in.

Ji bilî vê, di kovarê de du lehengên bi navê “Rengîn û Xemgîn” hatine xêzkirin ku her du heval her tîm li ser mijarekê bi hev re diaxivin. Ew hin caran henekan bi hevdu dikin ku ev ji bo kêfa zarokan bîne baş e. Lê tiştê ku balê dikşîne herdu jî kur in, yanê ji heman zayendê ne. Ji lehengan heke yek qîz bûbûya dibe ku bêtir bala zarokan bikişanda. Di beşên Zaroknameyan de gotinên kurdî, peyvên

resen ên kurdî gelek caran derdikeve li pêş zarokan ku ev jî ji hêla ziman û çandê ve dewlemendiyek e. Dema çîrokên Zaroknameyê bîn xwendin tê dîtîn ku peyv û gotinên hatine bikaranîn, mijarên ku hatine hilbijartin li gor çand û edetên civaka kurdî ne. Xaleke din jî ew e ku li gor mijar û naverokên din hejmara lîstîkan di kovarê de gelekî kême, hema bibêje yek tene ye. Ev kêmasî dikare bê rexnekirin. Lewra zarok bi lîstîkan kêfxweş dibin û weneyan mijaran baştir û hêsantir fêm dikin û zêde kêfxweş dibin.

Di beşa Zaroknameyê de bi tenê perwerde, fêrkirin û şîretdayîn tune, nivîskaran çîrokên wek Xoçeyê Navdar (Nasrettîn Xoçe) hilbijartine ku zarok bikenin û kêfxweş bibin. Çîrokên beşa Zaroknameyê jê hinek dirêj in, ne li gor asta zarokên ku temenê wan biçûk in. Lê her çiqas ev çîrok ji hêla zarokan ve neyên xwendin jî, dema mezin ji wan re bixwînin îhtimal e ku zarok hînê guhdarîbûnê bibin. Rastiyek heye ku zarok nivîsên ku bi tîpên biçûk hatine nivîsandin nikarin rehet bixwînin û ji nivîsê zû aciz dibin. Di nivîsên Zaroknameyê de mezinahiya tîpên nivîsan gelemperî ne li gor asta zarokan e, biçûk in. Hînkirina reqeman, tîpên alfabeyê, rojên heftayê, meh, reng û hwd ji ber ku tiştên hişê zarokan pêşve dibin girîng in, lê di kovarê de ev kêmasî jî xwe dide der.

Herî dawîn divê bê gotin ku kovara *Nûbiharê* ya ku îro di civaka kurdî de bi nav û deng e, her çiqas hin kêmasî hebin jî di edebiyata zarokan a kurdî de li gor dema ku dest bi weşanê kiriye gaveke girîng avêtîye. Hemû mijar, xêz û wêneyên ji bo beşa zarokan hatine amadekirin li ser kelepura edebiyata zarokan a kurdî zede bûne ku ew ê bigîhêjin nifşan. Rêvebir û nivîskarên *Nûbiharê* îro ne di nav rûpelên kovarê de, bi berhemên cuda yên ku bi awayekî rêk û pêk hatine amadekirin bi Weşanxaneyê *Nûbiharê* digîhînin ber destê zarokan. Heta wisa ku êdî kesên li ser vê qadê pispor in edîtorîya van berheman dikin û kevîreki li ser temelê edebiyata zarokan a kurdî zêde dikin. Hêvî ew e ku ev xebat û yên din di vî warî de balê bixşîne ser edebiyata zarokan a kurdî û xebatên zêdetir û xurttir derkevin holê.

### Çavkanî/References

- Aksoy, A. B. & Çiftçi, D. H. (2014). *Erken çocukluk döneminde oyun duyu-motor oyundan kurallı oyuna*. Pegem Akademi.
- Amed, E. (1993). Rûpelek ji exlaqê pêxember. *Nûbihar*, (9), r. 27-28.
- Amed, X. (1993). Pûtên bêxêr û bêkêr. *Nûbihar*, (8), r. 27-27.
- Amed, X. (1993). Pêxember û lepên şixulker. *Nûbihar*, (11), r. 29-29.
- Amed, X. (1995). Rengîn û xemgîn- seîdê kurdî. *Nûbihar*, (37), r. 23-23.
- Amed, X. (1995). Rengîn û xemgîn- Evdilmelik Firat. *Nûbihar*, (39), r. 30-30.
- Amed, X. (1995). Revîna xewê. *Nûbihar*, (34-35), r. 47-47.
- Amed, X. (1995). Rengîn û xemgîn. *Nûbihar*, (34-35), r. 47-47.
- Amed, X. (1995). Rengîn û xemgîn. *Nûbihar*, (36), r. 23-23.
- Amed, X. (1996). Şêr şêr e çi jin çi mêr e. *Nûbihar*, (41-42), r. 30-30.
- Amed, X. (1996). Çiz mîz nizanîm. *Nûbihar*, (47), r. 29-29.
- Amed, X. (1996). Viz viz ji we hingiv ji min. *Nûbihar*, (45), r. 31-31.
- Amed, X. (1997). Çavê neyartiyê kor e. *Nûbihar*, (56), r. 29-29.
- Amed, X. (1997). Rengîn û xemgîn. *Nûbihar*, (55), r. 30-30.
- Amedî, X. (1993). Pêxember û lepên şixulker. *Nûbihar*, (11), r. 29-
- Asan, N. (1997). Rûpelek ji dîroka îslamê. *Nûbihar*, (56), r. 29-29.
- Azad (1992). Du qise ji jiyana pêyamber ê ekrem. *Nûbihar*, (1), r. 30-31.
- Bozkurt, K. (2013). Kürt masallarının yapısal özellikleri, *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlıdan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*. Bingöl Üniversitesi Yayınları.
- Cambridge (2024). <https://dictionary.cambridge.org/> Wergirtina ji înternetê (4ê Çileyê Pêşîn 2024).
- Cegerxwîn, (1996). Xebat bikin roj û şev, şûr û qelem digel hev. *Nûbihar*, (45), r. 30-30.
- Cegerxwîn, (1995). Ji biçûkan re. *Nûbihar*, (34-35), r. 46-46
- Çakmak Güleç, H. & Geçgel, H. (2012). *Çocuk edebiyatı, okul öncesinde edebiyat ve kitap*. Kriter Yayınevi.
- Çocuk Haklarına Dair Sözleşme (2024). Wergirtina ji înternetê (4ê Çileyê Pêşîn 2024). [https://www.unicef.org/public/uploads/files/UNICEF\\_CocukHaklarınaDairSozlesme.pdf](https://www.unicef.org/public/uploads/files/UNICEF_CocukHaklarınaDairSozlesme.pdf)
- Dilovan, S. (2010). Nameya tombişê ji zehrayê re. *Nûbihar*, (112), r. 92-93-94
- Dilovan, S. (2010). Pelda û zehra. *Nûbijar*, (112), r. 92-93-94.
- Dost, X. (1995). Dilocan. *Nûbihar*, (36), r. 25-25.
- Elçi, N. (2010). Name: Nûdem Elçi. *Nûbihar*, (111), r. 93-93
- Gazî, M. (2006). *Gurzek ji zargotina zarokan; disko disko danîno*. Weşanxaneyê Aras.
- Güleryüz, H. (2002). *Yaratıcı çocuk edebiyatı*. Pegem Akademi Yayıncılık.
- Hawar, Z. (2009). Pîrê û rovî. *Nûbihar*, (108), r. 94-94
- İnal, K. (2014). *Çocuk ve demokrasi*. Ayrıntı Yayınları.
- Kara, S. (1992). Ko zivistan çû bihar tê. *Nûbihar*, (2), r. 24-26.
- Kara, S. (1993). Qendîla biçûk. *Nûbihar*, (7), r. 23-26.
- Kavcar, C. (1999). *Edebiyat ve eğitim*. Engin Yayınevi.



- Kaya, M. (2011). *Çocuk edebiyatında gülmece (mizah) İlköğretim Çocuk Edebiyatı Kitap Kataloğu*. Eğitimden Yayınları.
- Malpir, M. (1996). Ka em bavên ber aqilan. *Nûbihar*, (46), r. 31-31.
- Neydim, N. (2003). *İnceleme-araştırma-eleştiri-çocuk Edebiyatı*. Bu Yayınevi
- Nûbihar (1997).(60), r. 4-4
- Nûbihar (1992). Di Payîz De, . (1), r. 3-4.
- Nûbihar (1995). Gotinên navdaran. (34-35), r. 46-46.
- Nûbihar (1995). Derxistinok. (34-35), r. 47-47.
- Nûbihar (1995). Gotinên pêşyan. (36), r. 25-25.
- Nûbihar (1996). Gotinên navdaran- Cegerxwîn. (45). r. 30-30.
- Oğuzkan, A. F. (2000). *Çocuk edebiyatı*. Anı Yayıncılık.
- Oxford Dictionary (2016). Wergirtina ji internetê (9 Gulan 2016). <https://en.oxforddictionaries.com/definition/joke> 09.05.2016/11.15
- Özer, A. (2007). Karikatür ve eğitim. *Bilim ve Aklın Aydınlığında Eğitim Dergisi*, (84), r. 19-25.
- Özkan, R. (2009). Gotineke xweş. *Nûbihar*, (109), r. 92-92
- Özkan, R. (2009). Ceribandin. *Nûbihar*, (108), r. 92-92.
- Özkan, R. (2009). Zarokno hûn bi vena dizanin?. *Nûbihar*, (107), r. 127-127.
- Özkan, R. (2009). Medreseya sor. *Nûbihar*. (109), r. 92-92.
- Özkan, R. (2009). Çîroka newrozê. *Nûbihar*. (107), r. 125-126.
- Özkan, R. (2009). Berhemek (Nûbihara Biçûkan Ehmedê Xanî). *Nûbihar*, (109), r. 92-92.
- Özkan, R. (2009). Tika. *Nûbihar*, (108), r. 92-92.
- Özkan, R. (2009). Kîvroşk. *Nûbihar*, (109), r. 93-93.
- Özkan, R. (2009). Mirîşka kurtê. *Nûbihar*, (109), r. 93-93.
- Özkan, R. (2010). Gotinek pêşyan. *Nûbihar*, (110), r. 92-92.
- Özkan, R. (2010). Mol axa. *Nûbihar*, (112), r. 91-91.
- Özkan, R. (2009). Listika qanqolê. *Nûbihar*, (109), r. 93-93.
- Özkan, R. (2009). Bapîrê me Ehmedê Xanî. *Nûbihar*, (108), r. 92-92.
- Özkan, R. (2009). Melayê Cizîrî. *Nûbihar*, (109), r. 92-92.
- Özkan, R. (2009). Meha Remezanê. *Nûbihar*, (108). r. 92-92.
- Özkan, R. (2009). Tika. *Nûbihar*, (108), r. 92-92.
- Özkan, R. (2009). Nûh pêxember û çiyayê cudî. *Nûbihar*, (110), r. 91-91.
- Özkan, R. (2010). Çîroka kalo heyvo, *Nûbihar*, (111), r. 94-94.
- Uğurlu, S. B. (2010). *Çocuk ve edebiyatı eleştirisi*. Turkish Studies, International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic, 5 (3). r. 1921-1945.
- Pertev, R. (2009). *Zarok û çirok destpêka pedagojiya kurdî*. Doz.
- Pîranî, B. (1996). Noka genî (47), *Nûbihar*, r. 30-30.
- Resmî Gazete*. 12 Nisan 1991, (20843), r. 8-8
- Sadik, M. A. (2010). Şeltik şültik. *Nûbihar*, (110), r. 92-92.
- Sever, S. (2015). *Çocuk ve edebiyat*. Tudem Yayınları.
-

- Seyda, Î. (1993). Çirçirîk û mêrû. *Nûbihar*, (9), r. 28-28.
- Starr, F. (1909). *A little book of philipine riddles; Yonkers*. World Book Co.
- Steel, M. (2000). *Oxford wordpower dictionary for learners of English*. Oxford University Press.
- Subaşî, K. (2016). Vegotina hêmayî û metaforîk di mamikên kurdî de. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 1(1). r. 71-90. vgz. İlhan Başgöz, "Türk Bilmecelerinin Fonksiyonları", *Folklorla Doğru*, j. 37, İstanbul, 1974, r. 29.
- Subaşî, K. (2018). Mamikên kurdî ji hêla taybetmendî û bikaranîna zimên ve. Doru, M. N & Bozkurt, Ö. (Ed.). *Dil Bilimleri Klasik Sorunlar-Güncel Tartışmalar*. (r. 215-269). Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.
- Şahbaz, N. K. (2008). Çocuk edebiyatında ihmal edilmiş bir edebî tür: deneme, *İnönü Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, Cilt: 9, Sayı: 15, s:189–203
- Şimşek, T. (2007). *Çocuk edebiyatı*. Suna Yayınları.
- Şirin, M. R. (2007). *Çocuk edebiyatı kültürü okuma alışkanlığı ve medya sarmalı*. Kök Yayıncılık.
- Tîgrîs, A. (2001). 6762 Gotinên pêşîyan. Weşanên Rewşen.
- Tüfekçi Can, D. (2014). *Çocuk edebiyatı: Kuramsal yaklaşım*. Eğitim Yayınevi.
- Türkçe Sözlük*. (2011). Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Xursî, M. (1996). Mirî çawa tên şuştin?. *Nûbihar*, (47), r. 30-30.
- Yalçın, A. & Aytaş, G. (2014). *Çocuk edebiyatı*. Akçağ Yayınları.
- Yıldız, A. (2018). *Hunera vegotina bedew a devkî û nivîskî II*. Lorya.

### EXTENDED ABSTRACT

Since children shape the future of a society, studies about them are important. Therefore, the subject of this study is children's literature. Literature is an art form in which human emotions, imagination, thoughts, and experiences are richly and beautifully expressed through language and writing. Children's literature, as a branch of literature, refers to works written in accordance with children's age and developmental characteristics. Just as in the world, children's literature in Kurdish society began with oral literature, and for a long time, no concrete works were produced for them after the transition to written forms. Following the enlightenment brought about by the Renaissance, children were recognized as individuals, and content began to be produced for them. This movement gradually spread worldwide and, albeit late, reached Kurdish society. Kurdish writers and poets began to create content for children in various media, with some of these media being magazines. This study discusses a magazine (Nûbihar Magazine) that has made significant contributions to Kurdish children's literature and the content prepared for children within it. The study is limited to the section of Nûbihar Magazine prepared for children. To provide readers with background information on the magazine, detailed information is given about Nûbihar Magazine, which has continued its publication in the Kurmanji dialect of Kurdish since 1992. After discussing the magazine's inception, purpose, content, and authors, the study moves on to the section prepared for children. It provides a detailed account of the types of writings and illustrations published for Kurdish children in the magazine. Content analysis was used to determine which content was prepared for children. Through this method, the issues of Nûbihar Magazine from 1992 to 2010 were examined one by one, and the content was analyzed. Although not all of the published writings and illustrations were formatted to be pedagogically suitable for children, the magazine was found to possess rich content in terms of children's literature. Numerous writings and illustrations, including tales, fables, stories, poems, cartoons, memoirs, letters, and proverbs, were published in the magazine. In addition to analyzing and commenting on these contents, information about when and by whom they were published is presented in tables in this study. Ultimately, it was observed that those who prepared the children's section aimed to inform them in their native language about religious, moral, national, and cultural topics, to educate and entertain them according to Kurdish traditions and customs. Through this study, it has been determined that the magazine makes a significant contribution to Kurdish children's literature. By analyzing this written data containing Kurdish children's literature, an effort was made to contribute to the field, taking a small step in this direction. It is hoped that this study will draw the attention of new generations to the field of children's literature and encourage further studies on the subject.

# Li Gor Pîvanên Edebîyata Zarokan Nirxandina Çîrokên Çetoyê Zêdo yên ji bo Zarokan Çetoyê Zêdo'ya Ait Çocuk Öykülerinin Çocuk Edebiyatı Ölçütleri Çerçevesinde Değerlendirilmesi

Evaluation of Çetoyê Zêdo Children's Stories According to Children's Literature Criteria

Aydın MERAL

<b>Aydın MERAL</b>	Ministry of National Education (MEB), Independent Researcher, Mardin-Türkiye.
<b>Jêgir Citation Atf</b>	Meral, A. (2024). Li Gor Pîvanên Edebîyata Zarokan Nirxandina Çîrokên Çetoyê Zêdo yên ji bo Zarokan. <i>Artuklu Kurdology</i> (18). 65-82 DOI: 10.35859/artuklukurdology.1572904.
<b>Dîroka Şandinê Submission Date Geliş tarihi</b>	24.09.2024
<b>Dîroka Qebûlê Acceptance Date Kabul Tarihi</b>	23.12.2024
<b>Dîroka Weşandinê Publication Date Yayın tarihi</b>	30.01.2025
<b>Cureyê Gotarê Article Type Makale Türü</b>	<b>Gotara vekolinê</b> Research article Araştırma makalesi
<b>Hakemî Peer-Review Hakemlik</b>	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk Ethical Statement Etik Beyanı</b>	<b>Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
<b>Kontrola İntihalê Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü</b>	<b>Belê – iThenticate</b> <i>Yes – iThenticate</i> Evet – iThenticate
<b>Nakokiyên Berjewendiyên Conflicts of Interest Çıkar Çatışması</b>	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî Grant Support Maddi Destek</b>	<b>Nivîskar beyan dike ku wî ji bo vê vekolinê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
<b>Mafê Telifê &amp; Destûr Copyright &amp; License Telif Hakkı &amp; Lisanslama</b>	<b>Nivîskar li jêr lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.
	Ev gotar ji teza lîsansa bilind ya bi navê <i>Li gor Pîvanên Edebîyata Zarokan Nirxandina Çîrokên Zarokan yên Kurmancîya Bakur</i> hatiye wergirtin û amadekirin ku tez li Zanîngeha Mardin Artukluyê li Enstîtuya Zimanên Zindî bi şêwirmendîya Doç. Dr. Kenan Subaşı hatiye amadekirin û parastin.

## KURTE

Zarok, kesayetek e ku ji hêla raman û nerînê ve ji mezinan cuda ye. Cudabûna zarokan di qonaxa bi navê zarokatîyê de bi awayekî zelal tê dîtin. Pêhesîna xwemalîbûna zarokan û pêşxistina vê xwemalîbûnê pêwîstiya herî giring ya vê qonaxê ye. Zarokên ku di vê qonaxê de bîr ferqkirin, divê ji hêla mezinan ve eleqeyêke taybet û piştgiriyê bibînin. Ev piştgirî wê bibe alîkar ku zarok hem di dema zarokatîyê û hem jî dema mezinatîyê de aram û serkeftî bibin. Di vê kontekstê de edebiyata zarokan, yek ji qadên herî sereke ye ku di hêla ramanê de sîdê dide zarokan. Berhemên ku rastî û îzafiyeta zarokan bi awayekî serkeftî di wan de hatine bikaranîn, ji bo xwînerên piçûk giring in. Di vê xebatê de çar pirtûkên çîrokên zarokan û çîroknûsîya Çetoyê Zêdo ku yek ji nivîskarê edebiyata zarokan e; ji hêla ziman, naverok, ramanê ve di çarçoveya krîterên edebiyata zarokan de hatine nirxandin. Bandora berheman ya li ser zarokan ji hêla nivîsaran ya giştî û helwesta wan di rexneyê de tîr şîrovekirin.

**Peyvên Sereke:** Zarok, edebiyata zarokan, kurdî, çîrokên zarokan, Çetoyê Zêdo.

## ÖZ

Çocuk, düşünce ve bakış açısıyla yetişkinden ayrılan bir bireydir. Çocukluk, çocuk farklılığın belirgin olarak gözlemlendiği dönemin adıdır. Çocuğun özgünlüğünün fark edilmesi ve bu özgünlüğün geliştirilmesi, çocukluk dönemi için oldukça gereklidir. Bu dönemde potansiyeli fark edilen çocuğa özel bir ilgi göstermeli ve çocuk desteklenmelidir. Bu destekleme hem çocuklukta, hem de yetişkinlikte çocuğun mutlu ve başarılı bir birey olmasına katkı sunabilir. Bu bağlamda çocuk edebiyatı, çocuğa düşünsel katkı sunabilecek alanların başında gelir. Çocuğa görelilik ve çocuk gerçekliğinin yansıtılabildiği çocuk edebiyatı ürünleri, çocuk okurlar için önem arz ederler. Bu çalışmada Kürt çocuk edebiyatı yazarlarından biri olan Çetoyê Zêdo'nun çocuk edebiyatı yazarlığı ve çocuklar için yazılmış dört öykü kitabı dil, içerik ve düşünsel yönleriyle çocuk edebiyatı çerçevesinde değerlendirilmiştir. Değerlendirmede ürünlerin çocuklar üzerindeki etkileri, metnin genel eğilimi ve bütüncül yönü yorumlanmıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Çocuk, çocuk edebiyatı, Kürtçe, çocuk öyküleri, Çetoyê Zêdo.

## ABSTRACT

Child, become different with his thought and perspective from adult. Childhood is the name of the period which you can observed differences of child clearly. Noticed the genuine of child and improve this genuine is the most necessary of this period. The child who is become noticed in this period by adult should show an private interest to this child and adults should support the child. This support can provided a happy and succesful child and olsa later when he/she become an adult give him/her the same skills. In this context children literature, one of the firstly area to give children intellectual contribute. The writing of child which reflected the reality and relativism of child has an important stage for child. At this study, one of the Kurdish children's literature author Çetoyê Zêdo is examined from his four children story books and his authorship from tongue, content, intellectual within of children literature standard. In assessment commented the effect of writing on child, the common tendency of text and holistic way.

**Keywords:** Child, children's literature, Kurdish, stories of child, Çetoyê Zêdo.

## Destpêk

### Zarok û Edebîyata Zarokan û Pêwîstîyên Berhemên Zarokan

Zarok û zarokatî ji hêla civaknasî û psîkolojiyê ve bêjeyeke nûjen e. Agahîyên li ser zarokan di demên modern de hin bi hin zêde bûn û zarok û zarokatî hat naskirin. Kesayet, taybetî, rastî û îzafiyeta zarokan bi saya xebat û lêkolînan derkete pêş. Zarok beriya van xebat û lêkolînan ji hêla laşî ve wek kesên biçûk dihatin hesabandin û nasîn. Dema ku agahîyên li ser zarokan zêde bûn êdî zarok derketin darî çavan û xebat li ser wan hatin kirin. Şirin qonaxên zarokatîyê bi du alîyan dide nasîn:

Du qonaxên zarokatîyê hene. Ya yekem zarokatîya kevneşopî, ya duyem zarokatîya modern e. Tesewura zarokatîya modern, utopyaya herî pedagojîk ya Ronasansê ye. Li gorî Erîksonê psiko-dîroknas û herweha dîroknasê civakê; zarokatî bi tevgerê çandî derketîye holê û bi pêş ve çûye. Li gorî ramana Postman ji zarokatîya nû ew e ku cudabûna zarokatî û mezînbûnê hin bi hin kêm dibe. (2012, r. 12).

Guherîna têgiha zarokê, bi dema xwe re têkildar e. Bûyerên çandî û civakî bandorê li ser zarokan jî dikin û mîna tiştên din zarok û zarokatîyê jî diguherin. Şirin, bi awayekî giştî vê mijarê tîne ziman.

Di bûyerên civakî de guherînên ku tên serê mirovan, di civakê de guherînên mezintir bi xwe re tînin. Zarokatîya ku berê tenê weke temenekî dihat dîtin, piştî Ronasansê di nav civakê de bû asteke ramanî û pêleke derûnnasîyê. Vê guherînê, nêrîna li ser zarokan jî bi xwe re anî. Bi piranî jî di serdema modern de ev zarokatî geş bû û veguhezî kesayeteke serbixwe. Serbixwebûna edebiyata zarokan naveroka berhemên jî nûjên kir. Mijarên ji bo zarokan bi nirx û pirs-girêkên wan di naverokê de cih girt. Guherîna edebiyata zarokan ya di bin bandora Ronasansê de ji mijar, leheng, nêrîn, naverok û zimanê berhemên zarokan re astên nûjen ava kir. Di Ronasansê de ji ber ku têgiha zarokê guherî, amûrên edebiyata zarokan jî guherî.

Naverok, armanc û afirandina pirtûkên zarokan xwedî taybetmendîyan e û ev taybetmendî di nivîsandin û amadekirina berhemên zarokan de divê li ber çavan bên girtin. Têgiha edebiyata zarokan kêr zêde xwedî çarçoveyekê ye. Sînorên vê têgihê carinan ji hin hêlan ve xwedî cudahiyan be jî, bi hin unsûran hatiye girêdan û Dilidüzgûn vê wiha tîne ziman:

Edebîyata zarokan ji serdema berî dibistanê heta serdema kamilbûnê dewam dike. Bi gotineke di pirtûkeke ku armanca wê gihaştina girseyeke temenên wan di navbera 4-12an de be û ji hêla nivîskî û ramanî ve ji van kesan re guncav be, mirov dikare bêje ku ev pirtûk pirtûka edebîyata zarokan e. Pirtûkeke ku armanca wê ev kom be, divê ji hêla fêmkirin, ziman, îmaj û pêwendiyên perwerdeyê ve zarokên van deman li ber çavan bigire. (2007, r. 18, 88).

Her temeneke zarokatîyê xwedîyê taybetmendîyên xwe ye. Ji ber vê sedemê, pirtûkên ku ji bo van serdeman tên amadekirin divê van taybetmendîyên qada edebiyata zarokan bişopînin û ji hêla naverok, ziman, leheng, honak û derûniyê ve têkûz bin. Aliyekî kêr, ji bo zarokan kêmasîyê derdixe holê û ji nêrîna zarokatîyê re dibe pirs-girêk.

Naverokeke balkêş û herikbar ji bo zarokan sedemeke xwendinê ye. Bingeha vê ji kesayeta zarokan tê. Zarok jî bi piranî di temenên biçûk de der û dora xwe kifş dikin û her bûyera ku diqewime bi baldariyê mezîniyê dişopînin. Nivîskarên ku ji bo zarokan dinivîsin dema ku naveroka berhemên xwe ava dikin heke bikaribin di vê astê de ava bikin, mimkûn e ku berhemên wan ji hêla zarokan ve pir bên xwendin.

Perwerdekirina zarokan, bi salan e yek ji mijarên herî sereke ye. Şert û mercên diguherin, pêwîstîya guherînê ya naverok û şewazê ya perwerdeya zarokan jî bi xwe ra tîne. Meral wiha balê dikişîne ser perwerdekirin û bandora wê ya li ser zarokan:

Nîvendên di jîyanê de bi pîralî û pirhejmar in. Ji bo haydarbûn û watedarkirina wan nîvandan divê zarok bi vê hişmendî û şewazê bîn perwerdekirin. Ji ber ku ancax zarokê bi vî alî ve bê perwerdekirin dikare vê pîralîbûnê bibîne û peyamên li der û dora xwe fêmkirî û bersivên di cih de bide (2016, r. 54).

Perwerdeyê baş dikare zarokan ji gelek alîyan ve geş bike û taybetmendiyên wan xurt bike. Bêguman perwerdeya ku hêza xwe ji edebiyata zarokan digire, zarokan ji hêla raman û ziman ve bêhtir bi pêş ve dibe.

Zarok û zarokatî bi yek pênaseyê nikarin bîn naskirin. Zarok û zarokatî ji çand, dîrok, têkiliya civakî û heta carinan ji kesayeta zarokê bi xwe jî cudahiyan derdixin holê. Carinan kesayeta zarokan bi rêyê serbixwe ve diçe û zarok ji hêlên cuda ve xwe diafirîne. Di vê astê de edebîyata zarokan divê taybetmendiyên zarokan li ber çavan bigire. Razber û şênberîya, aliyên pêwîst û peywendîya ku zarok tê de ye ji bo naverok, ziman û afirandina lehengên berhemên zarokan nîşaneyên sereke ne.

Taybetmendîya edebîyata zarokan bi naskirina zarokan ve têkildar e. Armanc divê di serî de bê zelalkirin û pêvajoya xwendinê piştî vê astê dest pê bike. Di dawiyê de çî tê xwestin û çî guherîn divê çêbe, piştî ku ev armanc hat zelalkirin êdî pêvajoya xwendinê ji bo zarokan dikare dest pê bike. Pêvajoya ku hat zelalkirin, rêya helwesta pirtûkên zarokan jî diyar dike. Heartling bi awayekî zelal pêwîstîya berhemên edebîyata zarokan tîne ziman û nivîsîna pirtûkên serkeftî yên ji bo zarokan bi du şertan ve girê dide:

Şertê yekem, divê pirtûk ji hêla zarokan ve bê fêmkirin û zimanê wê poetîk bimîne; şertê duyem jî, her çiqas zehmet be jî, divê pirtûk ji zarokan re bibêje ku bê ka mirov çawa bi hev re dijîn û ji bo hevdu dikarin çî bikin. Heartling dibêje ez ji pirtûkên ku jîyanê xweş didin xuyakirin bêhtir, li pirtûkên piçûk yên utopyaya civakî digirim (Şirin, 2000, r. 56).

Bi tena serê xwe naverok an jî ziman ne bes e. Her du divê heta astekê serkeftî bin. Bingeha pirtûkên zarokan yek jê jî divê ev be ku zarokan ji hêla civakî ve amade bike û pêkanîyên wan derxe holê. Di vê rewşê de divê zimanekî estetîk, naverokeke xurt û hevokên herikbar nîşanî zarokan bê dayîn. Leheng û mijarên ku di hişê zarokan de neyên qebûlkirin nikarin serkeftinê bi dest bixin. Herwiha bingeha edebîyata zarokan divê li ser erênîyê jî ava bibe. Her çiqas mijar û bûyerên xetere dikarin bîn bikaranîn jî, di encamê de divê zarok bi hêvî bimînin û bandora xerab û xerabîyê ji ser xwe biavêjin. Bi naverokên li ser başîyê û tevgerên afirîner zarok dikarin ji xwe re ramanên baş biafirînin.

Qada edebîyata zarokan hin bi hin xwe kifş kirîye ku ev bêguman ji naskirina zarokan tê. Qada ku zarok nas kir; naverok, ziman û mijarên xwe jî li gor zarokan saz dike. Yalçın û Aytaş vê mijarê wisa şirove dikin:

Di demên berê de têgehên weke “edebîyata zarokan” an jî “edebîyata zarokatîyê” zêde bal nedikişand. Bi piranî beşên ku bala zarokan dikişandin ji berhemên mezinan dihatin hilbijartin û ev rewş wek başîyekê dihatê dîtin. Di wan beşan de bi piranî giranî didan fêrkirinê (2011, r. 14).

Lukens jî ramanên xwe bi vî şiklî tîne ziman: Di edebîyata zarokan de honak ne weke yên demên berê ne. Honak di demên berê de bi awayekî hêsan û bi rêya mijarên sade dihat sazkirin lê neha bûyerên girift, cihên cuda, lehengên guherbar û peyamên nehînkê di nav honakan de hene (2018, r. 24).

Berî her tiştî nêrîna li ser edebîyata zarokan bi demê re hatîye guhertin. Fikra ku edebîyata zarokan karekî zarokatîyê ye êdî ji holê rabûye. Edebîyata zarokan ji gelek hêlan ve pisporîyê dixwaze û naverok divê bi awayekî zanistî bîn nivîsandin. Asta derûnî û zimanê zarokan divê li ber çavan be ku berhem sûdê bide zarokan û wan ji bo jîyana derveyî amade bike. Herweha taybetmendiyên wan xurt bike.



Zimanê berhemên zarokan yek ji xalên herî giring e. Zimanê di edebîyata zarokan de tê bikaranîn ne zimanê mîna edebîyata gelemperî ye. Zimanê berhemên zarokan divê di asta zarokan ya zimanî û ramanî de be. Divê hevok û bêje di asta zarokan de bîn afirandin û berhem di van çarçoveyan de bîn sazkin. Taybetmendiyên zarokan van pêwîstiyên jî bi xwe re tîne. Lukens jî balê dikêşe ser vê mijarê û der barê mijara divê ziman çawa be de wiha dibêje:

Di demekê de dihat gotin ku pirtûkên bi vegêrê yekem tînan nivîsandin ji hêla zarokên piçûk ve xwedî pirsgirêk in; ji ber ku zarok di şopandina honakê de astengiyê dikşînin, lê di demên nêzik de ev hat guhertin û di gelek berhemên de êdî ev rêbaz (vegêrê yekem) tê bikaranîn. Di van çîrokên de divê rê vebe ku dengê vegêrên ciwan ji aliyên zarokan ve hêsantir bîn fêmkirin. Ev çîrok divê bi piranî li cihên nasyar derbas bibin û zarok bi lehengan re bikarin têkilîyê ava bikin (2018, r. 198).

Afirandina lehengên edebîyata zarokan bi temen û asta psikolojîya zarokan ve girêdayî ye. Armanca giştî ya pirtûka zarokan, sînorên taybetmendiyên lehengên qadê jî diyar dike. Karakter, tevger û gotinên lehengên berhemên rasterast li ser zarokan bandorê dikin, ji ber vê yekê divê leheng bi hişmendî bîn afirandin. Yek ji amûrên pirtûkan jî leheng in û leheng di pirtûkên qada edebîyata zarokan de xwedî hesasiyeteke ne. Nivîskar divê bi zarokan bide xuyakirin ku leheng ji der û dora xwe hêzê distîne û di nav rewşê de diguhere. Sever jî balê dikêşe ser vê mijarê: “Serkeftina honaka nivîskar bi danîşandina guhertina lehengan ve girêdayî ye. Lehengên ku piştî gelek bûyeran naguherin yan jî xwedî guhertineke bêbingeh in di nêrîna zarokan de cih nagirin” (2013, r. 130).

Pirtûk her çiqas tişteki honakî be jî divê taybetmendiyên jîyanê jî di xwe de bihewîne. Tiştên ku tevger û çûn û hatin tê de hebin bêhtir bala zarokan dikşînin. Heman tişt jî bo lehengan e jî. Lehengên ku bi tevger in û bi saya naverokê tînan guhertin ji bo balkişandîna guncavtir in. Bûyerên li der û dora zarokan diqewimin jî bi tevger û guherbar in.

Zarok çanda rexnekirinê dikare ji pirtûkên serkeftî hilbigire. Dema ku pirtûk xwedî alîyekî rexneyî û pîralî be, zarok dikare jî vê sûdê bigire. Ji bilî lehengan çanda rexnekirinê jî ji bo zarokan giring e ku zarok dikarin vê çandê ji pirtûkên serkeftî hîn bibin. Subaşi tîne ziman ku endîşeya yekem a otorîteriyê perwerdekirina zarokan e û wiha dibêje: “Xetereya mezin jî bêyî ku bi awayekî rexneyî bifikire, xwînerek her tiştê ku dixwîne weke rastiyê qebûl bike û li gorî wê hereket bike ku ev jî bi temamî hizra afirîner û rexneyê dikuje û teqlîdê ava dike” (2021, r. 226).

Zarok, xwedî hiş û aqlê afirîner in. Hestên nû, bûyerên nû, nêrînen nû ji bo zarokan tiştên sereke û pêwîst in. Zarok, jîyana xwe li ser van tiştan ava dikin û kesayeta xwe diafirînin. Lê gava ku nivîskar li dijî van taybetmendiyên alî bigire û naverokê bi awayekî “mezînatî” biafirîne, berhema xwe ji rastî û îzafiyeta zarokan dûr dixê. Zarok, berê xwe didin aliyên nûjen û zindî, ne yên rasterast ji jîyanê û şîretkar.

### Çîroknivîsîya Zarokan di Kurmancîya Bakur de

Rewşa çîrokên edebîyata zarokan ya bakur, bêguman bi pêvajoyên siyasî, civakî û perwerdehiyê ve girêdayî ye. Alozi û guherînen pîralî û bêçareserî, aqûbeta kurmancîya bakur jî bi xwe re dorpêç kirîye. Ligel vê rewşa giran xebatên bo çîroknivîsîya kurmancîya bakur, hin xebatên sereke hatine kirin. Destpêka vê qadê ya yekemîn li derveyî bakur e. Kesên mîna Mîr Bedirxan, Cegerxwîn, Osman Sebrî û Zinarê Xamo li derveyî bakur, fabl û çîrokên kurdî yên ji bo zarokan nivîsandine û çapkirine. Dema ku li bakur şert û mercên li ser kurdî ewle dibin, hem rêjeya nivîskaran û hem jî ya berhemên zarokan

zêde dibe.

Xebatên nivîskî yên li ser edebîyata zarokan ya kurdî, di salên ewil de gavên biçûk in, lê paşê ev gav her ku diçin mezin dibin. Mînak berhema Cegerxwîn a bi navê “Cîm û Gulperî” (1947) ya ku ji bo keç û xortan wek diyarî hatiye nivîsandin berhemeke balkêş e ku Tosun wiha dibêje;

Cîm û Gulperî bi hevoka “çîroka min ji we re xweş” ve qedîya ye jî, ji bo edebîyata zarokan a kurdî dikare wek nimuneyek bê nîşandan. Koma Karên Çandî ya Enstituya Kurdî ya Parisê destnîşan dike ku Cegerxwîn ev pirtûk di sala 1948an de çap kirîye, lê ji ber ku ev pirtûk êdî dest nakeve, wan di sala 1978an de li Berlînê ji nû ve çapkirine (2018, r. 149)

Berhema Cîm û Gulperî her çiqas bo keç û xortên kurd mîna diyarîyek bê danasîn jî ev berhem ji naverokê û pêwîstiyên din ve ne ji bo zarokan e. Armanca nivîskar ev e ku hişmendîyekê çêbike û kurdî geş bike. Kovara Hawarê ya ku xwedî naverokeke pir dewlemend e, ji aliyê edebîyata zarokan ve jî xwedî hin nirxan e ku Tosunê mijarên edebiyata zarokan a di kovarê de wiha destnîşan kiriye:

Fablên Osman Sebrî hinek di kovara Ronahîyê de hatine weşandin. Wek mînak di hejmara 5emîn de “Çîroka Dîk û Rovî”, di hejmara 6an de “Şêr û Kêvroşk”, di hejmara 7an de “Daweta Kêzê”, di hejmara 8an de “Mih û Şêr û Gur” di hejmara 9an de “Ker û Heft Gur”, di hejmara 12an de “Gurê Pîr”, di hejmara 13an de “Kerê Dengbêj” hatine weşandin. Ji bilî Osman Sebrî, hin nivîskar û helbestvanên din jî di kovara Hawarê de ji bo zarokan helbest, çîrok û fabl nivîsandine. Wek mînak, Mihemed Emîn Botî fableke bi navê “Çûk û Fil” di kovara Hawarê de nivîsandîye. Celadet Bedirxan kitêba Bryan Guinness ya bi navê “Conî û Cimêma” ya ku ji çîrokên zarokan pêk tê, ji frensî wergerandîye kurdî (1943). Bedirxan di hejmara 20an a Ronahîyê de behsa vê kitêbê dike û dibêje xwendevan dikarin ji Kitêbxana Hawarê vê kitêbê peyda bikin (2018, r. 149).

Kovara Hawar û Ronahî, di kurdî de gavake binirx avêtîye û zimanê kurdî ji gelek hêlan ve pêş xistîye. Nivîskarên mîna Celadet Bedirxan, Kamiran Bedirxan û Osman Sebrî di van kovaran de ji bo edebîyata zarokan berhemên sereke afirandine û ji şopînerên xwe re rêyek vekirine. Sal bi sal qada edebîyata zarokan ji hêla kesên eleqedar û berhemên ku tînan afirandin ve xwe pêşve dibe û ev qad geş dibe. Tosun nivîskarên ku di vê qadê de li bakur ked û berhem dane wiha rêz dike;

Di salên dawî de jî (2014) antolojîyeke çîrokên a bi navê “Hebû Tûnebû Antolojîya Çîrokên Zarokan” ya Zinarê Xamo ji hêla Weşanxaneya Rûpelê ve hatiye weşandin. Zinarê Xamo, Murad Ciwan, Mahmûd Lewendî, Mahmut Baksî, Kemal Burkay, Haluk Öztürk, Firat Cewerî, Mehmet Emîn Bozaslan ên ku li Tirkîyeyê koçî Swêdê kirine û li wir cih bûne ji bo zarokan helbest, fabl, çîrok û pirtûk nivîsandine. Van rewşenbîran ji bilî berhemnivîsandinê, wergerê, kovar derxistine û pirtûkên ku di dibistanan de zimanê kurdî hînî zarokan dikin, amade kirine. (2018, r. 149).

Serdema yekem ekola Hawarê ye, serdema duyem jî ekola kesên li dîyaspora ye. Ev navên qala wan tê kirin, dikarin wek nivîskarên serdema duyem bînan nirxandin. Xebatên van kesan her çiqas carinan dûrî asta zarokan bin jî, ji hêla ziman û pêşxistina edebiyata zarokan ya kurdî ve roleke giring dilîzin. Piştî serdema duyem, di salên dawî de jî xebatên li ser edebiyata zarokan ya kurdî kesên ku berheman diafirînin zêde dibin. Tosun van navan wiha bi rêz dike:

Xwedîyê Weşanxaneya Hîvayê Mem Bawer di hevpeyvîneke xwe de navê van nivîskaran wiha rêz dike: “Bêrî Bihar, Îsmail Dîndar, Yağob Tilermenî, Mîran Janbar, Berfîn Ayşe Öğüt, Mahmûd Nêşite, Mûrad Dildar, Şukran Çaçan, Hasîp Yanîç, Ferîdûn Bîrgul, Seyhan Karakoç, Berfîn Îde Demîral, Yasemîn Elban, Amed Tîgrîs, Mahmûd Lewendî, Kerem Tekoglu, Janya Acar, Amed Gernas, Jîr Dilovan, Yunis Bahram, Yehya Elewîferd, Konê Reş, Aynur Özbay, Benûşe Elewîferd, Rustem Felat, Roza Metîna, Hîva Yüce ve Mem Bawer (2018, r. 150).

Gavên bo vê qadê hatine avêtin, ji şopînerên qadê re prototîpên xwe ava kirine. Hejmara

kesan û berheman girêdayî şertan zêde dibe. Qada edebîyata zarokan bi zêdebûna xwendekaran wê geştir bibe. Ji bo ku nirx û kûrbûna qadê zêde bibe divê astengiyên li ser ziman rabin. Çetoyê Zêdo jî nivîskarekî ji bakur e, mijara vê lêkolînê jî çar çîrokên wî ne ku em ê behsa wan bikin.

### 1. Çetoyê Zêdo<sup>1</sup> û Çîroknivîsiya Wî ya ji bo Zarokan

Çetoyê Zêdo<sup>1</sup>, yek ji nivîskarên edebiyata zarokan ê bakur e û bi piranî çîrokan dinivîse. Armanca vê lêkolînê jî ev e ku berhemên nivîskar ên ji bo zarokan hatine nivîsîn bîn nirxandin û li ser wan şirove bîn kirin. Çetoyê Zêdo, di vê gotarê de bi çar çîrokan cih digire. Zêdo, di çîrokên xwe de xwedî zimanekî ironîk û herikbar e. Mijarên mîna azadî, hevaltî, wêrebûn, xweza, pîrsgirêkên di demên zarokatîyê de di çîrokên xwe de bi kar tîne. Zêdo pêwîstiyên qada edebîyata zarokan di hevpeyvîna xwe de wiha tîne ziman:

Nivîskar divê pîvanan bizane, lê dîsa jî divê xwe bi pîvanên mekanîk ve girê nede. Bi giştî divê xwedî poetikayê xwerû û bi estetîkekê ve girêdayî be. Hay ji xwe û zarok û ziman û civaka xwe hebe... Nivîskar bizane ji kê re, kîjan temenî re an xwe li kê û çawa digire û dinivîse. Bijartina mijar û vegotina çîrokê, ziman û şêweyê fambar û balkêş, baldarîya pedagojîyê... (2024).

Ziman û ramanên zarokan di qonaxa zarokatîyê de xwedî alîyekî serbixwe ne. Ziman û honaka edebîyata zarokan divê van serbixweyîyan rast bibîne û bibihîze. Amûrên ku jî jîyan û nêzî jîyanê hatin bidestxistin, bi zimanekî estetîk û di nav çarçoveya rastî û îzafiyeta zarokan de tê bikaranîn. Temen û taybetmendiyên zarokan jî xalên sereke ne ku nivîskar di nivîsandina berhemê de divê vê li ber çavan bigire. Zêdo, bingeha nivîskarîya xwe wiha tîne ziman:

Ez zarok bûm, pişt re bûm mezinekî di nav zarokan de. Weke mamoste 20 sal, weke bav pênc sal, weke lêgerîna zarokîya xwe min jî weke gelek kesên ji bo zarokîya xwe li kurmancî û hunerê girtîye, nizanîm ev jî min çiqasî dixê nav zarokîyê... Dixwînim û carinan ji min bê dinivîsim (2024).

Nivîskarîya edebîyata zarokan amûr, naverok û zimanê xwe dikare ji hûrgilîyên dema zarokatîyê û tecrubeyên dema mezinatîyê bigire. Jîyana rastî, bi rêbazên nivîsê û zimanekî guncan dikare ji bo edebîyata zarokan bibe naverokên serkeftî. Serpêhatiyên zarokatîyê yên derûnî, civakî û kesayetî nimûneyên binirx didin qada edebîyata zarokan. Guherîna asta edebîyata zarokan li gor Zêdo wiha ye:

Zarokîya îro û ya do çû carî ne weke hev in. Di vê serdeya mê de her tişt bi lez û bez diguhere, edebîyat jî ji sînorê xwe yê berê ber bi digîtalbûne ve diçe. Lê berhem her çî be "lîstîk" ew ê her bi zarokan re hebe, çî weke dîtbarî çî weke berê bi nivîskî... Mirov nikare "wêjeya buhurî" li ser zarokan ferz bike. Weke mezinekî mirov dikare li ser geşedan û bîrbirina zarokan, wan bi berhemên "resen û baldar"ê binase ew ê bikêrhatî be (2024).

1 Di hevpeyvîna me ya bi Çetoyê Zêdo re wî xwe bi vî şiklî da nasîn: Çetoyê Zêdo (Çetin Erol) di sala 1981ê de li Mêrdînê ji dayîk bû. Di 2004an de, Zanîngeha Wanê beşa Mamostetîya Zimanê Tirkî û di 2012an de Zanîngeha Stenbolê beşa Dramatûrjîyê qedand. Wekî dramatûrg di ÎBŞT û di hin şanoyên Kurdî de xebitî. Derhênerîya şanoyên "Şengê û Pengê" û "Bêlome" û "Zargotin"ê kir. Berhemên wî yên ku heta neha çap bûne: Şengê û Pengê (Şanoname, Weşanên Filîto, 2014) Siltanê Filan (Şanoname, Weşanên Şaredarîya Amedê, 2015). Ji Soranî, romana Ferhad Pîrbal, 7 Wênay Rûtî Jinî Cenabî Wezîr adapteyî kurmancî kir. (Avesta, 2014). Bi Yavuz Akkuzu re Dîroka Şanoya Kurmancî (Peywend, 2015) û Kürt Tiyatro Tarihi (Evrensel, 2016) amade kir. Ji nav weşanên Nûbiharê "Daweta Noko û Nîskê", "Du Legleg Zozan û Gernas" (2019), "Ejderhayê Tirsonêk", "Gurê Kubar" (2021), "Şêrê Bitenê", "Çûkê Bilûrvan", "Du Çîrok û Nameyek" (2024) hatin çapkirin (Zêdo, 2024).

Dînamîkên jîyanê, naverok û şeweya edebîyatê diguherîne. Bi taybetî jî edebîyata zarokan ji qadên din bi payeke bêtir vê guherîna dijîn. Ev, ji taybetmendîbûna zarokan tê. Zarok ji bûyer û guherînan der û dora xwe karakterên bêhtir hesas in. Di demên modern de guherînan di perwerde, teknoloji û civakê de rasterast li ser jîyana zarokan bandor kirîye. Ji ber van sedeman, afirandina berhemên zarokan divê van guherînan li ber çavan bigire.

“What is the use of a book without pictures or conversations?” Camêr Lewis Carroll vê pirsê 150 sal berê bi ‘Alice’ dide” gotin: Pirtûkeke bêyî wêne û diyalogan bi kêrî çî tê?” (Zêdo, 2024). Mijar û bûyerên di edebîyata zarokan de her çiqas balkêş bin jî, şewê û amûrên din yê di berhemê de carinan karên giring digirin ser milên xwe. Li gorî temenê xwîneran wêne û herikandina ziman, bala li ser berhemê diguherîne. Nivîsên bi diyalog çalakîya di naveroka berhemê de xurt dike û ev derfetê dide ku zarok bi kêfxweşî nivîsan bixwînin. Zêdo, kistasa nirxa berhemên zarokan bi rexneya zarokan ve girê dide û wiha dibêje:

Zarok rexnegirên herî bêqûsûr in, ew bêyî hesabekê li ser mijarekê an bûyerekê çî hîs bikin wê yekê dibêjin. Loma divê zarok bibêjin ka çiqasî ji wê berhemê hez kirine an na? Çî hîskirine, çawa dîtine, çawa nirxandine... Em weke mezinan çî didin wan, ew çî hîs dikin. Xulase ew ê di kurmançî de ew ê kêmîr bin (2024).

Nêrîna nivîskar, nêrîna bi çavên zarokan e. Zarok li hemberî naveroka berhemên hest û ramanên xwe bi awayekî bêsansur dikarin ji derve re bibêjin. Mezin divê vê derfetê bidine zarokan da ku xwînerên binirx û rexneyên xurt di qada xwendinê de derkevin. Zarok ji ber temenê xwe dikarin azad û bêsinor bifikirin. Heke mirov bixwaze serkeftîbûna berhemên edebîyata zarokan fêhm bike, divê çav bide wan ku krîter zarok in an na. Divê ev, di çarçoveya pîvanên edebîyata zarokan de bê nirxandin.

## 2. Nirxandina Çîrokên

Di gotarê de analîza belgeyî ji rêbazên lêkolîna wesfî hatîye bikaranîn. Di pêvajoya amadekirina vê gotarê de pirtûk, gotar û xebatên akademîk yê di qada edebîyata zarokan de bi awayekî berfireh hatin lêkolînkirin û xwendin. Piştî berhemên ku hatine hilbijartin bi pîvanên edebîyata zarokan a ku diyarkirî hatine analîzkirin. Me nirxandina bêje û dirêjahîya hevokên çîrokên Çetoyê Zêdo, li gorî rêbaza Wezaretê Perwerdeyê ya Tirkîyeyê û li gorî formulasyona Dale-Chall pêk anî. Formulasyona Dale-Chall nivîsan li gorî bêjeyên nenasyar û dirêjahîya hevokan ji hêla hejmara bêjeyên di hevokan de analîz dike. Bi tena serê xwe ev analîz agahîyeke berfireh nade. Agahîyên bîn bidestxistin ji hêla guncavbûna zimanê nivîsê ve agahîyan dide. Ji ber vê sedemê dema ku analîz bîn kirin divê rêjeyên din jî bîn bikaranîn. Yek jî pîvanên dirêjahîya hevokan hejmara bêjeyên di hevokê de ne:

Li gorî pîvanên lêkolîn û nirxandina pirtûkan ya Lijneya Talîm û Terbîyeyê ya wezaretê me dirêjahîya hevokan nirxand ku divê di pola yekem a dibistana seretayî de hevokek herî zêde 6-7 peyv, di pola duyem de 8-9 peyv, di pola sêyem de 10 peyv, di pola çarem de 12 peyv, di pola pêncem de jî 14 peyv be (Gülyüz, 2013, r. 269).

Di edebîyata zarokan de peyvên di berhemên de divê bi awayekî hişmendî bîn bikaranîn. Xwînerên piçûk dema ku berhem xwendin divê alozîyên ji hêla peyvên ve nekişînin. Peyv, divê li gorî asta zarokan bin. Pîvanên din yê ji hêla zimên vê rêjeya peyvên nenasyar ev in:

Li gorî formûla Dale – Chall, sed peyvên pêşî yê nivîsê tê wergirtin û tê de hejmara hevokan û peyvên zehmet û nenasyar (peyvên ku bo zarokan di asteke jor de bin) têne kifşkirin. Dirêjahîya hevokê wiha tê kifşkirin: Hejmara peyvên li hejmara hevokan tê parvekirin û paşê encam tê diyarkirin. Rêjeya peyvên nenasyar jî wiha tê kifşkirin: hejmara peyvên nenasyar li hejmara peyvên mayînan tê par kirin û paşê bi 100î tê carkirin. Encam çî be, rêje ew e (Çetinkaya, 2010, r. 57).

## Aydın MERAL

Li Gor Pîvanên Edebîyata Zarokan Nirxandina Çîrokên Çetoyê Zêdo yên ji bo Zarokan

Çîrokên ku xebat li ser wan tê kirin ji hêla vegêr, leheng, zincîra rûdanê, dem û mekan, rastî û îzafiyeta zarokan ve dê bîn rexnekirin. Alozi, naverok, peyam û ramanên di çîrokan de bi rêbazên edebîyata zarokan ve di bin çend sernavan de hatin tesnîfkirin û rexne dê li gor van pîvanan bîn analîzkirin.

Analîzkirina ji hêla ji ziman ve bi rêya pîvana Dale-Chall pêk tê. Bi saya vê rêjeya nenasyariyê dikare bê tasnîfkirin û astên bêjeyan bîn zelalkirin.

Di vê çarçoveyê de, astên peyvên nenasyar hatine tasnîfkirin. Ev rêje nîşan didin ku di kîjan temenî de zarok dikarin di kîjan rêjeyê de ji naverokê bêyî pirsgirêk fêhm bikin.

Rêjeya Peyvên Nenasyar di Xwendinê de	Asta Xwendinê	Asta Perwerdeyê	Temen
4,9	Asta 1em	Dibistana Seretayî	5-10 Salî
	Asta 2yem		
	Asta 3yem		
	Asta 4em		
5,0-5,9	Asta 5em	Dibistana Navîn û Amadehîyê	10-12 Salî
	Asta 6em		
6,0-6,9	Asta 7em		12-14 Salî
	Asta 8em		
7,0-7,9	Asta 9em	Lîse	14-16 Salî
	Asta 10em		
8,0-8,9	Asta 11em	Zanîngeh	16-18 Salî
	Asta 12em		
9,0-9,9	Asta 13em	Piştî Zanîngehê	18-22 Salî
	Asta 14em		
10+	Asta 15em û jortir		22+

## 2.1. Gurê Kubar

### 2.1.1. Kurteya Çîrokê

Gurê Kubar/Gurgîn, gurek e. Dema ku kesek çêliyeke wî di nav berfê de dibîne, wî rizgar dike û paşê wî radestî hevalekî xwe yê beytar dike ku wî baş bike. Beytar piştî tedawîyan Gurgîn wî radestî şaredarîyê dike da ku gur berdî xwezayê. Lê şaredarî gur radestî baxçeyê ajalan dike. Gurê çêlik li ber destên mirovan mezin dibe. Gur, her çiqas di nav şertên xweş de be jî, ji fikra azadîyê haydar e û dest bi planên revê dike. Rojekê gur ji baxçeyê ajalan ên ku tê de ye dişînin baxçeyekî din. Di rê de qefesa wî ji maşînê dikeve û Gurgîn rizgar dibe. Gurgîn pir birçî ye û dixwaze zikê xwe têr bike. Ji bo taştê diçe ba beranekî, ji bo firavîne diçe ba hespekî û ji bo şîvê jî diçe ba çêlekekê. Bi wan her sê ajalan re bûyerên balkeş tên serê Gurgîn û di dawîyê de hin ramanan ji wan bûyeran derdixe û diçe ba koma guran.

### 2.1.2. Pîvera Dirêjahîya Hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b):  $(a)/(b) = 100/12 = 8,33$

Çîrok li gorî dirêjbûna hevokan ji bo xwînerên temenê wan 8 û yên ji vê mezintir guncan e. Zarokên di van temenan de dikarin bi awayekî hêsan hevokên vê çîrokê bixwînin.

### 2.1.3. Pîvera Peyvên Nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmara Peyvên Nasyar(b)]\*100 =  $(1/99)*100 = 1,01$

Çîrok ji hêla bêjeyên ku hatine bikaranîn ve ji bo hemû xwînerên ku temenê wan şeş û ji vê jortir guncan e û xwîner dikarin naverokê û peyamên naverokê bi hêsanî fêhm bikin.

### 2.1.4. Guncanbûna Ziman û Vegotinê

Ziman û vegotina çîrokê dûrî peyamên bişîret, îmaj û wateyên veşartî ne. Nivîskar zimanekî herikbar hîlbijartîye û bi awayekî zelal honaka xwe saz kirîye. Hevokên ku dirêjahîya wan îdeal û bêjeyên nenasyar ji bo xwînerên ku temenê wan piçûk (şeş salî û jortir) derfetê dide ku çîrok bi hêsanî bê xwendin û fêmkirin. Bi saya lehengên ku ajal in –yê sereke gurekî çêlik e- monologên navxweyî, rastî û îzafiyeta zarokan bi awayekî serkeftî di ziman û vegotinê de hatîye avakirin. Naveroka zelal, fêmkirina çîrokê zêde dike.

### 2.1.5. Rexneya Lehengan

Leheng ji mirov û ajalan pêk tên. Bi vî alî ve dikare bê gotin ku ev çîrok xwedî taybetmendiyên fabl û çîrvanokan e. Ev her du alî, taybetmendî û tevgerên xwe yê jîyana xwe di çîrokê de pêşkeş dikin. Armancên mirov û ajalan di naverokê de hin bi hin xwe didin xuyakirin. Her du alî jî xwedî peyameke zelal û xuyakirî ne û imajeke rastîya jîyanê didin xuyakirin. Leheng, di nav guherînan de ne û ev lebat bi awayekî serkeftî dikare baldarîya xwîneran bikişîne ser xwe. Li gorî vê çarçoveyê lehengên çîrokê serkeftî hatine afirandin û li gorî nirxên edebîyata zarokan guncan û serkeftî ne.

### 2.1.6. Dîyardeyên ku Hatine Bidestxistin û Rexnekirina Çîrokê

Çîrok, rastîya ajalên bindest yê di baxçeyên ajalan de dihevine. Vê pîrgirêke bi awayekî pisporî tîne ziman û xwe naxe nava naverok û vegotinê. Ev serkeftîbûn xwe di honak, ziman û vegotinê de jî dide xuyakirin û berhemê bi naverokeke rexnegir pêşkêşî xwîneran dike. Rastî û îzafiyeta zarokan xwe di nêrîn û dîmenan de dide xuyakirin û peyama xwe digihêjîne xwîneran. Vegotin û zimanê sade ji bo



hemû asta xwîneran guncanbûna xwendinê û fêmkirineke hêsan pêşkêş dike. Leheng –Gurgîn- roj bi roj sînoren jîyana xwe ferq dike û dixwaze azad bibe. Ji ber ku hin bi hin taybetmendiyên ajaltiyê fêm dike, difikire ku jîyana wî divê ne wisa be.

### 2.1.7. Rexneya Giştî û Babeta Çîrokê û Rastî û Îzafiyeta Zarokan di Çîrokê de

Berhemên serkeftî yê edebîyata zarokan ji bilî ziman û vegotinê, divê xwedî rastî û îzafiyetên zarokan jî bin. Ev rastî û îzafiyet, divê xwedî nêrîn û ramanên zarokan bin. Divê zarokan fêm bikin û wan bidin fêmkirin. Bi awayekî bêşîret û bêtundî divê peyama xwe bigihînin zarokan û vê jî bi zimanekî guncan saz bikin. Çîroka Gurê Kubar xwedî van taybetmendîyan e. Ziman, vegotin û mijareke giring bi awayekî pisporî tê hûnandin û pêşkêşî xwîneran dibe. Gurgîn dema ku azad dibe jîyanê hin bi hin nas dike û xwe adapteyî jîyana xwezayî dike. Gur, kesayetiya xwe nas dike û fêm dike ku divê ku ew xwe ji nû ve biafirîne. Di vê çarçoveyê de gur/leheng/Gurgîn mimkûn e ji zarokan re bibe mînak ku ew jî di jîyanê de xwe nas bikin û pirsgirêkên xwe çareser bikin.

## 2.2. Zozan û Gernas

### 2.2.1. Kurtiya Çîrokê

Zozan û Gernas, du leglegên heval in û jîyana xwe parve dikin. Her du legleg jî dema hê çêlik bûne maka wan miriye û ew bi tena serê xwe mezin bûne. Her du legleg di dema koçberîya demsalê de li rastî hev tîn û dibin heval. Hevaltîya wan dibe evîndarî. Zozan û Gernas, ji bo ku ji xwe re hêlînekê bibînin li gelek deveran digerin. Ji ber ku sar e, nikarin berê xwe bidine Serhedê, lewma li dora Heskîf, Çinar û Qerejdaxê digerin. Ji ber ku li Heskîfê bendav bilind dibe, berê xwe didin Çinarê. Gernas ji zimanê mirovan fêm dike û dibîne ku şivanekî baş heye û alîkarîyê dide leglegan. Şivan, ji wan re li ser zinarekî hêlînekê ava dike. Zozan, hêkên xwe li vir dike û çêlikên wan çêdibin. Îcar Gernas û Zozan bi malbateke aram û kêfxweş re dijîn.

### 2.2.2. Pîvera Dirêjahîya Hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b):  $(a)/(b) = 100/11 = 9,09$

Çîrok, ji hêla dirêjbûna hevokan ve ji bo zarokên ku temenê wan di navbera neh-dehan de ne guncan e. Zarokên ji van temenan piçûktir ihtîmal heye ku carinan di şopandina hevokan de rastî pirsgirêkan bîn.

### 2.2.3. Pîvera Peyvên Nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmara Peyvên Nasyar (b)]\*100 =  $(1/99) * 100 = 1,01$

Ev hejmara ji bo peyvên nenasyar ji bo xwînerên ku temenê wan şeş salî û jortir e guncanbûna çîrokê nîşan dide. Ev rewş derfetê dide xwîneran ku naverokê bi awayekî hêsan û herikbar bixwînin û jê fêm bikin.

### 2.2.4. Guncanbûna Ziman û Vegotinê

Ziman, li gor asta naverokê û girseya ku çîrok ji wan re tê hûnandin pir guncan û sade ye. Bêjeyên ku hatine bikaranîn bêjeyên rojane ne û nêzî jîyana zarokên xwîner in. Vegotin jî di vê hêlê de alîkarîyê dide xwendin û fêmkirinê. Îmaj, naverok, peyamên rasterast û yê veşartî bi saya vê vegotina herikbar û sade bi awayekî zelal xwe dide der.



### 2.2.5. Rexneya Lehengan

Leheng ji mirov û ajalan pêk tên. Çîrok taybetmendiyên fabl û çîrvanokan dihewîne. Lehengên sereke du leglegên hevalên hev in. Çîrok li gor nêrîna leglegan hatiye hûnandin. Ev ajal, çavdêrî û şiroveyên xwe ji bo mirov û xwezayê tînin ziman. Çîrok, bi saya keda van her du lehengan xwe digihîjîne mirovekî şivan û di naverokê de atmosfereke erênî tê sazîkirin. Ev taybetmendîya çîrokê bi saya vê koma lehengan tê afirandin û ev ji bo xwîneran raman û hestên erênî diafirîne. Dikare bê gotin ku ji bo edebîyata zarokan mîna keke serkeftî ye. Serkeftîbûna wê ji têkoşîna lehengan tê. Leheng, bo astengiyên jîyanê li ber xwe didin û bi serdikevin.

### 2.2.6. Dîyardeyên ku Hatine Bidestxistin û Rexnekirina Çîrokê

Pîştgirî, têkilîya baş ya di navbera mirov, ajal û xwezayê de peyama vê çîrokê ya sereke ye. Ev pîralîbûn bi saya vegotin û zimanê herikbar xwe bêhtir dide xuyakirin û fêmkirina çîrokê ji hêla xwendekaran ve hêsantir dibe. Xweza, mirov û ajal di jîyanê de heyberên pir giring in û nivîskar ev heyber bi honakeke serkeftî bi mijarê ve girê daye. Vegotin û naveroka bi pîştgirîyeke yekpar hatine avakirin, berhemê ji zarokan re yan jî ji xwînerên pîralî re guncan dîkin. Nihêrîn, rastî û îzafiyeta zarokan bi çavên lehengên sereke tê binyadkirin û çîrok tê asta berhemên zarokan.

### 2.2.7. Rexneya Giştî û Babeta Çîrokê û Rastî û Îzafiyeta Zarokan di Çîrokê de

Çîrok, ji hêla naverok û vegotinê ve xwedî astên nezi hev in. Navrok mijara pîştgirîya mirov û ajalan bi awayekî zelal dide xuyakirin û vê bi saya zimanekî hêsan li dar dixê. Her çiqas carinan hevokên dirêj hebin jî, ev rewş ji fêmkirina naverokê re pîrgirêkê dernaxe. Vegotin, pêşîya nêrîna zarokan ya li hemberî dinyaya derveyî vedike û derfetê dide ku xwînerên piçûk jî ji peyama naverokê fêm bikin. Çîrok, ji bo xwînerên piçûk ji van hêlên ku tên binavkirin ve guncan e.

## 2.3. Daweta Noko û Nîskê

### 2.3.1. Kurtiya Çîrokê

Dîk, mirîşk, qaz, werdek, çûk û gur lehengên vê çîrokê ne. Noko û Nîskê dizewicin û dawetnameyekê ji Diklan Axa (Dîk) re dişînin. Dîk û hevalên wî dema ku diçine dawetê di rê da gur pêşîya wan digire û wan daveje kîsê xwe, lê çûk direve. Çûk, alîkarîyê ji hevalên xwe yê çûk dixwaze. Çûk tên û ajalan ji destên gur rizgar dîkin. Ajal di nav kêfxweşiyê de diçine dawet û şahîyê.

### 2.3.2. Pîvera Dirêjahîya Hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b):  $(a)/(b) = 100/11 = 9,09$

Çîrok ji hêla dirêjahîyê ve ji bo zarokên temenê wan neh-deh e guncan e. Zarokên ji van temenan piçûktir mimkûn e ku di şopandina çîrokê de zehmetiyê bikişînin.

### 2.3.3. Pîvera Peyvên Nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)]\*100 =  $(3/97) = 3,09$

Çîrok, ji hêla peyvên nenasyar ve ji bo zarokên di temenê şeş salî û jortir de guncan e. Zarok, di dema xwendinê de zêde rastî peyvên nenasyar nayên û bi xwendineke herikbar dikarin çîrokê bixwînin.

### 2.3.4. Guncanbûna Ziman û Vegotinê

Çîrok, xwedî zimanekî sade û herikbar e. Bi taybetî zarokên neh-deh salî bi her awayî dikarin berhemê bi hêsanî bixwînin û jê fêhm bikin. Ziman, naverok û peyama çîrokê bi zelalî derdixe pêş. Bi rêya dubarekirina hin beşan ji ziman bêhtir tê hezkirin û xwendin zindîtir dibe. Vegotin, li gorî dîyalektîka zarokan hatîye sazîkirin. Zimanê îronîk û nêzî zûgotinokan armonîyekê saz dike û ev ji bo zarokan erênî ye.

### 2.3.5. Rexneya Lehengan

Leheng ji ajalan pêk tên û bi vî awayî çîrok dikeve şeweya fablan. Ajal bi rêya kesayetkirin û axivandinê bûne karakterên çîrokê. Naverok bi rastîya xwezayê ve tê hûnandin û bi awayekî honakî tevger û têkoşîna di navbera ajalan de xuya dike. Ji ber vê yekê, naverok bi saya lehengan xurt û bi hêz dibe. Naverokên wisa yên bi liv û tevger bala zarokan bêhtir dikişînin.

### 2.3.6. Dîyardeyên ku Hatine Bidestxistin û Rexnekirina Çîrokê

Çîrok, ji hêla ziman, naverok û lehengan ve têkûz e. Afîrandina naverokê û hûnandina ziman serkeftî ye û ji bo zarokan guncan e. Zarok, bi awayekî hêsan dikarin ji vê naverokê fêhm bikin û keyfê jê bistînin. Li gor hevokazîyê carinan hevokên dirêj hene ku tenê ji zarokên neh-deh salî re guncan in, lê bi giştî çîrok ji aliyê taybetmendiyên edebîyata zarokan ve biserketî ye.

### 2.3.7. Rexneya Giştî û Babeta Çîrokê û Rastî û Îzafiyeta Zarokan di Çîrokê de

Him nêrîn, him jî ziman û bûyerên ku di honakê de hatine afirandin, li gorî rastî û îzafiyeta zarokan e. Di ziman de rêbaza dubarekirinê tê bikaranîn û ev xwendina zarokan hêsan dike. Naverok jî li gorî hiş û ramanê zarokan hatiye hûnandin ku dengên nava serê zarokan û herikbarîya hevokan nêzî hev in. Ev rêbaz, fêmkirina zarokan pirtir dike û xwîner bi hêzeke zindîtir çîrokê dixwînin.

## 2.4. Ejderhayê Tirsonek

### 2.4.1. Kurteya Çîrokê

Ejderhayê piçûk dest bi dibistanê dike, li wir Mamûyê Piçûk nas dike û dibin heval. Bi hev re demên xweş derbas dikin û hevaltîya wan xurttir dibe. Piştî ku dibistan bi dawî dibe, ew jî ji hev dûr dikevin. Dê û bavê ejderê piçûk dixwazin zarokê xwe hînî firîne bikin, ji ber vê qeyda wî li qursa firîne çêdikin, lê mixabin bi ser nakevin. Rojê ejder pir xemgîn e û rêya daristanê digire da ku here ba hevalê xwe Mamû. Her çiqas ejderhayê piçûk ji tenêbûnê ditirsîya jî bi tena serê xwe derkete rê. Ji ber ku taybetmendîyeke ejderê piçûk ya bêhnaskirinê heye, ew li pey bêhna hevalê xwe Mamû diçe. Dema ku nêzîk dibe, dibîne ku dînozoran herêma mamûyan dorpêç kirine û dixwazin wan têk bibin û herêma wan ji wan bistînin. Ejderha bi agirê xwe erîşî dînozoran dike û wan dipekin. Piştî demeke kin dînozor dîsa erîş dikin, lê Ejderhayê Piçûk dîsa wan têk dibe û mamûyan rizgar dike. Di vê navberê de malbata ejder jî hatîye herêmê. Her du malbat dibine dost û bi kêfxweşîyekê dijîn.

### 2.4.2. Pîvera Dirêjahîya Hevokan

Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b):  $(a)/(b) = 100/10 = 10$

Çîrok ji hêla dirêjahîya hevokan ve ji zarokên neh salî re guncan e. Zarokên ji vî temenî piçûktir mimkûn e ku di şopandina hevokên dirêj de zehmetiyê bikişînin.

### 2.4.3. Pîvera Peyvên Nenasyar

[Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvên Nasyar(b)]\*100= (4/96)\*100=4,16

Çîrok ji hêla hejmara peyvên nenasyar ve xwedî asteke guncan e û xwînerên di temenên şeş salî û jortir de dikarin bi awayekî hêsan vê naverokê fêmbikin.

### 2.4.4. Guncanbûna Ziman û Vegotinê

Zimanê çîrokê zimanekî sade û herikbar e. Xwînerên di hemû temenan de dikarin ji naverokê fêmbikin û bigihîjin peyama û gotinên ku nivîskar dixwaze bîne ziman. Hestên lehengan bi awayekî serkeftî xuya dike. Xwîner dikarin naverokê bi hêsanî fêmbikin. Vegotina sade fersendê dide ku xwînerên piçûk, ji xwendinê kêfê bistînin.

### 2.4.5. Rexneya Lehengan

Hemû leheng ji ajalên ku nişên wan qelîya ne pêk tên. Sedema vê ew e ku nivîskar dixwaze ev mijar di hişê xwîneran de cî bigire. Ajalên ku ji mamû, ejderha û dînozoran pêk tên carinan di nav dijminatîyê de bin jî, bi piranî bi hev du re dost û hogir in. Hin leheng hê piçûk in û jiyanê bi saya kesên malbata xwe nas dikin. Ev ji zarokan re dibe mînak ku ew pîrs û tîrsên serê xwe bikaribin bi xwe çareser bikin. Leheng, di asta ku zarok ji wan fêmbikin û sûd bigirin de hatine afirandin û serkeftî ne.

### 2.4.6. Dîyardeyên ku Hatine Bidestxistin û Rexnekirina Çîrokê

Çîrok ji hêla ziman ve pir sade û herikbar e. Xwînerên piçûk dikarin bi hêsanî ji bêjeyan fêmbikin û bigihîjin peyama naverokê. Carinan hevokên dirêj hebin jî, ev bi rêya guncanbûna bêjeyên sade dikare bê têkberin û xwînerên piçûk dikarin peyama fêmbikin. Vegotin bi nêrîna zarokan ve girêdayî ye û çavdêriya zarokan di naverokê de cih girtîye. Nivîskar ev frekansa ziman, nêrîn û derûniya zarokan di çîrokê de bi kar anîye.

### 2.4.7. Rexneya Giştî û Babeta Çîrokê û Rastî û Îzafiyeta Zarokan di Çîrokê de

Çîrok ji hêla amûrên mîna ziman û naverokê ve xwedî nêrîn, rastî û îzafiyeta zarokan e. Nivîskar di vegotinê de çav daye van pêwîstîyên sereke û çîroka xwe li gorî vê saz kirîye. Hevaltî, dostanî, alîkarî, piştgirî û carinan jî dijminatî bi awayekî tematîk bi kar anîye. Ev mijar, di jîyana zarokan de tiştên sereke û girîng in. Nivîskar li gel van mijaran, mijarên wek cîsnên ber bi qelandinê ve ne, kêmarî û ajalan jî di naverokê de di hûne û van bi awayekî giştî dixwe nava nivîsarê. Ev peyamên ku bi zimanekî sade hatine îfadekirin bo zarokan mijarên sereke ne û pêwîst in ku zarok wan bixwînin.

### Encam

Edebîyata zarokan a kurdî ya her ku diçe tora xwe fireh dike bû mijara me jî û di vê xebatê de me li ser beşeke wê lêkolîn kir. Me 4 **çîrokên Çetoyê Zêdo** nirxandin. Encam, hem ji hêla naverokê hem jî ji hêla zimanê **çîrokan** ve nirxandinên wisa nîşanî me dide:

Çîrokên Çetoyê Zêdo, ji hêla ziman û naverokê ve di qada edebiyata zarokan de serkeftî ne. Çîrok ji hêla dirêjahîya hevokan ve ji bo zarokên ku temenê wan heşt-neh, ji hêla bêjeyên nenasyarî ve jî, ji bo xwînerên temenê wan şeş salî û jortir guncan in. Her çiqas di nava her du qadan de cudabûn hebe jî, zimanê çîrokan pir sade û hêsan in. Xwînerên piçûk bê pîrsgirêk dikarin çîrokan bixwînin û naveroka wan fêmbikin. Weke ku Zêdo di hevpeyvînê de tîne ziman, çîrokên wî xwedî diyalog û zimanekî îronîk in. Ew rewş rê dide ku xwîner ji xwendina van çîrokan kêfê bistînin. Bêjeyên çandî, zimanê xwedî armonî û herikbar taybetmendiyên zimanê Zêdo ne.

Naveroka çîrokên Zêdo, bi lehengên guherînbar û bûyerên balkêş ve xwedî ramanên afirîner in. Çîrok ji mijarên mîna parastina xwezayê, têkilîya mirov û ajalan, daxwaza azadiyê û alozîyên ku leheng wan dijîn pêk tên. Xwîner dema çîrokan dixwînin, haya wan ji naverokê çêdibe di nav demê de gav bi gav peyamên wan fêm dikin û ji xwe re fikir u ramanan ava dikin. Pirsgirêkên ku bi saya lehengên ajal tên qalkirin, pirsgirêkên di jîyana mirovan de ne jî. Ev pirsgirêk bi zimanekî îronîk tên nivîsandin. Xwîner, bi rêya honakê dikarin di hişên xwe de pirsan bikin. Leheng bi saya hişmendîya xwe ji alozîyan rizgar dibin û ev hêza naverokê ya li ser xwîneran zêde dike. Herwiha Zêdo, di çîrokên xwe de navên mekanên rastî (Mêrdîn, Amed, Heskîf...) bi kar tîne û ev bo erdnîgarîya kurmancî jî hişmendîyekê çêdike. Mijarên mîna Bendava Heskîfê û ajalên ku tovên wan qelîyane bi awayekî serkeftî tên qalkirin. Ev mijarên xwezayî bi awayekî bêşîretkar tên honakkirin.

Çîrokên ku di gotarê de hatin nirxandin li gor pîvanên edebiyata zarokan xwedî asteke binirx in. Çîrokên hilbijartî ji hêla pedagojîyê ve ji bo zarokan dikarin ramanên erênî biafirînin. Mijarên alozî yên di naverokê de cî digirin, bi rêya hevaltî, têkoşerî, alîkarî û hwd tên çareserkirin. Ev rêbaz ji bo zarokan başî û pêşveçûne geş dike. Zimanê hemû çîrokan herikbar û hêsan e. Hevokên zêde nêdirêj xwendinê bo zarokan hêsan dike ku ew dikarin bi vî zimanî naverokê fêm bikin û bigihîjin fikr û ramanên çîrokan.

### Çavkanî/References

- Çetinkaya, G. (2010). *Türkçe metinlerin okunabilirlik düzeylerinin tanımlanması ve sınıflandırılması*. Yayınlanmamış Doktora Tezi. Ankara Üniversitesi.
- Dilidüzgün, S. (2007). *Çağdaş çocuk yazını*. Morpa Kültür Yayınları.
- Güleryüz, H. (2013). *Yaratıcı çocuk edebiyatı*. Edge Akademi.
- Lukens R. J. & Smith J. J. & Coffel C. M. (2018). *Çocuk edebiyatına eleştirel bir bakış*. Erdem Yayınları.
- Meral, A. (2016). *Ömer seyyidînin öykülerinin çocuk edebiyatı ölçütleri açısından değerlendirilmesi*. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. Çanakkale Onsekiz Mart Üniversitesi. Eğitim Bilimleri Enstitüsü. Türkçe Eğitimi Ana Bilim Dalı.
- Sever, S. (2013). *Çocuk edebiyatı ve okuma kültürü*. Tudem Yayınları.
- Subaşı, K. (2021). Nirxandina helbestên zarokan ên kurdî li gorî rastîya zarokan û îzafiyeta zarokan. *Mukaddime*. 12 (1), r. 220-248.
- Şirin, M. R. (2000). *Çocuk edebiyatı kültürü*. Kök Yayıncılık.
- Şirin, M. R. (2012). *Dersimiz çocuk*. İz Yayıncılık.
- Tosun, T. (2018). Edebîyata zarokan a kurdî li bakur. *Humanities Journal of University of Zakho (HJUOZ)*. 6. (1). r. 147- 154.
- Yalçın, A. & Aytas G. (2011). *Çocuk edebiyatı*. Akçağ Yayınları.
- Zêdo, Ç. (2024). Hevpeyîna nivîskî ya bi rêya emailê.

### EXTENDED ABSTRACT

This article purpose to do assessment children's stories of Çetoyê Zêdo who is a Kurdish children stories author. The main purpose of article that is find out of suitable or not stories for children. The stories assessment including assessment of characters, rhetorically, language, pedagogy and context. At the conclusion of article, we could understanding a general framework about these stories. There is a cavity at the area of Kurdish children stories of North Kurdish children literature assessment. Hence, that first aim of this article is make a study on this area to find out positivities and negativities.



The article has two main part. One of them reading the sources academic book about children literature. In this first part, bases of area of children literature criterions has find out from books which has been reading. At the second part, context of Çetoyê Zêdo's stories are assessment in view of bases of criteria of children literature. The article include four children stories. Assessment of these four stories will give us about their suitable for children readers. For many time, there were some studies about Kurdish children stories books has made but There was not very big and deeply. So that, this article wants to do a deeply study on this area.

The main of this study is that to find children stories book of Çetoyê Zêdo's are suitable or not for children readers. The sort of study is conceptual and applied. Firstly for the conceptual part academic referenses has been readen and after stories has been applied to commented. Çetoyê Zêdo who is a well know children stoeis book auther athor at Kurdish and because of this his books has been selected as a sample. Academic referenses has been readen and the criteria of children literature has been found. And than the stories of Zêdo has been commented with these criterias. At the article has been used quantitative and qualitative method. The result of these method has been commented.

At the article has those conclusions and results: Stories of Zêdo has staible context, language, pedagogy and creative fiction. The author uses a basic language for children readers. The language of stories so simple and children can understand them easily. Sentences are short and word in the stories are simple. Author, know the child pedagogy and he use this information in his context.



Pêvek





**Cîhana Lêkolînên Edebiyata Zarokan a ku Her Diçe Berfirehtir Dibe****The Expanding World of Children's Literature**

Peter HUNT

<b>Peter HUNT</b>	Peter Hunt, ORCID:0000-0003-0967-3300   Honorary Professor of English and Children's Literature, Cardiff University, United Kingdom
<b>Wergêran: Dilan Tayçur</b>	Dilan Tayçur, ORCID: 0009-0009-2664-955  dilantaycurr@gmail.com, Mardin Artuklu University, Kurdish Language and Culture Department, Graduate Student, Mardin-Turkey
<b>Jêgir</b> Citation Atf	Peter, Hunt (2025). Cîhana Lêkolînên Edebiyata Zarokan a ku Her Diçe Berfirehtir Dibe. Wer. Dilan Tayçur. <i>Artuklu Kurdology</i> (18). 83-96
<b>Dîroka Şandinê</b> Submission Date Geliş tarihi	23.09.2024
<b>Dîroka Qebûlê</b> Acceptance Date Kabul Tarihi	09.12.2024
<b>Dîroka Weşandinê</b> Publication Date Yayın tarihi	30.01.2025
<b>Cureyê Gotarê</b> Article Type Makale Türü	<b>Gotara Wergerê</b> Translation article Çeviri makalesi
<b>Hakemî</b> Peer-Review Hakemlik	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk</b> Ethical Statement Etik Beyanı	<b>Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
<b>Kontrola Întihalê</b> Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	<b>Belê – iThenticate</b> <i>Yes – iThenticate</i> Evet – iThenticate
<b>Nakokiyên Berjewendiyan</b> Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti alîyên din nakokîya berjewendîyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî</b> Grant Support Maddî Destek	<b>Nivîskar beyan dike ku wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
<b>Mafê Telifê &amp; Destûr</b> Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	<b>Nivîskar li jêr lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

Baş e, teoriya edebî bi kêrî çî tê? Ma ew ê strîna zarokên me temîn bike? Belkî na. Lê derheqê teoriya edebî de hinek têngîhiştin dê îmkânê bide me ku em fam bikin ka edebîyata em pêşkêşî zarokên xwe dikin, çawan karîger e. Di heman demê de bi saya wê, dibe ku em bi metnên li dora xwe ra têngîliyê saz bikin û weku xwînerên ciwan ên metnan, berdewamî li strînê bikin, her çend ew stran ji yên ku em dibêjin mezintir (mature) bin jî. Heya ku em strînê bidomînin, şanseki me heye ku em ruhê xwe yê stranbêjiyê bigihînin kesên ku em hîn dikin (McGillis, 1996, r. 206).

### Edebiyata Zarokan

“Edebiyata zarokan” weku qadeke lêkolînê ya dilkêş xuya dike; ji ber ku pirtûkên zarokan bi giranî bala gûrûyên rewşenbîr û çandî nekişandiye; ji “mecbûriyet”ên weku “em divê derheqê wan de çî bifikirin, çî bibêjin” (xuya ye ku) bi bextewarî azad e. Herwiha ji bo gelek xwînerî, pirtûkên zarokan meseleyeke zewqên şexsî ye û ew jî dibe ku bê vê watayê, belkî ew edebiyata rastîn e – lê heke ew “edebiyat” jî tekstên wisa pêk bê ku bala xwîneran bikişîne, wan biguherîne û di xwîner da bertekên bihêz pêk bîne.

Lê heke zewqa şexsî, ji bo lêkolînê sedemeke nemaqûl xuya dike, wê demê em dikarin li ser bandora pirtûkên zarokan a rasterast an jî nerasterast û ya civakî, çandî û dîrokî bifikirin. Ew ji hêla perwerdehî û ticarî ve bi awayekî eşkere giring in -encamên wan ên li seranserê çandê, ji ziman bigire heya siyasetê: piraniya mezinan û bêguman hema hema piraniya kesên di pozîsyona hêz û bandorê de ne, di zarokatîyê de pirtûkên zarokan dixwînin û ne mimkûn e ku îdeolojîyên di hundurê wan pirtûkan de ti bandorê li ser pêşketina wan nekiribe.

Lê dîsa jî pirtûk hatin marjînalîzekirin. Axirî zarokatî rewşeke wisa ye ku em jê dûr dikevin; lê pirtûkên zarokan -ji nivîsînê heya weşanê û heya înteraksiyona wan a bi zarokan ra- qada wê grûba ku ji hêla çandê ve hatiye marjînalîzekirin, ango ya jinan e.

Lê ev marjînalîzebûn xwediyê hin avantajan e; ji ber ku ji aliyê çandî ve weku profileke-nizm hatiye dîtin, “edebiyata zarokan” nebûye “milkê” ti kom an jî dîsîplînekê: ne “aîdê” Beşa Edebiyatê ne aîdê Pirtûkxane û Dibistanan ne jî rêxistinên lokal/teng yên dê û bavan e. Ew ji bo xwendekarên (fermî an nefermî) edebiyatê, perwerdeyê, lêkolînên pirtûkxaneyê, dîrokê, psikolojîyê, hunerê, çanda populer, medyayê, pişeyên lînerîna zarokan û hwd. balkêş e û her nêrîneke pispor dikare bi rêya xwe nêzî vê qadê bibe. Xwezaya wê, him wekî komeke metnan û him jî wekî mijareke ji bo lêkolînê, şikandina barîyerên di navbera dîsîplînan û yên di navbera cureyên xwîneran de ye. Û wekî komeke metnan him yek ji hunerên herî zindî û orjînal e û him jî cîhê îstîsmara ticarî ya herî xav e. Ev tê wê watayê; çawa ku pirtûkên zarokan di valahiyê de çênin (xwînerên wan ên jidil, rexnegir û bikaranînan wan ên xuyayî, pratîkî û xwedî encam hene), loma teoriya edebiyata zarokan jî di anîna cem hev ya pirtûk û xwîneran de her tim xwedî rol e.

Encama vê ya hinekî nearam (an jî pir bi îlham) ev e ku divê em qebûl bikin pirtûkên zarokan kompleks/têkelhev in û lêkolîna wan bêsînor cihêreng e. Gelek xwendekarên li çaraliyê cihanê yên ku bi dersên edebiyata zarokan ên ji her astî ve eleqedar dibin bi lez dibînin ku tişt gelekî tevlihevtir in ji ya ku wan texmîn dikir. “Ew pirtûka zarokan e, tişt nabe”, “Zarok dê wê ferq nekin” yan “Hûn wê zehmettir dikin, divê ne wisa be.” Hejmara mamosteyên edebiyata zarokan yên ku rastî gotinên wiha nehatibin, kêman in. Lê ev tevlihevî, ne tenê problematîzekirinên ji hêla wan akademîsyenan e ku dixwazin bilêtên xwarina xwe ewle bikin; herwiha kiriyara ragihandinê ya herî zelal, bi awayekî ecêb tevlihev e -û em li vir bi pirsên bingeîn yên ragihandinê û têngîhiştina di navbera mezin û zarokan de, yan jî ya rasttir, bi ya navbera takekesan re mijûl dibin.

Ger edebiyata zarokan ji ya ku xuya dike tevlihevtir e, belkî ya pirtir tevlihev pozîsyona wê ya di navbera nivîskarên mezin, xwîner, rexnegir û pratîzeker û xwînerên zarok de ye. Edebiyata zarokan

xaleke diyar e ku teorî tê de rastî jiyana rast tê, ku em neçar dibin van bipirsin: em dikarin li ser pirtûkekê çi bibêjin, çima divê em bibêjin, em dikarin çawa bibêjin û tiştê ku em dibêjin dê çi bandorê bike? Em herwiha neçar dibin ku bi pêşdarazên xwe re rû bi rû bimînin. Gelek kes wê înkâr dikin ku ew ketine bin tesîra xwendina xwe ya di zarokatiyê de (“min xyz di zarokatiya xwe de xwend û ti zirara wê negihîşt min”) û dîsa jî dibe ku ev heman kes bin ku qebûl dikin zarokatî di jîyana me de qonaxeke giring e (ew yek hema hema weku gerdûnî tê pejirandin) û zarok dilnazik in, hesas in û divê ji manipulasyonê bîst parastin. Edebiyata zarokan giring e -lê dîsa jî ne giring e.

Di encamê de, berî ku em dest bi kişkirina daristana aloz a bi navê “edebiyata zarokan” bikin, divê em hin têgeh, raman û rêbazên bingehîn saz bikin: li ser argumanên bingehîn bixebitin, kîjan teknîkên rexneyê, kîjan rabêj û kîjan stratejî ji bo mijara me guncav in -an jî yekta ne- diyar bikin. Dikare bê nîqaşkirin ku em dikarin (û divê) ji amûrên giring ên teorîk û analîtîk yê ji hemû dîsîplînan ji felsefeyê bigire heya psikoterapiyê sûd wergerin; an jî divê em teorî û pratîkeke rexneyî ya li gorî hewcedariyên teqez yê “edebiyata zarokan” bi pêş bixin.

Ev pirtûk, ku gotarên sereke ji çapa duyemîn a *International Companion Encyclopedia of Children's Literature* (Ansîklopediya Navneteweyî ya Edebiyata Zarokan) hildibijêre; teoriya bingehîn ji bo hemû serpêhatiya “edebiyata zarokan” peyda dike, xetên sereke yê hin nêzikatiyên pratîkî destnîşan dike, qadên lêkolînê pêşniyaz dike û çavkaniyên nûjen pêşkêş dike da ku xwîner rêya xwe ya kesane û guncav bibîne.<sup>1</sup>

### Edebiyat û Zarok

Hemû nivîskarên vê pirtûkê di baweriyêke negotî de ne ku edebiyata zarokan ji bo mezinan hêjayî xwendin, nîqaşkirin û hizirkirinê ye. Aidan Chambers motîvasyonên gelek mamoste û nivîskarên “liberal humanîst” bi kurtî wiha vegotiye:

Ez ji tradîsyona demotîk im; Ez di wê baweriyê de me ku edebiyat her tim aîdî hemû mirovên ji hemû serdeman e. Divê erzan be û mirov bikare bi hêsanî bigihêje wê. Divê xwendina wê bi kêf be lê di heman demê de dijber, berevajîker, vejîner û xemrevîn be; divê mirovan rihet bike û hemû wan taybetmendiyên din bihewîne ku em ji bo edebiyatê îdîa dikin. Di dawiyê de, ez bawer dikim ku em di edebiyatê de baştirîn derberrîna xeyala mirovî dibînin û ew amûra herî bikêr e ku rê dide me em ji heqî xwe û bi ramanên xwe yê derbarê xwe de derkevin (Chambers 1985, r. 16)

Ev bawerîya bi edebiyatê, bingeha piraniya raman û perwerdeya rojane ya derheqê zarok û pirtûkan de ye; Ew li pişt pêwendîya edebiyat û xwendewarîyê (literacy) de ye, ferq nake ku ka pirtûkên zarokan bi serê xwe bi qîmet in yan ji bo tiştên balatir (edebiyateke “mezin” an “mezinan”) kevirekî pêşveçûnê ne.

Daxuyaniya Chambers, bi awayekî zelal ne bêalî ye: ew hin îdeolojiyên eşkere (û hin jî ne ewqas eşkere) dihewîne (aspektên îdeolojiyê di Beşa 3. de tîrêxandin) û ew me li hember pîrsa “edebiyat çi ye” rûbirû dihêle. Li ser vê meseleyê, bi qasî behrekê mirekeb hatiye rijîn lê divê mirov qebûl bike peyvên rêzkirî yê li ser rûpelekê bi tena serê xwe xwedî nirxeke “edebî” nînin. Weku Jonathan Culler kurte dike, “Edebiyat ... kiriyareke axaftinê yan jî bûyereke metnî ye ku hin cure diqetan dikişîne ser xwe” (1997, r.27) -yan jî ya çêtir, hin nîrx li wê tîrêxandinê jî hêla hin endamên çandê yê ku di pozîsyona nîrxdiyarîkirinê de ne.

Di edebiyata zarokan de praktîzeker (ên bi zarok û kitêban re dixebitin û ji nuansên teorîk bêtir, xwedî xemên acîl in, dixwazin bi awayê herî basît bizanin ka çi baş e? Ev ji bo edebiyata zarokan

<sup>1</sup> Ev gotar pêşgotina wê kitêba navborî ye ku ji aliyê edîtor Peter Hunt ve hatiye nivîsîn û loma dê carinan qal û referansî hin nivîs û beşên di kitêbê da bike. (wergêr)

esas e. “Divê meriv qîmetê bide çi?” Ew pirs weku sîyekê dadikeve ser wan û gelekî dijwar dibe ku mirov gelek kesan îqna bike “ya baş” aîdî kesekî din -wan kesên “mezin”- nîne. Li derveyî akademîyê, nîqaşên li ser pirsê “çi baş e?” êdî vediguhêrin hevokên mîna “ew meseleya zewqê ye.” Lê mirov bi gelemperî li ser vê yekê hinekî nerehet in – an jî dilgiran in; qey kesek, li cîhekî, ji wan çêtir dizane ku çi “baş” e (û ne hewce ye ku ew ji vê rewşê qayîl bin) (binêre Hunt, 1997).

Encameke berbelav ya vê rewşê ew e ku mirov bi nepenî ji cureyekî pirtûkan hez dike û qîmetê didiyê; lê dema bi eşkere be tişteke din pêşniyaz dike. Pirtûkên ku di pîvana nixandina kozmîk de xwedî statuyeke nizm in (û yên ku ji hêla tîcarî ve pir serkeftî ne, bi taybetî serîya “Harry Potter”a J. K. Rowling) derveyî nixandineke cidî dimînin (binêre Hunt, 2001, r.122–4; Zipes, 2001, r. 170–89). Yên din -belkî yên “klasîk”- tînan hînkirin û destnîşankirin û derheqê wan de tê nivîsîn. Di perwerdeya seretayî û ya navîn de, ev yek dikare bibe sedema bertekeke li dijî xwendinê: heke zarok li dibistanê cureyekî pirtûkan bixwînin û li derveyî dibistanê jî cureyekî din, wê demê dibe ku hin pirtûk ji hêla wan ve weku “yên din” bînin hesibandin (binêre Beşa 11).

Ev dabeşkirin dibe sedem ku nêzîkatiyên rexneyî yên ne guncav li ser pirtûkan bînin pejirandin. Pirtûkên zarokan ji pirtûkên mezinan cuda ne: ew ji bo xwînerên cuda, yên xwedî awayên xwendinê cuda û xwedî qabîliyet û hewcedarîyên cuda hatine nivîsîn; herwiha, zarok metnan bi hin awayan tecrube dikin ku pîrî caran nikare bê tarîfkirin lê gelek ji me bawer dikin ku ew pêvajoyên pîr dewlemend û tevlihev e. Ger em pirtûkên zarokan (tevî ku em bi nezanî vê yekê bikin jî) li gorî heman pergala nixandî yên ku em ji bo pirtûkên mezinan bikar tînin, binixînin wê demê em pirsirêkên beredayî derdixin holê. Ku jixwe em pirtûkên zarokan bi yên mezinan qiyas bikin, derdikeve holê ku pirtûkên zarokan -ji ber pênasîya xwe -bêtir kêmnix in. Weku mînak, dema bê gotin ku “Judy Blume<sup>2</sup> bi qasî nivîskar Jane Austenê baş nîne” ew ne qiyaskirina du kesên hevşib e û bi vê gotinê tê ferzkirin ku Jane Austen bi awayekî zîmkarî ji nivîskara ewil jortir e. Wê demê “edebiyat”, wexta em bixwazin zarokan di nav çandê de taybet de perwerde bikin têgeheke bikêr e; lê heke em metnan bi awayên din “bi kar bînin” ew dikare xapîner an jî xirabker be.

Ger peyva “edebiyat”ê problemên eşkere derdixe holê, peyva “zarok” jî bi heman awayî muxlaq e. Têgeha zarokatiyê cih bi cih, dem bi dem diguhere û dîrok, pênasî û lêkolîna zarokatiyê weku konseptekê di van salên dawî de geş bûye bi hin pirtûkên weku *Childhood* (1996) (Zarokatî) a Chris Jenks, *A History of Childhood* (2001) (Dîrokeke Zarokatiyê) ya Colin Heywood û *Theories of Childhood* (2000) (Teorîyên Zarokatiyê) a Carol Garhart Mooney, (û li Cunningham 1995 jî binêre û bi rengekî sivik lê ne kêmtir zelal, ya Hardyment 1995). Li welatên ne-Rojavayî, tînkiliyên di navbera çîrok û çîrokbêj, mezin û zarok de ji yên li Rojavayê bi awayekî radîkal cuda ne (bo nimûne binêre Pellowski 2004). Ji ber wê jî, li ser navê zarokên îroyîn yan yên berê hikumdayîn tîra xwe zehmet e- her çend ew mezinên ku bi zarok û pirtûkan re mijûl in, meylarî (an jî mecbûrî) vê bin jî. Ev rewş bala me dikşîne ser sivikkirinê qebe yên ku di gelek metnên rexneyî de li ser xwînerên hevtemen tînan kirin: bi têgeha xwînerê “zarok” ya di edebiyata zarokan de, divê pirsirêka axaftina li ser “xwîneran” yan jî “xwînerê” taybet zelaltir be (binêre Beşa 2).

Mînaheke esas a tevliheviyên bi vî rengî di nîqaşa helbesta ji bo zarokan de tê dîtin. Bêguman tişteke wisa tuneye, eger em bihesibînin ku “helbest” weku cureyekî edebiyatê, wisa hatiye avakirin ku xwendineke taybet hewce dike –xwendineke wisa ku “zarok” (bi gelemperî wisa tê texmînkirin) nikarin pêk bînin. Neil Philip di “Destpêk”a *The New Oxford Book of Children’s Verse* (Pirtûka Nû ya Oxfordê ya Helbesta Zarokan) de awayekî bi bandor vê angaştê hildiweşîne:

Hin kes dikarin bibêjin ku têgeha helbestê ji bo zarokan bêwata ye... Lê dîsa jî kevneşopiyê helbesta zarokan ya ku tê naskirin, heye. Ya herî giring, ew kevneşopiyê têgihîştin û famkirina

2 Judith Blume nivîskareke Amerîkî ya çîrokan zarok, ciwan û mezinan e. (wergêr)

yekser e. Di helbesta zarokan ya herî baş de hesteke wisa heye ku qey dinya cara yekem e tê dîtîn û qey ji bo terîfa wê ziman ji hewayê tê komkirin... Ev bi ti awayî nayê wê watayê ku helbestên zarokan “hêsan” in. Ez ê îdia bikim ku helbesteke ku di dilê xwe de razeke nepen nahewîne, ne helbest e (Philip, 1996, r. xxv).

### Dîrok, Îdeolojî, Polîtîka

Dê heta niha diyar bibe ku him çêşîdên pirtûkên zarokan û him jî awayên lêkolîna wan pir berfireh in. Çawa ku pirtûkên zarokan beşeke ji avaniyên îdeolojîk yên çandên cihanê ne, dîroka wan jî bi awayekî îdeolojîk tê avakirin (hinek ji van mijaran di beşên 3, 4 û 8an de hatine axaftin). Du avahiyên herî eşkere yên dîrokê nêrîna Anglosentrîk û nêrîna mêran e (elbet her çend ew “nêrîn” ji stabîlîteyê dûr bin jî). Avahiyên din yên dîrokê -wek femînîst, gay, yan “zarokparêz (childist)”- li benda nivîsandinê ne, her çend di nêzikatiya yekem de bi hin pirtûkên mîna van gelek pêşketin çêbûbe jî: *Disciplines Virtue: Girls' Culture in the Eighteenth and Nineteenth Centuries* (1995) (Dîsîplînên Fezîletê: Çanda Keçikan di Sedsalên Hijdeh û Nozdehan de) ya Lynne Vallone, *Waking Sleeping Beauty: Feminist Voices in Children's Novels* (1997) (Hişyarkirina Bedewa Razayî: Dengên Femînîst di Romanên Zarokan de) ya Roberta Seelinger Trites ya evanjelîst, *The Feminine Subject in the Children's Literature* (2002) (Mijara Femînen ya di Edebiyata Zarokan de) ya Christine Wilkie-Stibbs û *Girls, Boys, Books, Toys: Gender in Children's Literature and Culture* (1999) (Keçîk, Kurik, Pirtûk, Lîstok: Zayend di Çand û Edebiyata Zarokan de) ya Lyon Clark û Margaret Higonnet (û binêr Beşa 8an).

Pirtûkên zarokan li çaraliyê cihanê xwedî dîrokeke dirêj in û hêmanên folklorîk, çîvanokî û tradîsyona devkî dikişînin nava xwe. Li gelek deveran, weku li hin parçeyên Afrîkayê, xwedî rengekî post-kolonyal in û têkiliyeke wan a nerehet bi çanda xwecihî re heye; li cihên din, ew ji hêla dewletên totalîter ve ewqas giring tînin ku marûzî sansûreke tund dimînin. Herwiha mumkîn e ku meriv li seranserê cihanê rastî mînakên bi heman rengî bê -her çend bi eşkere dijwar be ku meriv li hember nerîna berfireh a Sheila Rayê bisekine:

Di qonaxên destpêkê yên lîteratûra çapkîrî de pirtûkên taybetî ji bo zarokan çap bûne, kêma in yan jî qet tunene. Belkî çend pirtûk hene ku di sedsalên panzdeh yan şanzdehan de li welatên Ewropayê bi piranî ji bo mebestên perwerdeyê weku pirtûkên nezaketê û yên rabûn û runîştinê hatine çapkîrî; yan jî pirtûkên dersê yên di sedsala bîstan de ji bo piştevaniya mifredata dibistana fermî ya li welatên di nav geşedanê de hatine weşandin. Di vê rewşê de, zarok dema ku fêrî xwendinê dibin di heman demê de pirtûkên mezinan yên ku xîtabî wan dikin jî digirin; ew jî dibe ku xwedî sedemeke wisa be ku çapa ewil ya lîteratûrê ya di civatekê de ji çîrokên gelêrî sûd werdigire ku ew hêmanên van çîrokên gelêrî xîtabî her salî dikin. Ol jî faktoreke giring e... Hêdî hêdî çîrokên bi taybetî ji bo zarokan hatine nivîsîn, xuya dibin... [û di dawiyê de] ji bo eleqeyên curbicur û hewcedariyên taybet, telebkirina pirtûkan derdikeve holê. Yek ji pirsgerêkên ku di sedsala bîst û yekan de welatên di nav geşedanê de, pê re rûbirû dimînin ew e ku ji wan tê xwestin, di demeke kin de -herî zêde sî yan çil sal- van hemû qonaxan derbas bikin, di gel ku welatên Ewropî heman pêvajoyê di pêncsed salan de temam kiribe jî (Ray, 2004, II, r.850).

Ger edebiyata zarokan ya naskirî hewcedarî zarokatiyeke naskirî be û ger divê teqez bi mezinan re neyê parvekirin, wê demê em dikarin bibêjin ku pirtûkên zarokan yên bi zimanê îngilîzî tenê di sedsala hejdehan de, di gel weşangerên Brîtanî yên mîna Mary Cooper û John Newbery derketine. Pirtûka ewil “ya bi taybetî ji bo ciwanên Emerîkaya Bakur hatiye amadekirin”, *Spiritual Milk for Boston Babes* (Şîrê Ruhanî ji bo Pitikên Bostonê) li Londrayê di 1646an de hat çapkîrî (Griswold 2004: II, 1270); Li Hindistanê pirtûkên zarokan li Kalkutayê bi avabûna “School Book Society” ya ji hêla mîsyoneran ve di 1817an de dest pê kir (Jafa 2004: II, 1078) û pirtûka zarokan ya herî kevn ya bi zimanê Malayalam (li Keralayê tê axaftin) *Cherupathangalkku Upakaratham Kathakal* (c. 1824) çîrokên ji Îngilîzî wergerandî dihewîne. Ev serdestiya zimanê Îngilîzî dewam dike: di sala 1988an de, nivê pirtûkên zarokan yên ku li Fransayê hatin weşandin, wergerên ji îngilîzî bûn (Bouvaist 1990: 30).



(Bereksî vê, Fransa li ser pirtûkên zarokan yê Almanî xwedî tesîreke domînant bû.) Îro, trafîka di navbera Îngilîzî û zimanên din de hema hema yekalî dimîne (Hunt 2000: 107-11).

Pirtûkên herî pêşîn yê ji bo zarokan, weku ya di formulasyona Ray de, li ser materyalên çandê yan jî bi awayekî eşkere dîdaktîk bûn; edebiyata zarokan bi forma xwe ya nûjen bi giranî fenomeneke sedsala nozdehan e. Bo nimûne, di dawîya sedsala hîjdehan de li Hollendayê mezinbûneke bilez di honaka zarokan de hebû; lê li Spanyayê, tevî wergerên Grimm, Andersen û Perrault, pirtûkên zarokan ên “rastîn” heta dawîya sedsala nozdehan derneketin holê.

Ji wir şûnde, dîroka pirtûkên zarokan ya li çaralîyê cihanê, li aliyekî rageşîyên di navbera hêzên otorîter yê perwerdeyê, olê û siyasetê de nişan dide û li aliyê din jî rageşîyên di navbera têgehên cihêreng yê bi “azadîyê” re peywendîdar (bi taybetî yê bi fantazî û hêza xeyalî tîn îfadekirin) nişan dide. Lîteratûrên ku di encamê de derketin holê, têgeha zarokatiyê ya ji bo wan civakan û tîkiliya wê ya hêzê ya bi mezinan re pir zelal nişan didin. Dîrokên navdar yê bi zimanê Îngilîzî weku Avery 1994 (USA); Darton 1932/1982 (Îngîltêre); Gilderdale 1982 (Zelandaya Nû); Hunt 1995 (Îngîltêre); Saxby 1969, 1971, 1993 (Awustralya); Townsend 1965/1990 (Îngîltêre).

Dîrok, bi şiklê xwe yê avakirî, bi gelemperî nişanî me dide ku (bi awayekî eşkere) mezin dikarin hilberîna edebiyata zarokan kontrol bikin û dikin, her çend xwendina zarok xerabker be jî (binêre Beşa 6an). Sansûr, hem berî û hem jî piştî hilberandina metnan û bi gelemperî di rewşên ecêb de nifûzî pêvajoyê dike. Weku Mark West jî ferq kiriye:

Ji serê dîroka edebiyata zarokan vir ve, kesên ku hewl dane pirtûkên zarokan sansûr bikin, tevî hemû cudahiyan xwe yê îdeolojîk, di derheqê hêza pirtûkan de xwedî nêrîneke romantîk in. Ew bawer dikin yan jî îdîa dikin ku pirtûk di damezrandina nîrx û helwestên zarokan de xwedî tesîreke wisa mezin e ku divê mezin hema hema her peyva ku zarok dixwîne, bişopînin (West, 2004, II, r.689).

Sansûr îzafî ye: ger pirtûk ji sinifan werin derxistin, weku pîrî caran bûye, gelo ew parastin e yan sînordarkirin e? Gelek kiryarên herî zordar yê ku li dijî pirtûk, weşanxane, pirtûkxane û mamosteyan hatine kirin, li USAYê jî hêla organîzasyonên rastgir ve hatine kirin ku bi gelemperî bi eslê xwe xiristîyanên fundamentalîst in. Dibe ku mînakê herî navdar Educational Research Analysts (Analîstên Lêkolîna Perwerdehiyê) be, rêxistineke li Teksasê ye ku ji hêla Mel û Norma Gabler ve tê birêvebirin û metnan analîz dike, ji kampanyayên herêmî re “delîlan” peyda dike û hewl dide ku (carinan bi rêya komîteya kirîna pirtûkên dersê yê dewletê) tesîrê li weşangeran bike. Hin mînak jî bo pirtûkên ku li herêmê hatine qedexekirin *The Diary of Anne Frank* (Rojnivîska Anne Frankê), *The Wizard of Oz* (Sêrbazê Oz) û pirtûkên mezinan yê ku bi berfirehî jî hêla zarok û nûciwanan ve tîn xwendin yê weku *The Catcher in the Rye* (Zarokên li Zeviya Ceh) û bêguman pirtûkên Rowlingê yê bi navê “Harry Potter” in (West 2004: II, 686). Zarok dibe ku (an jî teqez) xwendîneke “li dijî” fikrê metnê bike (ku ew rewş, şîroveyan li ser sedem-encamê yê basît, binîqaş dike) û ev rastî nişan dide ku pirtûkên zarokan weku potansiyel berevajîker (subversive) in. Mînakeke îronîk ya hêza wan ew e ku her çend ew li Almaniyaya Nazî jî ber Gleichschaltungê bi tundî hatin kontrolkirin jî, pirtûka klasîk a Erich Kästner *Emil and the Detectives* (1929) (Emil û Detektîf) li ber destan ma di gel ku pirtûkên wî yê din jî hêla Naziyan ve hatibûn şewitandin.

Sansûr, di vê meylê de ye ku zarokan wisa pênase bike, zû bi bandor dibin û xwedî fikrên basît in, weku nimûne, di mijarên cinsî yan nijadî de heya ku hevsengî bi eşkereyî neyê gotin û nişandan nikarin nêrîneke hevseng bibînin. Pirtûkên Judy Blume, bi taybetî jî *Forever* (1975) (Îlelebed) a ku di nav pirtûkên zarokan de teswîrên yekem yê tîkiliya cinsî yê bi awayekî eşkere dihewîne, bi berfirehî hatine şermezarkirin lê jî hêla nûciwanan ve bi hejmareke mezin hatine kirîn. Hewl hatiye dayîn ku nivîskarên curbicur yê mîna jî Beatrix Potter (pisîkên tazî yê di *The Tale of Tom Kitten* de (1907) (Çîroka Tom Kitten)) bigirin heta Alan Garner (xixijoka bêpergal ya di *Tom Fobble's Day*

(1977) (Roja Tom Fobble)) sansur bikin yan jî bigirin bin tesîra xwe. Hin Pirtûk hebûn ku helwestên wan di roja xwe de ji hêla piraniyê ve dihatin qebûl kirin, lê derheqê wan de jî zehmetîyan serî rakir. Mînak, di pirtûka Hugh Lofting a bi navê *The Story of Dr Dolittle* (1922) (Çîroka Dr Dolittle) de karikatûrên nijadperest yan jî pêşdarazên seksîst yên di berhema Enid Blyton de; bi çapên xwe yê nû hatine guherandin ji ber ku Îngîltere her ku diçe pir-çandî (multicultural) û ji hêla siyasî ve rasttir (politically correct) dibe yan jî qet nebe di mijarên wisa de hesastir dibe. Çandên cuda “sansûrê” bi awayên cuda pêk tînin. Li Îngîltereyê nemaze ji hêla pirtûkfiroş û tomerîfiroşên mezin ve bi rêya bijartîyê pêk tê; li DYAyê muxalefeta rasterast û çalakîyên dengî bêtir berbelav in; li cihên din, çawa ku dewletên totalîter metnên ji hêla siyasî ve qebûlbar “hildiberandin”, civakên post-totalîter (û post-kolonyal) jî li hember efendiyên xwe yê berê bertek nîşan dane.

Wê demê, edebîyata zarokan xwedî dîrokeke xas û tesîreke mezin e lê ev yek heya van demên dawî di lêkolînên cidî yê li ser vî cureyî de xuya nebûye. Belkî jî qada ku herî zêde hatiye paşguhkirin bîbliyografya ye -dîroka pirtûkan weku pirtûk bixwe. Weku Brian Alderson dîtîye “bêguman bîbliyografyaya zanistî xwedî wê hêzê ye ku piştgiriyê bide çalakîyên cihêreng ên di qada pirtûkên zarokan de pêk tînin, çawa ku di warê lêkolînên edebî yê li cihên din de xwedî roleke giring e.” (1977, r. 203; li Beşa 10an jî binêre). Lêbelê, lêkolîna edebiyata zarokan li şûna “pirtûkê” weku berhem bixwe, berê xwe dide xwîner û tesîrê, di encama wê de em di rewşeke wisa de ne ku xwedî gelek rexneyên spekulatîf û teorîk in, lê çavkaniyên bîbliyografîk yê “şênber” nîsbeten kêmtir in. Çavkaniyên wisa çiqas lazim in, ew mijara nîqaşeke din e lê di gel koleksiyonên berfireh yê edebiyata zarokan li pirtûkxaneyên li çaralîyê cihanê, ku piraniya wan pir hindik hatine bikaranîn, ji bo lêkolîna bîbliyografîk û dîrokî potansiyeleke mezin heye.

### Xwendina Edebiyata Zarokan

Ew qet tişteke maqûl nîne mirov zen bike ku xwendin û şirovekirina pirtûkên zarokan pêvajoyeke hêsan e, ji ber wê temayeke dubarekirî ya vê cildê têkilîya di navbera xwîner û tekstê de ye. Nivîskar dema behsa xwîner dike (xwînerêkî ji rêzê yan jî xwînerêkî jêhatî, xwedî zanîn û helwestên teqez), çiqasî dikare tiştên ku ji nivîsê tînin famkirin kontrol bike? Em çawa dikarin tiştê ku hatiye fêmkirin, kifş bikin? Mekanîzmayên ku têgihiştinê pêk tînin, çi ne?

Beşa 5an a vê pirtûkê, “Analîzkirina metnan: zimannasî û şêwaznasî” û beşa 9an, “Dekodkirina wêneyan: pirtûkên bi-resim çawa dixebitin”, me digihîne bingeheke analîza tekstê. Eşkere ye ku têgihiştina metnê him weku zimanê devkî û him jî weku zimanê dîtbarî giring e û ev yek bi taybetî ji bo edebiyata zarokan derbasdar e -ji ber ku xwînerê ewilîn ê van pirtûkan zimanê ku bikar tîne, hê jî hîn dibe.

Analîzên hûrgulî û bidîqet yê ku di van beşan de tînin pêşkêşkirin, di heman demê de li dijî wê nêrînê ne ku edebiyata zarokan (û xwînerên wê) weku girseyeke bê karakter dibîne; Tiştê ku em pê re mijûl dibin, xwendinên ferdî û xwendinên “edebî” ne ku li gorî pîvaneke derveyî ya nîrxan nikarin bînin nirxandin. Weku Nodelman û Reimer destnîşan kirine:

Mixabin, gelek xwîner difikirin ku mijar an peyamên tekstan bi hêsanî tînin famkirin û bi çend peyvên tînin vegotin; bi wî fikrî nêzî nivîsan dibin... Xwendina bi vî rengî balê ji zewqê yekser ya ji metnê dûr dixîne... ji manayên kûrtir yê dibe ku di tekstê de vîşartî bin (Nodelman û Reimer, 2003, r.66).

Xebatên edebiyata zarokan di navbera xebatên “edebî” û “çandî” yê ekstrem de ne. Ya yekem weku Jonathan Culler destnîşan kiriye, meyla teşwîqkirina “xwendina nêzîk (close reading)” e, ya ku “ji bo hûrguliyên avaniya vegêranê çav-vekirî ye û balê dide ser tevliheviyên watayê”. Berevajî vê, lêkolînên çandî (a ku gelemperî bi metnê “ne-edebî” re mijûl dibe, weku televîzyon û pirtûkên zarokan) “berê xwe dide “şirovekirina semptomatîk (symptomatic interpretation)” – ango tesbîtîkirina



mijarên berfireh, berbelav û portatîf” (Culler, 1997, r. 52). Dema em xwînerên zarok û dînamîkên hêzê yên di nava pirtûkên zarokan de – yên ku tê da nivîskarên mezin pirî caran hewl didin ku xwînerên ciwan bibandor bikin- bidin ber çavan, dibe ku ji dilê me bê em li hemberî angaştên li paş wan her du pozîsyonan bisekinin. Bi heman awayî, divê em pir bi baldarî li pirsgerêka felsefî ya li koka têgihîştina xwendinê binêrin; ku nêrîna herî pragmatîk û belkî muhafezekar bi dest bixînin:

Tê zanîn ku têgihîştina xwîner ji metnekê girêdayî zanîna wî ya berê û bikaranîna wê zanîne ya di pêvajoya xwendinê de ye. Dema mirov bide ber çavan ku amanc û motîvasyonên cuda yên ji bo xwendinê dê famkirin û encamên di astên cuda de derxe holê... ihtîmal e ku xwînerên cihêreng heya radeyekê metnên cihêreng bi awayên cuda şirove bikin. Bi rastî, ji bo metnên edebî rewş wisa ye ku pirî caran ev klîşe tê gotin: bi qasî ku xwîner hene ewqas jî şirove hene. Lê dîsa jî ew mirov tatmîn nake ku îdia bike metnek ji bo xwînerêkî tişteke tesadîfî îfade dike. Metin bixwe divê heta radeyekê xwezaya têgihîştina ku xwendevan ava dike, bi şertan ve girê bide (Alderson û Short, 1989, r. 72).

Aloziyên li ser fikrê çawa “metin, têgihîştinê... bi şertan ve girê dide” ne zelal in; heman tişt ji bo pirtûkên biresim jî ne zelal e. Çimkî tê ferz kirin ku şirovekirina resiman bi awayekî jî şirovekirina peyvyan hêsantir e. Çawa ku Scot McCloud di kitêba xwe ya bi navê *Understanding Comics: Invisible Art* (Famkirina Wêneçîrokan: Hunera Nepenî) ya nûjenixwaz de destnîşan dike, ew “tişteke pênebawer e” ku zêhna mirov îkonan-temsîlên sembolîk û razberiyên ji rastiyê ewqas bi hesanî qebûl dike (1993: 31, û binêre rp. 30–45). Wêneçîrok, bêhemdî xwe pir-dengî ne; heta ya herî “basît” hewceyî qabiliyetên kompleks ên şirovekirinê ye. Her çiqas bi xebatên Nodelman (1988), Doonan (1993), Nikolajeva û Scott (2001), Anstey û Bull (2000) û ji hêla yên din ve bê dabînkirin jî, ya ku ji bo resiman kême gengîneyeke peyvyan a şirovekar e, weku yên heyî ku em ji bo peyvyan, nivîsan bi kar tînin.

Piçûkdîtina hêza pirtûkên-bi resim (an jî wêneçîrokan) heman e bi piçûkdîtina zarokan weku xwîner – a ku ez hêvî dikim min baş nîşan daye ku xeletiyêke navendî ye. Ji bo nimûne Jane Doonan, ji mekanîkên kompleks yên xwendina resiman bêtir, bi estetîkê re eleqedar e:

Nêrîneke kêmtir berbelav û ya ez pê bawer dikim ku pirtûkên biresim herî zêde rûmetdar dike ev e ku resim bi saya hêza xwe ya derbirinê mimkûn dikin ku pirtûk weku objeyêke hunerî tevbigere... pirtûkên biresim dibe ku tevkariyê li pêşveçûna me ya estetîkî bike û nirx di wir û serpêhatiya estetîk... de ye. Di serpêhatiyêke estetîk de, em bi listikeke pir dijwar û ya herî bi kêf re mijûl dibin... Û di vê listîkê de... em mecbûr in ku bi nosyonên razber yên mantiqî, sehekî û hêmayî re têkildar bin (Doonan, 1993, r.7).

Bêguman serpêhatiya pirtûkekê, berî peyv yan jî resimên li ser rûpelê dest pê dike û wêdetir dibe. Weku objeyekê, tevahiya pirtûkê serpêhatî ye û ew serpêhatî her ku diçe, bûye qada sêwirînerê pirtûkê: her pirtûkê cuda ye û “Her pirtûkê cihêreng e û ne ewqas basît e ku ji sêwiraneke ku li ser hatiye fikirîn, sûd wernegire... Sêwirîner carinan neçar e ku însiyatîfê bigire ser xwe ku malzemeya nivîskar bi dîtbarî pêşkêş bike û bi vî awayî wê veguherîne hilberîneke bazarê.” (Martin 2004: II, 638).

Her çend em bala xwe bidin ser metnan jî, ew eşkere ye ku lêkolîna edebiyata zarokan girseya ku lê tê xîtabkirin jî dihewîne: zarok, xwîner û şert û mercên xwendinê. Metin di heman demê de kontekstek e; weku Aidan Chambers jê re dibêje, xwîner ji hêla “hawirdora xwendinê” ve tîr çêkirin an jî nayên çêkirin. Ne hewce ye ku “metin” nivîskî be. Weku Chambers çavdêrî lê dike: “Çîrokbêjî zarûrî ye ji bo ku mirov bikare bibe xwînerên edebî” (Chambers 1991: 46) û lêkolîna li ser “çîrok bi devkî çawa tîr vegotin”, tevkariyê li têgihîştina me dike ku em fam bikin ka çîrok -û ragihandin- çawa dixebitin.

Çîrokbêjî (ku em vegerin li ser pirsên îdeolojiyê yên ku ti caran ne pir dûr in) xwedî mêhwereke siyasî ye jî. Pisporekî mumtaz ê Amerîkî yê edebiyata zarokan, folklor û çîrokbêjiyê Jack Zipes, ji dil û can bi feziyetên texrîbker yên çîrokbêjiyê bawer dike. Dîsa destnîşan dike ku dibistanên li Rojavayê (bi lihevkirina civakê):

...di wê mebestê da ne ku zarokan veguherînin serfkar (consumer) û reqîbên serkeftî yên cihaneke “azad” ku ji hêla şert û mercên pîyasayê ve tê dîktekirin... Heke çîrokbêj di dibistanan de bi navê zarokan tesîrdar dibin... ew muhîm e ku hesteke civatîbûnê, hesteke civateke xwerexnegir û xwenas telkîn bikin da ku nîşan bidin tişteke jirêzê çawa vediguhere tişteke fewqulade. Heke dibistan... dixwazin nîşan bidin ku ew dikarin ji bilî enstîtûyên dîsîplînê, rastkirinê û xapandinê veguherin tişteke din, dibistan ji bo vê cure çîrokbêjîya “xirabker” ciheke îdeal e...

(Zipes 1995: 6)

Wê demê çîrokek çawa tê ragihandin, devkî yan jî nivîskî, bi wêne yan sembolan û bi her kîjan navgîniyê ve tê ragihandin (ji bo nîqaşa film li Wojcik-Andrews (2000), Whyte (2004); û ji bo televîzyonê, Buckingham (2002)), şert û mercên wê ragihandinê û tesîrên wê yên muhtemel hemû bûne beşeke bingeîn a lêkolîna edebiyata zarokan. Ev, bi berfirehî tê wê watayê ku tiştê weku “rexne” tê binavkirin, xwedî hin xeman e ku ew xem wêdetirî sînorên kevneşopî yên rexneya edebî dibe û nîqaşeke yekane ya eklektîk pêşkêş dike.

### Rexnekirina Edebiyata Zarokan

Îroniyeke xweş e ku kesên bi mijara edebiyata zarokan re, ya ku basît xuya dike, eleqedar dibin (bi piranî bêhemdî xwe), di teoriya edebîyatê û rexneyê de li merheleyên pêşî cih digirin.

Bi berfirehî hatiye nîqaşkirin ku pratîzekerên lêkolînên edebiyata zarokan divê nekeve forma gettobûnê, lê hemû teknîkên rexneyî yên guncav bi kar bînin. Dibe ku kesekî skeptîk destnîşan bike ku ne ji bo ekolên rexnegiriyê ne jî pirtûkên ku prensîbên wan diyar dikin, kêmasiyek tune. Xebatên van ekolan dikarin bi awayekî berhemdar li ser edebiyata zarokan bînin sepandin û ev rastî ji hêla Roderick McGillis bi pirtûka wî ya bi navê *The Nimble Reader* (1996) (Xwînerê Jîr) hatiye nîşandan, ya ku guncawtîya ekolên ramanan ji formalîzmê heya femînîzmê pêşkêş dike.

Di vê pirtûkê de, pênc beş (Beşa 2yan û Beşên 5-8an) qadên sereke yên teorî û pratîka edebî dihewînin. Nêzîkatîyên din yên bi taybetî ji bo edebiyata zarokan berhemdar in bi van re eleqedar in: analîza vegêranê (wek nimûne Nikolajeva 2004), bi giştî dîskors û strûktûrên çandî yên ku di metnan de tên xuyakirin (nemaze yên ku ji kolonyalîzmê û post-kolonyalîzmê bandor wergirtine, binêre McGillis 2000).

Mînak “Strûkturalîzm”, her çend dibe ku şewazeke rexneyî ya demode be jî, dibe ku ji bo lêkolîna mîtan, destanan û çîrokên folklorîk û çîvanokan xaleke destpêkê peyda bike, lê tenê xaleke destpêkê. Ecêbiyeke sosyolojîk û dîrokî ye ku edebiyata zarokan (ya ku bêgûneh tê dîtin) van metnên (di serî de) tundî, şidet û minasebetên cînsî tê de ne, dihewîne û absorbe dike; lê bi têngîhiştina binyadên wan û paşê jî peywendîdarkirina bi tevgerên çandî û demên dîrokî re, dibe ku ji rengên xwe yên xuyanî û tîpîk bêtir bi regekî din bînin dîtin. Fîkrê ku çîrokên gelêrî û mît qalibên arketîp dihewînin, dibe ku biqîmet be; fîkrê ku “ji ber forma wan a ‘hêsan’ ev arketîp ji bo zarokatiyê guncav in”, me vedigerîne nîqaşên li ser têngîhiştin, famkirin, çandîbûn û konseptên zarokatiyê. *The Trials and Tribulations of Little Red Riding Hood* (1993) (Xem û Pirsgerêkên Keça Kumsor) ya Jack Zipes mînaekeke hêja ye ku tê de analîzên strûktûrel bi xebatên psîkolojîk, civakî û dîrokî tên kombînkirin. Dibe ku “Little Red Riding Hood (Keça Kumsor)” ji çavdêrekî guhnedêr re tenê weku çîrokeke zarokan a basît xuya bike. Zipes nêrineke weha red dike:

Ne mimkûn e ku mirov bandor û giringiya sendroma Little Red Riding Hood zêde bike ya ku di civakên rojavayî de mînaekeke çandî ya serdest e. [Xwendinek ev e ku] Little Red Riding Hood tîrsa mêran a ji minasebeta cînsî ya jinan -û ya ji xwe- nîşan dide. Çewisandin û regûlasyona ajoyên cînsî di vê çîroka edebî ya bûrjûwazî de ku bingeha hewcedariyên mêran ên tîrîbûyî datîne, bi tevahî hatine xêzkirin. [Weku alternatîf] ji ber şert û mercên civaka rojavayî, li cihê ku jin bûne nêçîra mêran, taybetmendîyeke

erênî ya çîrokê heye: ew jî hişyariya wê ya li ser ihtîmala destdirêjiya zayendî ye ku ev hişyarî ji bo amanceke bikêr hê jî dewam dike.

(Zipes 1993: 80–1; herweha binêrê Zipes 1997, û Griswold 2000)

### Bikaranînên Edebiyata Zarokan

Dema akademîsyen tên dinyayê, di vaftîzkirinê de periyê baş soz û bext dide wan ku dema ew mezin bin dê bikarin pirtûkan pir baş bixwînin û fam bikin. Lê hê wê peyva xwe temam nekiriye ku periyê xirab tê û bi awayekî tehdîdkar dibêje “lê divê tu ti caran, ti caran di pacyê de li derve nenêrî” (Joan Rockwell, ji Parker 1994, r.194).

Weku em dibînin, lêkolîna edebiyata zarokan me vedigerîne hin xemên pir bingehîn: çima em dixwînin? Pirtûk *ji bo* çi ne? Bersiv dibe ku, wek mînaka Chambers, bawerîyeke giştî ya liberal-humanîst a bi pirtûk û şaristaniya mirovî be; lê pîrî caran, edebiyata zarokan wekî mexzena dawî ya felsefeya *dulcis et utile*<sup>3</sup> tê dîtin: dibe ku pirtûk bikêf bin, erê, lê di eslê xwe de divê *bikêrhatî* bin. Pirtûkên zarokan yê wê cihanê ne û yek ji taybetmendiyên teoriya rexneyî ya ku ew ji gelek pisporên pirtûkên zarokan re nexweş tê, aliyê wê yê xwedbin e.

Wê demê di nixandina pirtûkên zarokan de, “*ji bo*” pîrî caran peyva sereke ye. Pirtûk ne tenê “baş” in, lê “*ji bo ... baş*” in. Pirtûkên zarokan di demên cuda de ji bo mebestên cuda tên bikaranîn – bona gelek tiştan ku ji pirtûkên din bêtir. Hinek ji bo wextderbaskirinê “baş” in; yê din ji bo bidestxistina xwendin û nivîsandinê “baş” in; yê din ji bo berfirehkirina cihana xeyalî “baş” in yan ji bo hînkirina helwestên civakî yê gelemperî (an taybetî) “baş” in; yan jî ji bo mijûlbûna bi pirsgerêkan yan jî ji bo biserketina li pirsgerêkan “baş” in, yan jî ji bo xwendina bi awayê “edebî” ya ku di çanda mezinan de beşeke piçûk e, “baş” in; yan jî ji bo biserketin û micadeleya bi nijadperestiyê re “baş” in... û piraniya pirtûkan, çend heb ji van tiştan pêk tîne. Ev ne pîvanek e ku hin amanc ji yê din bilindtir bin; ew matrîsek e ku bi sedan watayên mahir jê tîne hilberandin. Ya ku hûn difikirin “baş” e bi we re, bi zarokan re eleqedar e û ji bo çî hûn pirtûkê bi kar tînin bi wê re eleqedar e- û her xwendinek cuda ye.

Du beşên wê pirtûkê “Famkirina xwendin û xwendewariyê” (Beş 11) û “Metnên Başker: Bibliyoterapî û Psikolojî” (Beş 13) ku behsa encamên pratîkî yê xwendina pirtûkên zarokan dikin, nîşan didin ku bi xwendina pirtûkên zarokan çawa teorî bi pratîkê ve tê girêdan; ihtîmala psikolojîk û encamên pratîkî û hişmendiya peyv, mirov û derdorên wan çawa bi hev ve dipêçin. Lê heman tişt dikare ji bo sepanên din ên “pratîk” ên edebiyata zarokan bê gotin, nemaze adaptasyona çîrokên ji bo zarokên xwedî pêdiviyên taybet (Mathias, 2004).

Lêkolîna edebiyata zarokan ne tenê cudahiyên mahir ên metnî, lê di heman demê de tevgerên ku li ser jiyandê bandorker û pratîkî ne di nava xwe de dihevine; ya ku “qada” edebiyata zarokan pev re pê digire ew hişmendî ye. Her sal ji bo pirtûkên zarokan yê “baştirîn” xelatên cihêreng tîne dayîn; lê ew cihêrengiya xelatan bi tenê pirtûkên bi awayekî razber “baştirîn” nahewîne, lê di heman demê de yê ku mînorîteyan teswîr dikin an aştiyê pêş dixin -yan jî bîzat ji hêla zarokan ve hatine hilbijartin, liyaqî van xelatan bûne (Allen, 2004).

Ji ber vê yekê nivîskar, weşanger, pirtûkxanevan, mamoste, dê û bav û zarok û gelek kesên din dema li ser bikaranînên edebiyata zarokan nîqaş dikin, ew li ser heman qada înteraktîf mijûl dibin bi wan kesên ku pirtûkan analîz dikin, ango bi pisporan. Ev rewş ji min re bi potansiyel, weku çavkaniya hêzeke mezin û înovasyonê mezin xuya dike. Di sala 1997an de, hejmarek ji kovara salane ya bi prestîj a bi navê *Children’s Literature* (Edebiyata Zarokan), ji bo “nivîsîna çeperast (cross-writing)” hat veqetandin. Cross-writing li ser vê fikrê ye ku “her çend pirtûkên zarokan bi gelemperî yek-dengî

3 Xweş û bikêrhatî

bên xwendin jî, têkeleke dengên mezin û ciwan ya diyalojîk dihevine.” Nivîskarên ku ji bo zarokan dinivîsin bêhemdî xwe di navbera “xwebûn”a xwe ya berê û ya îroyîn de diyalogekê ava dikin. Li gor edîtoran ev yek “hevkarîgerî û fertilîzasyona çeperast” dihevine (Knoepflmacher û Myer, 1997, r.vii). Ew îmaj dikare piraniya Lêkolînên Edebiyata Zarokan temsîl bike û tiştê ku ev pirtûk ser disekine jî têgihîştina watayên li pişt wan pir-dengîyan e.

### Siberoja Lêkolînên Edebiyata Zarokan

Em di serdemeke wisa de dijîn ku pirtûkên zarokan bi awayekî bêhempa tînan hilberandin û firotin û vê yekê jî eleqeyêke giştî ya bêhempa li ser vê qadê peyda kiriye. “Edebiyata Zarokan”, li zanîngehan li çaralîyê cihanê weku derseke pejirandî bi domdarî konsolîde bûye û wisa xuya dike ku (ligel zordariyên aborî yê berfireh li ser pergalên perwerdeyê) ev yek dê berdeham bike. Lêbelê ev pêşketin bi hin guherînan derket holê: di navbera sînorên rûniştî yê dîsîplînên akademîk ên di warê zanista beşerî û di warê zanista fenî de, bi merheleyan şikestinekê dest pê kir û ji hin aliyan ve, xwezaya înterdîsîplîner a edebiyata zarokan modelek ji vê pêvajoyê re peyda dike.

Dibe ku wisa xuya bike ku hêmanên reqîb şûna hevgeriyekê ava bikin, dê mijarê ji hev biqetînin. Çawa ku McGillis destnîşan kiriye:

...gelek kes li gelek deveran derheqê tişteke bi navê edebiyata zarokan de dipeyîve, heta lêkolînan dikin lê pirî caran ev komên cihêreng bi hev re nakevin tîkiliyê. Teorîzasyona nadîde ya akademîsyenê edebiyatê, ji mamosteyê praktîzeker re pir tîsî xuya dike; lê amancên pratîkî yê perwerdekarên ji bo teorîsyen û dîroknasê edebiyata zarokan pir teng û sînordar xuya dikin. Eleqeya bi biblioterapiyê -ku carinan ji hêla rexnegirên nêzî psikolojîyê ve tê îfadekirin-... pirî caran ji ber tunebûna îhtimama şeweperest ya analîzeke edebî ya cidî tê redkirin. Û meraqa berhevkirina daneyan ya pisporê medyayê û pirtûkxanevan, her çiqasî ji hinekan re balkêş bê jî, ji hêla rewşenbîrî ve teşwîqker an ji hêla civakî ve dîlkêş nayê dîtin (McGillis, 1999, r.203).

Lê divê ev yek hêviyên me neşikîne. Di sala 1981an de Harold Rosen dîsîplîna “Îngilîzî” wiha pênase kiriye:

...qada ku herî kêr dişibe qadên akademîk ên kevneşopî û ya ku tê de mirov nikare dîsîplineke akademîk, bi tenê li gor koma xebatên wê pênase bike. Di dilê wê de, komeke fikran serwer nîne ku teşe bide wê. Kes nikare bi awayekî ewle sînorên wê diyar bike: ew kolonîze dibe û kolonîze dike. Dema em pratîkên ku bi awayekî acizker di bin ala wê de kom bûne, vekolin; ew hevnegirtî, keyfî, tesadîfî û tîvel xuya dike ku qey li hember analîz û ravekirineke zelal disekine (ji Eaglestone, 2000, r.7)

Lêkolînên Edebiyata Zarokan di bingeha xwe de derheqê zarokan û tîgeha zarokatiyê de -her çend ji hev dûr bin jî- xwedî fikarekê ye. Û ji bo vê qadê rêyeke xwezayî ya ber bi paşerojê ve, dibe ku wê bi meta-dîsîplîna Lêkolînên Zarokatiyê re girêdan e, ku ew qad bi lez pêş dikeve. Li vir, edebiyata zarokan dikare li gel zarokatiya rast û ya teorîk, di çarçoveya avanîyên edebî (yên mezinan) û teswîrên wan ên zarokatiyê de bê lêkolînkirin (binêre Travisano 2000, û Lesnik- Oberstein 1998). Weku mînak temayên şînê bi bibliyoterapiyê [bikaranîna pirtûkan ji bo xweşbûnê] û objektîfîkasyona zarokatiyê jî bi arketîpên edebî ve dikare bê pêwendîdarkirin. Rêzeya pirtûkan a li ser zarokatiyê, ku vê dawîyê ji hêla British Open University (Zanîngeha Open a Brîtanî) ve hatiye çapkirin, bi kurtasî li ser qadê vedibêje:

Qada lêkolînên zarokatî û nûciwanîyê ya ku çiqas diçe mezintir dibe, him ji bo lêkolîn û hînkirina înterdîsîplîner û him jî ji bo analîza sepan û politîkayên hemdemî yê weku perwerdehî, tenduristî û xizmetên civakî, çarçoveyêke entegre peyda dike. Zarokatî niha meseleyêke gerdûnî ye û mecbûr dike ku nêzikatiyên vekolînê yê kevneşopî ji nû ve bên çavpêxistin. Di heman demê de zarokatî ji bo me

---

4 interplay and cross-fertilisation

hemûyan yek bi yek- zanyar, siyasetmedar, dê û bav û zarokan -meseleyeke pir kesane ye (Kehily û Swann 2003, II)

Ji ber vê yekê cihêrengî ji bo edebiyata zarokan bingeh e. Loma, hejmara Payîz (29.3) 2004an ya kovara *Children's Literature Association Quarterly* (Komeleya Edebiyata Zarokan a Sê Mehane) beramberî analîzeke nêzîk (close) ya edebî li ser berhema Noel Streatfeild, vekolîna bûkokên lezbiyen (lesbian dolls) û cihê kûçikan di edebiyata zarokan de û minasebetên cinsî dihewîne. Encyclopedia International Companion, ku gotarên vê hejmarê jê hatine girtin, ji teoriya rexneyî bigire heya weşana ji bo hewcedariyên taybetî û ji “metnên” ku di sala 4500an berî zayînê de hatine nivîsîn bigire heya metafîksiyona postmodern cih digire. Ev cihêrengiya fikaran e ku bi rêya pir-dengîyê tê îfadekirin û lêkolînên edebiyata zarokan ewqas tevlihev û balkêş dike.

### Çavkanî/References

- Alderson, B. (1977) Bibliography and children's books: the present position, *The Bibliographical Society*. Reprinted from *The Library* 32, 3: 203–13.
- Alderson, J. C. û Short, M. (1989) Reading literature, dnd. Short, M. (ed.). *Reading, analysing and teaching literature*, Longman.
- Allen, R. (2004). *Winning books*, Pied Piper.
- Anstey, M. û Bull, G. (2000). *Reading the visual*, Harcourt.
- Avery, G. (1994). *Behold the child. American children and their books, 1621–1922*, The Bodley Head.
- Bouvaist, J. M. (1990). *Les enjeux de l'édition – jeunesse à la veille de 1992*, Salon du Livre de jeunesse.
- Buckingham, D. (ed.) (2002). *Small screens. Television for children*, Leicester University Press.
- Chambers, A. (1985). *Booktalk. Occasional writing on literature and children*, The Bodley Head.
- (1991). *The reading environment. How adults help children enjoy books*, Thimble Press
- Clark, B. L. û Higonnet, M. (1999). *Girls, boys, books, toys: Gender in children's literature and culture*, Johns Hopkins University Press.
- Culler, J. (1997). *Literary theory: A very short introduction*, Oxford University Press.
- Cunningham, H. (1995). *Children and childhood in western society since 1500*, Longman.
- Darton, F. J. H. (1932/1982). *Children's books in england: Five centuries of social life*, 3rd ed. rev. Alderson, B., Cambridge University Press.
- Doonan, J. (1993). *Looking at pictures in picture-books*, Thimble Press.
- Eaglestone, Robert (2000). Undoing english, *CCUE News* 13: 6–8.
- Gilderdale, B. (1982). *A sea change: 145 years of new zealand junior fiction*, Longman Paul.
- Griswold, J. (2000). *Is history real? A multimedia meditation on 'sleeping beauty'*, Campanile Press.
- (2004). The U.S.A.: A historical overview, dnd. Hunt, P. (ed.) *International Companion Encyclopedia of Children's Literature*, 2nd edn, Routledge.
- Hardyment, C. (1995). *Perfect parents. Baby-care advice past and present*, Oxford University Press.
- Heywood, C. (2001) *A history of childhood: Children and childhood in the west from medieval to Modern Times*, Polity Press.
- Hunt, P. (ed.) (1995). *Children's literature: An illustrated history*, Oxford University Press.
- (1997). Good? Good as? Good for?, *Books for Keeps*, 103, 8–9.
- (2000). Children's Literature, dnd France, P. (ed.) *The oxford guide to literature in english translation*, Oxford University Press.
- (2001). *Children's literature: A guide*, Blackwell.
- Jafa, M. (2004). The Indian Sub-continent, dnd. Hunt, P. (ed.) *International companion encyclopedia of children's literature*, 2nd ed, London and New York: Routledge.
- Jenks, C. (1996). *Childhood*, Routledge.
- Kehily, M. J. û Swann, J. (2003). *Children's cultural worlds*, Milton Keynes/Chichester: Open University Press/John Wiley.
- Knoepflmacher, U. C. û Myers, M. (1997) From the editors: "Cross-writing" and the reconceptualizing of children's literary studies', *Children's Literature* 25, Yale University Press, vii–xvii.
- Lesnik-Oberstein, K. (ed.). (1998). *Children in culture. Approaches to childhood*, Macmillan.
- Martin, D. (2004). Children's book design, dnd. Hunt, P. (ed.) *International companion encyclopedia of children's*
-



- literature*, 2nd ed, Routledge.
- Mathias, B. (2004). Publishing for special needs and Hunt, P. (ed.) *International companion encyclopedia of children's literature*, 2nd ed, Routledge.
- McCloud, S. (1993). *Understanding comics: the invisible art*, Tundra.
- McGillis, R. (1996). *The nimble reader*, Twayne.
- (1999). The delights of impossibility: No children, no books, only theory, *Children's Literature Association Quarterly*, 23 (4), 02–8.
- (ed.). (2000). *Voices of the other: Children's literature and the postcolonial context*, Garland.
- Mooney, C. G. (2000). *Theories of childhood: An introduction to dewey, ontessori, Piaget and Vygotski*, Redleaf Press.
- Nikolajeva, M. (2004). Narrative theory and children's literature', *International companion encyclopedia of children's literature*, 2nd ed, Routledge.
- Nikolajeva, M. & Scott, C. (2001) *How picturebooks work*, Garland.
- Nodelman, P. (1988). *Words about pictures*, University of Georgia Press.
- Nodelman, P. and Reimer, M. (2003). *The pleasures of children's literature*, 3rd ed. Allyn and Bacon.
- Parker, J. (1994). Unravelling the romance: Strategies for understanding textual ideology, and. Corcoran, B., Hayhoe, M. & Pradl, G. M. (ed). *Knowledge in the making. Challenging the text in the classroom*, Heinemann.
- Pellowski, A. (2004). Culture and developing countries', and. Hunt, P. (ed.) *International companion encyclopedia of children's literature*, 2nd ed, Routledge.
- Philip, N. (ed.). (1996). *The new oxford book of children's verse*, Oxford University Press.
- Ray, S. (2004). The world of children's literature: An introduction, and. Hunt, P. (ed.) *International companion encyclopedia of children's literature*, 2nd ed, Routledge.
- Saxby, H. M. (1969). *A history of australian children's literature 1841–1941*, Wentworth Books.
- (1971). *A history of australian children's literature 1941–1970*, Wentworth Books.
- (1993). *The proof of the pudding: Australian children's literature 1970–1990*, Ashton Scholastic.
- Townsend, J. R. (1965/1990). *Written for children: An outline of english-language children's literature*, Penguin.
- Travisano, T. (2000). Of dialectic and divided consciousness: Intersections between children's literature and childhood studies, *Children's Literature* 28, 22–9.
- Trites, R. S. (1997). *Waking sleeping beauty: Feminist voices in children's novels*, University of Iowa Press.
- Vallone, L. (1995). *Disciplines of virtue. Girls' culture in the eighteenth and nineteenth centuries*, Yale University Press.
- West, M. (1988). *Trust your children: Voices against censorship in children's literature*, Neal-Schuman.
- (2004). Censorship, and. Hunt, P. (ed.). *International companion encyclopedia of children's literature*, 2nd ed, Routledge.
- Whyte, P. (2004). Adaptation and authenticity. Filming children's literature, *Inis [Children's Books Ireland]*, 9, 6–9.
- Wilkie-Stibbs, C. (2002). *The feminine subject in children's literature*, Routledge.
- Wojcik-Andrews, I. (2000). *Children's films: History, ideology, pedagogy*, Garland.
- Zipes, J. (ed.) (1993). *The trials and tribulations of little red riding hood*, 2nd ed, Routledge.
- (1995). *Storytelling. Building community, changing lives*, Routledge.
- (1997). *Happily ever after. Fairy tales, children, and the culture industry*, Routledge.
- (2001) *Sticks and stones: The troublesome success of children's literature from Slovenly Peter to Harry Potter*, Routledge.



## Pênasekirina Edebîyata Zarokan û Zarokatîyê

## Defining Children's Literature and Childhood

Karin LESNIK-OBERSSTEIN

<b>Karin LESNIK-OBERSSTEIN</b>	Professor   ORCID: 0000-0002-4970-0556   University of Reading, Department of English Literature, United Kingdom   k.b.lesnik-oberstain@reading.ac.uk
<b>Wergêran: Ferhat YILMAZ</b>	Research Assistant   ORCID: 0009-0000-4737-4665   Mardin Artuklu University, Kurdish Language and Culture Department, Mardin-Turkey   ferhatyilmaz4546@gmail.com
<b>Jêgir</b> Citation Atf	Lesnik-Oberstein, K. (2025). Pênasekirina Edebîyata Zarokan û Zarokatîyê. Wer. Ferhat Yılmaz. <i>Artuklu Kurdology</i> (18). 97-109
<b>Dîroka Şandinê</b> Submission Date Geliş tarihi	23.09.2024
<b>Dîroka Qebûlê</b> Acceptance Date Kabul Tarihi	13.11.2024
<b>Dîroka Weşandinê</b> Publication Date Yayın tarihi	30.01.2025
<b>Cureyê Gotarê</b> Article Type Makale Türü	<b>Gotara Wergerê</b> Translation article Çeviri makalesi
<b>Hakemî</b> Peer-Review Hakemlik	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk</b> Ethical Statement Etik Beyanı	<b>Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etîk hatine şopan-din û hemû çavkanî bi awayekî têtûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
<b>Kontrola İntihalê</b> Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	<b>Belê – iThenticate</b> Yes – iThenticate Evet – iThenticate
<b>Nakokiyên Berjewendiyên</b> Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî</b> Grant Support Maddî Destek	<b>Nivîskar beyan dike ku wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
<b>Mafê Telifê &amp; Destûr</b> Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	<b>Nivîskar li jêr lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

Di bingeha hewla ‘edebîyata zarokan’ de peyitandina pênaseya wê cih digire. Ew ji cureyekî pirtûkan pêk tê ku hebûna wan bivênevê girêdayî têkiliyê ferzkirî ya bi xwînerên taybet (zarokan) re ye. Ji ber vê yekê pênaseya ‘edebîyata zarokan’ ji aliyê amanca wê ve tê piştgirîkirin. Ew dixwaze bibe tişteke taybet; lewra ev taybetî ye ku wê bi xwîneran re, ‘zarokan’, girê dide û ew bi awayekî aşkere û dilxwazane vê têkilidariya xwe dipejirîne. Lê gelo pirtûkên zarokan ew in ku ji hêla zarokan ve hatine nivîsandin an ji bo zarokan hatine nivîsandin? A rastî; ‘ji bo’ zarokan pirtûkek nivîsandin tê çi watayê? Eger pirtûkek ‘ji bo’ zarokan hatibe nivîsandin, lê ev pirtûk (tenê) ji hêla mezinan ve hatibe xwendin dîsa jî ew wekî pirtûkeke zarokan tê hesibandin? Eger pirtûkine ‘mezinan’ ji hêla zarokan ve bèn xwendin, ew wekî ‘edebîyata zarokan’ tèn hesibandin? Wekî ku rexnegirê Brîtanî John Rowe Townsend diyar dike:

*Robinson Crusoe* teqez ji bo zarokan nehat nivîsandin; û hem pirtûkên *Alice* bi tîra xwe xîtabê mezinan nake? Eger *Tom Sawyer* ji edebîyata zarokan be, *Huckleberry Finn* çi ye? Eger *Jungle Books* (Pirtûkên Daristanê) ji edebîyata zarokan bin, *Kim* û *Stalky* çi ne? Û eger *The Wind in the Willows* (Bagera li nav Darên Bîyê) ji edebîyata zarokan be, *The Golden Age* (Serdema Zêrîn) çi ye? Û ev mînak gelek in (Townsend, 1980, r.196).

Di warê edebîyata zarokan de pênasekirina deqan û nepejirandina curesazîyê eger wekî mijareke negiring bê dîtin, dê ev gelekî kêşesaz be; herçend hemî gelemşe ev yek nebe jî. Eger em heta nezanin kîjan pirtûk ji ‘pirtûkên zarokan’ tèn hesibandin, em çawa dizanin ku pirtûkên baştirîn ji bo zarokan kîjan in? Lewma ji bo hemî rexnegirên ku vê tégihê bi kar tînin, di bingeha xwe de ‘edebîyata zarokan’ tê vê watayê: pirtûkên ku ji zarokan re baş in, bi taybetî yên ku ji hêla nîrxên hestî û sincî ve baş in. Em dikarin nîşaneyên vê nêrînê di hizra rexnegirê Kanadî Michele Landsber de bibînin:

Pirtûkên baş ji bo zarokan gelekî sûdewer in. Baştirîn hêla wan ew e ku ew asoya nêrînê zarokan fireh dikin û di hizra wan de pîrhêliyeke xweş a jiyane diafirînin... Tu demborandineke din ji zarokan re bi qasî pirtûkên baş alîkar nînin, ew di zarokan de hesta empatiyê û mirovhezîyê geş dikin. Tu kêfxweşîyeke din bi qasî pirtûkan nikare hişê zarokan bi sembol, model, pîrhêlî û derfetên jiyane dewlemend bike ) Landsberg, 1987, 34)

Wataya edebîyata zarokan wekî ‘pirtûkên ku ji zarokan re baş in’ du tiştan nîşan dide: A yekem, bêjeyên hevger ên ‘edebîyat’ û ‘zarok’ di raveka ‘edebîyata zarokan’ de nikarin ji hev bèn veqetandin û her yek tenê bi wataya xwe ya xweser bê fêmkirin; ya duyem, lewra ji nû ve pevgerêdana van her du bêjeyan wekî ‘edebîyata zarokan’ dê bi me nede zanîn ka ew çi watayê di xwe de di hundirîne. Di ravekê de her du bêje bi temamî hevûdu diwesifînin û wataya hevûdu ji bo amanca têgeha sazkerî vediguherînin. Bi kurtasî; bêjeya ‘zarok’ ya ku di ‘edebîyata zarokan’ de cih digire, watayeke taybet dide bêjeya ‘zarok’. Ev bêje bi awayekî teng amaje bi zarokan nake; mesela qesda ji zarok ne ew e ku di qadeke wekî perwerde, derûnnasî, civaknasî, dîrok, huner û edebîyatê de cih bigire. Bi heman awayî bêjeya ‘edebîyat’ê ya ku di ‘edebîyata zarokan de’ cih digire, watayeke taybet dide bêjeya ‘edebîyat’ê. Ne hewce ye ku ew bi ‘edebîyateke’ din re bê berawirdkirin, nemaze bi edebîyata ‘edebîyata mezinan’ re.

Digel vê nêrînê, yek ji bingehîrîn taybetmendiyê rexne û teoriya edebîyata zarokan ew e ku bêjeyên ‘edebîyat’ û ‘zarok’ yên di ‘edebîyata zarokan’ de dişên ji hev bèn veqetandin û ji hevûdu kêmbê zêde azade ne; û hem rasterast amaje bi ‘edebîyat’ û ‘zarokên’ din dikin. Rexnegir ji bo ku vê nêrîna xwe xurt bikin, gelek caran ji teoriyên perwerde, derûnnasî, civaknasî, dîrok, huner û edebîyatê yan piştgirî digirin yan jî serî li angaşên wan didin. Lêbelê ev rexnegir agahiyên ji qadên din herdem li gorî nêrînê xwe yên taybet bi kar tînin.

Qismen sedema vê aloziyê, tégihîştina bêjeya ‘zarok’ a di edebîyata zarokan de ye, lewra ev bêje di çarçoveya seha takekesî û bersivên hestî de tê gengeşîkirin. Mînak, rexneya edebîyata zarokan a rastî

pir kê m (lê gelek şiroveyên bêsinor dike) bala xwe dide gengeşiyên birêkûpêk yê derbarê mijarên hişî de; bala xwe nade mijarên wekî lihevhatina listeyên bêjeyan ku ji hêla derûnnasên perwerdeyê ve tîn sazîkirin, asta bêjeyan a di pirtûkan de û yan jî asta kemilîna hişî ku ji bo têgihîştina naveroka pirtûkan pêwîst e. Herçend ev mijar di bin banê ‘edebîyata zarokan’ de cih negirin jî, ew di qada derûnnasiya zarokan de tîn hesabandin yan jî ji bo sazîkirina pêşnûmayên xwendineke kêrhatî ya xurt guncan tîn dîtin. Ev rewş di klavûzên mamosteyan de jî xwe dide dest ku ji bo edebîyata zarokan hatine amadekirin. (Wekî xebatên Lonsdale û Mackintosh 1973; Huck 1976; Sadker û Sadker 1977; Smith û Park 1977; Glazer û Williams 1979; û Norton 1983.) Ev xebat hewl didin ku di navbera pirtûkên zarokan û lêkolînên perwede û derûnnasiyê de têkiliyekê saz bikin. (Ev hewl, heta eger gelekî li ber hatibe ketin jî, di xwe de gelek sextiyan dihewîne. Di mînakên herî baş de jî destkeftin bi encamên qels bi dawî dibe. Divê mirov tenê bala xwe bide ser gengeşiyên domdar yê ku dibêjin divê em çawa sîstema bingehîn a xwendinê bi zarokan bidin fêrkirin.) A rastî, di gengeşiyên hevdem yê xebatên edebîyata zarokan de bala rexnegiran bi giranî ser vê ye ku gelo dê pirtûk meraqa ‘zarokê’ bikişîne û yan jî çawa bikişîne; gelo dê ‘zarok’ jî pirtûkê ‘hez’ bike û yan jî dê pirtûk ‘xweşa’ wan biçê.

Herçend ku têgeha ‘edebîyata zarokan’ di xwe de kêşeya pênaseyê dihewîne û di navbera rexnegiran de bûye sedema gengeşiyên, bi gelemperî hatiye pejirandin ku têgeha ‘zarok’ bi heman awayî di xwe de kêşeya pênaseyê nahewîne; rexnegir bi tundî li hember wê angaştê rawestane ku angaşt dike pênaseya zarokê ne zelal e. Digel ku ev wiha tê pejirandin, lêbelê hin kesên wekî dîroknas Philippe Ariès û civaknas Margaret Mead û Martha Wolfenstein (1955) di xebatên xwe de diyar kirine ku pênaseya ‘zarokatî’ yê pir kê m jî be di qonaxên cihê yê dîrokê de û di çandên cihê de ji hev cuda bûye. Wekî ku Ariès diyar dike:

Divê bê zanîn ku nêrînên bi van têkiliyan (ên malbatî) re eleqedar di hin demên dîrokê de dibe ku ji hevûdu cuda bin, lewra ev dem bi êwrên dirêj ên dîrokê ji hev hatine veqetandin. Tiştên ku niha me eleqedar dike dîroka fêma malbatê ye, ne şayesandina reftaran yan jî xwezaya zagonê... Fêma zarokatîyê divê bi dilovaniyê re neyê tevlihevkirin ku em ji bo zarokan hest dikin: Ew tî wataya ferqkirina xwezayêke taybet a zarokatîyê. Ev xwezaya taybet a zarokan ji mezinan cuda dike, heta ji nûciwanan jî (Ariès, 1973, r. 8, 125).

Ariès aşkere dike ku ‘malbat’ û ‘zarokatî’ du fê m in ku di saziyên çandî û civakî de xwedan erk in. Ev erk xwe di guhestina hewl û nirxên guherbar ên sincî, reftarî û civakî de nîşan dide.

Teorîsyenê Brîtanî Jacqueline Rose bi hûrgilî li ser nêrînên ên wekî Ariès radiweste. Dewsa ku ew bala xwe bide rêça guherînên dîrokî û çandî, Rose nêrînên Ariès ên derbarê edebîyata zarokan de di çarçoveya çanda Rojavayê de di nav pêvajoyêke hevdem de dinirxîne. Rose diyar dike ku:

Sêwirîna zarokan li ser nêrînekê venîştiye ku dibêje zarokek heye. Lewra divê ew muxatabê bê girtin û pê re axaftin jî divê hêsan be. Hizra bêgunehbûna zarokê gelek gunehan vedişêre... *Peter Pan* di çanda me de wekî abîdeyekî sêwirîna zarokan cih digire ku xwedî angaştên xwe yê nepêkan e. Ev angaşt ew e ku dibêje ew zarokan temsîl dike, bi wan re diaxife û ji bo wan hatiye nivîsandin. Ew zarokan wekî komek qebûl dike ku dikarin bî nasin û muxatabê pirtûkê bî n girtin (Rose, 1984, r.1)

Rose diyar dike ku hê jî di serî de ‘zarok’ jî hêla çî n, gel, nijad, zayend hwd. ji hev hatine veqetandin. Lêbelê angaştên wê ji vê gelekî derasayîtir e: Li gorî Rose ‘zarok’ têgeheke sazîkirî ye. Ew li gorî daxwazên nivîskar û rexnegirên edebîyata zarokan hatiye sazîkirin. Ew ne têgeheke ‘aşkere’, ‘objektîf’, û ‘zanistî’ ye. Di hizra Rose de pêwîstiyên mezinan di çarçoveya termînolojiya Freudîen de tîn gengeşîkirin ku ev pêwîstî bi binhişê mirovan re eleqedar in. Lewra Rose ne di wê baweriyê de ye ku pêvajoya sazîkirina têgeha ‘zarok’ û pirtûkên ji bo vê têgehê bi hêsanî dikare (yan jî divê) bê rawestandin. Ev pêvajoya xwedî erkên giring e ku Rose hewl dide wan bi pênaseyên xwe baştir fê m bike. A rastî edebîyata zarokan û rexneya edebîyata zarokan angaştên Rose zêde bi kar neanîne û jixwe ji

gelek awayan nikarin bikin jî. Lewra hebûna van qadan bi temamî girêdayî têgeha ‘zarok’ a sazkirî ye. Tê xuyan ku hemî xebatên wan ji bo vê ‘zarok’ê ye. Lêbelê, çî digel angaştê Rose yan çî bêyî wê, edebîyata zarokan û rexneya wê melheseya gelek ‘zarokên’ din (pirî caran li dij) dike. Ev yek jî nîşan dide: Mirov divê bipejirîne ku yan têgeha ‘zarok’ê sazkirî ye. Dubare divê em bibêjin ku divê ev têgeha ‘sazkirî’ wekî tişteke vala û bêwata neyê dîtin. Ev têgeh divê bi awayekî felsefîk bê fêmkirin ku bi watayên cuda xwe dikemilîne; yan jî dibe ku derbarê vê têgehê de hin rexnegir ji yên din rastir in, lewma divê nêrînen wan bêhtir bîn pejirandin.

Ger wisa be kêşeya edebîyata zarokan û teoriya wê di navbera rageşîya sînoren qadê de derdikeve holê ku ji aliyê valahî û lihevnekirinên ferezî ve hatiye sazkin. Ev gengeşî li derdora van nêrînan dibore: Têgehên ‘zarok’ û ‘edebîyat’ aşkere, lihevhatî û ji hêla hişî ve watadar in; bikaranîna têgehên ‘zarok’ û ‘edebîyatê’ di raveka ‘edebîyata zarokan’ de di watayên gelek xweser de tînan bikaranîn ku gelek caran pirdirûvî û guherbar in. Hewldanên pênasekirina ‘edebîyata zarokan’ û ‘zarok’ê (ya xwîner) jî di vê qada gengeşiyê de tînan bikaranîn. Teorîsyenê çandê yê Britanî Fred Inglis dibêje ku:

Korbînî ye ku mirov nepejirîne ku romannûsên zarokan ji bo xebatên xwe hin nerît bi pêş nexistine. Pêşveçûneke bi vî rengî dūmahika xwezayî ya pergala hūrgulî û nepenî ya rêgez, hūnbūn, jiberxweyî, nerît, dirûv û lihevnanî ye. Ev yek dema ku mezin ji zarokan re çîrokên dixwînin an jî bi wan re bi awayekî zarokane diaxivin xwe dide der (Inglis, 1981, r. 101).

Rexnegira Awustralya Barbara Wall dipejirîne û tevahiya dahûrîna xwe ya pirtûkên zarokan li ser ‘vê qenaetê’ saz dike ku “mezin ... eger di çîrokê de xîtabî zarokan bikin cuda diaxivin... Ev axaftin carinan veşartî û carinan jî bi aşkere xwe di vegêrana nivîskar de dide der ku ev yek jî dibe dirûvê pirtûka zarokan.” (Wall 1991:1-2) Lêbelê rexnegirê Britanî Nicholas Tucker diyar dike ku awayê nêrîna Inglis û Wall ji aloziyê dûr nakeve; li gorî wî “herçend pir kes dipejirînin ku di navbera edebîyata mezinan û zarokan de cudahiyan aşkere hene, lêbelê dema ku wext bê ravekirinê dibe ku ew pir dijwar dibînin diyar bikin ka bi rastî cudahiyan di navbera wan de çî ye” (Tucker, 1981, r.1).

Ji ber ku ji mêj ve ye erkê rexnegirên edebîyata zarokan ew e ku biryar bidin ka kîjan pirtûk ji bo zarokan baş in û çima, lewma hemî rexne û dahûrînen edebîyata zarokan ên derbarê pênaseya ‘edebîyata zarokan’, ‘zarok’ û ‘edebîyatê’ (çî bi gotinên nepenî û çî bi yên aşkere) teji ne. Gava ku rexnegir diyar dikin ku wan bi awayekî biryar daye ku pirtûkek ji bo zarokan baş e, ev bi rastî tê wê watayê ku wan ji bo bikaranîna zarokan erkek li wê pirtûkê bar kirine û ev yek jî hizra wan a derbarê zarokan de aşkere dike ka zarok kî ye û çî difikire (nemaze dema ku berhemek dixwîne). Joan Aiken dibêje ku wê bi zanatî di pirtûkên xwe de cih nedaye peyamên sincî; lewra li gorî wê “zarok li hemberî sinca derewîn xwedî bertekeke xwezayî ya xurt in. Zarok pê dihesin ka kengê salmezineke xwedî rojeveke sincî ye, berî ku ew hêj devê xwe vekin” (Aiken, 1973, r.149). Lêbele Rosemary Sutcliff dibêje ku “*Ez* ji berpîrsiyariya karê xwe haydar im û ez hewl didim ku dema ji pirtûkên min dixwînin hin peyamên sincî ber guhên zarokan bixim.” (Sutcliff 1973: 306). Pamela Travers, afirînerê *Mary Poppins*, dibêje ku “Hûn beşek ji xeyalên xwe nabirin û pirtûkek nanivîsin, xaseten ji bo zarokan; lewra heke hûn dirûst bin, bi rastî hûn nizanin zarokî li ku diqede û kamilbûn li ku dest pê dike. Kemilîn bêsînore e û hemî yek e” (Cott 1984: xxii). E.B. White dibêje ku “Divê hûn bi giran binivîsin, ne bi sivik. Zarok daxwazkar in... Ew hema hema bê pîrs her tiştê qebûl dikin ku hûn bi dilpakî, wêrek û aşkere pêşkêşî wan dikin... Ew ji peyvên ku wan didin zorê hez dikin.” (White 1973:140) Rexnegira Awûstûryayî Maria Lypp, ku kêmzêde wekî Travers û White difikire, dibêje ku afirandinên nivîskarên zarokan bo edebîyata zarokan girêdayî ‘têkiliyeke asîmetrîk’ e ku ‘kodê çîroka zarokan’ pêk tîne; lêbelê ‘îdeala ragihandina sîmetrîk’ heye ku tê wataya têgihîştina rast a di navbera nivîskar û xwîner de û pîvana normatîf ya Lyppî ji bo edebîyata zarokan dibe ev. (Heimeriks û Van Toorn, 1989, r. 370-372). Lêbelê Barbara Wall berevajiyê Travers, White û Lypp angaşt dike ku:

Hemû nivîskarên ku ji bo zarokan dinivîsin, divê hinekî sivik binivîsin. Ger ew li gorî xwînerên mezin ango hevsalên xwe binivîsin, çîrokên wan dê herdem bala zarokan nekêşin û belkê pir caran dê neyên fêmkirin; ya herî xirab, ev dikare rasterast zirarê bide zarokan; heta eger serleheng zarokek be jî, wekî çîrokên *The Go-Between* û *What Maisie Knew*. Gava ku nivîskarek muxatabê xwe zarok bihesibîne û naveroka çîrokê yan jî rêbazên vegêranê ji bo sehên xwînerên zarok biguncîne, mirov dikare bibêje ku nivîskar di navbera xwînerên mezin û zarokan de cudahiyeke ji hêla şîyan, mêldarî û baldariyê ve qebûl dike (Wall, 1991, r.5).

Lêbelê, digel ku Wall ditirse ku zerarê bide zarokê, Gillian Avery difikire ku “Zarok mekanîzmaya xwe ya parastinê heye li hemberî tiştên ku ew di pirtûkê de jê hez nake yan fêm nake... Ew guh nade naveroka ku jê hez nake (belkê ji ber binhişê xwe) yan jî watayêke cuda jê werdigire... Zarok tiştên ku dixwazin ji pirtûkekê digirin û ne tiştêkî din” (Avery, 1976, r.33). Ev pênaseya ‘zarok’ a rexnegirên mezin nikare li gorî nêrîn û dîtînen zarokan bê pênasekirin an berevajîkirin; ji ber ku ev dîtîni ji hêla mezinan ve ji bo amanc û perspektîfên wan têne şîrovekirin-hilbijartin an jî sererastkirin. Nicholas Tucker aliyekî vê yekê wiha rave dike:

Hewldana fêmkirina xweza û karîgerîya têkiliya di navbera zarok û pirtûkên wan ên bijare de qet ne hêsan e... Hewldaneke rehet ya ji bo vê kêşeyê pîrî caran ev e ku bi rêya lêkolîn û anketên cihêreng ji zarokan tê pirsîn ka wataya pirtûkan li ba wan çî ye. Lêbelê arastekirina pirseke wiha sext bo vekolîna bersivên tevlihev (carinan nezalal) ji bo peyda kirina kêşeyê rêyeke giran e. Zarok bi awayekî dikarin pirsan piştguh bikin, şîroveyên kurt ên wekî ‘Ne xirab e’ yan ‘Çîrok baş e’ bikin. Ev cure bersiv jî têgihîştina lêkolîneran a derbarê berhema xwendî de bi pêş ve nabin (Tucker, 1981, r.2).

Di vê nuqteyê de divê bê zanîn ku rawêja neguhêrbar a di binyada edebîyata zarokan de têgihîştina seha gerdûnî ya ‘zarokê’ ye ku rexneya edebîyata zarokan a li seranserê cihanê bi hev ve girê dide. Rexneya edebîyata zarokan a di gelek çandan de ‘zarokê’ wekî ‘hebûneke heyî’ dipejirîne û ev ‘hebûna heyî’ di çandên cihê de bi rengekî cuda tê pênasekirin; lewra di nav çandên cihê de têgihîştina ji mewhûma zarokê newekheviyek xuya dike. ‘Zarok’ û ‘edebîyata zarokan’ ya pevgirêdayî wê, di vê riwangehê de, pir caran ji hêla rexnegirên çandên din ve wekî ji Rojava deyngirî tê fêmkirin. Rexnegirê Endonezyayî Sunindyo vê yekê wiha destnîşan dike:

Wekî li welatên din, edebîyata Endonezyayê jî rehên xwe ji nerîteke devkî werdigirt... Dîroka pirtûkên zarokan li Endonezyayê ya serdema îro bi tevahî di dema Balai Pustaka de dest pê dike; ew weşanxaneyêke dewletî bû ku di sala 1908an de (dema ku Endonezya kolonîyeke Holandî bû) ji aliyê rêveberiya Holanda Giravên Hindûstana Rojhilat ve hatiye damezrandin. (Sunindyo, 1987, r. 44–45).

Rexnegirê Japonî Tadashi Matsui destnîşan dike ku li Japonyayê di salên 1920an de “mezînbûna bajarên mezin ên bi nifûsa zêde bû sedema derketina çîna navîn... di nav vê çînê de liberalîzma Ewropî, şewaza jiyanî bajarvanî, perwerdeya girseyî ya herwe û têgeheke nûjen a zarokê” derket holê (Matsui, 1986; 1987, r.14). Dema ku Birgit Dankert balê dikişîne ser paşxaneya pêşkeftina edebîyata zarokan li Afrîkayê, ew bala xwe dide agahiyên berê xwe yê derbareyê karîgerîya Rojavayê û balê dikişîne ser aliyekî din jî;

Di gel gelek ‘destkeftinên’ çandî yê din, hêzên kolonyal ên berê pirtûkên zarokan jî bi Afrîkayîyan dan nasandin. Van veguhestinên çandî tevliheviyek derxist holê. Hin kesan ji van veguhestinan re rêz digirtin û hinekan jî ew red dikirin; her wekî gelek hêmanên din ên çandî ku wan ji hêzên kolonyal ên wê demê (û îro jî dikin) deyn kiribûn. Nîqaşên li ser pirtûkên zarokan dimîne yê wan demên ku edebîyata zarokan li Ewropayê dest pê kiribû: Divê pirtûkên zarokan wekî berhemên perwerdeyê bîn amadekirin, bi van pirtûkan çanda gelêrî bê parastin, rêjeya xwendin û nivîsandinê li Afrîkayê bilind bike û piştgirî bide nasnameya çandî ya Afrîkî (Hunt, 1992, r.112).

Cudahiyên di navbera pênaseyên cihêreng ên têgehên ‘edebîyata zarokan’, ‘zarok’ û ‘edebîyatê’ ji



bo rexneya edebîyata zarokan kêşeyî ne; lewra ev yek hewla bidestxistina amanca rexneyê sist dike. Di vê rewşê de, pêşniyazên xwendinê yên rexneya edebîyata zarokan ji bo zarokan dibe pirsgirêk û rexnegir bi awayên cuda hewl didin rastbûna dîtinên xwe biselmînin. Pirsgirêkên giring ên civakî (wekî nijadperestî) bûne sedem ku rexnegirên ku xwedî heman nêrînan in li dijî nijadperestiyê pirtûkekê bi yekcar cuda binirxînin. Mînak rexnegirê Brîtanî Bob Dixon pesnê romana Paula Fox a *The Slave Dancer* (Govenderê Kole, 1973) dide û romanê wekî ku “mirov metel dihêle û rasterast nîşaneya mirovahiyê ye... wekî karekî hunerî yê di asta herî têkûz de” pênase dike (Dixon, 1977, r.125); lêbelê heman roman di nav rexnegirên Amerîkî de hate rexnekirin ku yek ji wan jî Sharon Bell Mathis bû ku vê romanê “heqaretek ji zarokên reşik re” didît. (Mathis, 1977, r.146). Di çarçoveya van rexneyan de Binnie Tate angaşt dikir ku “nijadperestî di gelek xalan de xwe dide der... (bi îmayên zêde yên nijadperestî û hizrên neyînî yên di vê mijarê de dubare dibin)” (Tate, 1977, rr.152–153). Rawêja ku pirtûkên zarokan bi rengekî karîgeriyê li ser zarokan dikin giringiya vê mijarê tîrtir dike: Gelo *The Slave Dancer* nijadperestiyê dihewîne yan li dijberî wê derdikeve (an tiştêkî bi tevahî cuda dike)? Di her rewşê de, rexnegirên edebîyata zarokan bivênevê xwe dispêrin vê angaştê bingehîn: Ew ji rexnegirên ku dijberiya wan dikin bêtir fêhm dikin zarok kî ne, zarokatî tê çî watayê û zarok çawa û çima dixwînin.

Di vekoîlînên curbicur ên hewildanên pênasekirina ‘edebîyata zarokan’ de em bi berdewamî li rastî rawêja zarokê (xwîner) tên (ango rawêja seha ‘xwînerê zaroka’ yekgirtî, hevgirtî û objektîf). Wekî din, em dibînin ku her rexnegirek angaşt dike ku ew xwedî kapasîteya têgihiştina vî xwînerê zarok e. Em dikarin bibêjin ku hemû rexnegirên edebîyata zarokan di vê baweriyê de ne, herçend karê wan tenê rexnegirîya edebî ya edebîyata zarokan be jî. Ji ber ku hêla ‘edebî’ ya berhemekê, dîyarkirina karîgeriya pirtûkê ya li ser ‘zarokê’ ye. Lêkolîna pêvajoyên pênasekirina ‘edebîyata zarokan’ û têgeha ‘zarokê’ ya ku bingeha vê qadê pêk tîne, nîşan dide ku nêrînan cuda çiqas berbelav in û hem bi awayekî jî nîşan dide ku ev cudahiyên heyî insicama rexneya edebîyata zarokan lawaz dike. Bi gotineke din rewşa heyî dide xuyakirin ku pênasekirina edebîyata zarokan û zarokatîyê ji bo rexnegirên edebîyata zarokan gelekî giring e û pênasekirina çawa û çima gelekî karîger e.

Di pênasekirina ‘edebîyata zarokan’ de xala bingehîn bo rexnegiran ev e ku ew pirtûkên ji bo amancên dîdaktîk an perwerdeyê hatine nivîsandin ji yên ‘edebîyata zarokan’ cuda dikin. Ev mijar niha jî bi giranî di nîqaşên ser pirtûkên zarokan de xwe nîşan dide. F.J. Harvey Darton derbarê vê mijarê de nêrîna xwe ya berbelav wiha diyar dike: “Bi ‘pirtûkên zarokan’ mebesta min ew berhemên çapkîrî ne ku bi xwezayî zarokan şa dikin, kêfa wan xweş dikin; ne ku hewl bidin rêya rast nîşanî wan bidin û şîret li wan bikin an jî tenê serê wan mijûl bikin” (Darton, 1932/1982 r.1). Li gorî rexnegirê edebîyata zarokan, taybetmendiya sereke ya ‘edebîyata zarokan’ ew e ku bi şeweyeke xwezayî û balkêş xwe pêşkêşî xwînerê zarok bike; ne bi peyamên dîdaktîk ku bêhteng, zorker, rênîşaner û êrîşker in. Ev taybetmendî di heman demê de dibe nirxandina sereke ya nîşankirina taybetmendiyan ‘edebî’ yên pirtûkên zarokan. Wekî ku Margery Fisher diyar dike:

Divê em ji çîrokên zarokan pend û şîretan, angaştên dadweriyê û belavokên civaknasiyê *hêvî nekin*. Divê em wan wekî karên hunerî yên serbixwe bibînin ku bikarin xwe bigihînin bi xeyal, hiş û dilê xwînerên xwe... Eger nivîskarek nekare tiştê ku bi rastî his dike bine ziman, eger nekare mijarek bi kurahî vebêje... (Sedem her çî be, di hewla xwe de hewceyî sadebûnê his bike) ev di dawiyê de taybetmendiyan pirtûkan sist dike; taybetmendiyan ku divê di edebîyata zarokan de hebin (Havilan, 1973, r.273).

‘Edebîyata zarokan’ ‘edebîyatê’ wiha pênase dike: Wekî tiştêke ku bi eslê xwe ji bo zarokan baş e; wekî tiştêke ku ji pirtûkên neçîrokî karîgertir e, an zêdetir li ser zarokan bandor dihêle. Ev (bê guman) çend rawêjan derbarê ‘zarokê’ de dihewîne ka ‘zaroka’ dixwîne çî ye û çawa vê pêk tîne. Charlotte Huck bi kurtî di vê mijarê de nêrîna xwe wiha tîne ziman: “Nivîseke baş an jî bikaranîna



ziman a bikarîger dê ji xwîner re bibe alîkar ku kêfa spehîtiyê, heyraniyê û pêkenînê biceribîne... Xwîner dê bê handan ku xewnên xwe xeyal bike, bifikire û pirsan ji xwe bike” (Huck 1976:4). Ev têgeha ‘edebî’ bi serê xwe ji gelek rexnegirên edebîyata zarokan re pirsgerêkên giring derdixe holê. Di hewildana xwe ya di parastina hem têgeheke hîmî û hevîrtî ya ‘zarok’ û hem jî têgeheke ‘edebîyatê’ de, rexnegir mecbûr dimînin ku bi vegotinên hevîdîj re bikevin têkoşînê; ev gotar bi awayekî zelal rê li ber me vedike ku em bibînin di rexneya edebîyata zarokan de ‘zarok’ û ‘edebîyat’ hevûdu çawa diwesfînin û dikemilînin. Mînak Joan Glazer û Gurney Williams diyar dikin ku “pirtûkên zarokan ên baş bi ‘materyalên bihêz, honandineke serkeftî, mekanên dewlemend, lehengên kemilî, mijarên giring û şewazên hunerî... zimanekî wêrek û xeyalî” dirûvê xwe aşkere dikin (Glazer û Williams, 1979, r.34, 19); û ev “tazebûn... ji nivîskar tê. Û nivîskarî jî bi têgihîştina mahîyeta zarokê dest pê dike.” (22) Digel van, ev herdu rexnegir dibêjin ku zarok ji van pirtûkan hez nekin jî ev pirtûk dikarin wekî ‘edebîyata baş’ bînin dîtin; lewra “ji malzemeyên xurt pêk tên... ecibandî û nehezkirina zarokan qelîteya edebîyatê diyar nake... Divê pirtûk li gorî taybetmendiyên xwe yê edebî bînin nixandî û zarok ji edebîyateke hêja behredar bin.” (34)

Têgeha ‘zarok’ê di peywendaya xwendinê de bi hin nêrînên diyar ên wekî azadî, hest û hişmendiyê ve girêdayî ye. Her wekî ku Darton jî amaje pê dike; têgeha ‘zarok’ê bi berterafkirina nêrînên hafîsînkirin û zorlêkirin dirûv digire û di nav pêkhatiyên çandî û civakî de li kuncên taybet vedinişe. Ev ramanên derbarê edebîyat û azadîyê de ji îdealên humanîzma lîberal a Rojavayî dertên ku esasen reha xwe ji çanda Yewnanî ya klasîk werdigire. Dema ku em gotinên Michele Landsberg, Charlotte Huck, Glazer û Williams ên derbarê nixra edebîyata zarokan de bi ya perwerdekarê humanîst yê sedsala 16an Juan Luis Vives re berawird bikin, ev xal xwe aşkere dike:

Helbest xwedî mijarên karîger ên derasayî ne û daxwazên mirovan bi awayekî ecêb û zindî nîşan dide. Ji vê re *energia* tê gotin. Giyanêke gewre û payebilind di nava wan de heye; ewqasî ku xwîner dikevin ber pêlên vî giyanî û rewşeke nû ku ji sînorên hişê xwe û cewhera xwe derbas dibin (Vives, 1913, r.126).

Digel hemû angaştên berxwedêrên ku dijberiya naveroka perwerdeyê û têgeha ‘fêrkariyê’ (dîdaktîzm) ya xetere di vegêrana rexnegirên edebîyata zarokan de roleke berçav bi perwerdeya zarokan a hestî, sincî û bîreweriyê nayê dayîn; herçend em dizanin ku ew giringî didin vê xala edebîyata zarokan jî.

Di vê navberê de, derbarê tîkiliya di navbera ‘zarok’ û pênaseyên taybet yê azadî yan serbestiyê de, em dikarin gotara Tadashi Matsui ya di navbera ‘fîkrên lîberalîzma Ewropî, şewaza jiyana bajarvanî, perwerdehiya girseyî ya azad’ û ‘têgeha nûjen a zarokê’ de bînin bîra xwe. Bi heman awayî em dikarin behsa gotara Birgit Dankert a li ser edebîyata zarokan a Afrîkayê jî bikin ku balê dikişîne ser rewşa tevlihev a edebîyata zarokan. Ev berhem wisa tînin nivîsandî ku wekî ew hilgirê çanda devkî ya malbatî ne û bêangajman in (‘deqeke bêguneh’); lêbelê tê hizrîn ku naveroka rastîn a pirtûkê her çî dibe bila bibe, çanda nivîskî (wekî hilberîneke îdealên perwerdehiya hunerên lîberal) mecbûr e ku van nixan bihewîne.

Rexnegirê swêdî Boel Westin di vê mijarê de balê dikişîne nêrînên Darton û vê xalê bêtir ronî dike. Li gorî wî, rexnegir dixwazin xwe ji rola fêrkariyê ya edebîyatê dûr bikin, ev yek di hewla wan de dixuye; lewra êdî ew bala xwe ji zorlêkirinên mezinan zêdetir didin bi hewcedariyên ‘zarokan’:

Heta dawîya sedsala 19an, amanca sereke ya pirtûkên (Swêdî) zarokan ew bû ku xwînerên xwe yê ciwan ji hêla hestên sincî, reftarên rast û hizrên dînî ve perwerde bikin. Edebîyata zarokan li Swêdê taze di destpêka sedsala 20an de dest pê kir ku bersivê bide hewcedariyên zarokan, ne yê mezinan (Westin, 1991, r.7).

‘Edebîyata zarokan’ wekî qadeke nû hate dîtin ku hem ji hêla şewaz û hem jî ji hêla naverokê ve ‘hewcedariyên zarokan’ bi cih bîne. Ji ber vê yekê ye ku tê hizrîn di navenda pirtûkên zarokan de

‘zarok’ heye; herçend ev ‘pirtûkên zarokan’ ji hêla mezinan ve hatibin nivîsandin, çapkirin, firotin û pir caran kirin jî. Rexnegira Zelandaya Nû Sydney Melbourne dema ku derbarê şayesandina Maoriyan a di pirtûkên zarokan de nêrînên xwe tîne ziman dibêje ku: “Em li pey çi ne? Ne tenê xemilandinê candî, ew teqez e. Cewhera zarokan? Erê...” (Melbourne, 1987, r.102).

Têkiliyên nêzik di navbera pênaseyên zaroka xwîner û edebîyata zarokan de bi tevahî diyar dibin: Rexnegir gelek caran wan wekî yek û heman tişt bi nav dikin; lewma edebîyata zarokan wisa tê dîtin wekî ku ji hêla zarokan ve hatiye nivîsandin. Zarok hewcedariyên xwe, hest û serpêhatiyên xwe di wan de tînin ziman. Lissa Paul dema ku rewşa edebîyata jinan û ya zarokan dide ber hev wiha dinivîse:

Dema ku nîşan û zimanê edebîyata jin û zarokan ji rexnegirên serdest ên mêr re biyanî û yê din bin, hema bêje ne pêkan e ku ew wataya van qadan tam fêhm bikin. Ji ber vê yekê, yek ji pirsgerêkên bingeşîn ên rexnegirên femînîst û edebîyata zarokan; naskirin, pênasekirin û nirxandina ‘ya din’ e.” (Paul, 1990, r.150).

Paul edebîyata zarokan wekî ku ji aliyê zarokan ve hatiye nivîsandin dinirxîne û vê rewşê jî dişibîne nivîsandina edebîyata jinan, wiha dinivîse: “Jin zêdetirî nivê nifûsa cihanê pêk tînin û em hemî jî wextekê zarok bûn. Hişê mirov jê nabire çawa ku jin û zarok ewqas dirêj nehatine dîtin û dengê wan nehatiye bihîstin.” (150) Bi vî awayî, Paul vê rastiyê piştguh dike ku edebîyata zarokan (eger ne ji hêla jinan ve hatibe nivîsandin) ji hêla ‘rexnegirên serdest ên mêr’ ve hatiye nivîsandin (eger ew ne di wê baweriyê de be ku ji bo nivîsandina edebîyata zarokan hewce ye ku ji nû ve mirov bibe zarokek; lewma gelek rexnegir di wê baweriyê de ne). Mînak Myles McDowell jî têgeha ‘zaroka di pirtûkê de’ wiha pênase dike:

Pirtûkên zarokan bi giştî kurttir in; ji ravekirin û raçevkirina derûnî bêtir giraniyê didin ser diyalog û bûyeran; serlehengên berheman zarok in; nirxên nerîtî pir tînin bikaranîn; roman di pêşnûmayeke zelal a sincî de diherike ku di romanên mezinan de pirî caran tê piştguhkirin; pirtûkên zarokan bi gelemperî xweşbîn in, ne reşbîn in; ziman li gorî zarokan tê bikaranîn; naverok li gorî sistemeke diyar tê honadin; ihtîmal pirî caran tê piştguhkirin û di wan de behsa gelekî sêhr, xeyal, daxwaz, bûyerên normal û serpêhatiyên tînin kirin (McDowell, 1973, r.51)

Li ser van pîvanan û têgeha ‘zaroka di pirtûkê de’, rexnegir û nivîskara Amerîkî Natalie Babbitt dibêje ku pirtûkên zarokan ne hewce ne ji pirtûkên mezinan kêmtir ciddî bin û ne jî mecbûr in ku ‘hêsantir’ an jî bi hestên ‘cuda’ re têkildar bin: “A rastî, tiştêk bi navê hestên mezinan tune û edebîyata zarokan bi hemî hestan re mijûl dibe.” (Babbitt, 1973, r.157) Piştî Babbitt amaje pê dike ku cudahiyeke mezin a bergeh û pirrengiya naverokê di navbera herdu cureyan de tune. Her mirova ku di *The Wind in the Willows* (Bayê Bîyan) derdikeve pêşiya xwîner dikare di *Ulysses*a James Joyce de jî xwe nîşanî me bide. Li gorî Babbitt, ji aliyê naverokê ve di navbera edebîyata mezinan û ya zarokan de zêde ferq tune: “Aliyên herî dijwar yê jiyane yê wekî şer, seqetî, feqîrî, hovîti, di edebîyata zarokan de jî hene.” (157) û fantazî jî ne derî vê yekê ye.

Babbitt herwiha difikire ku bikaranîna ziman ne taybetmendiyeke cudakirina edebîyata zarokan ji edebîyata mezinan e:

Pirtûkên zarokan xwedî xezneyeke peyvên xwerû ne? Zimanê Kiplingî hinekî bi yê Hemingwayî bidin ber hev û careke din bifikirin. Hevoka destpêkê ya *A Farewell to Arms* (Bi Xatirê Silahan): “Niha dema payîzê bû û daran belçimên xwe weşandibûn û rê jî bibûn herî.” Hevoka destpêkê ya *How the Rhinoceros Got His Skin* (Kergedan Çawa Bû Xwedî Çermê Xwe): “Wextekê, li giraveke bêşênî ya li rexê Deryaya Sor Persiyek dijiya ku ji kumê serê wî tîrêjên rojê yê ji tava Rojhilata Navîn geştir dibiriqî.” Ewqas bes e! (Babbitt, 1973, r.157).

Karîgera rexeke (side-effect) ya vê nêrînê ev e ku ‘edebîyata zarokan’ di encama lêgerîneke dîrokî

ya hewla fêmkirina ‘zarok’ û ‘hewceyên wî’ de derketiye holê (di vê çarçoveyê de John Locke û Jean-Jacques Rousseau bi gelemperî wekî ‘keşifkerên zaroktiyê’ tên pejirandin). Di encama vê nêrînê de, gelek (lê ne hemî) rexnegir edebîyata zarokan bi têgehên peresînî rave dikin: Bi zanebûn an jî xeletî wisa difikirin ku ‘edebîyata zarokan’ têgeha ‘zarokê’ di pirtûkan de her gav baştir û rasttir bi kar tîne û her diçe di vê hêlê de xwe bi pêş ve dibe. Wekî ku Boel Westin li ser dîroka edebîyata zarokan a Swêdê dinivîse:

Piştî Şerê Cihanê yê Duyemîn, meylên nû yên psîkolojiya zarokan û nêzîkatiyeke azadtir a perwerdeyê ji hêla kesayetên wekî Bertrand Russell û A.S. Neill li Swêdê bi berfirehî hat pejirandin. Daxwaza zarokê ya ji bo listin û pêketina kêfxweşiyê di qonaxên cuda yên kamilbûnê de hat dabînkirin. Di edebîyata zarokan de cihan êdî bi çav û sehên zarokan bi xwe hat şayesandin. (Westin, 1991, r.22).

Li gorî vê nêrînê, têgeha ‘zarok’ di ‘klasîkên edebîyata zarokan’ de bi gelemperî wekî avantgard an jî bi rengekî awarte û anakronîk tê pênasekirin... Wekî mînak Barbara Wall rewşa klask a *Alice in Wonderland* (*Serpêhatiyên Aliceê Li Welatekî Ecêb*) wiha rave dike:

Di dîroka edebîyata zarokan de yekem car bû ku hişê zarokê (Alice) di navenda vegêranê de cih girtibû... Tu vegêrê zarokan ewqas nêzîkî lehengeke zarok nebibû; ne tenê ji nêz ve ew raçev kiribû, di heman demê de bêtir ku wê rexne bike ew şayesandibû û tiştinan nîşan dabû ku wê zarokê tenê dîtibûn (Wall, 1991, r.98).

Dubendiya fêrkarî-edebî ya rexnegirên edebîyata zarokan didome û wekî yek ji biryareke dawî ya nîrxa ‘edebîyata zarokan’ rola xwe berdeham dike; lewra ‘zaroka’ di pirtûkan de ji hêla her rexnegirê ve bi awayekî tê pênasekirin. Mînak Sheila Egoff wiha dinivîse:

Ez dikarim vê pêşniyaz bikim ku bila amanca edebîyata zarokan ne hînkirin be, lê kêfdayîn be; bila taybetmendiya wê meraqa bêdawî ya zarokan, sadebûn, ken û germahî be û li seranserê dinê di pirtûkên zarokan de bila edebîyat tê de bimîne; lêbelê civaknasî û hîndeke li derê wê bisekine (Egoff, 1987, r.355).

Bi heman awayî, Yoko Inokuma dema ku derbarê komên kêmar ên edebîyata zarokan a Japonî de dinivîse wiha dibêje:

Amanca hîndeke yê ya nivîskar bi tevahî aşkere ye... Tu kes ji rastbûna amanca wê guman nake. Lêbelê hem xwînerên Koreyî û hem jî yên Japonî dibe ku dijwar bibînin xwe bi lehengên yekalî re hevaheng bibînin... Di encamê de, xwesteka Imao Hirano ya ji bo danasîna zarokên Japonî nakam maye û di destê wê de tenê otobîyografiyê edebî ya weset maye... Bi kurtî, pirtûkên xwedî nîrxên bilind ên edebî kurterê ne ji bo têngiştin û hevdiliya rast bi komên kêmar re (Inokuma, 1987, r.75, 76, 82).

Ravekirina Inokuma têgeha ‘hevyekeî (identification/özdeşim)’ zelal dike. Ev têgeh yek ji têgehên bingehîn ên rexnegirên edebîyata zarokan e. Hizra ‘hevyekeîyê’ dema ku dibe bersiva zarok çima û çawa dixwîne, piştgirî dide wê nêrîna ku dibêje ‘zarok’ ew kesê ku di ‘pirtûkên zarokan’ ên baş de ye: Tê hêvîkirin ku ‘zarok’ bi xwezayî û dilxwazî berê xwe bide wan pirtûkan ku di wan de xwe nas dike. Wekî ku rexnegirê Îsraîlî Adir Cohen dibêje:

Nivîskar têngiştin ku ji bo zarokan pirtûkek çavkaniya kêfxweşiyê ye ku zarok bi wan xwe dinase, tevli ceribandînan wan dibe û zanîna xwe bi rêka wan zêdetir dike. Pirtûk derfeta xwenasîn, xwekemilîn û berfirehkirina serpêhatiyên giyanî dide zarokan. Pêvajoya xwendin, xwepênasekirin, tevlibûn û peywendîdayîna bi awayekî dinamik xwîner tevli rastiya naveroka pirtûkê dike (Cohen, 1988, r.31).

Lêbelê, ‘hevyekeîyê’ jî nekariye xwe ji gengeşiyên derbarê pênaseya ‘zarokê’ de dûr bihêle. Ji ber ku pêvajoya ‘hevyekeîyê’ bi têgeha ‘zarokê’ ve girêdayî ye ku rexnegir çarçoveya wê dikêşin. Pênaseyên cihêreng rê li ber nîrxandinê cuda yên şîyana pirtûkê vedikin. Di van nîrxandinan de tê gotin ka bi

çiqasî xwînerê zarok dikare xwe pênase bike. Lêpîrsînên van nîrxandinan li ser xalên wekî pênasekirin çî ye û peywîra wê çî ye, zal dibin. Lêbelê hemî gengeşî hebûna domdar û pîrhêl a têgeha ‘zarokê’ dûpat dikin: Heger ne, têgeha ‘hevyekeştî’ bi edebîyata zarokan re ku têkiliyêke tevlihev a wê bi ‘rastîyê’ re heye, çawa dikare kar bike? Di çîrokê de hêj jî ji ‘zaroka’ berbiçav a pirtûkê tê hêvîkirin ku ji aliyê ‘zaroka xwîner’ ve wekî ‘rasteqîn’ bê pejirandin.

Ji ber vê yekê, rawêjên nepenî û aşkere yê derbarê ‘zarok’ û edebîyata zarokan de li ser ravekirinên ‘hevyekeştîyê’ karîger in; wekî ku em di vegotina Adir Cohen de dibînin. Donna Norton ‘hevyekeştîyê’ wekî “pêvajoyêke ku zarok pêwendiyêke hestiyarî bi model re didane; zarok bawer dikin ku ew wekî wan modelan in û raman, hest û taybetmendiyên wan dişibin wan modelan.” (Norton, 1983, r.20) Rexnegirên Amerîkî Judith Thompson û Gloria Woodard ji vê pêşniyazê wiha encam derdixin:

Lêbelê yek ji sînorên zehfî pirtûkan ew e ku tenê bi zarokên çîna navîn re hesta hevyekeştîyê didanin û li derdorî hizrên vê çînê naverokê disazîn. Ji bo gelek zarokên çermreş, ev pirtûk gelekî ji ceribandînan wan dûr dimînin... Ji bo ku xwînerên ciwan ên çermreş bi naveroka pirtûkê re hevyekeştîyê hîs bikin, hewce ye ku serlehengê pirtûkê derbarê çanda çermreşan (ku wekî jêreçand/subculture tê ditin) de xwedî agahiyên kûr be.

Thompson and Woodard 1972:23

Lêbelê rexnegirê Brîtanî Robert Leeson dema ku mekanîzmaya navendî ya pêvajoya hestiyarî ya xwendinê rave dike, ‘hevyekeştîyê’ bi vî rengî tîrtir dike. Herçend Leeson dipejirîne ku ‘zarok’ hewce ye ku xwe nas bike, di heman demê de ew dibêje ku “zarokên çîna karker naxwazin tenê derbarê xwe de bixwînin” û zarok hez dikin ku bikevin cîhanêke cuda û ew bi rêka xwendinê dixwazin kêf û kelecaniyêke neyekser biceribînin (Leeson 1977 :43). Li gorî Leeson, pirtûkeke baş ji bo ‘zarokan’ ew nîne ku tenê jê re bibe neynik û jiyana wan dubare bike; berevajî divê tişteke ku heta niha neceribandîye pêşkêşî wan bike. ‘Hevyekeştî’ têgeheke bipîrsgirêk e ku pîrî caran bikaranînan wê yê zêde û berbelav bê nîrxandin tîr pejirandin: Divê di pirtûkê de ‘zarokek’ bê pêşbînîbikin. Ger hebûna wê ‘zarokê’ bê pêşbînîbikin jî, ‘hevyekeştî’ nikare xwendina berdewam rave bike; lewra zarok tenê li pey xwegerînan nîne. Di dawiyê de, ‘hevyekeştî’ nikare pêvajoyên xwendinê yê hîpotetîk ên wekî fêrbûna tişteke nû, jixwewerînan an jî wekî ku D.W. Harding dibêje “têgihîştina xeyalî ya ku kesekî din çî hîs dike û berçavgirtina ezmûnên mirovî yê pêkan ên ku heta niha me bi xwe neceribandîne” rave bike (Harding 1967: 7).

Bi vî awayî pênaseyên edebîyata zarokan û zarokatîyê di nava vegêrana edebîyata zarokan de bi hev ve girêdayî ne, di pênasekirina hevûdu de karîger in. Di rexneya edebîyata zarokan de alozî û kêşe derdikevin; ji ber ku rexnegirên edebîyata zarokan di wê baweriyê de ne ku têgehên ‘edebîyat’ û ‘zarokatî’ xwedî pênaseyên serbixwe û taybet in û ev pênase tenê di nav edebîyata zarokan û rexneya wê de bo hevûdu sîdewer/karîger dibin. Rexnegirên edebîyata zarokan di nivîsên xwe de vê hizra xwe ya bîngêhî der dikin: Digel nelîhevîkirin û nakokiyên navxweyî yê ku min berê behs kiribû, ev yek herî zêde xwe di hewla rexnegiran de aşkere dike ku xwe dikin du beş wekî ‘mîrovên pirtûkhez’ û ‘mîrovên zarok’ (Townsend 1980:199). Townsend destnîşan dike ku:

Piraniya gengeşiyên derbareyê standardan de bê encam dimînin; ji ber ku aliyên dijber difikirin ku pîvanên wan ji hev cuda ne. Ger yek rast be, divê ya din xelet be. Ev ne hewce ye wisa be. Dibe ku ji bo amancên cihê cureyekî taybet ê nîrxandinê hewce be... Ez tenê dixwazim diyar bikim ku wekheviya riwangeha nêrînan derûnnas, civaknas û yê hin perwerdekarên digel yekûdu yan bi yê kesên xwedî riwangeha edebî re pîr kême (Townsend, 1980, r.193–207).

Lêbelê, pêşniyaza Townsend bo berhemên rexnegiran ku xwe ji heman ‘birê’ dibînin, kêşeya (heta ji bo edebîyata zarokan bi xwe!) peydabûna ‘zarokên’ cuda û ji ber vê jî şîroveyên nakok yê pirtûkan sivik nekîr. Edebîyata zarokan û rexneya edebîyata zarokan angaş dikin ku ew ji ber hebûna ‘zarokan’

û ji bo hebûna 'zarokan' hene û ew 'zarok' in ku meraqa (û hem jî maka gengeşiyê di navbera rexnegir û nivîskaran de) rexnegir û nivîskarên zarokan ber bi xwe ve dikêşin.

## References

- Aiken, J. (1973). Purely for love, dnd. Haviland, V. (ed.) *Children and literature: Views and reviews*. Bodley Head.
- Ariès, P. (1973) *Centuries of childhood*. Penguin.
- Avery, G. (1976). A sense of audience—2, dnd. Fox, G. et al. (eds) *Writers, critics, and children: Articles from children's literature in education*. Heinemann Educational Books.
- Babbitt, N. (1973). *Happy endings? Of course, and also joy'*, dnd. Haviland, V. (ed.) *Children and literature: Views and reviews*. Bodley Head.
- Cohen, A. (1988). 'The changing face of Israeli children's literature: forty years of creativity', *Modern Hebrew Literature new series* 1:25–31.
- Cott, J. (1984). *Pipers at the gates of dawn: The wisdom of children's literature*. Viking.
- Darton, F.J.H. (1932/1982). *Children's books in England: Five Centuries of Social Life*. 3rd ed., rev. B. Alderson, Cambridge University Press.
- Dixon, B. (1977). *Catching them young. Vol. 1: Sex, race and class in children's fiction*, Pluto Press.
- Egoff, S. (1987)ç *Inside and out: a Canadian's view of trends in contemporary children's literature'*, dnd. Lees, S. (ed.) *A track to unknown water: Proceedings of the second pacific rim conference on children's literature*. Scarecrow Press.
- Glazer, J.I. and Williams G, III (1979). *Introduction to children's literature*. McGraw-Hill.
- Harding, D.W. (1967). *Considered experience: the invitation of the novel*, *English in Education* 2, 1: 3–14.
- Haviland, V. (ed.) (1973). *Children and literature: Views and reviews*. Bodley Head. ,
- Heimeriks, N. and Van Toorn, W. (eds) (1989). *De hele bibelebontse berg. de geschiedenis van het kinderboek in nederland en vlaanderen van de middeleeuwen tot heden [the whole 'bibelebonts' mountain: The history of children's books in the netherlands and flanders from the middle ages to the present]*. Em. Querido.
- Huck, C.S. (1976). *Children's literature in the elementary school, 3rd ed.*, Holt, Rinehart and Winston.
- Hunt, P. (ed.). (1992). *Literature for children: Contemporary criticism*. Routledge.
- Inglis, F. (1981). *The Promise of happiness: Value and meaning in children's literature*. Cambridge University Press.
- Inokuma, Y. (1987). *The present situation of stories about minority groups in Japan*, dnd. Lees, S. (ed.) *A track to unknown water: Proceedings of the second pacific rim conference on children's literature*. Scarecrow Press.
- Landsberg, M. (1987). *Reading for the love of it: Best books for young readers*. Prentice Hall.
- Leeson, R. (1977) Children's books and class society: Past and present, children's rights workshop (ed.) *Papers on Children's Literature no. 3*, London: Writers and Readers Publishing Cooperative.
- Lonsdale, B.J. and Mackintosh, H.K. (1973). *Children experience literature*. Random House.
- McDowell, M. (1973). *Fiction for children and adults: some essential differences*, *Children's Literature in Education*, 10:551–563. 28
- Mathis, S.B. (1977). *The slave dancer is an insult to black children'*, dnd. MacCann, D. û Woodard, G. (eds) *Cultural conformity in books for children: Further readings in racism*, Scarecrow Press.
- Matsui, Tadashi (1986–1987) 'A personal encounter with Kodomo no kuni: a vanguard Tokyo periodical of the twenties and thirties', *Phaedrus: An International Annual of Children's Literature Research* 7, 2/3:14–18.
- Mead, M. and Wolfenstein, M. (1955). *Childhood in contemporary cultures*. University of Chicago Press.
- Melbourne, S. (1987). 'The portrayal of the Maori in New Zealand children's fiction', dnd. Lees, S. (ed.) *A Track to unknown water: Proceedings of the second pacific rim conference on children's Literature*. Scarecrow Press.
- Norton, D.E. (1983). *Through the eyes of a child: An introduction to children's literature*. Charles E. Merrill.
- Paul, L. (1990). *Enigma variations: what feminist theory knows about children's literature*, dnd. Hunt, P. (ed.). *Children's literature: The development of criticism*. Routledge.



- Rose, J. (1984) *The case of Peter Pan or: The impossibility of children's fiction*. Macmillan.
- Sadker, M.P. û Sadker, D.M. (1977) *Now Upon A Time: A Contemporary View of Children's Literature*, New York: Harper and Row.
- Smith, J.A. û Park, D.M. (1977). *Word music and word magic: Children's literature methods*. Allyn and Bacon.
- Sunindyo, (1987). *Publishing and translating in Indonesia*, dnd. Lees, S. (ed.) *A track to unknown water: Proceedings of the second pacific rim conference on children's literature*. Scarecrow Press.
- Sutcliff, R. (1973). *History is people*, dnd. Haviland, V. (ed.) *Children and literature: Views and reviews*. Bodley Head.
- Tate, B. (1977). Racism and distortions pervade *The Slave Dancer*, dnd. MacCann, D. û Woodard, G. (ed) *Cultural Conformity in books for children: Further readings in racism*. Scarecrow Press.
- Thompson, J. û Woodard, G. (1972). Black perspective in books for children, dnd. MacCann, D. û Woodard, G. (eds) *The black american in books for children: Readings in racism*. Scarecrow Press.
- Townsend, J.R. (1980). Standards of criticism for children's literature dnd. Chambers, N. (ed.) *The Signal Approach to Children's Books*. Kestrel Books.
- Tucker, N. (1981) *The child and the book: A psychological and literary exploration*. Cambridge University Press.
- Vives, J.L. (1913) *On education: A translation of the 'De Tradendis Disciplinis' of Juan Luis Vives, intro. and trans. F.Watson*. Cambridge University Press.
- Wall, B. (1991) *The arrator's voice: The dilemma of children's fiction*. Macmillan.
- Westin, B. (1991). *Children's literature in sweden, trans. S.Croall*. The Swedish Institute.
- White, E.B. (1973). On writing for children, dnd. Haviland, V. (ed.) *Children and literature: Views and reviews*. Bodley Head.

### **Xwendinên Zêdetir**

- Egoff, S., Stubbs, G.T. and Ashley, L.F. (eds) (1969). *Only connect: Readings on children's literature*. Oxford University Press.
- Hunt, P. (ed.) (1990). *Children's literature: The development of criticism*. Routledge.
- (ed.) (1991) *Criticism, theory and children's literature*. Basil Blackwell.
- Lesnik-Oberstein, K.B. (1994). *Children's literature: Criticism and the fictional child*. Clarendon Press.
- Meek, M., Warlow, A. û Barton, G. (eds). (1977). *The cool web: The pattern of children's reading*. Bodley Head.
- Salway, L. (ed.) (1976) *A peculiar gift: Nineteenth century writings on books for children*. (Penguin) Kestrel Books.
- Shavit, Z. (1986). *Poetics of children's literature*. University of Georgia Press

**Girr û Gallî Mindalanî Kurd**  
**Dîrokçeya Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî**  
Kenan Subaşı, Nûbihar, 2018, 184 rûpel, ISBN: 978-605-9413-35-0

**Neslihan GÜNEŞ EROL**

<b>Neslihan GÜNEŞ EROL</b>	Neslihan Güneş Erol  ORCID: 0009-0009-2264-1697  neslihangn65@gmail.com Graduate Student, Mardin aRtuklu University, Kurdish Language and Culture Department, Mardin, Türkiye Mardin Artuklu Üniversitesi, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Yüksek Lisans Öğrencisi, neslihangn65@gmail.com Orcid: 0009-0009-2264-1697
<b>Jêgir</b> Citation Atıf	Güneş Erol, N. (2025). Girr û Gallî Mindalanî Kurd – Dîrokçeya Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî. <i>Artuklu Kurdology</i> (18). 110-115
<b>Dîroka Şandinê</b> Submission Date Geliş tarihi	04.10.2024
<b>Dîroka Qebûlê</b> Acceptance Date Kabul Tarihi	23.12.2024
<b>Dîroka Weşandinê</b> Publication Date Yayın tarihi	30.01.2025
<b>Cureyê Gotarê</b> Article Type Makale Türü	<b>Nirxandina Pirtûkan</b> Book review Kitap Tanıtımı
<b>Hakemî</b> Peer-Review Hakemlik	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk</b> Ethical Statement Etik Beyanı	<b>Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
<b>Kontrola Întihalê</b> Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	<b>Belê – iThenticate</b> <i>Yes – iThenticate</i> Evet – iThenticate
<b>Nakokiyên Berjewendiyên</b> Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî</b> Grant Support Maddi Destek	<b>Nivîskar beyan dike ku wê ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
<b>Mafê Telifê &amp; Destûr</b> Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	<b>Nivîskar li jêr lisansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.



Kovargerîya zarokan di jîyana zarokan û di pêvajoya perwerdeya zarokan de roleke giring digirin. Kovarên zarokan ji alîyê naverokê ve pir dewlemend in û gelek cureyên edebî di hundirê xwe de dihevin. Di kovarên zarokan de berhemên edebî yên wekî çîrok, fabl, karîkatur, helbest, mamik, xaçepirs, zûgotinok, pêşbirk cih digirin. Zarok bi saya van kovaran gelek cureyên edebî nas dikin. Kovarên zarokan bi saya naverokên xwe yê rengîn û piralî bala zarokan dikişînin û zarokan teşwîqê xwendinê dikin. Ji bo ku zarok bibin xwînerên serkeftî yên edebîyatê û xwedî estekîkeke edebî, şopandin û xwendina kovarên zarokan wekî gaveke yekem û herî giring tê nirxandin (Subaşı, 2018, r. 25). Kovarên zarokan ji alîyê ve zarokan hînî xwendinê dîke û ji aliyê ve jî fersendê dide ku zarok hem bifikirin û hem jî kêf bikin. Kovarên zarokan dibe alîkar ku zarok xwe nas bikin û li hember derdor û malbata xwe bêtir hesas bibin. Kovarên zarokan ji bo geşedana nasnameya zarokan û ji bo civakîbûna zarokan roleke piştevanîyê bi cih tînin. Saya van kovaran zarok derfetê dibînin ku bi hevalên xwe re bixebitin, berpirsariyê bistînin û lêkolînê bikin. Kovarên zarokan rêya xwendin, nivîsandin û şîrovekirinê vedike û zarok bi vî awayî tiştên nû fêr dibin û tiştên nû diceribînin (Aytekin, 2016,

r. 260). Bi saya naverokên rengîn û wêneyî zarok ji nivîsan jî keyfê distînin û hişê wan yê dîtbarî xurt dibe. Bi rêya van kovaran haya zarokan ji bûyerên rojane çêdibin û bêtir xwe di jîyana rojane de dibînin û jîyanê bêtir nas dikin. Kovarên zarokan xeyalên zarokan fireh dikin û rê vedikin ku zarok ji alîyê hunerî vê jî xwe bi pêş bixin.

Di perwerdeya zarokan de kovarên zarokan xwedî cihekî taybet e. Di perwerdeyê de kovarên zarokan wekî amûreke perwerdeyê tînin bikaranîn. Di pêvajoya perwerdeya zarokan de kovarên zarokan ji wan re dibin piştevanî û fêrbûnê hêsantir dikin. Kovarên zarokan agahîyên ku di waneyê de hatine dîtin xurt dikin û temam dikin. Kovarên zarokan ne wekî pirtûkên fermî yên waneyan ji wan dûr in. Ji ber vê yekê jî zarok dema di van kovaran de tişteki fêr dibin jê keyfê distînin û agahîyê wan bêtir mayînde dimînin. Valahî û kêmasîyên pirtûkên waneyan bi saya kovarên zarokan tînin temamkirin. Kovarên zarokan xwesteka xwendin û fêrbûnê xurt dikin û bi vî awayê zarok dibin xwedî xwendineke birêkûpêk û ev tişt jî li ser perwerdeya zarokan bandoreke erênî çêdike. Kovarên zarokan ji bo fêrbûna zimanê dayîkê jî xwedî roleke giring e. Ev kovar hezkirina zimanî xurt dikin û fêrbûnê zeximtir dikin.

Kovarên zarokan ji bo erk û fonksîyona xwe bi cih bîne divê xwedî hin taybetîyan bin. Di amadekirina kovarên zarokan de jî divê pîvan û qaîdeyên edebîyata zarokan neyên jibîrkirin û divê ew li gorî rastîya zarokan û jîyana bin. Kaxezên kovarên zarokan divê bi kalîte û mat bin divê rûpelên kovarê birêkûpêk û nivîs li gorî temenê zarokan bin. Di kovarên zarokan de divê hema hema hemû cure nivîs (helbest, gotar, çîrok, fabl, mamik, karîkatur hwd.) hebin. Di kovarên zarokan de ziman û vegotin divê li gorî geşedana zarokan be û divê hevok kurt û safî bin ku zarok bi hêsanî wan nivîsan fêhm bikin. Wêne û şîkl divê li gorî asta têgihîştina zarokan bin. xwerû û safî be û divê di wêneyê de reng neyên tevlihevîkirin. Di kovarên zarokan de divê bûyerên rojane cih bigirin û wêneyên ku van bûyeran rave dikin hebin. Kovarên zarokan divê xwesteka fêrbûnê û xwesteka xwendinê bidin zarokan. Divê kovarên zarokan tenê li ser xala fêrkirinê nesekin û dema bixwaze tişteki bide fêrkirin divê rêya

kêyfê, şîrovekirinê û fikrê jî bihêle ku zarok ji wan nivîsan aciz nebin. Divê di kovarên zarokan de beşên wekî xaçepirs, mamik, berhevkirin yan jî jêkirina wêneyan hebin ku zarok hem jê kêyfê bistînin hem jî ji aliyê destbikariyê ve bi pêş bikevin. Dema kovarên zarokan li gorî geşedana zarokan, li gorî asta zarokan, li gorî rastî û îzafiyeta zarokan bin kovar wekî serkeftî tên qebûlkin. (Oğuzkan, 2022, r. 347)

Kovargerîya zarokan cara ewil li Ewropayê di sala 1722an de derketîye holê. Kovarên zarokan yê pêşî kovarên exlaqî (Moralische Wochenschrift) bûn. Di van kovaran de li ser şîreta exlaqê disekînin. Kovara zarokan ya ewil bi navê *Leipziger Wochenblatt Für Kinder* di sala 1722an de li Almanyayê dest bi weşanê kiriye. Piştî vê kovarê li Îngilistan, Fransa û Amerîkayê jî gelek kovarên zarokan dest bi weşanê kirine. Di weşangeriya tirkî de jî kovara zarokan cara ewil di sala 1869 an de bi navê “*Mümeçyyiz*” dest bi weşanê kiriye (Şimşek, 2001, r. 65; Bayram, 2005, r. 484-500). Kovargerîya zarokan a kurdî 224 sal piştî Ewropîyan, 77 sal jî piştî tirkî dest pê kirîye (Taher, 2018, r. 2) Yekem kovara zarokan a kurdî cara ewil di sala 1946an de bi navê *Girr û Gallî Mindalanî Kurd* li Mahabadê dest bi weşanê kiriye. *Girr û Gallî Mindalanî Kurd* ji aliyê Partîya Demokrat a Kurdistanê ya Îranê ve hatiye derxistin û rêvebirê kovarê Qadirê Muderrîsî bû. Zimanê kovarê bi zaravayê soranî bû û bi temami sê hejmar derketine (Subaşı, 2018, r. 66). Kovar rasterast ji bo zarokan derketîye û amanca kovarê jî pêşxistin û ronîkirina mejiyên zarokên kurd bûye. Di kovarê de gelek cureyên berheman cih girtine. Berhemên wekî çîrok, gotar, rêziman, helbest, pêşbirk, nivîsên mantiq û rewşenbîriya giştî û nivîsên agahdariyê cih girtine.

Kovara *Girr û Gallî Mindalanî Kurd* ji bo kovargerîya zarokan a kurdî pêngava yekem e û di warê xwe de xwedî cihekî giring e. Kovara *Girr û Gallî Mindalanî Kurd* bûye mijara wan kesan ku li ser kovarên zarokan xebat kirine. Li Bakur Türkan Tosun (2017), Îde Demîral Taher (2018) di tezên xwe yê masterê de behsa *Kovara Girr û Gallî Mindalanî Kurd* kiribin jî xebateke berfireh nehatiye kirin û tenê bi kurtasî agahî hatine dayîn. Li Bakur heta niha xebateke rasterast û berfireh nehatibû kirin. Xebata herî berfireh û xebata rasterast ev kovar kiriye mijara xwe û lêkolîneke berfireh hatiye kirin pirtûka bi navê *Girr û Gallî Mindalanî Kurd- Dîrokçeya Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî* ye. Nivîskarê pirtûkê Kenan Subaşı ye. Kenan Subaşı di qada edebîyata zarokan a Bakur de gelek xebatên pêşîn û hêja kiriye û di vê qadê de xebatên xwe dewam dike. Ev pirtûka wî jî di sehaya xwe de cihekî giring digire û hêjayî nirxandin û danasîne ye. Pirtûk di sala 2018an de ji aliyê Weşanxaneya Nûbiharê ve hatiye çapkirin. Pirtûk bi temami 184 rûpel e. Pirtûk ji du beşên sereke pêk hatiye. Di binê van beşan de jî gelek binbeş û sernav cih girtine. Beşa yekem behsa “têkîliya zarok û medyayê û kurtedîroka çapemenî û medyaya zarokan a kurdî” kiriye. Beşa duyem jî behsa “vekolîn û danasîna *Girr û Gallî Mindalanî Kurd*” kiriye.

Me çawa li jor jî gotibû beşa yekem behsa “têkîliya zarok û medyayê û kurtedîroka çapemenî û medyaya zarokan a kurdî” kiriye. Beşa yekem bi destpêkê dest pê kiriye û bi encamê xilas bûye. Di destpêkê de pênaseya medya û çapemeniyê hatiye kirin. Di encamê de tiştên ku gotiye bi kurtasî û zelal ragihandiye. Di beşa yekem de du binbeş û di van her du binbeşan de jî gelek sernav cih girtine. Binbeşa yekem behsa “têkîliya zarokan bi çapemenî û medyayê re” kiriye. Di binê vê binbeşê de sernavên wekî: “zarok û medya”, “zarok û televîzyon”, “zarok û kovar” û “zarok û filmên wan” cih girtiye. Di sernavê “zarok û medya”yê de behsa têkîliya zarok û medyayê hatiye kirin û li ser giringiya medyaya zarokan hatiye sekinandin û medyaya zarokan divê çawa be hatiye nîşandan. Di sernavê “zarok û televîzyon”ê de li ser bandora televîzyonê hatiye sekinandin û bi tabloyeke berawirdkirina bandorên neyînî û erênî yê televîzyonê hatiye nîşandan. Di sernavê “zarok û kovar” de li ser giringiya kovargerîya zarokan hatiye sekinandin. Giringî û amanca kovarên zarokan û ji bo perwerdeya zarokan û geşedana zarokan giringî û bandora kovarên zarokan hatiye nîşandan. Di sernavê “zarok û filmên wan” de li ser girîngî, taybetmendî û amanca filmên zarokan hatiye sekinandin. Nivîskar di van her çar sernavan de mijar bi awayekî zelal ragihandiye. Di van nivîsan de em fêhm dikin ku nivîskar di vê



warê de gelek tişt xwendiyê û di vê sehayê de gelek lêkolîn kiriye. Cih daye fikrên gelek kesên ku di vê qadê de xebat kirine. Ev jî nivîsên nivîskar xurttir û derbasdar kiriye.

Di beşa yekem û binbeşa duyem de behsa “seyra geşedanê û dîrokçeya medya û çapemenîya zarokan a kurdî” kiriye. Bi awayekî sistematîk qonax bi qonax behsa xebatên medya û çapemenîya zarokan a kurdî hatiye kirin. Di vê beşê de li ser kovar û televîzyonên zarokan yên kurdî hatiye sekinandin. Di destpêkê heta roja ev xebat hatiye amadekirin, cih daye kovar û weşanên televîzyonan. Di vê binbeşê de xebatên ku hatine kirin bi sernavên “xebatên ku li Tirkîyeyê hatine kirin”, “xebatên li Ewropayê hatine kirin”, “xebatên ku li Iraqê û Herêma Kurdistanê hatine kirin”, “xebatên li Îranê hatine kirin”, “xebatên ku li Sûrîyê hatine kirin” hatiye nîşandan. Ev kovar û weşanên televîzyonan li gorî derketina dîroka xwe hatine rêz kirin. Li ser van kovar û weşanan gelek agahîyên giring hatine dayîn. Agahîyên van kovaran hatine dayîn. Navê kovarê, derketina dîroka kovarê, çend hejmar be, berpirsiyar û nivîskarên kovaran bi awayekî birêkûpêk hatiye dayîn. Nivîskar beşa yekem bi encamekê qedandiye. Di encamê de bi kurtasî behsa van xebatan kiriye.

Subaşî di beşa duyem de behsa “vekolîn û danasîna Girr û Gallî Mindalanî Kurd” kiriye. Di vê beşê de jî dîsa gelek binbeş û sernav cih girtine. Di binbeşa yekem de destpêk cih girtiye û di vê destpêkê de behsa kovargerîya zarokan û behsa kovara yekem a zarokan a kurdî *Girr û Gallî Mindalanî Kurd* kiriye. Binbeşa duyem “sala 1946an û Girr û Gallî Mindalanî Kurd” e. Di vê binbeşê de pêşî behsa rewşa sîyasî ya wê wextê hatiye kirin û gelek agahîyên giring hatine dayîn. Di binbeşa sêyem “Girr û Gallî Mindalanî Kurd” de bi berfirehî behsa hejmarên kovarê, amanc û mebesta kovarê, babetên di kovarê de û naveroka kovarê kiriye. Bi tabloyekê berhemên ku di kovarê de cih girtine, hatine nîşandan. Di tabloyê de cureyên nivîsan, sernivîsê wan û nivîskarê wan hatiye dayîn. Heta ku nivîs çend rûpel e û di kîjan hejmarê de derketiye hatiye destnîşankirin. Nirxandineke berfireh û analîtîk hatiye kirin.

Di binbeşa “Kovara Girr û Gallî Mindalanî Kurd” û destpêka rojnamenûsîya perwerdeyî” de nivîskar pêşî behsa “Komara Demokrat a Kurdistanê” kiriye û behsa damezrandina komarê, xebatên komarê kiriye. Navên kovarên ku wê wextê hatine çap kirin daye. Di vê binbeşê de behsa kovargerî û rojnamenûsîya zarokan ya li Iraq û Îranê kiriye. Derbarê kovargerî û rojnamenûsîya li Iraq û Îranê de gelek agahî hatine dayîn. Di vê binbeşê de bi sernavê “teknîka rojnamenûsîyê di kovarê da” kovar ji aliyê teknikî ve hatiye nirxandin. Hin şaşîyên redaksiyonê bi tabloyekê hatiye nîşandan. Ji aliyê naverokî ve hatiye nirxandin û dîsa bi tabloyekê cureyên berhemên û hejmarên berhemên hatiye nîşandan. Di vê binbeşê de sernaveke wiha “edebîyata zarokan di kovarê da” cih girtiye. Di vê sernavê de nivîskar pêşî li ser edebîyata zarokan û li ser edebîyata zarokan a kurdî hin agahîyan dide, piştî derbasî kovarê dibe. Nivîskar helbest û gotarên di kovarê de li gorî edebîyata zarokan nirxandiye û fikrê xwe destnîşan kiriye.

Di binbeşa “jiyannameya nivîskarên gotarê” de navên heft nivîsakaran cih girtiye. Navên wan nivîsakaran ev in: Muhammed Tofîq Wirdî, Mela Qadirî Muderrîsî, Muhammed ‘Eterî Gillollanî, M.S. Qizilcî, M. Azer, Hêjarê Mukiriyani, Hêmin Mukiriyani. Nivîskar yek bi yek ev nivîskar dane nasandin û behsa xebatên wan kiriye.

Di dawîya pirtûkê de du pêvek cih girtine. Pêveka yekem “wergera kurmancî ya kovara Girr û Gallî Mindalanî Kurd” e. Pêveka duyem jî “nusxeyên orjînal yên kovara Girr û Gallî Mindalanî Kurd” e. Dîyar e nivîskar ji bo wergera kurmancî kedeke baş daye û hemû nivîs bi awayekî birêkûpêk û bihûrgilî amade kiriye.

Wekî encam em dikarin bibêjin ev pirtûka me danasîna wê kirî di qada xwe de pirtûkeke yekem e û valahîyek dagirtiye. Cara ewil di kurmancî de bi vî awayî xebatek hatiye amadekirin. Cara ewil Kovara Girr û Gallî Mindalanî Kurd bi vî awayî hatiye lêkolînkirin û li Bakur vekoler pê hesîyane ku kovareke

---

wiha ji bo zarokan hatiye amadekirin. Di beşa “Dîrokçeya çapemenî û Medyaya zarokan a Kurdî” de li ser gelek mijarên edebîyata zarokan hatiye sekinîn. Di warê dîrokçeya medya û çapemenîya zarokan a kurdî de gelek agahî hatiye dayîn. Nivîskar agahîyên li ser kovaran berfirehtir kiriba dê xebateke baştir û zelaltir çêbûya. Di beşa danasîna kovarê de danasînek û nirxandineke têr hatiye kirin. Kovar bi her awayî ve bi zelalî hatiye nirxandin. Di vî karî de bê guman lêkolîna Hîmdayî Husên ya li ser rojnamegerîya kurdî jî gelek bandor lê kiriye. Çimku di qîsmeke danasîna kovarê de wekî wergêran e ku wê jî ji Hîmdayî Husên neqil kiriye. Di vê beşê de tenê ji aliyê sernavan de tevlihevîyek heye û sernav pir zêde ne û çend cihan jî heman agahî hatiye dayîn. Bi îhtîmaleke mezin ew jî ji ber wergêrana rasterast ya Hîmdayî Husên e. Heke xebata Husên di nav danasîna xwe de bimehanda dê maqûltir bûya. Di sernavê “sala 1946an û Girr û Gallî Mindalanî Kurd” de li ser komeley JK (Jîyanewey Kurdistan) û li ser PDKÎ (Partîya Demokrat a Kurdistanê Îranê) agahî hatiye dayîn û piştê vê dîsa di sernava “Komara Demokrat a Kurdistanê” de dîsa agahîyên komeleyê û partiyê cih girtine. Bi me hewce nedikir ku du cihên cuda dê heman agahî bîn dayîn. Di bin yek sernavî de agahî hatibûna dayîn dê baştir bibûya. Çend tiştên bi vî awayê nebin pirtûk ji aliyê dabeşkirina beşan û sernavan ve serkeftî ye. Nivîskar mijarên xwe kategorîze kiriye û li bin sernavan bi awayekî birêkûpêk rêz kiriye. Ev kategorîzekirina nivîskar mijar zelaltir kiriye û ji aliyê xwîneran ve jî fehmkirin hêsantir kiriye. Nivîskar di gelek cihan de tablo bi kar aniyê, vê jî ji aliyê dîtbarî ve gotinên wî hêsantir û xurtir kiriye. Ji aliyê jêrenotan ve jî pir dewlemend e, di van jêrenotan de gelek agahîyên giring daye û ji gelek çavkanîyan û ji gelek kesan sûd wergirtiye, ev jî nişanî me dide ku nivîskar ji bo vê pirtûkê lêkolînek û xwendineke kûr kiriye. Bi her awayî di vê pirtûkê de kedek û xebateke mezin heye. Ev pirtûk ji bo edebîyata zarokan a kurdî, ji bo çapemenî û medyaya zarokan a kurdî dibe çavkanîyeke sereke. Kesên ku di van qadan de bixebitin û tarîxa nêzik ya kurdan meraq dikin û kesên ku bixwazin xisûsen vîzyon û mîsyona Komara Kurdistanê bibînin, dikarin ji vê pirtûkê sûd wergirin.



### Çavkanî/Referances

- Aytekin, H. (2016). *Çocuk ve Gençlik Edebiyatı*. Ankara: Anı Yayıncılık
- Bayram, Y. (2005). Türk Edebiyatının İlk Çocuk Dergisi: Mümeyyiz (1869-1870). *Hece Çocuk Edebiyatı Özel Sayı*, 9 (10), 484-500.
- Oğuzkan, F. (2022). *Çocuk Edebiyatı*. Ankara: Anı Yayıncılık
- Subaşı, K. (2018). *Girr û Gallî Mindalanî Kurd- Dîrokçeya Çapemenî û Medyaya Kurdî ya Zarokan*. Stenbol: Weşanên Nûbihar
- Şimşek, H. (2001). "19. Yüzyılda Çocuk Dergiciliği ve Eğitsel İşlevleri Üzerine". *Milli Eğitim Dergisi*, (151), 1-9
- Taher, Î. (2018). Perwerdeya Nirxên Çandî û Civakî di Kovargerîya Zarokan a Kurmancî-Latîni de. (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî). MAÜ. Enstîtuya Zimanên Zindî yê Tirkîyeyê.
- Tosun, T. (2017). Edebiyata Zarokan di Kovara Nûbiharê de. (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî). BÜ. Enstîtuya Zimanên Zindî